

K. T.
Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstitûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyê
Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî
Teza Lîsansa Bilind

DI ÇEND PEXŞANÊN KURMANCÎ DE EVÎNÊN
EFSANEVÎ

Edîp POLAT
11711010

Şêwirmend
Prof. Dr. Kadrî Yildirim

MARDÎN- 2015

Ji bo Rêveberiya Enstîtuya Zımanên Zindî Yên Li Tırkiyeyê

Ev xebat ji aliyê jûriya me ve di Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî de weku teza lîsansa bilind hatiye qebûlkirin.

(îmza)

Serok :
(Unvanê Akademîk, Nav-Paşnav)

(îmza)

Endam :
(Unvanê Akademîk, Nav-Paşnav)

(îmza)

Endam :
(Unvanê Akademîk, Nav-Paşnav)

Pesendkirin

Ez pesend dikim ku şanênavên li jor ên endamên perwerdekarên navborî ne.

Îmza

.....
Unvanê Akademîk, Nav-Paşnav
Birêvebirê Enstîtuyê
(Mohr)

KURTE

DI ÇEND PEXŞANÊN KURMANCÎ DE EVÎNÊN EFSANEVÎ

EDÎP POLAT

Ceribandin ne tê de, hemî cureyên pexşanên kurdî, ji gelek aliyan ve nêzîkî hev in. Di wêjeya gel de, nexasim di mijara **Evînên Efsanevî** de cudahiyên cureyên wêjeyê pir nêzîkî hev dibin û carna jî ev cudahî ji holê radibin.

Min ji her efsaneyekî sê-çar waryant an form girte dest û ew dan ber hev. Heke naverok, karakter, herikîna vegotinê, honandina bûyeran weke hev be, berhem kurt be jî taybetiyên wê bişibin waryantekî, me ew weke “form” bi nav kir. Kurtahiya Efsaneyan min li gor waryanta herî dirêj û herî naskirî nivîsiye. Karakterên efsaneyê çî yên sereke bin, çî jî yên stero bin, min hemiyana lêkoland. Têkiliyên wan yên hestiyarî, xismî, olî, hevaltî û hwd. hêjayî lêkolînê bûn, lê li gor waryantan ev karakter û têkiliyên wan dihatin guhertin, min ev xal bi xal girte dest. Heke ev nehatana zelalkirin, waryant dê nehatana famkirin. Hejmara waryant û formên hin efsaneyan gelek bûn, me nikarîbû kurtehiya hemiyana bigirtaya nava vê xebatê, ew dikarîbû bibûna mijara teza doktorayê, lê min waryant û formên sereke û di nav gel de bi cih bûne bêtir girte dest. Hin ji van waryant an forman bi tirkî bûn, lê ji ber ku ew efsaneyên kurdan bûn, giyanên wan bi kurdî û bûyer li axa Kurdan derbas dibû, min ew jî girtin nava vê lêkolînê (mînak Mem û Zîna M. Said Ramazan el-Bûtî û Dewrêş ile Adûle ya Bawer Ferat). Efsane di kîjan demê de pêk hatine û li kuderê hatine jîyîn bo herkesî girîng e, bi qasî ku hatibûn zanîn min ew nivisand. Pêwîstî bi nirxandina encama hemî efsaneyan hebû, min pêwîstî bi şirovekirina wan dît. Van mijarên sereke ku di hemî efsaneyan de nayên guhertin, weke şeweya hevbeş a lêkolînê derket holê. Min cih neda kilam, helbest, destan an hwd. şeweyên menzûm ên van efsaneyan. Ji ber ku mijar bi pexşanan hatibû sînorkirin. Lê di nava metnan de min cih da çend ristên derbareyê van efsaneyan de.

Di dawiya xebatê de beşa “Encam” cih girtiye ku ew danberhev û nirxandina hemiyana e. Li gel vê, di “Pêvek 1” de kilameka li ser Dewrêş ku riwayet e ji alî Edûlê ve hatiye gotin cih girtiye.

Di encama vê xebatê de min şeweyek din di wêjeya kurdî de dît: Forma wêjeya têkel. Weke tê zanîn di wêjeyê de ji aliyê rûxsarî (morfolojîk) ve nivîs ya bi ristan û malikan tê nivîsîn ku em ji wan re destan, mesnewî, xezel û hwd. dibêjin, an jî weke pexşan tên

amadekirin ku em ji wan re jî çîrok, kurteçîrok, roman, serpêhatî û hwd. dibêjin. Forma Wêjeya Têkel ji van du şeweyan ku ew bi hev re tîk bikaranîn pêk tê. Ango di metnekê de him pexşan heye him jî helbest, kilam an destan hene. Ev şêwe jî bi piranî di evînen efsanevî de hatiye bikaranîn. Ji bo ku em vê formê baş têbigihên, min mînakên evînen efsanevî weke mijara lêkolîn û lêgerînê hilbijart.

Bi taybetî evîna Bijen û Menîce berî niha di nava kurmancan de zêde nedihat nasîn, lê dê were dîtin ku ji gelek aliyan ve ne kêmtir evîna Mem û Zînê ye. Mesnevîya Ehmedê Xanî Mem û Zîn ji aliyê Mele Mahmûdê Bazîdî ve bi şeweya kurteçîrokê jî derbasî qada wêjeyê bûye, lê tiştêk ji naveroka xwe wînda nekiriye. Wekî wê, di Şehnameya Fîrdewsî de bi şeweya mesnewî eşqa Bijen û Menîce cih digre, lê van evînan weke ku dê di berde wama vê tezê de were dîtin, li gelek herêman weke çîrok jî hatine gotin û weke pexşan di pirtûkan de cih sitendine. Bi kîjan şeweyê were gotin an nivisîn, kurt an dirêj, li gorî herêman herçiqas wariantên wan hebin û navên lehengên wan û cihên qewimîna bûyeran werin guhertin jî, tiştêk ji naveroka van evînan kêmtir nebûye.

Şayesandinên ku di helbest an stranên de nikarin werin gotin, di nava rûpelên çîrok an romanên de ku xwedîyê derfeta dirêjkirina gotinê ne, bi rihetî û dorfirehî bi lêv dibin. Mînakê heye ji dewra B. M. ye: Evîna Bijen û Menîce. Ev eşqek otantîk e ku hêja di şevbêrkên kurdan de ji çîrokbêjan tê guhdarîkirin. Bijen xwarziyê Ristemê Zal e, Menîce keça qralê Tûranistanê Efrasiyab e ku ew neyarê Îraniyan e. Astengiya mezin ev neyartî ye. Evîna Dewrêşê Evdî û Edûlê di şerê nava Milan û sê eşîrên din, Tirkmen, Gêsî, Şemiran de xurt dibe û bi trajedî xelas dibe. Astengiya mezin li pêşîya vê evîne baweriya olî û cihêtiya çînî ye. Dewrêş him Êzîdî ye û him feqîr e, lê Edûl misilmanek sunî ye, keça Mîr Zor Temir Paşayê Milî ye. Evîna Siyabend û Xecê bi hesretê re rû bi rû dimîne; Siyabend eşqiya ye, li çiyê ye û tenê ye, lê Xecê xuşka heft birayan e. Birayên Xecê wê nadin Siyabend, ew jî wê direvîne, dibe serê çiyayê Sîpanê. Siyabend li wir bi derba quloçê gakuwî, di encama qezayekê de di gelî re wer dibe û dimire. Xecê xwe li pey davêje. Di vir de nakokiya tîkiliyên civakî heye, heke ew qeza pêk neyê dibe ku bi hev re bi bextewarî bijîyana. Evîna Mem û Zîn ku ewil di Destana Memê Alan de cih girtiye, piştê ji aliyê Ehmedê Xanî ve bi terzê mesnewîyê hatiye nivisîn, di sedsala 18. de ji aliyê Mele Mehmûdê Bazîdî ve weke çîrok hatiye amadekirin. Di van salên dawî de jî bi şeweya romanê hatiye weşandin.

Me ji van evînan tenê çar mînak girtin dest: Dewrêşê Evdî û Edûlê, Siyabend û Xecê, Bijen û Menîce, Mem û Zîn. Lê bi dehan mînakên bi vî rengî hene.

ÖZET

BİR KAÇ KURMANCI NESİRDE EFSANE AŞKLAR

EDİP POLAT

Denemeler hariç, bütün kürtçe nesir edebiyatı örnekleri birçok açıdan birbirine yakındır. Halk edebiyatında, özellikle Efsanevî Aşklar'ı içeren eserlerde edebî türler arasındaki farklar çok azalır, bazen de neredeyse ortadan kalkar.

Her efsaneden üç-dört varyant veya formu ele aldım ve karşılaştırdım. İçerik, karakterler, anlatım silsilesi, olay örgüsü aynı olanlar, eser kısa da olsa özellikleri bir varyantına benziyorsa, biz onu “form” olarak adlandırdık. Efsanelerin özetlerini en uzun ve halk arasında daha çok bilinen varyantı esas alarak yazdım. Efsanenin karakterlerini ister ana karakterler ister stero karakterler olsun, hepsini inceledim. Duygusal, akraba, dini, arkadaşlık vs. ilişkileri incelemeye değerdi, fakat varyantlara göre bu karakterler ve ilişkileri değişmekteydi, bunu ayrı bir başlık altında ele aldım. Eğer bu durum netleştirilmeseydi, varyantlar anlaşılmayacaktı. Bazı efsanelerin form ve varyantları çok fazlaydı, hepsinin özetlerini bu çalışma kapsamına dahil edemedim, bu ancak bir doktora tezi olabilirdi, fakat halk arasında yerleşik olan belirli form ve varyantları daha çok ele aldım. Bu varyant ve formların bazıları türkçe idi, fakat onlar kürt efsaneleri oldukları, eserin ruhu kürtçe ve olay kürtlerin yaşadıkları topraklarda geçtiği için, onları da bu inceleme içine aldım (örneğin M. Said Ramazan el-Bûtî tarafından yazılan Mem û Zin romanı ile Bawer Ferat tarafından yazılan Dewrêş ile Adûle). Efsanelerin ne zaman ve nerede yaşandıkları herkes için önemlidir, öğrenebildiğim kadarıyla bu konuyu inceledim. Bütün efsanelerin sonuçlarının değerlendirilmesi gerekirdi, kendimce yorumlanmasını uygun gördüm. Bütün efsaneler için değişmeyen bu konu başlıkları, incelemem için paydaş bir yöntem olarak ortaya çıktı. Konu nesirlerle sınırlı olduğu için, bu efsanelerin ezgi, şiir, destan vs. manzume şeklindeki söyleyişlerine yer vermedim. Fakat bu efsanelerin metinleri içinde birkaç dizeye yer verdim.

Bütün örneklerin genel değerlendirilmesi ve yorumlanması için, çalışmanın sonunda “Sonuç” yer almaktadır. Bununla birlikte “Ek 1” de Edûlê'nin tarafından söylendiği rivayet edilen Dewrêş üzerine bir ezgi (kilam) yer almaktadır.

Bu çalışmanın sonunda kürt edebiyatında başka bir yazın biçimiyle karşılaştım: Karma edebiyat formu. Bilindiği gibi edebiyat tarihinde şekil (morfoloji) bakımından bir yazı ya dize

ve beyitlerden oluşur ki biz buna destan, mesnevî, gazel vb. deriz, ya da nesir şeklinde hazırlanırlar ki biz bunlara masal, öykü, roman, anı vb. deriz. Karma Edebiyat Formu bir arada kullanılan bu iki türden oluşur. Yani bir metnin içinde hem nesir var, hem şiir, destan ve “kılam” var. Bu tür, çoğunlukla efsanevî aşklarda kullanılmıştır. Bu formu tam anlayabilmemiz için, efsanevi aşkların örneklerini araştırma ve inceleme konusu olarak seçtim.

Özellikle Bijen ile Menice aşkı kurmanclar arasında şimdiye kadar pek bilinmiyordu, fakat görülecek ki bir çok açıdan Mem ile Zin aşkıdan geri kalır tarafı yok. Ahmedî Xanî'nin mesnevisi olan Mem ile Zin, Mola Mahmudî Beyazidi tarafından öykü şeklinde edebiyat dünyasına kazandırılmış, ancak edebi omurgasından bir şey kaybetmemiştir. Bunun gibi, Firdevsi'nin Şehnamesi'nde Bijen ile Menice aşkı ikili beyitler halinde anlatılırken, bu tezin ilerleyen sayfalarında da görüleceği gibi bu sevdalar birçok bölgede masal olarak da anlatılır ve nesir olarak kitaplarda yer almışlardır. Hangi stil ile söylenmiş veya yazılmış olursa olsun, kısa ya da uzun, yörelere göre değişen varyantları olsa bile, kahraman adları ve olayların geçtiği yerler değişse bile, bu aşklar içeriklerinden bir şey kaybetmemişlerdir.

Kafiyeli şiirlerde veya ezgilerde söylenemeyen betimlemeler, sözü uzatma fırsatının daha çok olduğu öykü veya roman sayfaları arasında rahatlıkla ve genişçe dile getirilebilmiştir. M. Ö.'sine ait bir örnek vardır: Bijen ile Menice aşkı. Bu otantik aşk halen kürtlerin gece oturumlarında (şevbêrk) masalcılardan dinleniliyor. Bijen Ristemî Zal'ın yeğenidir ve Menice Turanistan kralı Efrasiyab 'ın kızıdır ki o İran'ın düşmanıdır. En büyük engel işte bu düşmanlıktır. Dewrêşê Evdî ile Edûlê'nin aşkı, Milan ve öteki üç aşiret Türkmen, Gêsî ve Şemiran arasında patlak veren çatışma döneminde gelişir ve trajediyle sona erer. Bu aşkın önündeki en büyük engel inançları ve sınıfsal farklılıklarıdır. Dewrêş hem Yezîdî hem de yoksuldur, Edûl ise sunî müslüman ve Mîr olan Temir Paşa'nın kızıdır. Siyabend ile Xecê'nin aşkı hasretle karşı karşıya kalır; Siyabend eşkıyadır, dağlardadır ve tek başınadır, fakat Xecê yedi erkek kardeşin ailedaki tek kız kardeşidir. Kardeşleri Xecê'yî Siyabend'e vermezler, o da kızı kaçıtır, Sipan dağının doruklarına götürür. Siyabend orada bir yabanöküzünün boynuz darbesiyle bir kaza sonucu uçurumdan düşer ve ölür. Xecê de peşinden atlar. Burada sosyal ilişkilerdeki çelişkiler var, eğer o kaza meydana gelmeseydi, belki de birlikte mutlu yaşarlardı. Mem ile Zin aşkı, önceleri Memê Alan destanında yer almış, sonra Ahmedê Xanî tarafından mesnevi tarzında yazılmıştır, 18. yüzyılda Mele

Mahmûdê Beyazidî tarafından öykü olarak kaleme alınmıştır. Son yıllarda ise roman tarzında yayınlanmıştır.

Bu aşklardan sadece dört örneği ele aldık: Dewrêşê Evdî ile Edûlê, Siyabend ile Xecê, Bijen ile Menîce, Mem ile Zîn. Fakat buna benzer onlarca örneğin olduğunu belirtmek gerekir.

SUMMARY
SOME LEGENDARY LOVE STORIES IN KURMANCÎ PROSE
EDÎP POLAT

Except for Essays, all kurdisch prose literature samples are in many aspects similar. In Folk Literature, differences between literary varieties get very few, especially in works including ‘LEGENDARY LOVES.’ Sometimes those differences are nearly none.

I have talked over and compared three-four varieties or forms for each Legend. The ones that have the same context, characters, sequence of statement, and event sequence, even if the work is short, but its characteristics resemble a variety, I called it as ‘FORM’. I based the summaries on the longest and familiar legends in the society. I have examined both, the main and stereo characters. The emotional, religious, friendship and relative relations worth examining, but the characters and the relations were changing according to the varieties, so we discussed them under a separate title. If It wasn’t made clear, the variations wouldn’t be understood. Some of the legends had too many forms and variations, I couldn’t add the all these summaries to this study, if we did, it would be a doctorate thesis. We mostly handled the common varieties and forms in the society. Some of these varieties and forms were in Turkish language. Since they were kurdisch legends, and happened in the land where the kurds live, I included them in my study too. The example of these are the novels: ‘Mem-û Zîn’, written by M.Said Ramazan el Bûtî, and Dewrêş û Adûlê, which was written by Bawer Ferat. When and where the legends happened is important to everybody. We examined this subject as much as we could. All the legends should have been handled in terms of evaluation and result. It should have been intepreted as well. Those unchanged headlines, for all the legends were appeared as a Standard Method. Since our subject is limited to proses, I didn’t interest in any literary works such as: poem, song, and epics, but I mentioned a few lines of texts of these legends.

A part called ‘The RESULT ’ takes place at the end of study, including samples of all comments and evaluations. Along with ‘Supplement 1’ a song (kilam), that was believed to be sung by EDÛL upon DEWRÊŞ, takes place in it too.

In this study I met another type of written in kurdisch literature: Mixing literary form. As it is known, in literature history, in terms of shape, a writing is formed by lines and stanzas and we call these epic, mesnavi, and lyric, or they are prepared as a prose that we call them story, novel, memory. Mixing literature form is formed by using these two types together, that is: both a prose and poetry, epics and song (kilam). That was mostly used in legendary loves.

In order to understand this for better, I chose 'Legendary Loves' as my investigation and examining theme.

Especially the love of Bijen and Menice was not known among kurmanacs, but it will be seen that it is not less interesting than that of Mem-û Zîn. Ahmedê Xani' s Mesnavî, Mem and Zin, has contributed much to our literature world as a story by Molla Mahmudî Beyazîdî, but hasn't lost anything from its literary value. Like this, while in Firdevsy's Şehname, Bijen and Menice's love have been stated as couplets, but as it will be seen in the proceeding parts of this thesis, in many parts this love will be stated as prose and take part in books. Whatever style and method they are written by, short or long, even if there are different variations , even changing from region to the regions, if the name of heroes and location differs, the events happening areas changes, those loves haven't lost anything from their contexts.

Descriptions that were unstated in rhymed poetries or lyrics can be uttered more easily and widely in pages of story and novels, which there is a chance of prolonging remarks .There is one examples for the era Before Christ: The love of Bijen –Menîce. This is an authentic love events still are listened at kurds night meetings by storytellers.(şevbêrk). Bijen is Ristemi Zal's nephew, and Menice is Turanistan King Efrasiyah's daughter and the enemy of İran. The great obstacle is this enmity. Dewrêşê Evdî and Edûle's love starts when a clash between Milan and the other three tribes, Türkmen, Gêsî and Şemiran breaks out, ends with tragedy. The greatest obstacle between that loves is religious and beliefs and class differences. Dewrêş both Yezid and poor. Edûl is a sunni Muslim and Temîr Paşa's daughter. Siyabend and Xecê's love encounters longing. Siyabend is a bandit, he lives on mountains. Xecê is the sister of seven brothers. Her brothers don't allow her to marry Siyabend, he took her by force and got away. He takes her on the peaks of Mountain Sipan. There he fells from a rock, with the ox's horn attacks, and dies. Xecê jumps after him. Here, there are social contradictions. If that accident didn't happen they might be living together happily. Mem and Zin love, previously took part in Memê Alan epics, later was written by Ahmedê Xanî as a mesnavî. In 18th century, was written as a story by Mahmûdê Beyazîdî, lately it has been published as a novel.

From all these loves I only took four of them: Dewrêşê Evdî and Edûlê, Siyabend and Xecê, Bijen and Menîce, Mem and Zîn. But I can specify that there are ten similar ones to these examples.

NAVEROK

| | |
|--|----|
| DESTPÊK..... | 1 |
| BEŞA YEKEM..... | 4 |
| 1. EFSANEYA EVÎNA DEWRÊŞÊ EVDÎ Û EDÛLÊ..... | 4 |
| 1.1. Kurteya Efsaneyê..... | 4 |
| 1.1.1. Karakterên Efsaneyê..... | 14 |
| 1.1.1.1. Têkiliya Karakteran..... | 15 |
| 1.1.2. Li Gor Waryantan Guherîna Karakteran û Bûyeran..... | 17 |
| 1.2. Dem û Cih..... | 28 |
| 1.3. Encam û Nirxandin..... | 29 |
| BEŞA DUEM..... | 33 |
| 2. EFSANEYA EVÎNA SIYABEND Û XECÊ..... | 33 |
| 2.1. Kurteya Efsaneyê..... | 33 |
| 2.1.1. Karakterên Efsaneyê..... | 39 |
| 2.1.1.1. Têkiliya Karakteran..... | 41 |
| 2.1.2. Li Gor Waryantan Guherîna Karakteran û Bûyeran..... | 41 |
| 2.2. Dem û Cih..... | 46 |
| 2.3. Encam û Nirxandin..... | 46 |
| BEŞA SÊEM..... | 49 |
| 3. EFSANEYA EVÎNA BIJEN Û MENÎCE..... | 49 |

| | |
|--|-----|
| 3.1. Kurteya Efsaneyê..... | 49 |
| 3.1.1. Karakterên Efsaneyê..... | 58 |
| 3.1.1.1. Têkiliya Karakteran..... | 58 |
| 3.1.2. Li Gor Waryantan Guherîna Karakteran û Bûyeran..... | 59 |
| 3.2. Dem û Cih..... | 66 |
| 3.3. Encam û Nirxandin..... | 67 |
| BEŞA ÇAREM..... | 70 |
| 4. EFSANEYA EVÎNA MEM Û ZÎN..... | 70 |
| 4.1. Kurteya Efsaneyê..... | 70 |
| 4.1.1. Karakterên Efsaneyê..... | 89 |
| 4.1.1.1. Têkiliya Karakteran..... | 91 |
| 4.1.2. Li Gor Waryantan Guherîna Karakteran û Bûyeran..... | 93 |
| 4.2. Dem û Cih..... | 109 |
| 4.3. Encam û Nirxandin..... | 110 |
| ENCAM..... | 114 |
| ÇAVKANÎ (BÎBLİYOGRAFYA)..... | 122 |
| PÊVEK-1..... | 125 |
| PÊVEK-2..... | 128 |

PÊŞGOTIN

Ji aliyê şêweya vegotinê û herikbariyê ve têkiliyek di nava çîrok, kurteçîrok, roman û hemî cureyên pexşan û wêjeya devkî ya efsaneyên kurdî de tê dîtin. Bi piranî ew ji bo guhdaran hatine gotin, ne ji bo xwendevanan, di hemiyana de vegotinek helbestî heye, di gelek de erka dengbêjiyê jî heye. Ev têkilî dibe sebeb ku hinek cureyên wêjeyê ji aliyê mijarê ve veguhêzin hevûdin, tevnê ji hev bigrin an derbasî nava hev bibin.

Di dîroka wêjeya kurdî de gelek mijarên evînê bi vî rengî hene ku berê weke menzûm hatine nivîsîn an gotin, lê niha weke kurteçîrok, kurteroman an "romanên nûjen" ji nuh ve tên pêşkêşkirin. Di hemiyana de aliyên hevbeş hene: Yek, hemî hezkirinên ji rêzê, hest û têkiliyên nava du zayendan, piştî ku astengî ji wan re derketine bûne evîn. Ev astengî carna şer û cengên giran bûne, carna hisreta dûrketinê bûye. Du, gelek ji wan bi trajediyana xelas bûne, negihîştine miradên xwe. Sê, herçiqas pexşan bin jî, şayesandinên ku cih girtine lîrîk in, ango helbestî ne. Çar, piraniya lehengên sereke xwedî hespên bi navûdeng bûne. Ev hesp xwedî kesayet in, famber in, dev ji siwarên xwe bernadin, bi hêz in, cisne ne, taybetiyên wan hene.

Çima me peyva "efsane" ku berî me jî hatiye bikaranîn li van evînan kir? Tê zanîn ku wateya peyva efsaneyê ji efsûnê tê û ew jî di wateya sêr û mîtolojiyê de, lê di dewsa gotegot û fablan de jî tê bikaranîn.¹ Ji aliyekî ve jî mijara me destanên evînê ve jî têkiliya xwe hene, lê cudahiya destanê ji efsaneyana ev e ku destan cureyek wêjeyê ya menzûm e, lê efsane dibe ku weke pexşan be an bi şêweya çîrokê hatibe gotin.² Mînak efsaneya Siyabend û Xecê derbasî wêjeya tirkî bûye û weke "Efsaneya Xezalê" tê nasîn. Wê sîd daye berhema Yaşar Kemal a bi navê "Efsaneya Ala Geyîk"³. Peyva "efsane" raste rast ji aliyê Yaşar Kemal ve jî hatiye bikaranîn ku lêkolîner Ömer Uluçay di berhema xwe ya bi navê "Siyabendê Silîvî" de danberheva wariantên evîna Siyabend û Xecê û berhema navborî ya Yaşar Kemal pêk aniye.⁴ Lehengên sereke yê du bûyeran Siyabend û Xelîl in. "Sebeba mirina Siyabend û Xelîl mîna hev e: Dema serê pezkûviya birîndar jêdikin, di gelî de dikevin jêr û bi xedarî birîndar dibin. Xecê û Zeyneb ji bo hezkiriyên xwe xelas bikin werîs bera bin gelî didin, lê bi ser nakevin. Encama du bûyeran dibe mîna hev."⁵ Uluçay piştî danberhevek bi hûrgilî digihîje encamek

¹ Zana Farqînî, Ferhenga Tirkî-Kurdî, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stn, 2000 û Îzolî, D. Ferheng, Weşanên Deng, Stn. 1991. Aliyên mijarên evînê yê efsûnî di beşa encamê xala 11. de hatine zimên.

² Farqînî, Ferhenga Tirkî-Kurdî, r: 316. Di xala destanê de wiha tê gotin: "Destan, dasîtan, (Ji bo helbestên ku bûyerên derbarê xwedawendan, gernasên beriya dîrokê ji xwe re kirine mijar û babet).

³ Efsaneya Xezala Belek.

⁴ Yaşar Kemal, Üç Anadolu Efsanesi (Sê Efsaneyên Enebolê), Weşanxaneya Adam, ç: 9., Stn., 2002.

⁵ Ömer Uluçay, Siyabendê Silîvî, Weşanxaneya Gözde, r: 78, Edn., 2010.

wiha: "Yaşar Kemal 'Efsaneya Alageyîk' (Efsaneya Xezala Belek) ji destana meşhûr, dîrokî û belavbûyî a Siyabend û Xecê girtiye, li hev aniye, pevbestîna wê hiziriye, rol û navan guhertiye û nivîsiye. Di vê lihevanînê de elementên mîtolojîk tune ne."⁶ Lêkolîner Uluçay di berdewama xebata xwe de wiha dibêje: "...Xewna Siyabend a ku jê re tê gotin ji xeybê dê çek û hesp jê re werin û piştî şiyar dibe rasteqîniya vê yekê dibîne, vegotîneke efsanevî ye."⁷ Destbiratiya Qedê û Siyabend jî bi şêweyek efsanevî hatiye ristîn. Di vê mijarê de jî Uluçay wiha dibêje:

"Herwiha di şer de Siyabend Qedê têk bir. Qedê bang li Siyabend kir, got: 'Raweste, min te di xewna xwe de dît. Heta niha kesekî piştî min nedaye erdê. Lê, tenê kesek dê min têk bibe, navê wî jî Siyabend e. Ez dê jê re bibim rêheval û birayê axretê.' Siyabend bi destê wî girt û ew rakir û ew bûn birayê hev. Ev motîvek efsanevî ye."⁸

Di her çar mînakên ku me lêkolandiye de efsûn û mîtolojî hene, lewma me navê "efsane" bi kar anî. Her çar mînakên me di heman demê de destan in jî, lê seba bi hemî cureyên wêjeyê hatine nivîsîn, ew tenê di cureya menzûma destanê de hefs nebûne. M. Emîn Bozarslan di pêşgotina wergêra xwe ya Mem û Zîna Ehmedê Xanî de wiha dibêje: "Çîroka Mem û Zînê bi navê 'Memê Alan' di nava xelkê Kurd da gelek belavbûye û gelek kevn e. Ev çîrok ji Berî Mîladê ve di nava xelkê de tê gotin û bûye destaneka mîtolojîk."⁹ Di vir de tê dîtîn ku Bozarslan qala çîrokiya Mem û Zînê dike, ango pexşeniya "Memê Alan" tîne zimên. Berhevkar Roger Lescot di destpêka berhema xwe ya Memê Alan de di gelek cihan de (mînak di rûpelên 7, 8, 9, 11, 13, û 17an de¹⁰) raste rast bi peyva "efsane"yê çîroka Memê Alan bi nav dike. Wiha dibêje: "Efsaneya Memê Alan ji mêj ve ji hêla Ewrûpiyan ve tê zanîn. Hê di 1890an de A. Socin guhertoya pêşîn amade kiribû. Di pey wî re jî A. Von Le Çoq (1930), Oscar Mann (1906, 9) û Hugo Makas (1926) gelek guhertoyên (versiyonên) din ên Memê Alan derxistin holê."¹¹ Di berdewama berhevoka xwe de Lescot dibêje ku wî Memê Alan jî nêzikî bîst dengbêjan guhdarî kiriye û piraniya wan destana Memê Alan bi tevahî nizanibûne, lê çend kesan jî wan tiştên ku berê jî bîr kirine weke pexşan (nesîr) vegotine. Ew gava qala

⁶ Uluçay, h. b. r: 79

⁷ Uluçay, h. b., r:76.

⁸ Uluçay, h. b. r: 76.

⁹ Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, Weşanxaneya Hasat, r: 10, Stn., 1990.

¹⁰ Roger Lescot (Berhevkar), Memê Alan, Weşanxaneya Avesta, r: 7, 8, 9, 11, 13, 17. ç: 3, Stn., 2013.

¹¹ Lescot (Berhevkar), h.b., r: 8, ç: 3, Stn., 2013.

belavbûna efsaneya Memê Alan dike, dibêje "Tenê li herêmên ku zaravayên din ên kurdî (Zaza, Baba kurdî) tên axaftin, ev efsane belav nebûye." ¹²

Ji bo ku bûyereka an cureyek wêjeyê weke "efsane" were binavkirin, pêwîst e ku di nava gel de pir belavbûyî be, ango wariantên xwe hebin. Çar mijarên ku me girtine dest, li hemî deverên ku kurd lê dijîn bi şeweyên cihê hatine gotin. Di destanan de ev pêwîstî tune ye, lê ev yek hebûna wariantên destanan ji holê ranake. Aliyekî destanan qehremaniyê jî duhundurîne, lê di efsaneyan de hebûna cengê an lehengiyê ne pêwîst e.

Di vê babetê de pirsek din jî ev e: Kîjan aliyên van Evînên Efsanewî hene ku cureyên nezmê, pexşanê an romanê nêzîkî hev dikin? An çî dibin sebeb ku evîna Dewrêş û Edûlê, Siyabend û Xecê, Mem û Zîn an Bijen û Menîce him weke stran, him weke helbest û him jî weke mijara romanekê an çîrokekê werin nivîsandin? Em li pey pirsê ewil çûn û me dît ku aliyên mîstîk û surrealîst, mijarên otantîk û veguhestina evînên dunyewî bi yê Xwedayî ve, vê yekê bi xwe re tîne. Herwiha belavbûna mijarê ya di qada wêjeya devkî de vê yekê xurt dike. Mînak mesnewî weke cure nêzîkî romanê ye; mijar herikbar e, rist bi ristan ve girêdayîne, ew dikarin veguhezin hev.

Di van salên dawî de gava romanên nûjen weke cureyek nuh ketin nava wêjeya kurdî, hin nivîskaran mijarên romanên xwe ji berhemên klasîk ên wêjeya kurdî girtin; raperîn û evînên efsanewî bi şeweya romanên pêşkêş kirin. Şewê hat guhertin, lê mijar û lezeta wêjeyê nehat guhertin û lewma jî ev yek teşe girt, bi pêş ket. Roman û pexşanên bi vî rengî herikbar bûn, helbestî bûn û xwedî şayesandinên xurt bûn. Ev yek bala xwendevanên wêjeyê dikişand. Herwiha, lehengên ku jixwe berê di dîroknasiya kurd de cih digirtin, ji aliyê xwendevanên ve dihatin nasîn, niha weke lehengên romanê jî dertên pêş.

Aliyên hevbeş yê van efsaneyan hene; ji ber ku hemî bingeha xwe ji wêjeya devkî digrin, xwedî form û wariant in. Cihêtiya nava wariantan li gor herêman û welatan tên guhertin, navê lehengan jî li gor zimanan bi lêv bûne. Mînak bi Tirkî "Efrasiyab" di Kurmancî de weke "Elfesîya" cih girtiye. Herçiqas ew efsaneyên kurdan bin jî, di zimanên din ên herêmê de jî tên gotin û nivîsandin. Mînak li Rûsyayê Siyabend wekî "Siamanto" tête nasîn. Di wêjeya Tirkî de Huseyin Erdem bi navê "Siyabend ile Xecê" çîrokek dirêj nivîsiye. Mînakên wiha jî di nava belge û listeya çavkaniyên me de cih digrin.

¹² H.b. , r: 7 .

Di dema amadekirina vê tezê de em rast li gelek astengi û zehmetiyan hatin. Civandina berhemên pexşan ne hêsan bû, hin ji wan bi zimanê gel hatibûn nivîsîn, me ew sererastkir. Hin çavkanî jî çapên wan xelas bibûn, me ew yekser ji nivîskarên wan xwestin û bi dest xistin.

Ji bo alîkariyên wî yên hêja, ji şêwirmendê tezê Prof. Dr. Kadrî Yildirim re spas dikim.

| DANBERHEVA ÇEND PEXŞANÊN EVÎNÊN EFSANEVÎ | | | | | | | |
|---|--------------|------------------------------|---------------------------------|----------------------------|--|-------------------------|--|
| NAVÊN EFSANEYAN | ZARAV | ŞEWEYÊ PEXŞANÊ | ASTENGÎ | ÇAVKANÎ | NAVÊN DESTAN/ ÇÎROKAN | ENCAMA EVÎNÊ | NAVÊ HESPÊ LE- HENG |
| DEWRÊŞ Û EDÛLÊ | Kurmançî | Roman/Zargotin | Şerên Eşîrî/ Nakokiya Olî | Wêjeya Devkî / Roman | Destana Dewrêşe Evdî, Dewrêşê Evdî û Edûl | Trajedî û Mirin | Hedban |
| SIYABEND Û XECÊ | Kurmançî | Roman/Zargotin Û Çîrok | Nakokiya Çînî û Malbati | Çîrok/ Wêjeya Devkî | Siyabend û Xecê, Siyabend û Xecê (Roman) Siyabend | Trajedî û Mirin | Deybil- qiran |
| BIJEN Û MENÎCE | Kurmançî | Destan/Zargotin | Nakokiya Malbatî û Olî | Destan/Wêjey a Devkî | Şehnameya Fîrdewsî, Çîrokên Mala Zalê | Zewac/ Bextewarî | Şev- reng (Şeb- reng) |
| MEM Û ZÎN | Kurmançî | Çîrok, Roman/Zargotin | Nakokiya Malbatî | Çîrok / Wêjeya Devkî | Romana Mem&Zîn Çîroka Mem û Zînê Mem û Zîn | Trajedî û Mirin | Bozê Rewan |

LÎSTEYA KURTKIRÎYAN

b.n.: Berhema navborî

bnr: Binêrin

B. M.: Berî Mîladê

c: cild

ç: çap

Dr.: Doktor

Edn.: Edenê

Enq.: Enqere

H.b. : Heman berhem

hwd: Her wekî din.

Hwl.: Hewlêr

Îzm.: Îzmîr

K. T. : Komara Tirkiyeyê

P. M. : Piştî Mîladê

r. rûpel

Stn: Stenbol

Stck.: Stockholm.

T. C. : Türkiye Cumhuriyeti.

wer.: Wergêr

weş.: Weşanxane

DESTPÊK

Di wêjeya kurdî ya gel de gelek evînên dîrokî hene ku ew bûne efsane: Mem û Zîn, Siyabend û Xecê, Bijen û Menîce, Derwêş û Edûlê, Zal û Rûdabe, Cembelî û Binefşa Narîn, Tahar û Zuhre û hwd. Balkêş e ku gava navên du evîndarên efsanewî tê bilêvkirin an nivisîn, di zaravayê kurmançî de navê ewil yê mêran e yê duem yê keçan e. Ev yek wekî kevneşopiyek e ji dîrokê heta niha hatiye. Mînak kesek nabêje Zîn û Mem, di çavkaniyên nivîskî de jî peyva Zîn li pêşiya “Mem” cih nagre, lê wekî “Mem û Zîn” tê nîşandan. Herwiha evîna Siyabend û Xecê, Derwêşê Evdî û Edûlê, Bijen û Menîce jî wiha tên binavkirin. Ev yek belkî ji çanda serdest a pederşahiye tê, belkî jî vegotinek tradîsyonel e.¹³

Ji gelek aliyên ve ev efsane dişibin hev. Pirseka vê tezê ya zanistî ev e: Di nava van efsaneyên de hevpariyek çewa heye? Mînak di hemiyên de ji lehengên evîndar yek di malbatê de tekane ye, ya keç tenê ye ya jî xort tenê ye. Mînak di mijara evîna Derwêşê Evdî û Edûlê de, Edûlê keça Zor Temir Paşayê Milî ye, ne birayê wê ne jî xuşkên wê hene. Di efsaneya Siyabend û Xecê de, heft birayê Xecê hene, lê lehenga efsaneyê Xecê di malbatê de keçek tenê ye. Di efsaneya Bijen û Menîce de, Bijen xwarziyê Ristemê Zal e, birayê wî tune ne, ji bilî Ristemê Zal kesek hewl nade bo wî xelas bike. Di efsaneya Mem û Zînê de, Mem ji dê û bavê xwe bi tenê ye, Zîn ne bi tenê ye xuşka wê Sîfî heye, lê bavê wê tune ye.

Herwiha di van efsaneyên de, ji malbata aliyê keçê yek teqez ji evîndaran re dibe asteng, carna jî dibe neyar. Em li mînakên xwe binêrin: Di efsaneya Derwêşê Evdî û Edûlê de bavê Edûlê Zor Temir Paşa zalimek e, naxwaze keça xwe bide Derwêşê Evdî yê êzidî. Ewil malbata wî dişîne nefiyê, evîndaran ji hev dûr dixîne. Piştî şertekî zehmet dide ber Derwêş, ew dike serleşker û dişîne şerê Gêsan-Tirkmenan-Şemiran yê bi xetere. Heke Derwêş vegere jî, encama wê evîne ne diyar e. Di efsaneya Siyabend û Xecê de, heft birayên Xecê naxwazin xuşka xwe bidin Siyabend. Li dijî wî tevdigerin, di warianteka vê efsaneyê de Siyabend her heftan dikuje û Xecê direvîne. Di efsaneya Bijen û Menîce de bavê Menîce Elfesîya (Efrasiyab) hukumdarekî şeddad e, dixwaze Bijen daleqîne, piştî biryara xwe diguhere û wî dike bîra zîndanî. Di efsaneya Mem û Zîn de, Mîr Zeydîne kekê Zînê bawerî bi fesadiya Beko tîne û Mem dike zîndanê.

¹³ Di zaravayên din ê kurdî de dibe ku prensîbek wiha tune be. Mînaka "Leyla û Mecnûn" a di kurmançî de wekî îstîsna tê nixandî.

Herçiqas ew naxwaze wî bikuje jî, lê ji bihevrebûna du evîndaran re dibe bend û asteng. Gava vê helwesta xwe diguhere, êdî dereng dimîne, Mem di zîndanê de dimre.

Çima di her çar mînakan de malbatên keçan ji evînen wan re dibin asteng? Di sîstema pederşahiye de jin û keç di bin parastina mêran de tên dîtin, mefhûma "namûsê" heye û parêzvanên wê mêr in. Mêr dixwazin keç û xuşkên xwe qaşo ji "evîneka ne li rê" biparêzin, lê her car "rast" tevnagerin, carna jî mîna ku di çar efsaneyan de tê dîtin dibin asteng û neyarên evîndariyê. Du pexşanên (ku ji aliyê nivîskarên xwe ve weke roman hatine binavkirin) me girtine dest bi tirkî ne, yek jî bi Erebi ye lê li tirkî hatiye wergerandin. Her sê jî ji aliyê mijara xwe ve dişibin hev; parçeyek ji çanda kurdî ne û efsaneyê evînen kurdan e: "Mem û Zîn" a M. Saîd Ramazan el Botî bi navê "Memo Zeyn Kissatu Hubbîn Nebete fi'l-Erdî ve Eynae fi's-Semaî" (Mem û Zîn, Çîroka Evînek ku li Erdê Hêşîn Bûye lê li Ezman Kemiliye) bi erebî hatiye nivîsîn, di sala 1982an de li Şamê çapa wê ya 5. hatiye weşandin. "Dewrêş ile Adûlê" (Dewrêş û Edûlê) ya Bawer Ferat, "Sîyabend ile Xecê" (Siyabend û Xecê) ya Hüseyin Erdem bi tirkî hatine nivîsîn. Ev berhem bi naverok, mijar û tevna xwe bi kurdî ne, bingeha xwe ji wêjeya devkî ya kurdan girtine. Van berheman ji ber ku waryantên cihê bûn, me ew girtin nava vê xebatê. Mem û Zîna El-Bûtî ne tê de, nivîskarên du berhemên din çima tirkî hilibijartine, mijara niqaşê ye, li gor şert û mercên demê yê Tirkîyeyê divê werin nirxandin. Tenê nivîsîna bi zimanê wan yê tirkî an erebî, helbet wan berheman nake malê tirkî û erebî. Ev yek xurtbûn û meşhûrbûna van efsaneyan dide nîşandan ku çewa ketine nava çand û zimanên din ên herêmê. Di heman demê de, ev yek nîşaneyê tesîra pişaftina zimanên din ên li ser kurdî ye jî. Ji ber ku ev jî taybetmendiyek çand û folklorê kurdî ye, me van mînakan girte nava xebatê.

Di van efsaneyan de balkêşiyek heye ku, lehengên sereke xwedî heval in û van hevalan carna ew ji qusûmat û belayan xelas dikin, carna xayîn tevdigerin, wêrek tevnagerin. Mînak hevaleyê Derwêşê Evdî Eferê Gêsî ye ku ew ji eşîra neyarê Milan e, yê din Sadûnê birayê wî ye. Efer di rewşeke birîndar de digihîje ser Derwêş, lê nikare wî xelas bike. Hevalê Bijen Gurgîn (di hin waryantan de Hejale an Ecawîl Paşa ye) pê re diçe welatê Tûranistanê, lê piştî Bijen diçe cem Menîce û wînda dibe, Gurgîn vedigere malê, qet li hevalê xwe nagere û napirse. Hevalê Siyabend Qeregêtranê Salê ye, pir alîkariya hevalê xwe dike, lê ew tê kuştin.

Metodolojiya vê xebatê:

Ji bo pêkanîna çarçoveya têgînî (rêmanî) me berhema "Netewe û Roman" a Haşim Ahmedzade wekî çavkanî girte dest. Berhema Ahmedzade ya ku wekî teza doktorayê

hatiye amadekirin ji heft beşan pêk tê. Di beşa pîncemîn de pînc romanên Farisî, di beşa şeşemîn de pînc romanên Kurdî, di beşa dawî de "Niqaş û Encam" cih digre. Di vê berhemê de metodolojiya lêkolîna her romanî bi heft xalan pêkhatiye: 1-Bi gelemperî berhema navborî, 2-Karakterên romanê 3-Tevna Bûyerê 4-Zaviyeya lîstikê 5-Dem û Cih 6-Dunyaya Romanê 7-Nasname.¹⁴ Metodolojiya amadekirina vê tezê ji aliyê xalên sereke de di rêça xebata li jor de pêk hatiye ku xalên wan ên sereke di bin hev: 1-Kurteya Efsaneyê 2-Karakterên Efsaneyê 3-Têkiliya Karakteran 4-Li Gor Waryantan Guherîna Karakteran û Bûyeran 5-Dem û Cih 6-Encam û Nirxandin. Ji ber ku "Nasname" û "Dinyaya romanên" nûjen û destanroman an destan-çîrokan ji hev cihê ne me ew negirt nava vê xebatê.

Herwiha di lêgerîn û lêkolîna Ömer Uluçay a bi navê Siyabendê Silivî de metodolojiya analîzê dişibe şeweya lêkolîna Ahmedzade.¹⁵

Ji bo metodolojiya çarçoveya tîgînî ya her efsaneyekî, pêwîst bû me metodolojiya xebatên li ser destanan û wêjeya devkî ya gel pêk bîyanîyaya. Şeweya xebata Roger Lescot riya me ronî kir ku di destpêka destana "Memê Alan" de dibêje: "Yekane çareya bidestxistina guhertoyeke (waryantek) biserûber û neşikestî ew bû ku, ji gelek guhertoyan yeke nuh ya têkel bihata bikaranîn. Tiştê min kir jî ev bû. Tabloya danberhevê (mûqayesê) nîşan dide ku encama vê yekê ne xerab e."¹⁶ Lescot di destpêka berhemê de bi tabloyê li gor bingeha "Guhertoya Muayen" (ango waryanta herî naskirî) di nava guhertoyên ji çavkaniyên Mişo, O. Mann, Hawar, Xanî û Macler de li gor rêza qewimîna bûyeran danberhevek amade kiriye. Aliyekî metodolojiya vê tezê ku dişibe şeweya xebata Lescot, wiha ye: Di destpêka tezê de tabloya aliyên hevpar yê çar efsaneyan cih digre. Di serê her efsaneyekî de bi sernavê "Kurteya Efsaneyê" agahdariyek giştî (mîna guhertoya têkel a Lescot) hatiye zimên û rêza bûyeran li gor rêberiya waryantek herî belavbûyî an naskirî pêşkêş bûye. Cudahî û guhertinên ku ji alî Lescot ve bi alîkariya tabloyê hatine zelalkirin, di tezê de di bin sergotara " Li Gor Waryantan Guherîna Karakteran û Bûyeran" cih girtine.

Em dê şibandin û aliyên hevpar ên van efsaneyan jî di dawîya tezê de binirxînin. Lê ji bo aliyên wan ên şibandî baş werin fam kirin, em dê wan yek bi yek bigrin dest.

¹⁴ Haşim Ahmedzade, *Ulus ve Roman (Roman û Netewe)*, Weşanxaneya Perî, Stn., 2004.

¹⁵ Ömer Uluçay, *Siyabendê Silivî*, Weşanxaneya Gözde, r: 113-121, Stn., 2010. Di beşa "Siyamend" de çîroka Siyamend û Xecê ya M. Seîd Remezani el-Bûtî hatiye lêkolandin ku metodolojiya analîza vê beşê dişibe şeweya lêkolîna Ahmedzade. Kesayet û rolên wan (li gor rêza pevbestî), dem û cih, pevbestî û şeweyê, rêza bûyeran, taybetiyên karakteran xalên sereke yê wê lêkolînê ne.

¹⁶ Lescot, *Memê Alan*, r:9.

BEŞA 1.

1. EFSANEYA EVÎNA DERWÊŞÊ EVDÎ Û EDÛLÊ

1.1. Kurteya Efsaneyê

Ji bo ku evîna Derwêşê Evdî¹⁷ û Edûlê were fam kirin, divê pêşî **Destana Derwêşê Evdî** were zanîn. Du aliyên vê destanê hene; yek jê şerê nava eşîran e, ya duemîn evîndariya Derwêş û Edûlê ye ku bi bextewarî, bi zewacê bi dawî nebûye, wekî trajediyekî bi kuştina Derwêşê Evdî qediyaye. Ev mijar di nava kurdan de weke wêjeya devkî, him ji bo dengbêjan bûye mijar û him jî weke pexşan cih girtiye. **Eyup Kiran** bi navê **Dewrêşê Evdî (Kulîlka Bilbizêk û Rim)** pexşanek (romanek) bi kurdî (zaravayê kurmancî) nivisîye.¹⁸ Lê ev pexşan realîst e, dîrokî ye û tê îdfakirin ku wekî encama lêkolînekê hatiye nivisîn. Nivîskarê wê derheqa şeweya xebata xwe de wiha dibêje:

"Di vê xebata xwe de min qasetek dengbêj Mehmûdê Hesê, qasetek Koma Armanc, sê qasetên Baqî Xidir girt û min li wan guhdarî kir. Şahîne Bekirê Soreklî bandên Baqî Xidir di înternetê de, di malpera Avestakurd.netê de, di navbera hejmarên 33-37an de weşandibûn, min ew xwendin, birêz Celîlê Celîl versiyoneke dengbêjan di *Rewşenê* de weşandibû, min ew jî xwend. Ji Siwêrekê Eliyê Sînê Helo (Ali Akmaz) bi eslê xwe aşiq bû û ji Mala Siyamo bû, ne dengbêj bû, bi qîsekirin ji min re çîroka Derwêş got. Û min li herêmê ji gelek kesan pirs kirin..."¹⁹

Heman bûyer û evîn ji romana **Bawer Ferat** a bi navê "Sewdaya Bêderman **Dewrêş û Edûlê**"²⁰ re bûye mijar. Pexşana (romana) **Îbrahîm Osman** a bi navê **Evîna Mêrxasekî**, derbareyê heman evînê û şerî de hatiye nivisîn.²¹ Nivîskarê vê pexşanê jî îdîa dike ku di encama gelek lêkolînan de berhema xwe nivîsiye, wiha dibêje: "Bûyera ku bûye mijara vê romanê ne ji encama xeyalperestiyê û ne xwerû ji çîrokekê hatiye andin. Bûyer serpêhatiya destana lehengiyê ye û qewimiye. Encama gelek lêkolînan ez

¹⁷ Me navê Derwêş bikaranî, lê di navê hin berhemana de wekî "Dewrêş" cih digre, me orjînalê navan neguhert.

¹⁸ Eyup Kiran, *Derwêşê Evdî*, Weşanên Nûbihar, Stn., 2011.

¹⁹ h.b., r: 13-14, (Beşa Pêşgotinê).

²⁰ Bawer Ferat, *Dermansız Sevda Derwêş ile Edüle (Sewdaya Bêderman Dewrêş û Edûlê)* Weşanên Yurt, Enq., 2009.

²¹ Îbrahîm Osman, *Evîna Mêrxasekî*, weşanên Lîs, Amed, 2008.

gihîştîmê, bûyera ku bûye sedema strana Derwêşê Evdî, li derdora salên 1784an qewimiye..."²² Osman di destpêka pexşana xwe de çavkaniyên xwe wiha tîne zimên:

"Wekî tê zanîn, strana *Derwêşê Evdî* di nava dirêjahiya dîrokê de ji hêla gelek stranbêjan ve hatiye gotin. Lê min destpêkê ev stran, hêj di salên zarokatiya xwe de, ji dengbêj Hesênê Gulêweynarê guhdarî kir....

...Min heman stran ji dengbêjên navdar ên wekî Mahmûdê Hesê, Emê Xêlit, Baqî Xido û gelek dengbêjên çiyayê Şengalê yên herêmî jî guhdarî kir... Di salên dawiyê de dengbêjê bi eslê xwe ji başûrê rojavayê Kurdistanê Bavê Salih strana *Delêl* bi şiroveyeke nuh berhev kir û bi şêwazeke hunermandane and."²³

Ev her sê wariant ji hin aliyan ve cihê ne, lê aliyên wan ên hevbeş jî gelek in. Lêkolîna Ömer Uluçay ya bi navê "Destana Derwêşê Evdî (Tehlîl-Tesnîf-Kilam)"²⁴ di vî warî de berhemek hêja ye. Ev mijar wekî çîrokek dirêj ji aliyê dengbêj Baqî Xudo ve jî hatiye gotin û ji aliyê Şahîne Bekirê Soreklî ve derbasî ser rûpelan bûye.²⁵ Digel ku di pexşanan (romanên) de bipiranî şerên nava eşîra Milan û yên din (Gêsan, Tirkmenan, Şemiran) tê ziman jî, evîna Derwêşê Evdî û Edûlê ji serî heta dawî wekî tevî û hestiyê van berheman hatiye bicihkirin. Em dê ne li ser şerê nava vê destanê, lê bêtir li ser evîndariya nava destanê bisekinin û lêbikolin.

Temir Paşayê Milî di nîvê sedsala 18an de reîsê eşîra Milan bûye ku ew li herêma Wêranşarê û Serêkaniyê bi cih bûye. Di nava gel de ji ber zilm û şedadiya wî, jê re **Zor Temir Paşa** jî tê gotin. Temir, Mele Elî û Îbrahîm sê bira bûne ji eşîra Milan û xuşkek wan bi navê Rehîme hebûye. Wekî din bira an xuşkên wan nayên zanîn. Ji bilî keça wî ya bi navê Edûlê, zarokên Temir Paşa tune bûne.²⁶ Di pîraniya berheman an destanan de (herwiha di romana Îbrahîm Osman de jî), bavê Edûlê Temir Paşa ye. (Nakokiyek û cihêtiyek di nava romanên navborî de heye, dê were niqaşkirin.) **Derwêş** kurê **Evdîyê Milhim** e ku ji eşîra **Şerqîyan** e, ango êzîdî ye. Li gor çavkaniyekê secereya wî wiha ye: Li Êzdîxanê **Pêpan** hebû, axayê eşîrê **Şerqî** û **Dînan** bû. Pêpan di kemînekê de tê kuştin, kurekî wî bi navê Evdî hebûye, reviyaye çiyayên alî Batmanê, bi vî awayî ji mirinê xelas bûye, lê ji ber eşqiyayên çiyê li dorhêla wî kom bûne, wî dev ji çekan û çiya berdaye û daketiye deştê. Piştî dîsa de yax nekiriye û vegeziyaye

²² Îbrahîm Osman, h.b., r: 6.

²³ Îbrahîm Osman, h. b., r: 7-8. (Ji bo du agahiyên dawî li her du rûpelan binêrin.)

²⁴ Ömer Uluçay, Destana Derwêşê Evdî, Weşanên Dîwan, Stn, 2012.

²⁵ Uluçay, h.b., "Derwêşê Evdî: Şaxê Milan/Berî", r: 267-296.

²⁶ Lê li gor wariantên ku Bawer Ferat tevîna romana xwe jê girtiye, Edûl ne keça Temir Paşa ye, lê keça birayê wî **Îbrahîm Paşayê Milî** ye. Di wê romana navborî de qet qala Temir Paşa nayê kirin.

Êzdîxanê. Secere wiha rêz dibe: Derwêş û Sadûn kurên Evdî ne, Evdî kurê Milhim e, Milhim kurê Elî ye, Elî kurê Mistefa ye, Mistefa kurê Elî ye, Elî kurê Evdî ye û ew jî kurê Pêpan e.²⁷

Êzîdî, gelek caran leqay êrîşên erebên ku alîkarî ji kurdên sunî yên misilman girtine hatine. Êzîdiyên ku nema deyax dikin, ji çiyayê Şengalê derdikevin û li çar alîyan belav dibin. “Digel ku hejmara malbatên wan ji pêncî hezaran pirtir bû jî, ji ber belavbûnê nikarîbûne hêz bicivînin. Beşek li çiyayê Şengalê, beşek li Mêrdînê, komek li çiyayên Sasonê, hin ji wan li beriya Rihayê û qebîleya Evdî jî li qûntarên Qerejdax bi cih bibûn.”²⁸ Ev malbat ji mêj ve bûye ku xizmeta eşîra Milan kiriye.

Evdê Milhim demekê dilê xwe dixwe Rehîmeya xuşka Temir Paşa, lê Paşa xuşka xwe nade wî. Çîroka vê evîne jî dirêj e, di hemî wariantan de cih digre, bêmîrad û bi awayek bextreş diqede.

Edûlê û Derwêşê kurê Evdê Milhim ji zarotî de heval bûne û bi hev re mezin bûne. Bi hev re geriyane, bi hev re çûne bêriyê, nava zeviyên û dangiyan. Lê piştî ew balix dibin, dilê wan dikeve hev. Rojeka ku bavê Edûlê dertê seyde, çavê Derwêş li wê digere, ji pişt çadîran çend jin tên, ew bi mebesta destavê bi pêş ve diçe, dinihêre ku yek ji wan dişibe Edûlê. Gava pir nêzik dibin, ew wê nas dike. Heta wê gavê bi hev re qet neaxîfîbûn, hestên xwe ji hev re venekiribûn. Edûlê jî êdî meraqliyê wî bû, dema wê Derwêş dît ji nişka ve dilê wê keliya, hestên wê pêl dan, destê xwe kir şewqe û baş dîna xwe dayê. Gava nêzî hev dibin, çav ji çavan feyz digrin û bi hev re tên radan. Rûyên wan dikenin. Rojekê jî Edûlê bi komek keçik re diçe berhevkirina kerengan, Derwêş leqay wan tê û bi neynika destê xwe tîrêjan davêje çavên Edûlê. Edûlê dikene, diranên wê yên mircanî dibiriqin. Wê keliyê ew xwe mexsûs davêje erde, wekî ku lingekî wê eş ketibêkê eniya xwe diqermeçîne. Hevalên wê û Derwêş bi peraş baz didin, “Derwêş destê xwe dirêjî Edûlê dike, dixwaze wê rake, lê ji nişka ve birûskek ew diricifîne. Wekî ku deh kes ew girtibin, nikare tevbigere. Lewma dev ji destdirêjkirinê berdide, li nik wê çok dide erde.”²⁹ Derwêş dixwaze li lingê wê binêre, lê Edûl rê nade, dixwaze rabe piya, wê gavê Derwêş destê xwe dirêj dike bo alîkariyê. Destên du evîndaran cara ewil li wir digihîje hev.

Pismamê Edûlê Îsoyê Mele Elî wê ji xwe re dixwaze, lê keçik dil nake. Rojeka ku pêşbirka hespajotinê li dar dixînin, Hedbanê hespê Derwêş di bezê de her li pêş diçe û

²⁷ Bawer Ferat, Derwêş ile Edûle (Derwêş û Edûlê), Weşanên Yurt, r: 148, Enq., 2009.

²⁸ Ferat, h. b., r: 9.

²⁹ Ferat, h. b., r: 104.

dibe yekemîn. Ji ber ku gel li wan temaşe dike, Derwêş di nava elaletê de fersenda dîtina Edûlê bi dest dixwe, gava di ber de dibuhure hêdfika dibêje ez dê îşev di nava deveyên we de li benda te bim.

Hevdîtina wan xetere bû, lê wan ew dida ber çavan, heke ew bi hev re bihatana dîtina, dê bihatana recmkirin. Piştî selwanê (gavanê) deveyan, Derwêş tê ber çadiran, lê ji dîtina selwanê deveyan ditirse. Di tarîbana şevê de selwan tê, ew xwe vedişêre, selwan di ber wî re dibuhure, çend gahv wê de kulavê xwe radixe û li ser rûdinê. Kêfîkê bişûnde Edûlê tê, rûdinê û hêdfika bang li Derwêş dike. Derwêş bazdide û wê himêz dike, ji kêfan çavên wî av dikan. Edûlê jî digrî; ev nîşaneyeka êşê evîne ye ku heta wê gavê kişandibûn. Demekê wiha li hev dinêrin, naxwazin dest ji hev berdin. Edûlê ji paşila xwe kevnîkek û qevdîkek ji pora xwe dide Derwêş. Gava diaxifin, kûçîkê gavên ji nişka ve dirêye, Derwêş şûr dikşîne. Selwan tê cem kûçîkê û reşahiyên mirovan dibîne, bang dike, dibêje hûn kî ne.

“Derwêş rabû piya, destê xwe baş li qevda şûr şidand, êrîş bir ser gavên. Bi çend liv û tevgeran şûr da ser qirika wî. Selwan kesên li hemberî xwe nas kiribû. Şûr ji destan ket. Wekî ku di ber sekratê de be diricife, dibêje: ‘Di bextê te de me min nekuje! Zarok marokên min dê tenê û sêwî bimînin. Têm dest û piyên te, min nekuje!’ Piştî berê xwe dide Edûlê, dibêje: Xatûn min efû bike, ez ji kesekî re nabêjim. Min ne tiştêk dît, ne jî bihîst.”³⁰

Selwan ew şev ranazê, çend rojên din jî difikire, lê ew nepenî di dilê wî de dibe wekî pirzîkê û radigre. Piştî mehekê êdfî nema dikare tirs, xem û kela dilê xwe bitemirîne, ewil ji jina xwe re wê meseleyê vedike. Êdfî soza xwe ji bîr kiriye, rojekî biryar dide ku gilîyê xwe ji paşê re jî bêje û bi vî awayî têkeve çavê wî. Gava dikeve hundurê çadirê, dinihêre ku paşa bi çend kesan re diaxife û nargêle dikşîne.³¹ Ew diçe li pêş paşê çok dide erdê, paşa dipirse xêr e, tiştêk heye, devê selwên li hev dikeve heta paşa mirovên wir derdixe der. Selwan wiha dest bi serpehatiya xwe dike: Mehek berê bû, ez di nava deveyan de li ser kulavê xwe razabûm, bi dengê kûçîkî re şiyar bûm, çi bibînim baş e? Edûlê û Derwêşê kurê Evdê Milhim li nik hev rûniştine...

Paşa dibêje selwan tu derewan nakî û te ji kesekî din re gotiye an na? Selwan sondan dixwe bi Quranê û telaqê jinberdanê ku derewan nake û heta niha ji kesekî re jî

³⁰ Ferat, h. b., r: 115.

³¹ Di romana navborî ya Bawer Ferat de peyva “Paşa” di dewsa navê Îbrahîm Paşayê Milî de tê pêşkêşkirin.

negotiyê. Gava hezar fikir di serê paşayê Milan de digerin, li selwan tembîh dike ku bila devê xwe hişk girêde. Ew difikire ku wan rojan serê wî bi eşîra Ereban û eşîretên dorhêlê re di belayê de ye. Ne dixwest ku niha bi Êzîdiyan re jî têkeve nava teşqeleyê.

Di hin waryantan de tê gotin ku sebeba qewirandina Êzîdiyan ev giliyê selwan e, di hin waryantan de jî tê gotin ku di leystika merxeleyê de Derwêş û hevalek xwe dema dikevin pêşbirkê, Derwêş ji devê xwe peyva “Ez Derwêş im, kilê çavê Edûlê me” revandiye û ev gotin ji alî pismamê wan Îsoyê Mele Elî ve hatiye bihîstin û ji paşê re hatiye gotin. Paşa hêrs dibe û fermanek wiha dide: “Îşev çiqas şervan hene, bila xwe amade bikin. Biryara teqez û armancê dê ji we re bêjim.”³²

Li gor waryantek din jî Derwêş û Edûlê li Guhera Deveyan tîn cem hev. Li wir bi hev re dimînin, ji hev hez dikin û soz û peymanan didin hev. Edûl dibêje “ez nizanim taliya me dê çewa be, ji xeynî te kesekî nakim, an ji te re me, an ji axa sar re me.” Paşa agahî distîne ku ew dê li Guhera Deveyan werin cem hev.

“...Paşa şimika xwe kir pê, misînê xwe girt, hetanî newala pêş çû, li destavê rûnişt, rabû, misîn li wir hişt û bi kura Mandelê ve hilkişiya jor. Derket diyarê Mandelê, li pozê gomeyekî mezin rûnişt û li Guhera Deveyan mêze kir ku Edûl ji hêlekê de, Derwêş ji hêlekê de hatin guherê û li nav mexelê deveyan gihan hev û rûniştin. Paşa gelekî rûnişt, ponijî, qelûna xwe deranî, vêxist û kişand. Paşê mêze kir her yek bi hêlekê de ji nav hêstiran derketin. Paşa bi çavên serê xwe dît ku gotinên xelkê rast bûn. Wî jî Derwêş dieciband û jê hez dikir, lê belê ew ê çawa qîza xwe bida yekî Şerqî...”³³

Beriya ku şervanên Milan êrîş bibin ser Êzîdiyan, beriya xwîn were rêtin, Evdê Milhim ji vê yekê agahdar dibe û singên çadîran vedike, Êzîdî ji nişka ve bar dikin, hemî malbat berê xwe didin Şengalê. Diçin li Elîgorê bi cih dibin. Edûlê gava vê yekê dibihîze pora serê xwe dikşîne û di şînê de xerq dibe. Dixwaze biçe Şengalê, dixwaze xwe bigihîne Derwêş.

Lê mîna hemî aşiqan bend li pêşiya evîna wan hatibû honandin. Keçik misilman e, lê kurik êzîdî ye... Lewma jî hezkirin vedigere evînek reş, bextekî kor û dibe sewdayek bêdawî. Derwêş beriya Edûlê bixwaze, diçe Laleşa Nûranî cem Mîrê Êzîdiyan ji bo destûra vê zewacê, lê Mîr destûr nade, dibê mara te bi yeka sînî û misilman re nabe.

³² Bawer Ferat, Derwêş ile Edûle (Dewrêş û Edûlê) Weşanên Yurt, Enq., 2009, r: 129.

³³ Eyup Kiran, Derwêşê Evdî, Weşanên Nûbihar, Stn. 2011, r: 157.

Paşa jî xwestekê red dike, piştê ji bo zoma Şerqiyên ji holê rake li dek û dolaban digere. Beriya paşa êrîş bike, Şerqî bi vê yekê dihisin, ew vedikişin çiyayê Şengalê. Hesreta Edûlê di nav dil û mêjiyê Derwêş de dimîne. Edûl ji dê û bavekî tenê ye, kesê dê pê re bizewice, dê bibe welîaftê konfederasyona Milan, xwediyê tac û text. Lê Temir Paşa naxwaze textê wî bikeve destê Êzîdiyan.

Wekî hemî lehengên xort yên wê demê hespê Derwêş Hedban e û bi nav û deng e, hespê Zor Temir Paşayê Milî jî Gugercîn e.³⁴

Şer dê biqewime, sebaba şer ne Edûlê ye, ne tiştê din e. “Sebeb; li hember yekîtiya Taî, Şemir, Gêsan, Enez, Tirkmen, Bageran ku erd û eşîrên Milan talan dikirin, parastina ewlekariya Temir Paşa û derxistina wan ya ji Serê Kaniyê (Ceylanpınar) ye.”³⁵ Piştî ku êzîdî konên xwe ji cem Milan bar dikin, yekîtiya wan eşîran (Tirkmen, Gêsfî, Şemiran û hwd.) ji Temir Paşa re name dişînin daxwaz dikin ku Serê Kaniyê ji wan re serbest bike, heke ew vê yekê qebûl neke, dê şer li dar bikeve. Belkî ew Milan lawaz dibînin, çûndina Şerqiyên wekî fersend dibînin. Wan eşîrên Gêsan, Şemiran û Tirkan yekîtiyek xurt ava dikin. Serokên wan Kosê Weys, Çîl Brahîm û Eferê Gêsfî ne. Her sê fermana Zor Temir Paşa derdixin, li ser çermê xezalekê dinivîsin û wekî name ji ebra Milan re dişînin. Paşa di nava civatê de name dide xwendin, gef, plan, çavtirsandin hene. Wekî ku dengbêj dibêjin name wekî çarşefan bûye, yên mor kirine sî kes bûne, morên li binî mîna binê tawan bûne... Di nameyê de bi kurtî wiha hatiye nivîsîn: Bîrên Serêkaniyê divê di navbera me û Milan de wek hev bîn bikaranîn.. Divê pêşanî û serdestiya Milan li ser bîran tunebe. Divê ebra ku Milan zêft kiriye paşde bîn dayîn. Malên talanê wê paşde werin vegeandin. Yên ji me tevî we bûne, divê paşde vegeirin. Ji bo neheqîya ku li jinên me hatiye kirin divê pênc sed zêr û keriyek pez bê dayîn. Na ku ev bi cih neyên, wê sê hezar û heft sed siwarên me têkevin Milan, ew dê konê Zor Temir Paşa bi şûran parçe bikin...

Nan û xwarin didin qasidên ku name anîbûn, paşa dibêje herin eşîrên xwe agahdar bikin, heta hefteyekê em dê bersiv bidin.

Piştî vegera wan, defa hewarê lê dikeve, paşa emir dide dibêje bila rîsipî, serekên eşîran û ciwanên ji xwe razî werin dîwanê. Piştî nîvro dîwan vedibe, paşa dibêje eşîra Gêsan, Şemiran, Tirkmenan û hin eşîrên din li hember me hevgiretînek dijwar pêk anîne, nêzîkî pênc hezar siwarî civandine ser hev. Li Serêkaniyê, li Geliyê Şêxûşarê baregeh danîne. Wan beriya her tiştî qesta rihê min kiriye, an dê xûgî ji me bixwin, an dê me

³⁴ Ömer Uluçay, Destana Derwêşê Evdî, weş. Dîwan, r: 57, Stn. 2012.

³⁵H.b., r:161-162.

talan bikin, an jî divê em koçer bibin. Çare tune, divê em bavêjin ser wan, wan ji hev belav bikin.

Kesek piştî vê axaftinê deng nake, cesaret nake derkeve pêş, an şervanan bo vê yekê amade bike. Ev yek ji bo Temir Paşa û malbat û eşîra Milan têkçûnek e, paşa vê yekê dibîne. Bi şevan xew nakeve çavên wî, kabûsan dibîne, difikire, bi hemî dost û eqrebayan re dişewire, lê nikare artêşekê pêk bîne, gelê xwe bo berxwedanekê amade bike. Biryarek dide; gelê xwe dicivîne, şertê vexwarina qahweyê ji herkesî re eşkere dike. Li gor “Şertê Qahweyê”, kî di fîncana zêrîn de qahweya ku di dîwanê de tê pêşkêşkirin vexwe, ew dê berpirsiyariya vî şerî bigre ser milê xwe, şervanan bicivîne û êrîş bibe ser sê eşîrên neyarên Milan. Şertê serfermandariya êrîşê ewil vexwarina wê qahweyê ye. Ya herî girîng, tê îlankirin ku egîtê ku wê qahweyê vexwe û bibe serfermandêr, dê paşa xelatek din bidê: Keça xwe Edûlê lê mar bike. Tê gotin ku bi rojan li civatê ew fîncana zêrîn tê gerandin, lê kesek newêre vexwe. Sê roj wiha derbas dibin. “Zor Temir Paşa mêze kir wiha nabe, ji nivîsyar re got: îlan bike û bigerîne, kî pêşdiriyê bike ez ê qîza xwe ya xwediyê morguliyên Edûlê bidimê. Ez dê konekî li cem xwe jê re vegirim, pênc sed pez, pêncî hêştirî bidimê...”³⁶ Nivîsyar van gotinan di nav eşîrê de digerîne, wekî ku guliyên Edûlê derketibin mazatê. Lê tewş bû, kesekî taqet nedikir. Di hin waryantan de tê gotin ku Edûlê bi xwe wê qahweya şertê di fîncana zêrîn de li civatê gerandiye, di hin berhemana de tê gotin ku kesê bi navê Eyup ew gerandiye.

Seba ku kesek wê qahweyê venaxwe, Edûlê derbasî dîwanê dibe, ji bavê xwe re pêşniyar dike ku bang li Derwêş bike, tenê Derwêş dikare wê qahweyê vexwe, dibêje encax Derwêş dikare konê bavê min ji ber derbên şûr û palayan xelas bike. Paşa jî dibê madem wilo ye, tu bi destê xwe nameyekê ji Derwêş re binivîse. Edûlê name ji evîndarê xwe Derwêş re dinivîse û bi siwarekî re dişîne. Derwêş gava nameyê digre wekî ku bîna Edûlê hilde, dilezîne, du hevalên xwe Elî û Bozan, Sadûnê birayê xwe jî hildide û dikeve rê. Gava digihîje bin kon û nava wê civatê qahweya şertê ji destê Edûlê digre û yekser vedixwe û Edûlê maç dike.

Di waryantek din vegotinek wiha heye; dibêjin gava qahwe hat gerandin, tu kesî ranehiştê, dilê Edûlê lê dide, dengê wê dilerize, wechê wê sor û zer dibe, ew bang li egîdan dike:

³⁶ H.b., r: 182.

“Ey egîdên Milan! ...Milanê hewceyî Şerqîyan nekin. Milanê hewceyî van ‘dizên keran’ nekin... Navê Derwêş û Edûla welêt Kurdistanê dagirtîye, leke hatiye ser nav û dengê min, leke hatiye ser namûsa sî û du hezar Milan. Bilind kin ‘fincana şertê’. Rahêjin biskên Edûlê. Ax ez gedek bûma ax! Ê min li vê Şengala jêrîn rê li Derwêş bibiriya... Min dê li ser vê riyê yan canê xwe bida yan jî min dê Derwêş bişanda qebrê... Vexwin qahwê, tola min hilînin... Namûsa Milan xelas bikin!”³⁷

Di hin waryantan de hildana qahweyê ji aliyê Derwêş ve wekî rewşeke efsûnî, mîstîk û surrealîst tê gotin, Derwêş ji birayê xwe re dibêje:

“Hey Sehdûn! Gava min fîncan hilda min çi dît tu dizanî? Min carek dît ku di fîncanê de şerê egîdan e. Rim li hewayê difirin. Şûr lêdixin, mertal diparêzin, parçe dibin. Fîncan bi xwînê tijî dibe, madê min li hev dikeve. Toz û dûman bilind bûye, gihîştîye erşê. Şîhîna hespan fîncanê dadigre, Hedban dişihe. Di fîncanê de ejderhayek serê xwe bilind dike, dibêje: Deyne wê fîncanê...”³⁸

Derwêş qahweyê vedixwe û dibe xwediyê kon. Konê wî li ber yê Temir Paşa vedikin. Pêşî Edûlê gazî wî dike, bi hinceta destavê Derwêş ji kon dertê, Edûla ku li cihekî xewle li bendê bûye dibîne, Derwêş ji bo ew bi hev re neyên dîtin wê dixê bin ebayê xwe yê fireh.³⁹ Edûl ditirse, xemgîn e, vegera ji vê riyê tune ye, nobedar dengê Edûlê dibihîze, guman dike ku Derwêş Edûlê direvîne. Qerebîneyek bi nobedar re hebûye, devê wê dide ser Derwêş û bang dike: “Destê xwe ji ser Edûl Xanimê vekîşîne! Tu nikarî bi namûsa Milan bileyzî!” Wê gavê Edûlê ji bin ebayê dertê dibêje ma tu nizanî wî qahweya şertê vexwariye, bûye xwediyê guliyên min ê sor...

Zor Temir Paşa beriya Derwêş û eşîra Şerqîyan vexwîne bin konê Milan, li cemaeta Milan û li dîwana gerandî fen çêdike û dibêje gava Şerqî hatin kesek bila pêrgî wan neçe, kesek bila raneke serê hespên wan û kesek bila silava wan jî negre. Piştî

³⁷ Ömer Uluçay, Destana Derwêşê Evdî, Weşanên Dîwan, Stenbol, 2012. r: 54.

Şahîne Bekîrê Soreklî bo xebatek xwe wiha dibêje: “Sal 2004, berhem ji aliyê min ve bi deng hat tomarkirin û ji aliyê dezgeha Australî SBS ve di DVDyekî de hat bicihkirin. Me jimareke ji DVDîyan bêpere ji guhdarên beşa Kurdî ya SBS radîo re şandin. Dû re sal 2011, min 14 xelekên ji wê DVDyê di You Tube de ji bi cih kirin, her wiha di Facebookê de jî.”

³⁸ Uluçay, h. b., r: 76

³⁹ Tê zanîn ku di waryanteka Mem û Zîn de Mem Zînê di bin ebayê xwe de vedişêre. Ev jî mînakek vegotina dengbêjan e ku taybetiyek destanekî derbasî nava ya din dikan.

gava êzidî bo vê yekê bertek nîşan didin, paşa dibêje "jixwe yên li civata min ne zilam in!"

Derwêş piştî vexwarina "qahweya şertê" amadekariya cengê dike. Van kesan ji bo cengê dixwaze: Dibêje ez û birayê xwe di nav de, em sê cot bira; Ez û Sehdûn em du kurên Evdê Milhim, Ednan û Ferhan du kurên Mistê Ferhê ne, Yûsiv û Bozan du kurên Emerê Şerqî ne em dikin şeş û divê Îsoyê Mele Elî, Çîloyê Îzolî, Baqir Axayê Kher, Silêman, Bekir û Selîm jî werin. Mebest ji vê yekê, hevgirtina şervanan e ku gava birayekî wan birîndar bibe, yê din bo tolhildanê jidil şer bike. Dozdeh şervan sê şev û sê rojan bêrawestî li beriyê li neyarên xwe digerin. Hesp dibetilin, tî dibin, şervan jî birçî dibin, bêxew dimînin. Dixwazin vegerin, xwesteka vegeerê ji Derwêş re dibêjin, di dema ku dê vegeerî ji dûr ve du keçikan dibînin (du keçikên ji malbata Eferê Gêsî; Eysan û Leylan), Derwêş diçe cem wan, ew direvin. Cihê ku keçik diçin, mexerek e, cihekî wekî gelî ye û tijî kon in. Derwêş gava nêz dibe, çar beş çadir dibîne, alên wan ji hev cihê bûne. Dengê û hêwirzeyek, peroşek û lerzek di nav gel de hebûye. Ew hespê xwe dajo bin konekî ku di bin de şervanên çekdar hebûne. Kalemêrek ji bin kon dertê, Derwêş vedixwîne hundur, lê ew ji Hedban danakeve. Navê kalemê Ubeydê Şêxê Gêsan bûye, ew bavê Efer û Etman (Otman) bûye. Hev dinasin, fam dikin ku yê li hemberî wan Derwêş e. Dixwazin ew bo vegeerê qanî bikin, dibêjin xwe di ber Milan de, ji bo Temir Paşa nede kuştin.

Di dema niqaşa Derwêş û Efer de Sadûn jî tê cem wan, ew bi rima destê xwe li serê Efer dixê, wî birîndar dike. Wê gavê Derwêş berê xwe dide Sadûn, her du bira demekê li hev didin. Efer birîndar e, bi wî halî dikeve nava wan, nahêle şer bikin. Efer di aşîtiyê de îsrar dike, xwedîbawer e, lê Derwêş bi rik e, ji şer venagere. Di hemî wariyantan de hevaltiya Derwêş û Eferê Gêsî heye⁴⁰, ew û Efer bûne destbirakê hev. Beriya wê gavê, Derwêş hespê Hedban ji zoma Ereban, ji cem Efer aniye.

Derwêş vedigere cem hevalên xwe, bi hev re biryara êrîşê didin. Şer li nêzikî girê Edçanê (bi tirkî Uzunaçanê) ku niha di nava sînorê Tirkiyeyê de ye û di erda Serêkaniyê û Wêranşarê de cih digre diqewime. (Du girên li herêma girîng in: Edçan û Qeremîta.) Şervanên Milan yek bi yek, an cot cot tînin kuştin û gelek şervanên neyarên xwe dikujin, lê Derwêş dimîne. Girê Edçanê cihê rawestgeha wî bûye, li wir hevalên xwe yên sax jimartiye û vehesiyaye. Seroklehengên Gêsan-Tirkan-Şemiran Çîl Brahîm, Eferê Gêsî û Kose Weys bûne, ew li hev dicivin, dibêjin em bi vê şeweyê keysê li Derwêş naynin,

⁴⁰ Binêrin li berhemên li jor hatine destnîşankirin: "Derwêş û Edûlê" ya Bawer Ferat, "Derwêşê Evdî" ya Eyup Kiran, "Evîna Mêrxasekî" pexşana Îbrahîm Osman û hwd.

pêwîstiya me bi planek, bi dek û fenekî heye. Birayê Eferê Gêsî Etman, Derwêş dikşîne nava erda bi kolemişk da lingên Hedbên werin şikestin. Ev plan ya Kose Weys bûye, Etman hespê xwe ji ber Derwêş revandiye heta erda tijî qulên mişkan.

Di berhemekê de tê gotin ku Kose Weys Derwêş dikşîne nava kemînê, wiha tê gotin:

“Dibê wê çaxê Kose Weys dizgîna hespê bada û reviya. Dibê Derwêş Hedban bada û rapê kir. Wexta Kose Weys gihîşte bajarê mişkan, xwe ji ser bada. Hedban nêrî girgîn e, li bayê bezê di bajarê mişkan werbû, lingên Hedbûn di kabê de şikest, kete xwarê û Derwêş ji ser firiya. Li ku kete xwar? Li hemberî toda Zuhre Xatûnê⁴¹, xweyînga Eferê Gêsî –Tode, yanî Ereba jê re dibêjin Huddec; li ser piştê delûlan girêdidin ji qîzan ra-. Wexta ku kete xwarê, dibê tirk hatin wî. Wexta tirk hatin, Zuhre xwe ji ser todê çeng kire ser Derwêş û bang li tirkan kir, got ‘va kete alî min, dest jê berdin.’ Dibê tirkan şora Zuhre negirtin, di bin wê de dîsa lêxistin.”⁴²

Zuhre ji kekê xwe Efer re dibêje tirkan pêl rûyê gêsan kirin, tu û Derwêş destbirak in, li Sêrega çiyayê Şengalê we bi hev ra kevir berda erdê, niha tirk di bin min da li Derwêş didin. Wê gavê Efer bang li gêsan dike dibêje ji tirkan biqetin. Tirk û gêsî tên hemberî hev, lê serok û rîsipiyên wan nahêlin, dibêjin me hemû lehengên Milan kuştin, Derwêş jî birîndar e, dê bimre, dibe ku şerê me hêj dirêj bidome, ger em ji hev biqetin, em dê bi Milan nikaribin.

Efer Derwêş dibe ser Girê Edçanê. Derwêş ji Efer dixwaze hemî cesedên hevalên wî jî bîne cem wî.

Gava Edûlê bi hawara Milan re tê û cenazeyan li ser gir dibîne, Derwêş jî di rewşeke birîndar de li rex wan bûye. Edûlê serê Derwêş dide ser çoka xwe û kilama “Delal” diqîre heta giyan ji Derwêş dertê. Lewma di hemû waryantan de navê Derwêş wekî “Delal” jî cih girtiye. Li gor waryanta Qafqasyayê, Edûlê li pey kuştina Derwêşê Evdî radibe ser çokan, diqîre, dibêje "Derwêşo, delalo!" û bi hemû qeweta xwe xencer li ser sînga xwe dide. Serê Edûlê jî dikeve ser yê Derwêş.⁴³

Kî serpêhatiya vî şerî bi hûrgilî gotiye, nediyar e. Lê li gor forma ji aliyê **Baqî Xudo (Xidir)** ve hatiye gotin **Îsoyê Mele Elî** ji vî şerî birîndar vedigere malê û piştê jî

⁴¹ Ev nav di hin pexşanan de cihê ye.

⁴² Uluçay, h.b., r: 293

⁴³ Uluçay, h. b., r:141. Belkî ev yek ji alî dengbêjan ve hatibe lihevanîn.

birînên wî rihet dibin. Dibe ku çîroka kuştina wan egîdên Milan û Êzîdiyan ji aliyê wî ve hatibe gotin. Li gor formata Baqî Xido, "Îsa nemir, ji birînan rihet bû û Edûlê ji xwe re bir."⁴⁴

1.1.1. Karakterên Efsaneyê

Derwêş û Edûlê du karakterên sereke yên vê çîrokê ne. Wê demê Zor Temir Paşa rêveberê eşîra Milan bû. Edûlê keça Zor Temir Paşayê Milî ye (di waryanta ku Bawer Ferat çavkaniya romana xwe jê girtiye de, ew keça Îbrahîm Paşayê Milî ye⁴⁵), paşa naxwaze keça wî bi Derwêş re bizewice. Bavê Derwêş Evdê Milhim ku demekê aşîqê xuşka Temir Paşa Rehîmê dibe⁴⁶, ew û Rehîmê du karakterên li pişt in, lê rola wan mîna ya Tajdîn û Stî ku du lehengên efsaneya Mem û Zînê ne. Îsoyê Mele Elî (bi leqebê xwe Delî Balte) ji Derwêş re reqîb e, kurê apê Edûlê ye, tekane kes e ku ji şer bi saxî vegeriyaye û vê serboriyê gihandiye roja îro. Emerê Şerqî ji eşîra êzîdiyan e û hevalê Evdê Milhim e. Siyamoyê qehwecî dengbêj û aşîqê navmaliyê Milan e. Eyubê qehwecî, Yûsivê kurê Mele Elîyê Milî karakterên stero ne. Mele Xelîl jî peyayekî malbata Milan e, di dîwanê de nameya Gêsan-Şemiran û Tirkmenan a ku dibe sebeba şer dixweyne. Li gor pexşana Îbrahîm Osman Mele Xelîl û lehengê bi navê Cafer (an Cahfer) du qasid in û "ji dozdeh bavikên eşîra Milan mezinên duduyan bûn."⁴⁷ Lê li gor berhema Bawer Ferat Cafer serokê eşîrekî ye.⁴⁸

Hevalên Edûlê yên keçik ev in ku di gelek waryantan de cih digrin, lê stero ne, rola wan ne li pêş e: Fatima Elî Sîncarî, Edûla Kîkî, Beyaza Emo, Gozel, Îslim û Gulfidan Xatûn xuşkên Çîloyê Îzolî ne.

Du lehengên jin hene ku ew girîng in: **Zuhreya** (an Zohre) xuşka Eferê Gêsi û **Eyşa Welyaya** diya Derwêş. Eyşê jinek gelek wêrek û mêrane ye ku bi destê xwe wahş kuştiye lewma bala Evdê Milhim kişandiye. Zuhre Xatûn jî di şer de Derwêş diparêze ku di pexşana Îbrahîm Osman de navê wê weke "Edlanê" hatiye pêşkêşkirin.⁴⁹

Wekî kesayetên stero lehengên ku di şer de cih girtine ev in:

⁴⁴ Uluçay, h.b., r: 296.

⁴⁵ Bawer Ferat, Derwêş ile Adûle (Dewrêş û Edûlê), weşanên Yurt, r:68 Enqere, 2009.

⁴⁶ Di sê romanên de jî; romana Bawer Ferat, Eyup Kiran û Îbrahîm Osman de evîna Evdê Milhim û Rehmêya Milî cih digre. Bnr: Romanên ku li jor hatine qeydkirin.

⁴⁷ Îbrahîm Osman, Evîna Mêrxasekî, weşanên Lîs, r:85, Amed, 2008.

⁴⁸ Bawer Ferat, b.n., r: 44

⁴⁹ Îbrahîm Osman, h.b., r: 107-108.

Ji bera Milan Derwêş û Sehdûnê birayê wî, Ûsib û Bozanê kurê Emerê Şerqî, Çîloyê Îzolî, Ednan û Ferhan du kurên Mistê Ferhê Dodikî, Baqir Axayê Kher, Selîm û Ayibê Mistefê, Miheme Temê û Îsoyê Miheme Elî hebûne.

Aliyê Gêsan, Tirkmenan û Şemiran: Çîl Îbrahîm, Efer û Etmanê (an Otman) Gêsi, Kose Weys, Ubeyd (an Huweyd), Himê Misto.

Karakterek din jî hespê Derwêş Hedbên (an Hedvan) e ku di dema şer de piyên wî di kemînê de tîn şikestin.

Li gor ku di berhema Îbrahîm Osman a navborî de hatiye destnîşankirin, kurê Evdê Milhim tenê ne Derwêş û Sadûn in, pênc kurên din jî hene ku navên van ev in: "Milhim, Mehmûd, Temir, Bişar û Begzade".⁵⁰

1.1.1.1. Têkiliyên Karakteran

Têkiliya Derwêş û Edûlê ya aşîq û maşûqan e, ew du kesên evîndarên hev in. Heman têkilî di navbeyna Evdê Milhim û Rehîmeya (an Rehmê) Milî de jî heye ku di sê pexşanên navborî de mîna hev hatine nivîsîn. Evdê Milhimê Êzîdî ku bavê Derwêşê lehengê vê efsaneyê ye xizmetkar û şervanê eşîra Milan bûye.

Kesê ku li pêşiya vê evînê dibe asteng, Zor Temir Paşayê Milî ye ku ew bavê Edûlê ye. Karakterek zalim e, serokê eşîra Milan e, lê di heman demê de bi fenokî jî tevdi gere. Ger meriv li tevgera wî ya li hember şerqiyên (êzidiyan) binihêre, sepandina zilm û zordestiya wî baş tê dîtin. Mînak wekî ji berhemên numûne jî tê fam kirin, ew Bavê Derwêş Evdê Milhim û hemî malbata wî sirgûn dike. Bi çavên xulam û xizmetkaran li malbata Evdê Milhimê êzîdî dinihêre, wan bi kar tîne, gava bikêrî wî nayên sirgûn dike. Bi rikberî li hember zewaca Edûlê û Derwêş dertê. Aliyê wî yê fenokî jî ev e: Di bin konê xwe de dîwanê pêk tîne, "qahweya şertê" dide amadekirin, kî qahweyê vexwe, dê bibe fermandarê hêza çekdar, ew dê biçê li dijî neyarên Milan şer bike û ger bi ser bikeve dê bikaribe bi Edûlê re bizewice. Ango Temir Paşa ji bo Derwêşê Evdî û xortên ebra Milan li şer sor bike, keça xwe derdixe mazatê. Ev yek, felsefeya wî ya li hember zayenda jinê jî dide nîşandan.

Derwêşê Evdî kesayetek şervan e, beriya wekî serfermandarê Milan biçê şer, dawiya wî şerî texmîn dike, lewma beriya "qahweya şertê" vexwe ji birayê xwe Sadûn re dibêje di fîncanê de şerê egîdan heye. Rim li hewayê difirin. Şûr lêdixin, mertal diparêzin, parçe dibin. Fîncan bi xwînê tijî dibe... Ew şerekî pir bi xwîn bi rê ve dibe,

⁵⁰ H.b., r: 7.

hevalên wî yek bi yek li ber çavên wî tîn kuştin, lê ew bi bizav e, qet venakişe. Ew tenê ne ji bo zewaca bi Edûlê re diçe şer, herwiha bo azadiya ebra Milan, bo zeviyên herême nekeve destê ereban, gêsan û şemiran diçe şer. Li hember selwanê deveyan jî ne bi rehm e, lewre di dema jivana Guhera Deveyan de gef li selwan dixwe.

Kesayeta Edûlê mêrane ye, xwedî biryar e, lewma di dîwanê de rolek aktîf dileyize, di dema gerandina "qahweya şertê" de naxwaze Derwêşê Evdî wê fîncanê bigre. Seba ku ew dizane ger Derwêş qahweyê vexwe û biçê şer, êdî venagere. Hemî kilamên li ser Derwêşê Evdî, li ser devê wê bi peyva "delal" hatine gotin. Ev jî dide nîşandan ku aliyê wê yê helbestvaniyê jî heye.

Temir Paşa gava bihevrebûna Derwêş û Edûlê ya li Guhera Deveyan dibîne ji xanima xwe re wiha dibêje: "...Edûlê û Derwêş, min bi çavên serê xwe dît li çolê gihîştin hev. Serekên eşîrên Milan ji Şerqîyan diqehirin, ev kûçikê birayê min Îbrahîm jî li dijberî min dixebite. Em devê wan nikarin bigrin. Di nav Milan de ewaniyên mezin çêdibin û min pir dihetikînin."⁵¹ Di vir de aliyek din ê Temir Paşa dertê holê, belkî ji tîrsa serekên Milan û Şerqîyan û birayê xwe Îbrahîm Paşa nabizive Edûlê li Derwêş mar bike.

Îbrahîm Paşayê Milî di waryantekê de birayê Temir Paşayê ji damariyê ye⁵², lê di romana Bawer Ferat de wekî bavê Edûlê rol digre⁵³. Di romana Îbrahîm Osman a navborî de Îbrahîm Paşa bavê Zor Temir Paşa ye⁵⁴, herwiha tê îdfakirin ku ew ji hev hez nedikirin.⁵⁵

Ednan (di waryantekê de Ubeyd⁵⁶) û Ferhan du birayên hev, kurê Ferhê Dodikî ne, du dergistiyên keçên bi navê Fatima Elî Sîncar û Beyaza Emo ne.

Sadûn birayê Derwêş e, di rola alîkarê leheng de ye.⁵⁷ Di efsaneya Siyabend û Xecê de rola Qedê, di efsaneya Bijen û Menîce de rola Girgîn, di efsaneya Mem û Zîn de rola Tajdîn çî be, rola Sadûn jî ev e.

Siyamo navmaliyê eşîra Milan e û dengbêj e. Li gor waryanteka vê efsaneyê Siyamo bi stranên xwe bûyerê gihandiyê heta îro.⁵⁸

Mele Elî û Îbrahîm Paşa du birayên Zor Temir Paşayê Milî ne.

⁵¹ Kiran, Derwêşê Evdî, r: 158.

⁵² Kiran, h.b., r: 81.

⁵³ Bawer Ferat, Derwêş ile Adûle, weş. Yurt, r: 68, Enq. 2009.

⁵⁴ Îbrahîm Osman, Evîna Mêrxasekî, weşanên Lîs, r: 39, Amed, 2008.

⁵⁵ H.b., r: 68.

⁵⁶ Bawer Ferat, Derwêş ile Adûle (Dewrêş û Edûlê), Weşanên Yurt, Enq. 2009, r. 232.

⁵⁷ Kiran, h. b., r: 83.

⁵⁸ Kiran, Derwêşê Evdî, weş. Nûbihar, Stn. 2011

Çil Brahîm, Kose Weys û Eferê Gêsî sê karakterên negatîf in, neyarê Derwêş û eşîra Milan in. Di pexşana Eyup Kiran de kesê ku Derwêş kişandiye kemîna kolemişkan Kosê Weys e, ango ew wekî qatîlê Derwêş tê nasîn⁵⁹, lê kesê rim li piştê Derwêş xistiye bi zelalî ne diyar e.

Kose Weys karakterek fenok e, bi dek e, di encama şer de têdigihîje ku ne bi riya kemînê be, kesek bi Derwêş nikare, lewma Derwêş li pey xwe dikşîne erda bi kolemişk.

Beriya şer, hevaltî û dostaniya Eferê Gêsî û Derwêşê Evdî hebûye û Efer başiya Derwêş dixwaze, armanca Efer ne şer e, aşîti ye. Ji alî din ve xuşka Efer Zuhre Xatûn jî ji ber naskirina wan a malbatî di dema birîndariya Derwêş de bi mebesta parastinê xwe davêje ser wî.⁶⁰ Ev dostanî dişibe têkiliya Pîran û Bijen ku tê zanîn Pîranê Weyse naxwaze Efrasiyab Bijen îdam bike, herwiha Efer û xuşka xwe jî naxwazin Derwêş were kuştin.

Îsoyê Mele Elî biraziyê Zor Temir Paşa ye ku dixwaze bi Edûlê re bizewice, ji şerê navborî birîndar xelas dibe.⁶¹

Hemî şervanên navborî, beriya ku Derwêş were civatê û qahweya şertê vexwe, nabizivin ku dest bavêjin tivingan û biçin şer. Lewma Temir Paşa gava Derwêş û malbata xwe tên, peyayên Milan wekî zîlam û şervan nahesibîne. Bi vê fenokiyê ew dixwaze zîlamên eşîrê hêrs bike bo beriya Derwêş "qahweya şertê" vexwin.

1.1.2. Li Gor Waryantan Guherîna Karakteran û Bûyeran

Siyamoyê Qahwecî di romana Eyüp Kiran de cih digre û wekî dengbêjê wê demê tê pêşkêşkirin, lê di berhemên din yên ku me girtiye dest de cih nagre.

Secereya Derwêşê Evdî di lêkolîna Ömer Uluçay de wiha hatiye pêşkêşkirin:

"Pepan hebûye, kurê wî Evdî, du kurên wî Elî û Îskan hebûne. Eliyê ji Mistefayê kurê Elî û Qeşema qîza Îskan, kurê wî Milhim, kurê wî Evdî, kurên wî Derwêş û Sehdûn..."⁶² Ev secere di berhemên din yên mijara vê lêkolînê de cih nagre.

Îbrahîm Paşayê Milî di romana Bawer Ferat de wekî bavê Edûlê, serokê eşîra Milan tê nasandin. Lê di pexşanên din de navê serokê eşîra Milan Zor Temir Paşa ye. Di "roman" a navborî de Îbrahîm Paşa serokê eşîra Milan e.⁶³

⁵⁹ Kiran, h.b., r: 266.

⁶⁰ Eyup Kiran, Derwêşê Evdî, Weş. Nûbihar, r: 272, ç:2, Stn. 2011.

⁶¹ Kiran, h.b., r: 264.

⁶² Uluçay, Destana Derwêşê Evdî, r. 148

⁶³ Bawer Ferat, h.b., r. 33

Di "romana" Îbrahîm Osman de navê bavê Zor Temir Paşa jî Îbrahîm e⁶⁴ û navê birayekî Temir Paşa jî Îbrahîm e⁶⁵ ku ev pirsekî tîne eqlê meriv: Gelo bav navê xwe li kurê xwe daniye?

Beriya evîna Derwêş û Edûlê dest pê bike, evîna bavê Derwêş Evdê Milhim û Rehîmê (an Rihmê) ya xuşka Temir Paşa di berheman de cih digre. Evdî Rehîmê ji xwe re dixwaze, lê paşayê Milan xuşka xwe hunkûfê êzidiyekî nabîne, wê bi yekî din re dizewicîne. Ev yek di romana Bawer Ferat de di beşên destpêkê de cih digre.⁶⁶ Piştî zewaca Rehîmê, ev hisret didome, ev yek bi sernavê "Evîna Di Nava Xweliyê De" di romanê de di beşa şeşemîn de cih digre. Piştî Evdê Milhim jî dizewice, du kurên wî Derwêş û Sehdûn mezin dibin jî ew vê evînê ji bîr nake, rojekî riya wî bi Rihayê dikeve, di nava mezelan de nivîsa li ser gora Rehîmê dibîne: "Ji cedên eşîra Milan neviya Zor Temir Axa, keça Mahmût Axa, xuşka Îbrahîm beg Rihmê..."⁶⁷

Di vir de tê fam kirin ku nivîskar, Îbrahîm Paşa jî wekî neviyê Zor Temir Paşayê Milî dide nasîn.

Ömer Uluçay gava di berhema xwe de destana Derwêş a ku Amer Çelik ew wekî "Şaxê Şengalê" dide nasîn digre dest, cih dide evîna Evdê Milhim û Rehmêya (an Rehîmê) Milan. Paşayê Milan ewil sozê zewaca wan dide, lê li ser sozê xwe nasekine, xuşka xwe dide mala Baqiriyânê Rihayî. Di cihekî de Evdî ji Rehîmê re dibêje: "Rehîmê bizanibe ku evîna te ji min re ters e, giran e. Ez nûrperest im, nîkaha keça misilman ji min re qedexe ye, qet nabe."⁶⁸

Sebeba kuştina Derwêş, şikestina lingên hespê wî ye. Di pexşanên Bawer Ferat û Îbrahîm Osman de beriya lingên Hedban werin şikestin, Etmanê birayê **Eferê Gêsî** dek çê dike,⁶⁹ gava bala Derwêş dikşîne ser xwe û ji ber wî direve, hespê xwe dajo erda bi kolemişk. Piyên Hedbên tîne şikestin, Derwêş dikeve xwarê. Piştî derbên mirinê li Derwêş dikevin. Lê weke me li jor gotibû di romana Eyüp Kiran (û destana Baqî Xido) de **Kose Weys** di şer de dertê hemberî Derwêş, paşê ji ber wî direve û diçe zeviya bi kolemişk, wî dike nav kemînê, lingên Hedbên dide şikestin. **Efer** û xuşka xwe **Zuhre Xatûn** Derwêş diparêzin, heta nefesa dawî ku êdî hawara Milan tê, Efer li cem Derwêş dipê. Di romana Îbrahîm Osman a navborî de mîna ku di romana Bawer Ferat de (r:

⁶⁴ Osman, Evîna Mêrxasekî, h. b., r: 39

⁶⁵ H.b., r: 68.

⁶⁶ Ferat, h.b., r. 38-39.

⁶⁷ Ferat, h.b., r. 73

⁶⁸ Uluçay, Destana Derwêşê Evdî, r: 149, 150, 184.

⁶⁹ Bawer Ferat, Derwêş île Adûle, r: 252 û Îbrahîm Osman, Evîna Mêrxasekî, weş. Lîs, r: 370, 2008, Amed.

252) cih digre, Derwêş hespê xwe dajo ser Etmanê birayê Eferê Gêsî, Etman ji ber wî direve, hespê Derwêş dikeve erda bi kolemişk.⁷⁰

Di waryanta **Rojhilat** ku bişkaftina wê ji aliyê **Perwîz Cîhanî**⁷¹ ve hatiye kirin de, sê navên din li lîsteya şervanên Milan hatine zêdekirin: **Seîd û Telhan** du bira ne û **Caferê (Eferê) Gêsî** jî merivê Ezîdiyan e, herwiha di bera neyarê wan de navê **Çîl Osman** derbas dibe. Di vir de **Çîl Osman** wekî serokekî tirkmenan û gêsan name ji Temir Paşa re nivîsiye, doza xwestekên giran lê kiriye. Wekî tê zanîn di romanên me lêkoland de **Çîl Brahîm** cih digre.

Navê hespê Evdê Milhim di waryanta **Şengalê** û di romana **Eyüp Kiran** de **Makhedban** (wekî diya Hedban) e⁷², di şaxê Rojhilat de bi navek din e.

Li gor waryanta **Şengalê** ku ji aliyê **Amer Çelîk** ve hatiye amadekirin, Rehmêya Milî ku Evdê Milhim aşîqê wê dibe, ji ber ku Evdê diçe ziyareta wê ew ji aliyê xezûranan ve tê jehrîkirin.⁷³

Di romana Bawer Firat de, Derwêş û Edûlê di daweta kesê bi navê Bekir de soz didin ji bo jivana li Guhera Deveyan.⁷⁴ Ne Temir Paşa ne kesekî din bi vê yekê nahise. Jivana wan êvarê bûye ku ev biryarek bi xetere bûye. Dema tarî dikeve erdê, ew tèn cem hev, bi hev re diaxifin.

"Wê gavê kûçîkê selwan⁷⁵ direyê, her du diwerqilin, selwan jî şiyar dibe. Derwêş şûrê xwe dikşîne û dipê. Selwan tê nik kûçîkê xwe, ew jî şûr dikşîne û diqîre: 'Hûn kî ne?' Derwêş êrîşî selwan dike, devê şûr dide ser zengilorka wî. Selwan ew dinase, şûr ji desta dikeve, dibe lûve lûva devê wî. Piştî li ber Derwêş digere: 'Bextê te de me, min nekuje, dê zarokên min sêwî bimînin.' Edûlê tê cem selwan, şûr dide alî û dipirse: 'Tu soz didî ku tu dê ji kesekî re vê yekê nebêjî?' Selwan xwe davêje piyê wê, dibêje: 'Bi Qurana pîroz, soz didim dê ji kesekî re nebêjim.' Derwêş dibêje: 'Bi soza vî selwanî bawerî nayê. Destûrê bide, ez wî bukujim.' Selwan bêtir ditirse: 'Bila ev ax rihê min bistîne ku ez rast dibêjim. Min we nedît, we jî min! Ez li pey nanê xwe me.' Edûl dibêje dereng e, ez dê herim, hev himêz dikin. Heta keçîk ji ber çavan winda dibe, Derwêş li wir dipê. Derwêş ew şev berdestî sibehê digihîje malê."⁷⁶

⁷⁰ Osman, Evîna Mêrxasekî, r: 370.

⁷¹ Uluçay, h. b., r. 223. Bişkaftin: **Perwîz Cîhanî**. Uluçay di jêrenotê de wiha dibêje. "Perwîz Cîhanî: Ji kasetê peya kir, li bajarê Ormiyê di bihara sala 1989ê de û di sê hejmarên 34, 35 û 36ê kovara Sirwê de çap kir. Tîpguhêzî: Perwîz Cîhanî, 06. 12. 2003, li bajarê Zûrichê."

⁷² Eyup Kiran, Derwêşê Evdî, weş. Nûbihar, r: 170, Stn., 2011.

⁷³ Amer Çelîk, Derwêşê Evdî-Destan, Weşanên Wezaretî Roşenbîrî û Lawan, Hwl., 2011.

⁷⁴ Bawer Ferat, Derwêş ile Adûle, Weş. Yurt, r: 111, Enq., 2009.

⁷⁵ Di hin berhemana de "şivan" tê gotin, ev ne rast e, ji ber ku ji kesên li ber pez re şivan tê gotin, lê ji berpîrsê deveyan re "selwan" tê gotin.

⁷⁶ Ferat, Derwêş ile Adûle, r: 114-116

Selwanê (gavanê) deveyan ku rola Bekoyê Ewan ê efsaneya Mem û Zîn distîne di derheqa wê bûyerê de mehekî bêdeng dimîne, ji kesekî re tişteki nabêje. Lê, nepeniya dilê wî dibe mîna pirzikek bi birîn. Rojekî ew xwe nagre, jivana Derwêş û Edûlê ji jina xwe re dibêje. Piştî demeke din, tîrsa wî dişike, soza ku daye Derwêş bi tevayî ji bîr dike û diçe dîwana paşa serpêhatiya xwe bi hûrgilî tîne ziman.

Paşa difikire ku serê wî bi ereban û eşîrên din re di belayê de ye, nedixwest wê gavê bi Êzidiyan re jî bikeve teşqeleyê, lê vê yekê qet ji bîr nake.

Di heman romanê de eşkerekirina evîna Derwêş û Edûlê bi bûyereke din tê ziman:

Rojekî Derwêş bi hevarekî xwe re leystika “Merxele”yê dileyize. Hevalê wî dibêje heke tu têk biçî, ez dê ji te golikek deveyan bixwazim. Wê gavê Çîlo û Îso jî ber bi wan ve tînin, Derwêş gava wan dibîne bi dengê bilind nav di xwe dide: “Tu min nasnakî? Ez kilê çavê Edûlê me, tu qala deveyekî dikî, ez dehan ji te re bînim!” Îso bi vê peyvê hêrs dibe, cara ewil navê Edûlê wiha eşkere dibihîze ji devê Derwêş.⁷⁷

Ev navdixwedan dişibe gotina Mem a ku piştî kişikê ji qehra Beko ji Mîr Zeydîn re evîna dilê xwe Zînê eşkere dike. Ev di wariantên din de tune ye.

Îso piştî ku vê peyvê dibihîze diçe cem paşayê Milan, dixwaze vê yekê jê re bêje, lê paşa hêrs dibe, biryar dide ku dawî li wê gote gotê bîne.⁷⁸

Xwestina Edûlê ya bi fermî tenê di romana Eyup Kiran de cih digre, di wariantên din de ev yek tune ye.

Evdê Milhim wiha dest bi axaftinê dike:

“Paşayê serbilind, ger destûra te hebe, hêviyek min heye ez dê ji te rica bikim.” Gava ew hewl dide Edûlê bixwaze, Paşa axaftina wî dibire, wiha dibêje: 'Evdê, guhdariya min bike! Hûn Êzidî ne, em misilman in. Tu xulam î, ez paşayê Osmanîyan im. Ereb dibêjin We ‘eslûhû we fêslûhû’. Zewacek wiha bi me nakeve. Tişteki wiha dûrî min û te ye. Mafir te ev mijar vekir, em êdî nikarin li rûyên hev binihêrin. Li Rojava Ferat û li rojhilat şetê Amedê, tu yê ji vî tuxubî derkevî, bi kuderê ve diherî here.’⁷⁹

Derwêş gava vedigere malê, dibîne diya wî tedarekê barkirinê dike, fahm dike ku paşê gotiye “na.” Diya wî Eysê dibêje kurê min, te meseleyê fam kiriye, em dê biçin Elîgorê. Eger Edûlê bi te re rast be, dê mêran nexwaze û xwazgîniyan vegeirîne. Heke qismet be, dê miradê we bibe, ne qismet be hezar keçên din li ber lawê min bi qurban in.

⁷⁷ Ferat, h.b., r. 127

⁷⁸ Ferat, h. b., r:128

⁷⁹ Kiran, Derwêşê Evdî, r. 165-166

Di her du pexşanan (ya Kiran û Ferat) de jî nefîkirina malbata Derwêş cih digre. Piştî ku her tişt eşkere dibe, paşayê Milan keça xwe nade Derwêş, êdî riyek din namîne ji şerqiyên (êzidiyan) re. Milkanê Milan terk dikin û ev yek ji rûyê Derwêş de pêk tê. Derwêş dê careke din xwediya morguluyan Edûlê nedîtaya, êşa Edûlê jî dê dest pê bikira.

Di romana Eyup Kiran de tê gotin ku li Elîgorê di demek kurt de Hedban li ser guhanan dimîne, gava dizê caniyek nêr û sipîboz tîne. Derwêş navê wî Hedbên datîne.⁸⁰ Derwêş baş li Hedbên dinihêre, ew têrşîr dike. Hesp mezin dibe, piştî dibe canî êdî Derwêş dest bi siwariya wî dike. Hespê Derwêş yê şer ev Hedbên e û efsaneya wî di berhemek din de cihê ye, wiha tê gotin:

"...Riya Evdî bi kêleka Behra Wanê ket. Demsal bihar bû, giya şîn bibûn, ezman şîpîşîn bû û stêrk birqok bûn. Tavehîvê her alî ronî kiribû. Hespê Evdî **Qemerê** guhên xwe mîç kirin, li derûdora mêze kir. Evdî hinek ji xwe wê de hespekî çîlîsipî dît. Got: 'Divê hespê kurê min ev be' û hewl da xwe. Qasek paşê hesp şîhiya. Evdî xwe amade kir, lê hesp ji ber çavan bi dûr ket û wî wîndî bû. Gelo ev hesp ji ezman daketibû yan ji behrê derketibû? Evdî fêhm nekir. Lê hat fêmkirin ku wî hespê sipî, bazdabû ser Qemerê û ji ber çavan wîndî bibû.

Evdî ji bo lawê xwe dev ji lêgerîna hespekî berda û veşariya mala xwe. Derwêş ji bavê xwe li hespê pirsî. Evdî got:

'Hespê te di vir de ye' û zikê Qemerê nîşan da."⁸¹

Vegotina ku hespekî ji ezman dadikeve jêr û bi Qemerê re tîn cem hev, ji vê bihevrebûnê Hedbên tê dunê, baweriyek efsanevî ye, dişibe efsaneya hespê Memê Alan Bozê Rewan ku dibêjin ji deryayê derketiye.

Walîyên herêmê ji pêşdeçûna paşayê Milan nerazî bûn, dixwestin Osmanî Fermana wî derxin. Temir Paşa "zanibû walîyên herêmê, bi taybetî Woywodê Diyarbekirê Şehzade Îbrahîm Hefîd Paşa ji bo wî hinek dek û fenan digerrîne, lê nizanîbû ew fen çî ne. Walî û serdarên herêmê, bi taybetî Şehzade Îbrahîm Hefîd Paşa navê wî kiribû Zor Temir Paşa."⁸²

Sê serokê eşîran; Kose Weys, Çîl Brahîm û Eferê Gêsi li hev rûdinên, li ser çermê xezalê fermana Temir Paşa dinivîsin, mor dikin û bi sê siwaran re dişînin Qerejdaxê. Sê siwar tîn, li ber konê Milan peya dibin, xizmetkar serê hespên wan digrin û bi hev re dimeşin dîwana paşê. Ew destê Temir Paşa radimûsin, yekî ji wan ji heqîba xwe eyarekî

⁸⁰ Kiran, h.b., r:170.

⁸¹ Uluçay, h.b., r: 151-152.

⁸² Eyup Kiran, h.b., r: 175.

xezalan yê debaxkirî derdixe û dirêjî paşê dike. Paşa bi nivîsyar dide xwendinê, tê de wiha dinivîse: “Paşayê Milan, konê te pir mezin e, ji konên me sê kesan mezintir e, lê tu ji me ne mezintir î. Konê xwe bi sê parçe bike, yek parçe ji te re bes e, bila were qeysa konên me. Heke tu konê xwe biçûk nekî, em dê werin ebra Milan, konê te bidin ber devê şûran, tejên konê te bikin cuherên hespan, em dê peyayên Milan bikujin, qîz û bûkên Milan ji xwe re bînin.”⁸³

Nameya neyarên Milan tenê di pexşana Kiran de cih digre, di xebata Bawer Firat û Baqî Xidir de tune ye. Di van berhemana de bi gelemperî tenê qala vê dijraberiyê tê kirin.

Paşa (di "romana" Bawer Ferat de Îbrahîm Paşa, lê di ya Eyup Kiran û Îbrahîm Osman de Temir Paşa) ji mêrxasên eşîra xwe re dibêje ku ew li lehengek serkêş digere. Paşa ji nivîsyar re wiha dibêje:

“Daxuyanî bide ku kî pêşengiya pêkanîna artêşê bike, ez dê keça xwe Edûla xwedîya morgulîyan bidim wî, ez dê konekî li cem ê xwe jê re vegirim, pênc sed pez û pêncî hêştirî bidim wî. Bêje Edûlê dê qahweya Yemenê bigerîne, kî bi xwe bawer e, bila fîncanê rake û vexwe.”⁸⁴

Meseleya gerandîna "qahweya şertê" di sê pexşanan de jî heye⁸⁵, lê her yek bi şeweyekê hatiye gotin. Navmaliyê Paşê li nava Milan digere, gotinên paşê dibêje, bang dike, Edûla paşê derdixe mazatê. Lê dîsa kesek taqet nake, newêre li fîncana ferfûrî binihêre. Neyarên wan li benda hatina wan bûn, kî pêşengiyê bikirana dê bihata kuştin.

Di her sê pexşanan (romanana) de jî paşayê Milan dişîne pey êzidiyan da werin alîkariya wî. Lê paşa ji peyayên xwe re dibêje gava ew hatin ji ber wan ranebîn, hespên wan netewilînin û silavê nedin wan. Peyayên Milan li gor fermanê tevdigerin, lê gava Emerê Şerqî û Evdê Milhim li sebeba vê yekê dipirsin, paşa dibêje qey di vê civatê de zilam hene, ger ew zilam bûna dê yekî ji wan qahweya şertê vexwara!⁸⁶

Edûlê ji bo Derwêş qahweya şertê raneke û venexwe tevdigere, çî ji dest tê dike. Naxwaze Derwêş vexwe, lewre dizane ku di dawiyê de mirin heye. Bavê wê jî dibîne ku kesek ranake fîncanê, wiha dibêje:

“Qahwecî were, ez dê rakim wê fîncanê, emrê min heftê sal in, ez her çar salên mayî naxwazim, encax ez rakim barê tirk û gêsan.”⁸⁷

⁸³ Eyup Kiran, h.b., r. 179

⁸⁴ H.b., r: 182-183

⁸⁵ Kiran, h. b., r: 202, Ferat, h.b., r: 186, Osman, h. b, r: 290.

⁸⁶ Ferat, Derwêş ile Adûlê, r: 177-178, ji bo heman bûyerê bnr. Kiran, Derwêşê Evdî, r: 199.

⁸⁷ Uluçay, Destana Derwêşê Evdî, Beşa Şaxê Milan/Berî ji vegotina Baqî Xidir, r: 271.

Kêfa Derwêş tê cih, li benda dîtina bejna Edûlê dimîne, yara wî dê fîncana qahweyê bidana ber wî.

Kesê/a qahweyê digêrîne li gor waryantan tê guhertin.⁸⁸

Siyamo ji Derwêş re dibêje: "Qahweya te dê xwediya morgiliyan niha bîne." Edûl wê gavê dikeve hundur, kembera zîvîn li navê bûye. Ew ewil diçe ber Evdê Milhim, sênî dide ber wî. Evdê dibêje "Na Edûla min, pêşî bibe ber Derwêşê min." Edûl piştî sênîyê dide ber Emerê Şerqî, ew jî dibêje: "Boza min, berê bibe ber Derwêş, ev heq ê wî ye." Ev diyalog di romana Eyup Kiran de cih digre.⁸⁹ Di pexşana Îbrahîm Osman de gava Eyup qahweyê digêrîne, Derwêşê Evdî beriya qahweyê vexwe wiha dibêje: "Ez baş dizanim, beriya ku bigihîjim Edûlê, ez dê werim kuştin... Bila evîna me bibe destan, li ser zar û zimanan bigere, bibe stran û agir, dilan bişewitîne. Bila Mem û Zîna Ehmedê Xanî di evîna me de dubare bibe."⁹⁰

Ev danberheva evînan encama vegotina çîrokbêji, dengbêji an destanbêjiyê ye ku hatiye zêdekirin. Di waryantên din de cih nagre.

Edûlê vedigere û tîk li nav çavên Derwêş dinihêre û ber bi wî ve diçe. Derwêş fîncana ferfûrî digre, dide ser lêvên xwe û bi ser devê xwe de berdide. Piştî vexwarina qahweyê Derwêş derbasî konê xwe dibe, li gor lêkolînekê Edûlê wî dibîne û xeberciyekî kal dişîne cem, zîlamê kal dibêje Edûl xanim dixwaze te bibîne. Qasek paşê bi hinceta destavê Derwêş ji bin kon dertê, Edûla ku hinek jê wê de li cihekî xewle li bendê bû, tê cem. Derwêş wê dixê bin ebuyê durzî yê fireh.⁹¹

Balê dikşîne ku ev tevgera Derwêş, Mem jî nîşan dide, ji bo ew ji alî Mîr Zeydîn ve neyên dîtin Mem Zînê di bin ebuyê xwe de vedişêre. Di gelek berhemana de ev yek cih nagre.

Derwêş ji Temir Paşa re dibêje du şertên min hene, yek hevalên xwe ez dê bineqînim, du, mijarek heye, ez dê tenê ji te re bêjim. Temir Paşa dibêje mijara duduyan em tev dizanin, gel jî dizane. Mebest dana Edûlê ye. Sibehê bi gurmîna meşkan re, Derwêş diçe cem paşê û listeya şervanan pêşkêş dike: "Ez yek, Sehdûnê birayê min, Êsib û Bozanê kurê Emerê Şerqî, Çîloyê Îzolî, her du lawên Mistê Ferhê Dodikî;

⁸⁸ Di pexşana Eyup Kiran de Edûlê qahwe digêrîne (bnr. Kiran, h.b., r: 201), di pexşana Bawer Ferat de tepsîya qahweyê di destê Eyup de ye (bnr. Ferat, h.b., r: 184), di pexşana Osman de jî kesê ku qahweyê digêrîne Eyup e (Osman, h.b., r: 288).

⁸⁹ Kiran, h. b., r. 201

⁹⁰ Îbrahîm Osman, Evîna Mêrxasekî, weş. Lîs, r: 288, Amed, 2008.

⁹¹ Uluçay, h.b., r. 72

Ednan û Ferhan, Baqir Axayê Kher, Selîm û Ayibê Mistefê, Miheme Temê û Îsoyê Miheme Elî. Ev dozdeh leheng in. Ez wan ji we dixwazim.”⁹²

Ew jî di nav de, wî şeş lehengên Êzîdî û şeş jî Misilman bijartibû. Di nava wan de Îsoyê Mele Elî, biraziyê Zor Temir Paşa jî hebû ku leqeba wî Delî Balte bû. Çend navên van siwaran di pexşana Bawer Ferat de cihê hatine pêşkêşkirin:

"Sadûn, Yusuf, Bozan, Îso, Ûbeyd, Ferhan, Bekir, Selîm, Derwêş" û du kesên din ku navên wan ne diyar e.⁹³

Derwêş û şervanên xwe piştî ku qederekê diçin, li ser diyarekî du keçan dibînin. Du keç dixwazin Derwêş bibin cem bavê xwe yê extiyar da aştiyek pêk were.

Ev yek li gor waryantan tê guhertin. Di vegotina Kafkasya ew çar keç in, Ömer Uluçay wiha neqil dike: "Ew çar qîzên ku hatibûn, sergînan berev dikirin. Derwêş ji wan pirsî, bersiv nedan ber bi konên paş gir ve bazdan. Ji konekî yekî kal derket pêşberî Derwêş... Derwêş ji yê kal pirsî wî jî bersiv da: 'Hezar siwarên Gêsî, serdarên wan Hafîrê Gêsî û Ecîl Brahîm e. Konên xwe li Girê Leylanê li dora Gola Zeytûnê vegirtine. Kurê min were ji vê giloka agir dût bisekine. Tu êzîdî yî em misilman in, di navbera me Kîkan û Milan de dijminatîyeke kevn heye. Tu were nekeve navê."⁹⁴

Balê dikşîne ku ev bûyer jî li gor waryantan tê guhertin. Weke ku li jor jî hatiye nivîsîn, di romana Eyup Kiran de ew du keçik in, di berhema Uluçay de çar in û navê Eferê Gêsî jî wekî Haferê Gêsî, Çîl Îbrahîm wekî Ecîl Brahîm hatine pêşkêşkirin.⁹⁵ Di romana Bawer Ferat de ew du keç in, lê kalemêrê ku dertê pêşiya Derwêş Ûbeydê bavê Efer e.⁹⁶ Di romana Îbrahîm Osman de jî ew du keçik in.⁹⁷

Hewldana Eferê Gêsî bo aştiyê:

Hevaltiya Eferê Gêsî û Derwêşê Evdî weke di rûpelên din de tê dîtin di waryantên din de jî cih digre. Di romana Eyup Kiran de tê gotin ku Derwêş û Sadûn li nêzîkî Kepeza Kîkan du siwar li ser rê dibînin, yek Eferê Gêsî yê din kurê wî Berho bûye. Derwêş gava tê nêz silav li wan dike, li hal û wextên hev dipirsin. Efer, Derwêş bi biryar û çavsor dibîne, lewma lawê xwe Berho xewle dike, dibêje gava te keysê dît, bi qerebînê derbekî berde Derwêş, em dê ji wî xelas bibin. Kêliya Efer dîsa dest bi axaftinê dike, dibêje ew kalemêr aştiyê xwest ji te, em destbirakê hev in, dev ji şer berde. Kurê

⁹² Kiran, Derwêşê Evdî, r. 207

⁹³ Ferat, Derwêş ile Adûle, r. 195

⁹⁴ Uluçay, Destana Derwêşê Evdî, r. 138-139

⁹⁵ Uluçay, h.b., r: 138-139.

⁹⁶ Ferat, h.b., r. 214

⁹⁷ Osman, Evîna Mêrxasekî, r: 224.

Efer bi dizîka dest davêje qerebînê, lê Sehdûn vê yekê têdigihêje, tavlê bi qerebîna xwe bera Berho dide.⁹⁸

Di pexşana Eyup Kiran de kurê Efer Berho di vê bûyerê de tê kuştinê.⁹⁹ Di waryantên din de kesekî bi vî navî cih nagre.

Di romana Bawer Ferat de ew kalê ku keçik ew nîşanî Derwêş dabûn, bavê Efer bûye. Ew kalemêr di guhê kurê xwe Efer de wiha dibêje: "Lawê min, tu û Derwêş hevalên hev in, wî bo vegeerê qanî bike. Armanca tekane ya begê Milan bi piştgiriya êzidiyan êrîşî me bike, wê gavê dê xwîn birije."¹⁰⁰ Efer ji Derwêş re dibêje tu ji nava me û Milan derkeve, soz didim ez dê Edûlê ji te re birevînim û bînim. Derwêş dibêje tu bi van peyvan min birîndar dikî. Ger ez wekî te gotî tevbigirim, rojek dê were ku Edûlê ji min re bêje te çima ne bi cengê lê bi dek û dolaban ez anîm. Ez wiha tevbigirim îxanetê bi evîna xwe dikim.

Gava ew wiha diaxifin, Sehdûnê birayê Derwêş tê li ser zinarekî nêzîkî wan dipê. Efer dikeve niqaşê û venagere mala xwe, Derwêş ji vê yekê ditengije, di encam de îşaretek dide Sehdûn. Sehdûn bi tîra destê xwe derbekê li serê Efer dide. Efer birîndar dibe, dikeve, xwîn ji serê wî tê. Derwêş bi ser birayê xwe de hêrs dibe, du bira sedemî birîna Efer li wê çolê şer dikin. Lê Efer dikeve navbeyna wan, nahêle ew hev bikujin.¹⁰¹

Heman bûyer di vegotina Baqî Xidir de jî heye. Bûyer kurt e û pir dişibe bûyera di romana Bawer Ferat de, lê ji hin aliyên ve jê cihê ye. Tê gotin ku dostaniya Efer û Derwêş pir kevn e, berê bi hev re çûne Şengalê hesp çêrandine, bo nîşana destbiraktiyê kevir kirine erdê, gotine heta ev kevir ji erdê dernekevin biratiya me jî naqede. Di vê formê de nayê zanîn ew hev li kuderê dibînin û diaxifin. Efer dibêje Derwêş vegere malê, mirina te ji min ve eyan bûye, tu bi dozdeh siwaran nikarî sê hezar û hefsed siwaran têk bibî. Derwêş venagere, Efer dibêje ez dê ji bo te Edûlê birevînim, lê Derwêş wekî romana navborî ya berî niha heman bersivê dide. Lê balkêş e ku di vegeerê de ji serê Efer xwîn tê. Çima xwîn tê, kî lê daye, ew nayê gotin, tenê ew ji tirk û gêsan re dibêje çûkek derket pêşiya min, ez ji ser hespê firiyam, eniya min li zinarekî ket.¹⁰²

Di dema şer de Îsoyê Mele Elî birîndar dibe, Derwêş wî li hespê siwar dike, dişîne ebra Milan. Derheqa vegera Îso de sê waryant dişibin hev. "...Derwêş hespê wî anî, Îso

⁹⁸ Kiran, h.b., r: 244-246

⁹⁹ Kiran, h.b., r: 247.

¹⁰⁰ Ferat, h. b., r: 216.

¹⁰¹ Ferat, h.b., r. 216-218

¹⁰² Uluçay, Destana Derwêşê Evdî, r. 275-277

rakir û li hesp siwar kir, bi ebayan û hinek hefsarên hespan li ser hespê ediland û girêda. Hev û din ramûsan û xatir ji hev xwestin..."¹⁰³ Di romana Bawer Ferat de heman bûyer wiha tê zimên: "Îso ji erdê rakirin, li hespê siwar kirin, bi ser zîn ve baş girêdan, berê hespê dan aliyê din yê gir. Bi terpûska li newqê dan, hesp beziya. Bi her gahvekî ve canê Îso pir diêşiya."¹⁰⁴ Di vegotina Baqî Xidir de vegeza bi birîndarî ya Îso wiha tê zimên: "Xeber dane paşayê Milan ku Îsa jî hat gihîşt, sax vegeziya. Dibê bi ser de bû lîlîniya zilxitan..." Di berdewama berhemê de tê gotin ku "Îsa nemir, ji birînan rehet bû û Edûlê ji xwe re bir."¹⁰⁵ Zewaca Edûlê bi Îsa re çewa pêk tê, ev ne diyar e û di waryantek din de cih nagre. Tewer di waryanta Kafkasya de xwekuştina Edûlê bûye mijara gotinê: "Edûl ket halekî din, ji xwe ve çû. Li ber çavên herkesî, xencera ku di bin kembera xwe de veşartibû derxist... Yên dîtin tevgeriyan. Lê Edûl rabû ser çogan û bi hemî qeweta xwe qîriya, got 'derdê min gelek mezin e, Derwêşo delalo!' û xencer bi hemî qeweta xwe li ser sînga xwe xist. Serê Edûlê jî ket ser serê Derwêş..."¹⁰⁶

Hemî şervanên Milan yek bi yek tînin kuştin, Derwêş bi tenê şer dike, ne siwarê dulûlan ne yê hespan nagihîjinê. Taliya talî neyarên wî planek û dekek li Derwêş çêdikin. Dixwazin hespê wî bikşînin nava erda qulemişkan, lingên Hedban bişkînin. Şervanê ku dek çêdike û Derwêş dide pey xwe, li gor waryantan tê guhertin. Di romana Eyup Kiran de ev şervan Kose Weys e: "... Kose Weys berê hespê xwe bi hêla erdê xerabbajarê mişkan de kir û da çargaviyan. Derwêş da ser piştê wî... Derwêş nikarîbû Hedbên ragirta, haya wî ji xerabbajarên mişkan tune bû. Derwêş nikarîbû bi hêla pîrekan de jî bişikêne, neçar ajot nav erdê hor, bi vî bayê bezê her du simên Hedbên ên pêşiyê di qulmişkan de hetanî kaba jorîn çûne xwarê."¹⁰⁷ Lê di romana Bawer Ferat de ev bûyer cihê ye, ne Kose Weys lê Etmanê birayê Efer Derwêş li pey xwe dikşîne nava erda bi qulemişk. "...Gava ew (Etman) dibîne ku Derwêş baş nêzîkî wî bû, hefsarê hespê xwe ber bi erda kolemişk ve li ba xist... Hedvan (Hedban) ket nava wê zeviyê. Derwêş ji bo berê hespê xwe vegeziya gava hefsar kişand, lingekî Hedban di qula mişkan de çû xwarê. Hesp bi serserkî ket erdê, pozê wî û piyê wî şikest." Li gor vegotina Serhedê ku Uluçay neqil dike, "pîra sêr dertê pêşiya siwarên tirk û gêsan yê direviyan. Ji wan re

¹⁰³ Kiran, h.b., r. 262

¹⁰⁴ Ferat, h.b., r. 248

¹⁰⁵ Uluçay, h.b., r. 295-296

¹⁰⁶ Uluçay, h.b., r. 141

¹⁰⁷ Kiran, h.b., r. 269-270

got êrîşî Derwêş bikin û wî bikşînin nav qulên koremişkan."¹⁰⁸ Ev vegotina efsanevî di waryantên din de cih nagre.

Derwêş bi derba rimê birîndar dibe. Derba kuştinê ji paş de li Derwêş dikeve, qatîlê wî ne diyar e. Di romana Eyup Kiran de tê gotin ku kalekî Gergerî rima xwe bi teql di piştta Derwêş re dike. Derwêş bi dev û rû diçe erdê, kalo diçe ser, pêl piştta wî dike, dest davê doxa rimê, ew di birînê de ba dide û rima xwe dikşîne, movikên piştta Derwêş dişikên. Zehra Xanima xuşka Efer xwe davêje ser Derwêş. Peyayên şemir û tirkmenan di bin Zehra Xanimê de jî lêdidin. Zehra kofîya xwe dişikîtine û davêje ser şemir û tirkmenan û bang li Efer dike: 'Ev kesê di bin min de lê didin birayê te ye an na?' Efer dibêje gelî gêsiyan derbasî alî min bibin. Ew ji tirkmenan û şemiran re dibêje: 'Derwêş daxilî nava me bûye, jixwe ye mirinê ye, hûn ji ser venegerin, em dê li hev bixin!' Ew vedikişin, diçin cem serekê xwe Kose Weys. Efer li ser wî digrî, bi alîkariya Zehra Xatûnê û hin peyayên xwe Derwêş hildidin û tînin diyarê Girê Edşanê.¹⁰⁹

Alîkariya Zehra (an Zöhre) xatûnê di romana Bawer Ferat de jî cih digre:

"...Gava Zöhre xatûn vê rewşa wî (Derwêş) dibîne, xwe ji ser deveyê davêje, ber bi Derwêş ve bazdide û xwe davêje ser. Ew bang dike: 'Qey dîn û îman bi we re tune, ev edaletek çewa ye?' Birîna Derwêş xedar bû."¹¹⁰ Di berdewama heman berhemê de tê gotin ku piştî gotina Zehra xatûnê Efer dibêje Gêşîno, vekişin! Dest nedin Derwêş! Efer nahêle ew Derwêş bikujin û ji bo tifaqa eşîrên wan xera nebe Çîl Brahîm jî fermana vekişandinê dide. Efer, Derwêş bi halê birîndar dibe ser girê Edşanê.

Gava hewara Milan digihîje ser gir, Derwêş hêj birîndar e, lê di himêza Edûlê de rih dide, Edûlê li ser wî kilama "Delal" dibêje.

Di romana Bawer Ferat de bavê Edûlê Îbrahîm Paşayê Milî bo Sêwasê tê surgûnkin¹¹¹, lê di romana Îbrahîm Osman de ne Îbrahîm Paşa lê Temir Paşa dişînin surgûnê. Ew demekî girtî dimîne, piştê ji surgûnê direve û vedigere ebra Milan.¹¹² Di heman pexşanê de ji bo Hedbên jî tê gotin ku "ew hespê deryayê ye, bi aqil e."¹¹³ Ev yek efsaneya ku bo Bozê Rewan hatiye gotin tîne bîra meriv ku çewa qala dertxistina wî ya ji deryayê tê kirin.¹¹⁴ Ev jî îspata derbasbûna taybetiya efsaneyekî bo nava efsaneyek din e ku ev yek bi destê dengbêj û çîrokbêjan pêk tê ku yek ji encamên vê tezê ye.

¹⁰⁸ Uluçay, h.b., r. 145

¹⁰⁹ Kiran, h.b., r. 271-272

¹¹⁰ Ferat, h.b., r. 253

¹¹¹ Ferat, Derwêş ile Adûle, r. 51.

¹¹² Osman, Evîna Mêrxasekî, r. 111.

¹¹³ Osman, h.b., r. 116.

¹¹⁴ Ronî War, Mem û Zîn, weşanên Ava, r. 21, Stn., 2011.

Hin aliyên pexşana Îbrahîm Osman yên ku dişibin pexşanên din ên derheqa vê mijarê de ev in:

-Qala hevaltiya Efer, xuşka Efer û Derwêş tê kirin.¹¹⁵

-Çûndina Evdê Milhim ya ser gora Rehîmê.¹¹⁶

-Derwêş û Edûlê biryara jivana nava Guhera Deveyan didin.¹¹⁷

-Danberheva evîna Evdî-Rehîma Milî û Derwêş û Edûlê.¹¹⁸

-Axaftina Edûlê di civata bavê wê (ya "qahweya şertê") de.¹¹⁹

-Derwêş hesp dajo ser Etman, bi vî awayî dikeve kemîna erda bi kolemişk û birîndar dikeve.¹²⁰

Bûyerên sereke yên ku di van sê pexşanan de diqewimin, wekî li jor jî tê dîtin pir dişibin hev an mîna hev in. Mîna efsaneya Mem û Zîn û Siyabend û Xecê her çiqas ew weke "roman" hatibin pêşkêşkirin jî, ji ber ku ew bi hin rastiyên dîrokî ve girêdayî mane, divê ew weke pexşan werin binavkirin.

1.2. Dem û Cih

Di pêşgotina pexşana Îbrahîm Osman de raste rast dîroka bûyerê weke "1784" hatiye destnîşankirin.¹²¹ Li gor çavkaniyekê Temirê Milî di dema Siltan Ebdilhemîdê 2. de paşa bûye. "Ebdulhemîdê Duyem li rojhilat ji kurdan 'Alayên Hemîdiyê' li dar xistin... Tê gotin ku Zor Temir Paşayê ku yekîtiya Milan li dar xist û bi pêşve bir, berhema vê polîtîkayê bû."¹²² Li gor heman çavkaniyê destana Derwêşê Evdî destaneke 250-300 salî ye û eşîra Milan berê koçber bûne, paşê li waran bi cih bûne. "...Û wekî navenda desthilatdariyê li Wêranşarê qesir dane çêkirin."¹²³

Cihên ku bûyer lê qewimîne û ev evîndarî pêk hatiye:

Bingeh û jêdera êzîdiyan Şengal e û cihê peristgehê Laleşa Nûranî ye. Malbata Şerqîyan (êzîdiyan) hatine herêma Riha yê, navçeya Wêranşar û Ceylanpinarê. Derwêş û Edûlê li vê herêmê bi hev re mezin bûne. Ji ber ku bavê Derwêş Evdê Milhim di nava

¹¹⁵ Osman, h.b., r: 107 û 108. Bnr. di pexşana Kiran a navborî de rûpelên 112-113, di pexşana Ferat a navborî de rûpela 139.

¹¹⁶ Osman, h.b., r: 119. Di pexşana Ferat a navborî de rûpela 72, di berhema Uluçay a navborî de rûpela 59.

¹¹⁷ Osman, h.b., r: 173. Di pexşana Kiran a navborî de rûpela 153, di pexşana Ferat a navborî de rûpela 113.

¹¹⁸ Osman, h.b., r: 247. Di pexşana Ferat a navborî de rûpela 156, di berhema Uluçay a navborî de rûpela 59.

¹¹⁹ Osman, h.b., r: 268. Di pexşana Ferat a navborî de rûpela 183.

¹²⁰ Osman, h.b., r: 370. Di pexşana Ferat a navborî de rûpela 252.

¹²¹ Osman, h.b., r: 6.

¹²² Uluçay, Destana Derwêşê Evdî, Weş. Dîwan, Stn., 2012., r: 21.

¹²³ H.b., r: 168.

eşîra Milan de cih girtiye û xebitiye, Derwêş jî bûye mîna kesek ji wan. Cihê nefîya êzîdîyan li gora çavkaniyekê **Elîgor** e, li gor çavkaniyek din **Dêrgulê** ye.¹²⁴ Li gor hin çavkaniyan jî **Çemê Circib** û **Zerganê**¹²⁵ cihê sekna êzîdîyan bûye. Ebra Milan ku li Serêkaniyê bûye, ewil konên xwe hebûne, paşê avahî dane çêkirin. Dema ew şerê ku Derwêşê Evdî di nav de tê kuştin diqewime, cihê sekna gêsan û tirkmenan Gola Xatûniyê, Girê Leylanê, Girê Qayîdiyê, Kepezê Kîkan, Qoça Çelogyê bûye. Cihê ku şer lê diqewime **Girê Edçanê** ye, li gor hin çavkaniyan **Ûzunaçan** e. Dibe ku navê ewil bi kurdî yê dawî bi tirkî be. Ew gir di nav axa dewleta Tirkiyeyê de, li bajarê Riha yê, di navbeyna navçeya Weranşar û Serêkaniyê de ye. Gava şervanên Milan birîndar dibin an tîn kuştin, wan tînin ser vî girî. Ew gir di heman demê de bo wan cihê bîhnberdanê bûye jî. Di hin kilaman de navê Girê Qeremîtê jî tê ziman, Uluçay di pirtûka xwe ya navborî de dibêje ku "...Qeremîta civatek xweser e. Qeremîta erdên pîroz Meke û Medîneyê îşxal û talan kirine... Girê Qeremîtê li ser navê vê hukumdariyê ye." Qerejdax, Çiyayê Kurd (Evdilezîz) û Çiyayê Tektêkê di bin rêveberiya Milan de bûye.

1.3. Encam û Nirxandin

Waryantên efsaneyê bi awayê kilaman ji aliyê dengbêjên mîna **Baqî Xudo, Siyamo, Mihemedê Kaşo, Xeffariyê Kolikî, Mihemedcanê Selem û Xelef, Nahsan Elçiyê Samsatî, Şakiroyê Qereyazîyê** ve hatine xwendin.¹²⁶

Ev efsane ji ber ku tenê ne evînî lê wekî cengname jî tê zanîn, bi navê Destana Derwêşê Evdî jî tê nasîn. Di romana Bawer Ferat de evîn li pêş e, di ya Eyup Kiran û Îbrahîm Osman de cengname serdest e. Vexwarina "Qahweya Şertê" wekî ezmûnekî dertê pêş û ji aliyê Zor Temir Paşa ve tê pêşkêşkirin, di hemî wariantan de "qahwe" û "Temir Paşa" cihek girîng digrin. Çêkirin, pêşkêşkirin û vexwarina qahweyê beşên herî girîng in. Kesek di vî şerî de îhtîmala serketina Milan nabîne, dibêjin çûyîn heye, vegeer tune, çima? Ew dizanin hejmara şervanên eşîrên din gelek e. Ev yek divê were nirxandin. Lewma kesek nabizive wê qahweyê vexwe.

Ji Derwêş re ev şer wekî xwekuştinê ye, mîna dueloya Pûşkîn ku dawî li jiyana wî anîbû. Derwêş dozdeh şervanan ne bi xwestekî dibe, ew mecbûr dibin didin pey wî. Balkêş e ku şeş ji wan êzîdî, şeş misilman in û bi pîranî ji malbatekî du bira di nav şerî de cih girtine.

¹²⁴ Bnr. Kiran, Derwêşê Evdî, weş. Nûbihar, Stn. 2011 û Ferat, Derwêş ile Adûle, weş. Yurt, Enq. 2009.

¹²⁵ Uluçay, h.b., r. 206-207

¹²⁶ H.b., r: 17-18.

Her lehengek hevalek xwe heye, yê Gilgamêş Enkîdû ye, yê Memê Tajdîn e, yê Siyabend Qedê ye, yê Derwêş Sehdûnê birayê wî, di hin waryantan de Eferê Gêsî ye.

Herçiqas di waryantekê de tê gotin ku Eferê Gêsî bi rimê li nav pişta Derwêş xistiye jî, kî Derwêş kuştiye wekî şexs û nav nediyar e. Ji ber ku ew di nava şerê komî de hatiye kuştin.

Hevaltiya wî û Efer balkêş e, Efer heta kata dawî bo veşerê di ber wî dide, aştiyê dixwaze, digel ku birayê wî birîndar dibe jî, ew dev ji xwesteka aştiyê bernade.

Destan tenê bi devê Edûlê wekî hawara şînê hatiye gotin.

Firotna keçan, bazara li ser keçan, xapandina wan, bikaranîna wan bo berjewendiyên axa û began di vê efsaneyê de tê dîtin. Edûlê jî ji bo şerê Milan, Gêsan û Tirkmenan alavek e, bi qehweya şertê tê pêşkêşkirin. Çend keç an jinên din jî wekî lehengê destanê ne: Beyaza Emo, Fatima Elî Sîncarî, Gozela Îzolî, Rehîma Milî, Eysa Welya, Zuhre Xatûna Gêsî.

Balkêş e, Derwêş digel ku aşiqê Edûlê ye li hember bazarkirina wê dernakeve, dema ew bi “qahweya şertê” ji aliyê bavê xwe Zor Temir Paşa ve derdikeve mazatê, Derwêş qet deng nake û di vê civatê de wê qahweyê vedixwe da Edûlê bibe para wî.

Piştî şer sîstemek çewa hatiye avakirin, Milan desthilatdariya xwe çewa domandiye, eşîrên li dijî wan çî kirine, têkiliya her du aliyan çewa dom kiriye? Hûrgiliyên van mijaran di destanê de nediyar in, divê ji aliyê dîroknûsan ve werin lêkolandin.

Kirû û mefhûmên ku evînê zêde dikin, agirê wê gur dikin, çî ne? Yek: Ola du evîndaran cihê ye û teqez nikarin bizewicin, ev yek ji aliyê Şêxê êzîdiyan ve ji Derwêş re tê gotin. Gelek şirovekarên evînê dibêjin eşqbazî ji tiştên dûr, nepêkan û bi astengî hez dike. Bihevrebûn û nêzîkbûna evîn û mirinê di vir de agirê her du aliyan geş dike. Tekoşîna ku Derwêş dide bi xwîn e, bi ked e, ev ked li pêşiya xwe tu bend û qeydan nas nake. Mîna destana Memê Alan di navbera du aşiqan de kelemek, bendek heye; ji dêvla Beko ve Îsayê Mele Elî heye ku dilê wî di Edûlê de ye. Mîna Mîrzeydîn, Zor Temir Paşa jî ji dîtina bihevrebûna Derwêş û Edûlê hêrs dibe, êzîdiyan sirgûn dike. Di vegotina Baqî Xidir de tê gotin ku Îsayê Mele Elî di dawiya şer de bi Edûlê re dizewice.

Zor Temir Paşa şertek datîne meydanê, kî bi cih bîne dê bi Edûlê re bizewice. Şertên bi vî rengî di gelek çîrokên rojhilatî yên mîstîk de hene. Mînak di destana Cembelî û Binefşê de bavê Binefşê Faris Beg naxwaze keçikê bide biraziyê xwe Ehmed. Bi teqezî red jî nake, şert û merc datîne pêşiya Ehmed, jê re dibêje heke tu biçî Baedra Şêxan hespê Şêx Xelef QÛLE xesp bikî an bidizî û bînî, ez dê Binefşê bidim te.

Ehmed vê yekê qebûl dike û ji bo pêk bîne sal û zemanan li ser vê riyê derbas dike.¹²⁷ Di efsaneya Siyabend û Xecê de, Xecê bi şev digrî, rondikên wê li ser rûyê Siyabend dikevin. Siyabend şiyar dibe, pezkûviyên nêr li pey a mê dibîne. Xecê rewşa xwe û Siyabend şibandiye wan pezkûviyan, lewma giriyaye. Siyabend jî kuştina pezkûviyekî nêr li pey a mê ji xwe re wekî ezmûn qebûl kiriye. Siyabend tîr davêje wî heywanî, ew birîndar dike, lê gava li ser kendêl kêr davêje sitû, ew wî diheliqîne newalê, ser kelema dara benîştokê.

Aliyê mîstîk di destanê de ev e ku, Derwêş gava “qahweya şertê” vedixwe, serê ejderhaya têde dibîne, xwîna bi kef dihesîne. Siyabend jî gava Xecê dibîne gelek rewşên metafîzîk dertên pêş.

Digel ku ola Êzdayetî li dijî vê zewacê ye, Derwêş çima bi israr Edûlê dixwaze? Tê gotin ku wî xwestiye bi vî awayî gahvekî bo yekîtiya gel bavêje.

Jivana wan a li Guhera Deveyan di gelek waryantan de jî heye, lê hûrgiliyên wan ji hev cihê ne.

Şêweya koça êzidiyan jî cihê ye.

Destana Derwêşê Evdî divê were berhevkerin, lêkolînkirin an bibe mijara teza doktorayê.

Bend li pêşiya vê evînê hene. Ya ewil, baweriya olî ye. Benda duemîn, Zor Temir Paşayê Milî naxwaze keça xwe bide yekî feqîr û belengaz. Jixwe di gelek çîrokên evîndariyê de ya xort xizan e, keç zengîn e, an jî rewş dijraberî vê yekê ye. Benda sêem: Temir Paşa beriya şer her du evîndaran bi hev re dibîne. Ev yek li gor urf û adetan çewt e, ne li rê ye û lewma dibe sebab ku paşa rikê ji wan bigre. Astengiya çaremîn, ji aliyê apê Edûlê Mele Elî ve tê derxistin. Ew wê ji kurê xwe Îso re dixwaze, naxwaze Edûl bi yekî biyanî re bizewuce.

Di gelek evînên dîrokî de dê her dem dixwazin xwesteka keçên xwe bi cih bînin, lê bav astengiyan derdixin. Diya Edûlê kî ye, ev nediyar e û di destanê de ne li pêş e, lê ew dixwaze Edûl bide Derwêş.

Mîna gelek evînên efsanevî, ev jî beriya wekî roman bête nivisîn, bi awayek resen ji aliyê dengbêjan ve hatiye gotin. Dema nivîskaran xwestiye ew bikin romanek nûjen, wê gavê pirsgrêk derketine holê. Hemî nivîskaran hewl dane ku bi "rastiya" vegotina dengbêjan û destanbêjan ve girêdayî bimînin. Ev hişmendiya li pey "rastiyê" bûye sebab ku sê romanên navborî bişibin hev. Mînak:

¹²⁷ Îhsan Çolemêrgî, Cembeliyê Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanxaneya Avesta, Stn., 2001.

1-Edûla keça paşayê Milan misilman e, ji dê û bavekî ew tenê ye, lê Derwêş êzidî ye û xizan e.

2-Bi hev re mezin dibin, dibin evîndarên hev, lê paşa ji ber sebebên olî û çînî keça xwe nade Derwêş.

3-Du evîndar di Guhera Deveyan de tîn cem hev, selwanê deveyan giliyên wan li cem paşê dike.

4-Malbata êzidiyan ji ebra Milan tê nefîkirin.

5-Li dîwana paşê "qahweya şertê" tê gerandin, paşa dibêje kî vê qahweyê vexwe ew dê bibe femandêrê şer. Lê ji Miliyan kesek cesaret nake vexwe, lewma paşa jî dişîne pey êzidiyan. Derwêşê Evdî tê û bi şertê ku dê paşa Edûlê lê mar bike qahweyê vedixwe.

6-Di şer de li pêşiya Derwêş kemîn tê avêtin, ewil piyên hespê wî tîn şikestin, paşê ew tê birîndarkirin.

7-Eferê Gêsî û xuşka xwe Derwêş ji êrîşan diparêzin, lê êdî dereng dimînin, Derwêş tê kuştin.

Pirseke: Di kîjan wêjeya dunê de sê "roman" ewçend dişibin hev?

Ji sedemî tatêl û xema dûrneketina ji "rastiyê" ev encam derketiye holê. Lewma van berheman ji romanê bêtir, divê weke "pexşan" werin binavkirin.

BEŞA 2.

2. EFSANEYA EVÎNA SIYABEND Û XECÊ

2.1. Kurteya Efsaneyê

Ji bo ku evîna Siyabend û Xecê (Xeca Gulîsor an Xecêya Resûl) were lêkolandin, divê du aliyên vê efsaneyê werin dîtîn; yek evîna Siyabend û Xecê, dudo tekoşîna ku Siyabend li dijî xizaniyê û şertên jiyana zehmet, ango “felekê” daye. Wekî hemî evînên efsanewî di zargotina kurdî de, di kilam û çîrokan de ev efsane jî cihekî taybet girtiye û gelek waryantên xwe hene. Bûyera mirina Siyabend û Xecê li ser çiyayê Sîpanê diqewime, lewma tê texmînkirin ku jiyana wan jî, bûyerên efsaneyê jî li alî Serhedê rûdane. Xecê ji malbata Şikakan e; Şikakiyên alî Serhedê Wanî ne. Dîroka qewimînan ne diyar e.

Di salên 1990î de Huseyîn Erdem bi navê “Siyabend ile Xecê”¹²⁸ (Siyabend û Xecê) kurteromanek bi tirkî çap kiribû, piştî ew wekî film derbasî qada sînemayê jî bibû. Lê ew film di şertên wê demê de hatibû qedexekirin. Lêkolîn û lêgerîna **Ahmed Aras** a bi navê **Siyabend û Xecê**¹²⁹ -Mîtolojiya Kurdî de Destaneke Evînî- di sala 1993a de derket. Lêkolîna **Ömer Uluçay** a bi navê **Siyabendê Silîvî**¹³⁰ jî di vî warî de cihekî girîng digre. Pexşana (ku nivîskar navê romanê lê kiriye) **Ronî War** a bi navê **Siyabend û Xecê**¹³¹ di çarçoveya vê xebatê de cih digre.

Li gundê bi navê Silîva kesekî bi navê Ahmet¹³² hebûye, navê birayê wî jî Miheme bûye, qet zarok jê re çênebûne. Piştî demek dirêj Xwedê kurek dide wî, ew navê wî Siyabend datîne. Jê re **Ahmed**, **Sîyahmed**, **Sihamed**, **Sihamend**, **Sîamanto** an jî **Siyabendê Silê** jî tê gotin. Tê gotin ku bi navê xwe **Ahmed** bûye, lê ji ber ku mîna ben lawaz bûye, wî wekî sîyê hesibandine, bi wateya “siyaben”, an “siya Ahmed” ev nav lê kirine. Dibe ku ew wekî siya bavê wî jî binavkiribin, gotibin “siya-ahmed.”

Hêj di heftsaliya Siyamend de nexweşiyek li gundê Silîva belav dibe, dê û bavê wî dimrin, ew sêwî dimîne. Wekî hemî lehengên hin efsaneyan ew jî tenê, li ber destê apê xwe Miho û amojinê, di şertên zahmet de dijî û mezin dibe. Ji ber ku li cem apê xwe xemgîn û belengaz bûye, ji malê direve, zarokên gund li xwe dicivîne, mirîşkên gund

¹²⁸ Hüseyin Erdem, Siyabend ile Xecê (Siyabend û Xecê), Weşanên Belge, ç.1, Stn., 1990.

¹²⁹ Ahmet Aras, Siyabend û Xecê, Weşanên Pirtûkxaneya Ülkem, İzmir, 1993.

¹³⁰ Ömer Uluçay, Siyabendê Silîvî, Weşanên Gözde, Edn., 2010.

¹³¹ Ronî War, Siyabend û Xecê, Weşanên Ava, Stn., 2011.

¹³² Li gor waryantan navê bavê wî tê guhertin. Di berhema Huseyin Erdem a navborî de navê bavê wî Ahmo ye, navê apê wî Miho ye. Di vir de navê "Silîva" ne ji bo navçeya Farqînê, lê wekî navê gundekî hatiye bikaranîn. Di pexşana Ronî War de navê bavê wî Qasim e.

didize, li çolê dipijîne û bi hevalên xwe re dixwe. Nifiran li qedera xwe dike û dikeve nava hewldana lêgerînekê. Bi awayek mîstîk bera pey “feleka xayîn” dide. Di dozdeh saliya xwe de, ji bo li kuçeyan tor tor negere, bi pêşniyariya amojna xwe, dibe golikvan. Piştî ku dest bi golikvaniyê dike jî, birçî dimîne, mecbûr dibe ku bi giya û zêzewatên çolê debara xwe bike. Rojeka ku garanê di newaleka kevîrî de derbas dike, kevîrek digindire û lingê golikekî dişkê. Jinika xwedîya golikê giliyê Siyabend li cem Miho dike, apê wî bi daran lê dixwe, serê wî dişkîne. Gava wiha dide pey û lê dide, siwarek bi leq wan ve tê û Siyabend diparêze. Siyabend jî piştî wê lêdanê êdî venagere cem apê xwe. Ew li çolê tenê digere heta pêrgî şivanekî tê, jê tika dike ku xwarinek bide wî da zikê xwe pê têr bike. Şivên xureka tûrik, li xwe û wî parê dike. Gava dibe êvar berf dibare, Siyabend li çolê cendekê deveyeka mirî dibîne û xwe di wir de vedişêre. Di wê hewayaya sar de, di nava ponijîn û xemgîniyê de radizê û ew şev xewneka ecêb dibîne: Kalek jê re dibêje Siyabendê Silivî rabe, min ji te re hespek bi navê **Deybilqiran** aniye û di qaşa zînê hespî de şûrek heye bi navê **Lahorê Qetlê**, tu yê bibî destbirakê **Qeregêtranê Salê**.

Siyabend piştî ji malê û ji cem apê xwe jî direve, dikeve rê û çol û pesar diçe, xwe digihîne ber deriyê qesrekê. Ew qesra Hesên Axa bûye. Hesên Axa ew li cem xwe dike mêvan, dilê Siyabend dikeve keça wî Gulperî. Hesên Axa jê hez dike. Gulperî ji ber gurîbûna wî rû nade Siyabend, ew jî bi “Simê Devê” li singa wê dide. Hesên Axa bi vê yekê dihise, sîleyek li pelegoşka Siyamed dixîne. Çend roj bişûnde, Siyabend hespê Hesên Axa **Deybilqiran** ji tewlê dertîne û ji xwe re dibe. Di romana **Ronî War** de xwedîyê hespê kesê bi navê Mîrze Beg e.¹³³ Demek bişûnde ew dibe isat, rêbir û şakî. Piştî dikeve riya xerabiyê, dixwaze ewil heyfa xwe ji ap û amojina xwe bistîne. Ew demekê xerabiyê dike, dikeve nava garan û kerîyan, terî û guhanên heywanan jêdike. Digihîje astek wiha ku, xerabiyên wî deng didin, gel êdî jê ditirse. Navê hespê wî **Deybilqiranê Xeybê**¹³⁴ ye, ew êdî siwar e, leheng e, xofê belav dike.

Siyabend dest bi rêbirîna dike, karwanan dişêlîne. Rojêkê pêrgî Başbazirganê dewletê tê, baca rê jê dixwaze, lê ew û Başbazirgan pevdiçînin, Siyabend bi derba simê devê ew dakuje. Katibê wî jî pê re ye, Siyabend keysê li wî jî tîne, dixwaze wî bikuje, lê katib ji berdêla zindîhiştina xwe de soz dide ku dema Siyabend bizewice, heqê xerc û mesrefa dawetê bide. Ew navnîşana xwe ya Elcewazê jî dide wî. Siyabend seba ku pir xerabî dike, pîrek rojêkê nîfirek li wî dike, dibêje: “Hêvî ji Xwedê li te derê serê

¹³³ Ronî War, Siyabend û Xecê, Weşanxaneya Ava, r: 79, Stn., 2011.

¹³⁴ Di pirtûka Ahmed Aras de navê hesp wekî “Hêşinbozê Surê” tê gotin.

Qeregêtranê Salê, heyfa me feqîran ji te hilîne.” Siyabend piştî ku vî navî dibihîze, sond dixwe ku bi pey Qeregêtran bikeve. Şevêkî Xocê Xizir tê xewna wî, tu dê Qeregêtran bibînî, hûn dê bibin destbirakê hev. Di rojeka çile de, di nava berfê de, di qûntara çiyayekî de rast li Qeregêtran tê. Qeregêtran birîndar e, şûjinek di piştta wî de ye. Jixwe Qeregêtran jî di xewna xwe de Siyabend dîtîye. Ewil şer dikin, lê yek zora yê din nabe, piştîre dibin destbirakên hev. Siyabend derdê xwe û “feleka xayîn” ji Qeregêtran re dibêje, her du bi hev re demekê li felekê digerin. Qedê (Qeregêtran) di demeke ku Siyabend di xew de ye, hespê xwe ber bi mêrgan dajo û digere. Lê siwariyek dertê pêşiya wî, siwarî rê dibire, nahêle ew here. Ew û siwarî dest bi şer dikin, di encam de siwarî Qedê dîl digre, wî datîne cihê ku Siyabend di xew de ye û bi riya xwe ve diçe. Siyabend şiyar dibe, Qedê di rewşeke perîşan de dibîne. Siyabend li Deybilqîran siwar dibe, li deştan digere, heman siwarî dertê pêşberî wî jî, dibêje “Tu ar nakî?” Bi êrîşê re fam dike ku ew ne yê demek berê, ango Qedê ye. Diqîre, derban davêje, li fersendê digere, lê Siyabend keysê lê tîne. Ew xwe ji ser hespê davêje, lê êdî nikare siwar bibe. Siyabend şûr datîne ser sitû, lê siwarî wê gavê bişkojên xwe diqetîne û sînga xwe vedike. Du memikên wê dertên holê, Siyabend şûrê xwe vedikîne, dibêje: “Rabe ser xwe xatûn!” Radibe, xwe dide nasîn, dibêje: “Navê min Erebzengî (Erebzincîr) ye, li vê deverê ez kesekî di ser şûrê xwe re nabînim. Min sond xwariye kesê ku milê min deyne, ez dê bibim ya wî.” Siyabend dibêje niha armançek min heye, ez li pey felekê me, ne li pey evînê.

Demekê ew û Qedê bi Erebzincîr re diçin, lê Erebzincîr ji ber ku keça mîrê cinan bûye, ji ber çavan wînda dibe.

Ew û Qedê li nêzikî kaniyekê rast li konekî bi çardeh sitûnan tîn, keçek di bin kon de hebûye. Ew kon li Mêrga Gulîstanê, li Textê Hesengolê bûye. Navê keçikê Xeca Gulîsor (an Xeca Mamiyan) bû, jê re Xeca Qelenderî, Xeca Resûl jî dihat gotin. Ew keçek bedew û pir xweşik bû. Gava Siyabend wê dibîne, dilê wî mîna çûkek serjêkirî dipirpîte, ne bi dilekî bi heft dilan keçikê dihebîne. Bi xap û fenokî ew û Qeregêtran dikevin bin kon, dinêrin ew tenê ye, heft birayên wê çûne pezcêrandinê û nêçîrê. Xecê xwe dide nasîn: Ew ji eşîra Şikakan keça Resûl bû, lê dê û bavê wê wefat kiribûn. Gelek pismamên wê dilketiyê wê bûn. Ew ji ber wan reviyabû, bi heft birayên xwe re hatibû çiyayê Sîpanê Xelatê. Dibêje birayên min li seydê ne, bisekinin heta ew tîn. Qeregêtran li navên birayên wê dipirse, ew dibêje: “Leter, Meter, Heyder, Cafer, Qelender, Mistefa

û Emer in.”¹³⁵ Dibe êvar, birayên wê bi kerîyek pez re vedigerin malê. Dibêjin hûn mêvanên Xwedê ne, bi wan re dikevin sohbetê, lê Siyabend eşkere dibêje ez xuşka we ji xwe re dixwazim. Birayên wê dibêjin hal û mesele ev, Şikakî li pey me ne, heke tu bi xwe bawer î û heke xuşka me jî dil bike, em dê bibêjin “erê”! Wê gavê ji Xecê dipirsin, ew jî dil dike, gustîlkan dikin tiliyên hev. Siyabend dixwaze dawetek ku li xweşikî û bedewiya Xecê were, pêk bîne. Sozê Katibê Başbazirgan dikeve bîra wî, dibêje ez dê biçim cihêz, xerc û mesrefên dawetê bikirim û bînim.

Siyabend dixwaze biçê bajêr, lê li Qereqêtran dinêre, bawerî nayne ku Xecê teslîmî wî bike, ji ber ku carekê ji caran dîtîbû ku Qedê bidizika li Deybilqiran siwar bibû. Ji wê rojê de şik ketîbû dilê wî, Qedê li pêş kon girêdide û diçe. Ew şev li bajêr dimîne, katibê Başbazirgan soza xwe bi cih tîne. Lê, nivê şevê Siyabend bi dengê Deybilqiran şiyar dibe, heywên dihîre û pêkolyê dike. Siyabend difikire, dibêje tiştêk bi Xecê hatiye lewma Deybilqiran dihîre û nasekine.

Nûçeya ku Siyabend û Xecê dê bizewicin belav dibe, erebekî parsekê lêvdeqandî agahî dide Hesên Axayê Şikakî. Axa bi hezar siwarîyî li Xecê digere, ew dibîne, her heft birayên wê dîkuje û Qereqêtran jî birîndar dike, Xecê li pişt zîne hespê xwe siwar dike û digel kerîyek pez direvîne.

Siyabend gava tê cihê kon, çav bi cesedên birayên Xecê dikeve. Qereqêtranê girêdayî jî birîndar e, li erdê dinale. Wê gavê Siyabend poşman dibe ku wî girêdaye. Miriyan defn dike, Qedê jê re dibê, ez hêvî dikim miradê te û Xecê bibe, ger zarokek we çêbibe, navê min lê deynin. Siyabend şopê digerîne, kincên qetandî li ser rîyan dibîne. Demek bişûnde xwe digihîne qonaxa Şikakiyan. Dibîne ku def û zirne li dar e, bi rojan e dawet gerandî ye.¹³⁶

Ew serê hespê xwe serbest berdide, hesp pozê xwe li konê pîreka heştê salî dixê. Pîrê dertê, Siyabend dibêje ez mêvanê te me. Pîrê wiha lê vedigerîne: Mêvan mêvanê Xwedê, lê ez pir xizan im, alîyekî konê min vekirîye, yek girtiye. Here cem Şikakiyan, tu nabînî def û dawet li dar e sî û neh roj in humîn û gurmîn e, here bila ew te biezimînin. Siyabend dibêje ez mêvanê te me. Piştî ew çar zêran dide pîrê. Pîrê razî dibe, cih jê re amade dike, êvarê dikevin axaftinê. Siyabend dibê ev daweta çî ye ku sî û neh rojan dom dike. Pîrê dibêje bila mala Siyabendê Silîvî xera bibe, ji cihê dûr hat, lê li Xecêya Resûl xwedîti nekir, ew da dest Şikakiyan. Ev daweta ku tu dibihîzî daweta

¹³⁵ Di versiyona Siyabendov Semend de (Weşanxaneya Hîvda, Stn., 2006) tenê navên du birayên wê Qehreman û Tahir cih digrin ku ew jî di nava navên li jor de cih nagrin.

¹³⁶ Li gor pexşana Ahmet Aras Siyabend li mala pîrejinekê dibe mêvan, dipirse "metê ji taxa jêrîn dengê defê tê, ev çî şêhnayî ye?" Ahmet Aras, Siyabend û Xecê, weşan: Ülkem Kitabevi, r. 53, İzmir, 1993.

Hesen Axayê Şikakî û Xecê ye, Xecê sî û neh roj in teslîmî wî nebûye, heta hezkirina Siyabend di dilê wê de hebe jî teslîm nabe. Hesen Axa heft birayên Xecê kuştiye, dilê Xecê dê çewa lê rûnê? Piştî vê axaftinê Siyabend pênc zêrên din dide pîrê û dibêje Siyabend ez im, ji kesekî re nebêje, here tasek şîr ji min re bîne. Çêlekek pîrê hebûye, pîrê diçe bi guhanên wê ve dizeliqe, bi çi kul û halî tasek şîr jê didoşe û tîne, Siyabend gustîlka tiliya xwe davêje nava şîr, dibêje vê tasa şîr ji Xecê re bibe. Bêje bila ew zewaca kurê Şikakiyan qebûl bike, dawetê bide sekinandin, xwe paqij bike, kincên bûkaniyê li xwe bike, li benda min bipê, ez dê werim, li ser piştê Deybilqiran wê siwar bikim û em dê bifirin ji nav konên Şikakan.

Pîrê gava xwe digihîne ber derê qesra kurê mîr, kilamek dibêje, di nav peyvên kilamê de qala çiyayê Sîpanê, xuşka heft birayên kuştî dike. Wê gavê deng diçe Xecê, ji xizmetkaran re dibêje pîrê bigrin hundur. Pîrê gava dikeve hundur, dibîne ku di destek Xecê de jehrî, di yê din de xencer heye, ji berbûriyan re dibêje xwe bidin alî, hûn ji derdê wê re nebûn derman, dora min e! Gava ew tenê dimînin, pîrê dibêje hezkiriyê te li mala min e, êdî xwe ji vê bîna mirinê xelas bike Xecê! Ger tu bawer nakî, şîrê tasê vexwe. Kêliya Xecê şîr bi ser xwe de dike, gustîlka binê tasê¹³⁷ dikeve devê wê. Ew bi pîrê bawer dike, dibê tu çi bêjî ez dê wisa bikim. Here ji Siyabend re bêje min ew ji te re amade kir. Pîrê diçe cem Hesen Axa, dibêje min Xecê anî rê, dawetê bisekinîne, ew te qebûl dike.

Herkes belav dibe, diçin konên xwe, axa li benda şevê dipê, pîrê jî tê bin konê xwe, ji Siyabend re dibêje, Xecê li benda te ye. Xecê ji cihê xwe bi dizî dertê, Siyabend wê li hespê siwar dike. Pîrê jî tenê tîr û kevanek ji zîv ku ji mêrê wê yadîgar e dide Siyabend. Deybilqiranê ku bi bayê re dibeze, ew şev wan digihîne ser pozê çiyayê Sîpanê. Her du evîndar li ser kaniyekê kon vedigrin, dilê wan bi agirê evînê dikele, hêstirên wan bi bextewarî û xemgîniyê têkelf hev dibin. Sibehê gava şiyar dibin dibînin ku axa bi şervanên xwe re hatiye wan dorpêç kiriye. Xecê dibêje, ew hatine dê te bikujin, min jî birevînin. Siyabend xwe amade dike, çekan hildigre, li Deybilqiran siwar dibe û bi nava wan dikeve. Gava ew xwe digihîne Hesen Axa, bi simê devê derbekî li sînga wî dide. Hespê wî vala dibeze, peyayên wî fam dikin ku axa hatiye kuştin. Tirsek dikeve nava wan, ji hev dipeşkilin, hemî li pey hespê kurê axê vedigerin warê xwe.

¹³⁷ Gustîl wekî simbol û alavek ragihandinê ye ku di gelek efsaneyan de cih digre. Di destana Memê Alan de veguestina gustîlên Mem û Zînê û di evîna Bijen û Menîce de şandina gustîla Ristemê Zal bo Bijenê di bîra zîndanê de du mînakên sereke ne ku di naveroka vê xebatê de cih digrin.

Rojekê li ser sînga Sîpanê ya bilind Xecê rûniştiye, Siyabend serê xwe daniye ser çoka wê û ketiye xewê. Wê gavê dozdeh pezkûvî ji pozên çiyê xwe berdidin nav şînahiya mêrgan. Yek mê bûye, yazdehên din nêr bûne. Yek ji nêran ku qamkurt, qelew û qilochên wî dozdeh şaxî bûne bera pey deh pezkûviyên nêr dide, nahêle ew nêzîkî ya mê bibin. Xecê di dilê xwe de dibêje “ew dişibe Siyabendê min.” Birayên wê û êrîşa mîrê Şikakan tê bîra Xecê. Çend dilop hêstir ji çavan dibarin ser hinarkê Siyabend, ew şiyar dibe. Ji Xeca ku digrî re dibêje, gurîbûna min te xemgîn dike, tu poşman bûyî? Xecê dibêje ez bi qurbana serê te yê gurî bibim, min dozdeh pezkûvî dîtî, yek mê, yazdeh nêr. Yekî nêr ê ku bi quloçê dozdeh şaxan bû, nedihîşt ên din nêzîkî ya mê bibin. Êşa birayan hat bîra min, lewma giriyam. Siyabend dibêje, ew pezkûviyê nêr here kuderê ji destê min xelas nabe.

Siyabend radibe, xwe girêdide, radihêje tîr û kevana pîrê ya zîvîn, bi pey pezkûvîyî dikeve. Li cihekî pêrgî garana wan tê, pezkûvîyê nêr hêj li pey a mê bûye. Siyabend diçe nêzîkî wan, tîrê dide ser newqa pezkûvîyî û berdide, tîra zîv li aliyê rastê dikeve, di aliyê çepê re dertê. Ya mê sitûyê xwe dihejîne û çiv dide xwe, direve ser çiyê.

Ji bo serê pezkûvîyî jêbike, Siyabend diçe cem. Ewil tîra xwe ji nava wî derdixe, dû re bi her du piyên pêşî digre û kaş dike, li pey xwe dibe heta ser keviya kaşekî bilind ê Sîpanê. Wê gavê dengê marîna pezkûviya mê tê. Siyabend xencera xwe dikşîne da karê xwe biqedîne. Xencerê dide ser qirika heywên, bi piyekî xwe jî pêl qilochê wî dike. Pezkûviyê ku hêj birîndar e û di ber rih de ye, xwe bihêz hildavêje û bi wê veciniqandinê re Siyabend di gelî re davêje jêr. Gava ew di gelî de wer dibe, diçe li binê gelî li ser kelemê dara benîştokê dikeve, kelem di singa wî de diçike, di piştê de davêje.

Çavê Xecê li riya wî dipê, dinihêre ku ew nayê, dertê û çiya bi çiya, newal bi newal li Siyabend digere. Ewil pezkûviya mê dibîne, dikeve şikê, piştî jî li ser pozê Sîpanê termê pezkûviyê nêr li erdê dibîne. Digere, tê ser keviya gelî, dengê nalînekê dibihîze ku ew ji kûraniya newalê tê. Xecê xwe xwar dike, li jêr dinihêre, dibîne ku Siyabend bi dara benîştokê ve ye. Xecê digrî, dike hewar û gazî, dibêje Siyabendê min, cihê min jî li cem xwe hazir bike, ez jî tîm! Siyabend dibêje na, xwe navêje, here werîsê heft gundan û keziyên heft keçan bi hev ve girêde, min xelas bike ji binê vî gelfîyî. Xecê bi gotina wî dike, diçe li gundên der û dorê digere, werîsan dicivîne û digel çend xortên herêmê tîne ser gelî. Lê ked û xebata wan vala diçe, kesek nikare Siyabend derxe ji wir. Siyabend dibêje Xecê, min bi xwe kir; min çewa pezkûviyên evîndar ji hev qetand, wî pezkûvîyî jî min û te ji hev dûr xist. Here li Deybilqiran siwar be, biçe Elcevezê, bikeve nava xortan, yekî ji min çêtir bibîne. Heke kurekî te çêbibe, navê wî Qeregêtran

deyne.¹³⁸ Xecê dibêje ez naçim cihekî, piştî te kesekî nakim. Xecê çavên xwe bi desmalê girêdide, xwe di wî gelyî re davêje xwarê. Ew jî li ser wî kelemê dara benîştokê dikeve, kelem bi giraniya wan ji cih radibe û ber bi jêr ve digindire, Siyabend wê gavê can dide, Xecê heta ku karwanek tê ber serê wê sax dimîne. Ew vê meseleyê ji serî heta dawî ji karwên re dibêje û wiha bi ser ve dike: “Piştî ez mirim, min û Siyabend li nik kaniyekê binax bikin û navên me li ser mezelan binivîsin. Tasek hesinî bi kevirê gorê ve girêdin, gava rêwî hatin bila ji wê kaniyê avê vexwun.”

Xwediyê karwan xwesteka Xecê bi cih tîne.

Li gor rîwayetê her sal du şaxên gulên sor li ser mezelen wan radibin, dixwazin xwe bigihînin hev, lê giyayekî reş di nava wan de şîn tê, nahêle ew bigihîjin hev, pezkûviyek tê wan gulan digurmiçîne.

2.1.1. Karakterên Efsaneyê

Siyabend û Xecê du kesayetên sereke yên vê pexşanê ne ku evîndarên hev in.

Bavê Siyabend Ahmo (an Ahmet) mirovek hejar bûye û di zarotiya Siyabend de dimre. Navê Apê wî Miho ye ku demek bişûnde dibe muxtarê gundê Silîva. Miho kesayetek zilmkar e, zarotiya Siyabend li ber destê wî derbas dibe, ew û jina xwe zilmê li Siyabend dikin. Karakterê Siyabend ê serhildêr û şerûd di vê serdema zarotiyê de teşe digre.

Karakterek din yê girîng Qeregêtranê Salê ye, ew “kurê Hemê û Zemê”¹³⁹ ye û destbirakê Siyabend e. Xeca Mamiyan (Resûl), xuşka heft birayan e, Şikakî yê, pismamê wê Hesên Axayê Şikakî wê dixwaze, lê Xecê dil nake û bi birayan re direve çiyayê Sîpanê.

Yek ji astengê vê evîne karakterê Hesên Axayê Şikakî ye ku di nava wî û Siyabend de şer li dar dikeve û ew tê kuştin.

Di waryanta Ahmet Aras ku ji devê Sebriyê Bilanixî hatiye girtin de navê heft birayan Leter, Meter, Heyder, Cafer, Qelender, Mistefa û Emer in.¹⁴⁰ Lê di pirtûka Celîlê Celîl-Ordîxanê Celîl a bi navê Destanên Kurdî de navên birayên Xecê: "Itî, Witî, Qereqot, Malmîret, Pêxwas, Pêbas û Canfidan" in.¹⁴¹ Erebeke parsek nûçe digihîne

¹³⁸ Di straneka Îsa Berwarî de Siyabend ji Xecê re dibêje here bizewice, ger kurek te çêbû, navê min lê bike.

¹³⁹ Aras, h. b., r: 19.

¹⁴⁰ Aras, h. b., r: 6 û 40.

¹⁴¹ Kesê ku neqil dike Ömer Uluçay, Siyabendê Silîvî, weş. Gözde, r: 63, Seyhan-Edn. 2010. Çavkanî: Celîlê Celîl-Ordîxanê Celîl, Destanên Kurdî, weş. Zel, r: 244, Stn, 1994.

Hesen Axayê Şikakî, jê re dibêje Xecê û Siyabend dizewicin. Axayê Şikakan heft birayên Xecê dikuje û Qedê jî birîndar dike û Xecê direvîne.¹⁴²

Hesen Axayê Şikakî, pismamê Xecê ye û dixwaze pê re bizewice, lê daweta ku li dar dixwe naçe serî.

Kesayetek din jî keçika bi navê Erebzincîr (Ereb Zengî) e, wekî kesayetek mîstîk, bi roleke stero dikeve nava efsaneyê û paşê winda dibe. Xwedêgravî ew keça mîrê cinan bûye.

Karakterê hêja pezkûvîyekî nêr ê bi heft qiloçan e ku dibe qatîlê Siyabend, ew di gelî re tera dike ser dara benîştokê. Pezkûvî astengek sereke ye ku nahêle ev evîn bi bextewarî bidome.

Pîrê jî karakterek stero ye ku li bajarê Şikakan alîkariya Siyabend dike da karibe Xecê birevîne. Başbazirgan û katibê wî hene ku Siyabend riya wan dibire, Başbazirgan dikuje, katib berdide, lê soza alîkariyê jê digre.

Di vê efsaneyê de du hesp hene ku dîrokî ne, yek jê hespê Siyabend **Deybilqiran**¹⁴³ e ku hevaleyê sadiq e, yê din weke ku di berhema navborî de tê gotin hespê Qeregêtranê Salê **Alabacaxê Şê** ye.

Hin ji van karakteran û pêwendiyên wan li gor waryantan tên guhertin. Mînak di waryanta Zeynelebidîn Zinar de Siyabend û Qeregêtran ji dê û bavê birayê hev in. Emer Axa heye, dixwaze keça xwe **Elîf** bide Siyabend, lê Siyabend Elîfê di şeva zîfafê de berdide. Ew dixwaze şûr, rim û hespê xwe jî bide wî, lê ew hespê **Mihemed Axa Deybilqiran** û şûrê wî **Lahorê Qetlê** digre. Karaktera perîzade heye, Siyabend wê li Qeregêtran mar dike. (Perîzade dişibe Erebzincîra di waryantên din de.)¹⁴⁴ Di heman berhema de **Têlîzeyneb** qarakterek e ku li Sîpanê tazî digere, Siyabend aşîqê wê dibe, pê re dizewice, lê pismamê wê **Delû Misto** wê dixwaze, ji ber ku Qeregêtran serê Delû Misto jê re tîne, Têlî Zeyneb jî xwe bi kêrê dikuje. Di vê waryantê de **Xocê Xizir** û **Kalê Pîr** jî du kesayetên mîstîk in.

¹⁴² Aras, h. b., r: 44-46.

¹⁴³ Di pexşana Ahmet Aras de navê hespê Siyabend ne Deybilqiran e, lê Hêşînbozê Sûrê ye. Bnr.: Ahmet Aras, Siyabend û Xecê, weş. Ülkem Kitabevi, r: 19, İzm., 1993.

¹⁴⁴ Kesê ku neqil dike Ömer Uluçay, Siyabendê Silîvî, weş. Gözde, r: 97-112, Seyhan-Edn. 2010. Berhema çavkanî: Zeynelabidin Zinar, Siyabend û Xacê, weş. Pencinar, Stockholm, 1992.

2.1.1.1. Têkiliya Karakteran

Siyabend ne di nava malbatê de, lê li derve bêdê û bêbav û li ber destê ap û amojinê mezin dibe. Lewma ev yek li hemî karakterê wî tesîr dike. Têkiliya wî û amojinê xerab e, apê wî Miho zilm û tadehiyê lê dike.

Erebzincîr bi Siyabend re şer dike, ew diceribîne, tê famkirin ku keça “mîrê cinan” e, paşê wînda dibe. Perîzade jî mîna Erebbincîr kesayetek mîstîk û efsûnî ye.

Qeregêtranê Salê ango Qedê destbirakê (an birayê) Siyabend ê herî nêzîk e, lê Siyabend bawerî pê nayne, wî li qeydê dixê, dibe sebeb ku ew birîndar bibe, lê dîsa jî dostaniya wan xera nabe. Numûneya vê hevaltiyê di hemî efsaneyan de heye; mînak Mem û Tajdîn, Bijen û Gurgîn, Derwêş û Eferê Gêsî û hwd.

Têkiliya Xecê û Siyabend ji bin konê birayên Xecê dest pê dike, Siyabend wê ji birayan dixwaze, paşê têkiliya wan wekî evînek kûr, bi hestiyar û wefakar dimeşe. Ew qet nikarin bibin jin û mêr, "felek" vê riyê nade wan.

Hesen Axayê Şikakî kesayetek zilmkar e, mîna Bekoyê di efsaneya Mem û Zînê de, mîna Temir Paşayê Milî û mîna Efrasiyabê bavê Menîce.

Pîrê ew kesayet e ku bi fenokî diçe cem Xecê û destê her du evîndaran cardin digihîne hev. Rola Hayzebûna di efsaneya Mem û Zînê de çî be, ew jî wê erkê tîne cih.

Deybilqîran ew hesp e ku mîna hemî hespên lehengên efsaneyan jêhatî ye, bi fam e û siwarê xwe diparêze, ew gava Xecê, heft birayên wê û Qedê di tengasiyê de ne, pêkolî dike, bi awayek mîstîk Siyabend agahdar dike.

Yek ji karakterên vê efsaneyê yê herî girîng pezkûviyê nêr e ku dibe qatîlê Siyabend, di dema serjêkirina xwe de qiloç li lingê wî dide, ew di gelî re davêje ser dara benîştokê.

2.1.2. Li Gor Waryantan Guherîna Karakteran û Bûyeran

Gelek wariantên vê efsaneyê hene; ji aliyê Ahmet Aras ve çar wariantên zanîn, li gor nivîskêr ya herî tekûz waryanta **Sebriyê Bilanixî** bûye.¹⁴⁵ Di berhema Ahmet Aras de tê gotin, Siyabend ji ber şikastina lingê golika muxtêr ji alî apê xwe ve zilm û tade dibîne, lewma ji malê direve. Li gor ku di berhema Hüseyin Erdem de hatiye nivîsîn, navê bavê wî **Ahmo**, yê apê wî **Miho** ye.¹⁴⁶ Lê Siyabend li gund bi zarokan re dizîya mirîşkan dike, lewma tê qewirandin. Di romana Ronî War de navê bavê wî wekî

¹⁴⁵ Aras, *Siyabend û Xecê*, r. 6.

¹⁴⁶ Erdem, *Siyabend ile Xecê*, r. 13.

“**Qasim**” hatiye nivîsîn û sebeba derketina wî ya ji gund jî zilma ap û amojînê bûye, herwiha li çolê dibe eşqiya û rêbir.¹⁴⁷

Li gor forma ku **Ömer Uluçay** nivîsiye, sebeba reva wî ya ji cem ap-amojînê, lêdana kurê muxtarê gund e. Apê wî Miho bo vê yekê pir li biraziyê xwe dide.¹⁴⁸ Di heman berhemê de qala gelek waryant û formên vê destanê tê kirin: Pexşana Hüseyin Erdem a ku li jor hatiye qalkirin weke parçeyek ji berhema Celilê Celîl û Ordîxanê Celîl (Destanên Kurdî) dinirxîne: "Di nava metna Celîlên birayan a bi kurdî û ya Hüseyin Erdem a bi tirkî de ji bilî yek-du guhertinan, ji aliyê tevn û temayê ve qet cudahî tune ye."¹⁴⁹ Waryantek girîng a Celîlên birayan e ku weke me li jor gotibû di berhema Destanên Kurdî de cih digre ku ji alî Uluçay ve hatiye nirxandin.¹⁵⁰ Nivîskar xebata Heciyê Cindî û Emînê Evdal a bi navê Folklorî Kurmanca jî girtiye dest û qala sê waryantên din (bi navên Sîabend, Siyabend û Xecê û Sîamanto) ên di wê lêkolînê dike.¹⁵¹ Berhema Siyabendov Semend a bi navê Siyabend û Xecê jî yek ji mijara heman nivîskarî ye ku hatiye lêkolandin.¹⁵² Pexşana Zeynelabîdîn Zinar a bi heman navî ku xweser e, gelek cihêtiyan di hundurîna wî me di rûpelên cihê ên vê xebatê de qalkiriye, di lêkolîn û lêgerîna Uluçay de jî hatiye nirxandin.¹⁵³ Herî dawî pexşana M. Seîd Remezani el-Bûtî ku ewil bi erebî bi navê **Siyamend İbnu'l-Edğal** nivîsiye û piştî bi navê "Siyamend ile Xecê'nin Hikayesi"¹⁵⁴ li tirkî hatiye wergerandin ji aliyê lêkolînerê navborî ve hatiye nirxandin.¹⁵⁵

Ahmet Aras dest nîşan dike ku di xewnê de kalekî extiyar hesp, kinc û şûr dide Siyabend, gava şiyar dibe, van li ber serê xwe dibîne. Navê hesp **Hêşînbozê Sûrê** ye, navê şûr **Lahorê Qetlê** ye.¹⁵⁶ Heman tiştî **Uluçay** jî tîne zimên, ew jî navê hespî wekî **Hêşînbozê Sûrê** diyar dike. Lê di romana War de navê hesp **Demirqerê Xeybê** ye ku ew hespê kesê bi navê **Mîrza Begê** ji aliyê Serhedê ye.¹⁵⁷ Di berhema Hüseyin Erdem de navê hespî Deybilqiran e, hespê kesekî bi navê Hesên Axa ye.¹⁵⁸ Lê, Hesên Axa di

¹⁴⁷ War, *Siyabend û Xecê*, r. 25.

¹⁴⁸ Ömer Uluçay, *Siyabendê Silivî*, weş. Gözde, r: 12, Seyhan-Edn. 2010.

¹⁴⁹ Uluçay, h. b., r:36.

¹⁵⁰ Uluçay, h. b., r:57.

¹⁵¹ Heciyê Cindî-Emînê Evdal, *Folklorî Kurmanca*, weşanxaneyê Avesta, Stn. 2008. Di pirtûka Uluçay a navborî de rûpel: 81.

¹⁵² Uluçay, h. b., r: 89.

¹⁵³ Uluçay, h. b., r: 97.

¹⁵⁴ Çîroka Siyabend û Xecê.

¹⁵⁵ Uluçay, h. b., r: 113.

¹⁵⁶ Aras, *Siyabend û Xecê*, weş. Pirtûkxaneyê Ülkem Kîtabevî, İzm., 1993.

¹⁵⁷ Aras, h. b., r:79.

¹⁵⁸ Erdem, *Siyabend ile Xecê*, r. 45. Ev Hesên Axayê tê qalkirin ne Şikakî ye ku Xecê revandiye, ew kesekî din e.

berhema **Aras** de navê axayê Şikakan e, pismamê Xecê ye û Xecê bi darê zorê direvîne. Di berhemên din de navê şûrê Siyabend **Lahorê Qetlê** (an Lawirê Qetlê) ye, lê di berhema **War û Erdem** de ji bilî şûrî, “Simê Devê” jî alavekî wî yê şer e û navê mîrê Şikakan jî ne diyar e. Li gor Erdem kesê ku Xecê direvîne “**kurê mîrê Şikakan**” e.¹⁵⁹

Di forma **Erdem** de Hesên Axa Siyabend dike mêvan, keça xwe Gulperî jê re dişîne, lê ew bi çavê xuşka xwe li keçikê dinêre, naxwaze pê re bizewice. Di romana **Ronî War** de wekî ku me li jor jî behs kir, bi navê **Mîrza Beg** karakterek heye ku keça wî jî heman daxwazê ji Siyabend dike, ew di rola “Gulperî” ya Erdem de ye.¹⁶⁰ Lê Siyabend pê re nazewice. Di pexşana ku Ömer Uluçay nivîsiye de, ew vedigere mala apê xwe, ji bo hev helal bikin xatir ji ap û amojnê dixwaze.¹⁶¹

Li gor forma ku **Uluçay** nivîsiye, Qedê bi destûra Siyabend bi dûrebînê li deşteke dinêre, konê Xecê dibîne, dibê “ew cihê dîwana felekê ye.”¹⁶² Di wê demê de dûrebîn hebûn an tunebûn nayê zanîn, lewra dîroka qewimîna bûyerên efsaneyê ne zelal e.

Li gor waryanta ku Celîlê Celîl û Ordîxanê Celîl nivîsîne¹⁶³ heta nîvê efsaneyê navê leheng “Gurî” ye. Şûrê wî ji polayê birûskê ye ku li dara nav baxçe ketiye, mertala wî ji simê devê ye.¹⁶⁴ Alabacaxê Şê hespê başbazîrgan bûye, wî bi darê zorê jê sitendiye.¹⁶⁵ Di vê waryantê de navên birayên Xecê Îtî, Wîtî, Qereqot, Malmîret, Pêxwas, Pêebas û Canfîda ne.¹⁶⁶ Kesê ku tê Xecê direvîne, ne axayê Şikakan e, kurê Mîrê Şikakan e û serê heft birayan û yê Qedê jî jêdike, Xecê digre cem xwe û dikeve riya Elcewazê. Ereba Zincîr ji şiklê merivan dertê, dîsa dibe cin û ji ber çavan wînda dibe.¹⁶⁷

Di waryanta Heciyê Cindî-Emînê Evdal de,¹⁶⁸ Siyabend biryar dide ku biçê welatê Ereban. Li wî welatî ew pêrgî konekî tê, di bin de pîrejînek û keçek xama û xweşik hebûne. Siyabend ji pîrejînekê dipirse da ew kon yê kî ye û ew keçik kî ye? Jinik dibêje ev keçik keça min e, navê wê Xecê ye, kon jî yê me ye, heft kurên min hene çûne seydê, qîza min jî dê bibe bûka Mîrê Ereban. Dilê Siyabend bi nêrîna ewil ber bi dilê Xecê ve

¹⁵⁹ Erdem, h. b., r: 61.

¹⁶⁰ War, h. b., r: 86-87.

¹⁶¹ Ömer Uluçay, Siyabendê Silivî, weşanên Gözde, r: 14, Edn., 2010.

¹⁶² Uluçay, h. b., r: 19.

¹⁶³ Ordîxanê Celîl-Celîlê Celîl, Destanên Kurdî, “*Siyabendê Silivî û Xecê*”, Weşanên Zel, Stn. 1994.

¹⁶⁴ Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl, h. b., r: 54-55.

¹⁶⁵ Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl, h. b., r: 68-73.

¹⁶⁶ Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl, h. b., r: 79-81.

¹⁶⁷ Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl, h. b., r: 82-83.

¹⁶⁸ Heciyê Cindî-Emînê Evdal, Folklorê Kurmancan, “Ji vegotina Êsivê Keko”, Weşanên Avesta, 2008 Stn. r: 561-573.

diherike û dilê Xecê jî dikeve Siyabend. Gava xwediyên kon, ango kurên pîrê ji seydê vedigerin, Siyabend keçikê ji birayên wê dixwaze, ew jî wê didin.

Di vir de nakokiyek dertê pêş, mafir ku dê Xecê bibûya bûka Mîrê Ereban, çima birayên wê xuşka xwe ya bi dergistî didin Siyabend? Di vê waryantê de kesên Xecê dixwazin ne Şikakî ne, ne pismamên wê ne, "kurê Mîrê Ereban" e.¹⁶⁹ Ev guherînek e, ya duduyan gakuviyê nêr ê ku bera pey ya mê dide û dixwaze ew bidestxîne bi çavekî ye, lingek wî seqet e û kuloçek wî şikestiyê.¹⁷⁰

Di waryanta Siyabendov Semend de¹⁷¹ lehengê çîrokê wekî zarokek pêçayî û sêwî ji aliyê pîrejinekê ve tê dîtin. Nivîskar di serê berhemê de nirxandin dike.¹⁷² Herikîna bûyeran wiha ye: Pîrejina ku pitik dibîne tenê bûye, mêrê wê hatiye kuştin, zarokên wê mirine, ew Siyabend mezin dike. Piştî ew guvrikî dibe, Ehmed Axa wî dike seyisê hespê xwe. Siyabend paşê hîn dibe ku her sal Mîrê Ereban ji Ehmed Axa xeracê distîne. Siyabend li hespekî sor siwar dibe û diçe hemberî serxeracvanê Mîr. Lê serxeracvanê Mîr bi xwe nayê şer, cîgirê xwe dişîne. Şer dertê, Siyabend wî ji ser hespê dixîne û serê wî bi şûr jêdike. Siyabend bi destûra Ehmed Axa berê xwe dide Sîpanê cem wê pîrejina diya xwe ya şîr. Di rê de pêrgî konekî tê, keçikek xweşik ji bin konî dertê der, navê wê Xecê bûye... Li gor Uluçay "vehonandina metna vê berhemê û herikîna bûyeran, bi berhema C. Celîl-O. Celîl û bi berhevoka H. Cindî-E. Evdal a waryantên *Destana Siyabend* re li hev tîn."¹⁷³

Di waryanta ku Zeynelabîdîn Zinar nivîsiye¹⁷⁴ de, Siyabend û Qeregêtran ji dê û bavê birayên hev in, Siyabend diçe deşta Farqînê û Qeregêtran diçe çiyayê Sîpanê. Siyabend ji ber ku pir dert ji destê "felekê" dikşîne, ji bo tola xwe jê bistîne berê xwe dide Yemenê... Rist û tevna xebata Zinar ji yê din cuda ye, lewma Ömer Uluçay di berhema xwe ya navborî de bo vê berhemê wiha dibêje:

"Lehengê ku navê xwe li destanê daniye, ango Siyabend di nava nakokiya karakterek têkel û cihê ku nayê fam kirin de hatiye pêşkêşkirin. Di berhemê de navên lehangên hatiye guhertin, lê erkên wan mîna waryantên din mane. Di hin cihan de motîvên mîtolojîk hene, lê berhem bi şeweya romanek realist hatiye nivîsîn. Ber bi dawiyê ve, di berhemê de bûyer trajîk û pir dibin. Vê zêdebûna bûyeran Şehnameya Fîrdewsî tîne bîra meriv. Ew Şahnameyek e, lê ev

¹⁶⁹ Heciyê Cindî-Emînê Evdal, h. b., r: 567-573,

¹⁷⁰ Binêrîn: Nivîskarê ku ji berhema **Cindî û Evdal** neqil dike Ömer Uluçay, Siyabendê Silivî, weşanên Gözde, r: 83, Edn., 2010.

¹⁷¹ Siyabendov Semend, Siyabend û Xecê, Weşanên Hîvda, Stn. 2006.

¹⁷² Semend, h. b., r: 5-11.

¹⁷³ Ömer Uluçay, h. b., r: 90.

¹⁷⁴ Zeynelabîdîn Zinar, Siyabend û Xacê, Weşanên Pencinar, Stock. 1992, 158 rûpel.

Siyahmedê Silivî ye. Lê di berhemê de motîvên Memê Alan, Cembeliyê Kurê Mîrê Hekarî û tewer ên ku qet di çanda Kurdî de tune ne, mînak fenteziyek bi xax heye ku keç û jinên xelkê bi zor û kotekî tîne di dewsa çelen de dide birayên Xecê, cih digre.¹⁷⁵

Balkêş e ku di vê waryantê de Siyabend, Xecê di xewna xwe de dibîne û wê gavê gustîlkên xwe bi hev diguherin.¹⁷⁶ Karakterên Gulperî, Elîf, Perîzade, Têlizeyneb û keça Mîrze Beg (nav ne diyar e) hemî dişibin hev, rola wan nêzîkî hev e, li gor waryantan navên wan tîne guhertin.¹⁷⁷

Li gor waryanta Ahmet Aras nivîsiye, gundî piştî têwerbûna di gelî de tîne, cenazeyên Siyabend û Xecê dibînin, dinêrin bi destên hev girtine û li wê derê mirine. Li kêleka hev du mezelan dikolin, wan defn dikin. Her sal biharê, li ber serê mezelen wan du kulîlk şîr dibin û serên xwe ber bi hev ditewînin, dema serê kulîlkan nêzîkî hev dibin, gakuviyek tê kulîlkan diqurmiçîne.¹⁷⁸

Pirtûka Siyabendov Semend a derheqê vê efsaneyê de pêşî bi tîpên krîlî çap dibe, paşê li kurdiya latînî tê veguhestin.¹⁷⁹ Karakterên Siyabend û Xecê mîna raperînerên civakî tîne nasandin. Ev waryant dişibe xebata Celîlê Celîl û Ordîxanê Celîl û xebata H. Cindî-Emînê Evdal.¹⁸⁰ Di vê waryantê de Siyabend li cem dayikê mezin dibe, ne li cem ap û amojînê. Pîrejînê Siyabend bi nan û xwarina parsê xwedî dike. Di waryantên din de bi Hesên Axa an kurê Mîr re şer dike, lê di vir de bi "Mîrê Ereban" re dikeve cengê. Meseleya dîtina konê Xecê mîna hemî waryantan di vir de jî cih digre. Piştî ku ew bi hev re Mîrê Ereban tîk dibin, Siyabend Xecê ji birayên wê dixwaze. Di vir de Qeregêtranê Salê rol nagre. Balkêş e Siyabend ne li Deybelqiran, lê li "Hespê Sor" siwar dibe. Mîrê Ereban bi gelek cihêzan (zîv û zêran) birayê Xecê yê mezin dixapîne, Xecê ji kurê xwe re dibe. Siyabend mîna waryantên din bi pey wê dikeve. Di vê waryantê de cara yekem name tê bikaranîn ku di waryantên din de tune ye. Xecê li pey xwe ji Siyabend re notek wiha dihêle: "Dilê min bi te re ye, ger tu mîr î, were min bibe!"¹⁸¹ Siyabend diçe cihê daweta kurê Mîrê Ereban û Xecê... Mîna waryantên din Siyabend gustîlk dide pîrê, pîrê gustîlkê dibe û baweriya Xecê tîne ku ji cem Siyabend hatiye, soz

¹⁷⁵ Uluçay, h. b., r:100.

¹⁷⁶ Zinar, h. b., r:101-104. Efsaneya Mem û Zîn di bîr bînin. Ev veguhestin di waryantên din de tune ye.

¹⁷⁷ Ji bo nîrxandina şexs û erkên berhema Zinar, binêrin: Ömer Uluçay, Siyabendê Silivî, weş. Gözde, r: 101-102, Edn., 2010.

¹⁷⁸ Aras, *Siyabend û Xecê*, Weş. Ülkem, r: 77, İzm., 1993. Di efsaneya Mem û Zîn de Beko dibe sitirî, di nava gora Mem û Zîn de şîr tîne.

¹⁷⁹ Siyabendov Semend, *Siyabend û Xecê*, Weşanên Hîvda, Stn. 2006.

¹⁸⁰ Hacıyê Cindî- Emînê Evdal, *Folklor Kurmancan*, Weşanên Avesta, Stn. 2008, 750 rûpel.

¹⁸¹ Neqilkirina ji pirtûka Siyabendov Semend: Ömer Uluçay, h.b., r: 94.

didin ku li ser mezêlavê Xecê hev bibînin. Siyabend Xecê li pişt xwe siwar dike û hespê dibezîne...¹⁸²

2.2. Dem û Cih

Dema qewimîna bûyerên vê efsaneyê ne diyar e. Cih aliyê Serhedê ye, di hemî waryantên efsaneyê de navê Elcewazê û Sîpanê Xelatê derbas dibin. Silîva navê gundê Siyabend e. Warê Şikakan di gelek waryantan de heye, lê di hin waryantan de navê Yemenê derbas dibe. Gund, çiya, daristan, zinar, gelî, Deryaya Sor (Qizildeniz), Çola Sîlekanê, Laleş, Wan, Ormiye, Çiyayê Tendûrek, Agirî, Çiyayê Mereto û Mengene navên warên ku ev efsane derbas dibin in.¹⁸³

2.3. Encam û Nirxandin

Ev efsane beşek ji wêjeya devkî ya kurd e; ji aliyê dengbêjan ve weke kilam jî tê nehvirandin, ji aliyê çîrokbêjan ve li civatan jî tê gotin.¹⁸⁴ Di forma roman an kurteçîroka nûjen de nîn e, bêtir mîna çîrok û çîrvanokên berê hatiye afirandin ku ev tesbît ji ber aliyên wê yê mîstîk in.¹⁸⁵

Çîrokek bi navê "Siyabend ile Xecê" (Siyabend û Xecê) bi tirkî ji alî Huseyin Erdem ve hatiye nivîsîn. Eşkere ye ku wekî navê xwe tevnê ji dunyaya kurdî girtiye. Ew jî mînak e ku çewa efsaneyek kurd li zimanek din tesîr dike û bi zimanek din tê nivîsîn.

Qeregêtranê Salê (Qedê) "feleka" ku Siyabend li pey e rê wî dide: Ew konê felekê, yê Xeca Resûl û heft birayên wê ye. Xecêya ku di encam de dibe destpêka evînek trajedîk jî jê re dibe "felek". Ango "felek" dîsa peyva xwe ya dawî di şexsê Xecê de ji Siyabend re dibêje! Aliyên balkêş yên vê efsaneyê gelek in; ji gelek aliyên ve, navên lehengan û bûyeran mîstîk in. Ji navê Siyabend bigre heta navê Qeregêtranê Salê û navên dê û bavê wî Hemê û Zemê, navên heft birayên Xecê; Îtî, Wîtî, Qereqot, Malmîret, Pêxwas, Pêbas û Canfida, navê şûrê wî Lahorê (an Lawirê) Qetlê di nava

¹⁸² Bnr. Cindî- Evdal, *Folklor Kurmançan*, Weş. Avesta, Stn. 2008.

¹⁸³ Uluçay, h. b., r: 103. Nivîskar gelek mekanan destnîşan dike.

¹⁸⁴ Siyabend û Xecê beşek ji çîrokbêjiya gel e. Ahmet Aras di berhema xwe ya navborî de çîrok an kilamên vê efsaneyê tîne ziman. Lêkolîna Ömer Uluçay a bi navê **Siyabendê Silivî** vê yekê derdixe ber çavan.

¹⁸⁵ Mîstîk di wateya vebêja serxwezayî an surrealîst de hatiye bikaranîn. Aliyên mîstîk ên vê efsaneyê ev in: Di berhema Ahmet Aras de tê gotin ku piştî mirina du evîndaran her sal li ser mezêlavê wan giyayek şîn tê. Gava serê terhikên wan nêzîkî hev dibin, gakûviyek tê û wan diqurmîçîne û dixwe. Di heman berheme de qala kesayeta bi navê Erebzincîr jî tê kirin. Ew weke keça Mîrê Cinan tê nasandin ku hebûna cinan bi baweriya olî ve girêdayî ye, metafîzîk e û mîstîk e.

kurdan de ne navên bikarhatî û olî jî nîn in. Navê Siyabend jî piştî efsaneyê di nava kurdan de bêtir belav bûye. Wateya Deybilqiran çi ye? An Alabacaxê Şê? Gelo ev nav ji tirkî, ji peyva “al bacak”, an “ala bacak” (bi wateya lingê sor, an lingê mezin) hatiye bikaranîn? Van navan çîrokê bêtir mîstîk dikin. Jixwe di efsaneyê de Erebb Zincîr heye ku ew keça mîrê cinan e! Ewil wekî mêran şer dike, gava têk diçe keziyên wê dixuyin, piştî sêra wê xera dibe. Herwiha perîzadeya ji Yemenê kî ye, çewa bûye perî, piştî çewa vediguhere û dibe meriv?

Heke meriv li tîkiliya nava lehengan, tîkiliya cih û demê binihêre, kirû û qewimînên dûrî eqilan hene. Mînak siwariyek di çend rojan de dikare ji Serhedê biçê heta Yemenê? Di dema ku teknoloji û amûrên ragihandinê pir ne li pêş in, ev çûndin zehmet e. Lê di wariantekî de Qedê û Siyabend bi hêsanî diçin heta Yemenê, ev jî balkêş e.

Me berê jî gotibû, di hemî pexşan û romanên dîrokî de navên hespan hene. Di vir de jî em rast li navê hespê Siyabend **Deybilqiran** û hespê Qeregêtranê Salê **Alabacaxê Şê** tî. Di çîrok, destan an romanên dîrokî de navên şûran pir tune ne (ji bilî navê şûrê Hz. Elî "Zulfiqar"), lê balkêş e ku navê şûrê Siyabend Lahorê Qetlê ye.

Di nava wariantan de aliyên hevpar ev in: Siyabend ji zarokî de sêwî dimîne, ap-amojinê wî xwedî dikin. Ji ber ku pir cefa û eziyet kişandiye, li hember qedera xwe serî radike, lewma bo tolhildanê bi pey “felekê” dikeve. Bidestxistina Xecê zahmet e, ew xuşka heft birayan e, ewil wê dane kesekî din ê xurt, maldar û êrîşkar. Bi vê astengiyê evîna Siyabend bihêztir dibe.

Efsane çîrokî ye jî¹⁸⁶, wekî helbestê bi aheng e jî, dengbêj wekî kilam jî dibêjin. Mirina Siyabend bi serê xwe helbestî ye, hêmaya wê bilind e û di hemî wariantan de nayê guherîn: Gakûvî (an pezkûvî) an jî xezaleka mê dikeve nav grûbek gakûviyên nêr û êrîşkar, Siyabend bi tîrê lê dide, ew jî bi birîndarî wî di gelî de tera dike ser dara benîştokê.

Romana ku ji aliyê Ronî War ve hatiye nivisîn, di bin kênca (tesîra) van wariantan de hatiye amadekirin û lewma ew ji romanê bêtir, dişibe forma çîrokek dirêj a wêjeya devkî.

Di gelek efsaneyan de her karakterek sereke hevalek xwe heye: Hevalê Gilgamêş Enkîdû ye, hevalê Mem Qeretajdîn e, hevalê Derwêşê Evdî birayê wî Sehdûn e (ji aliyek ve jî Eferê Gêşî ye), hevalê Bijen Gurgîn e û hwd. Herwiha hevalê Siyabend jî

¹⁸⁶ Ahmet Aras, Siyabend û Xecê, Weşanên Pirtûkxaneya Ülkem, İzmir, 1993.

Qeregêtranê Salê ye. Van hevalan carna lehengên sereke ji belayan xelas dikin, bo wan alîgir in, destbirak in û şewirmend in.

Bûyer li tevna "romana nûjen" nayê, ji ber ku ew bi "rastiya" waryantên dengbêj û çîrokbêjan ve girêdayî dimîne.

Ev evîn bûye efsane, lewma di nav kurdên dunyayê de (çi li Qefqasya û Ermenistanê, çi jî li nava Kurdên li Îranê) belav bûye û waryantên cihê derketine holê. Wê reng daye romanên nivîskarên wekî Yaşar Kemal, lewma wî "Efsaneya Xezala Belek"¹⁸⁷ nivîsîye. Ew ne tenê bi şeweya destanê, herwiha bûye senaryo, kilam, roman û çîrok jî.

Aliyên waryantan ên hevbeş ev in:

1-Siyabend ji dê û bavê tenê ye, xuşk û birayên wî tune ne. Dê û bavê wî, dema ew zarok bûye mirine, ap û amojînê (an hin kesên din) wî xwedî kirine.

2-Ji ber ku di zarotiya xwe de pir lêdan dixwe û eziyet dibîne, vê yekê mîna sûcekî "felekê" dinirxîne û bi pey "felekê" dikeve.

3-Destbirakê wî bi navê Qeregêtran (an Qedê) hebûye, alîkariya wî dike.

4-Di gera li pey "felekê" de çav bi konê Xecê dikeve, ew Xecê dibin evîndarên hev.

5-Astengî li pêşiya evîna wan dertên: Hesen Axayê Şikakî an jî Mîrze Beg dertên ser riya wî, di hin waryantan de heft birayên Xecê ji zewaca wan re dibin bend û kelem.

6-Dema ew pir nêzî bextewariyê dibin, li ser çiyayê Sîpanê gakûviyek birîndar Siyabend di gelî re davêje jêr, dibe sebebê mirina wî.

7-Xecê jî li pey Siyabend xwe di gelî de davêje û ew jî dimre.

¹⁸⁷ Bi tirkî: Ala Geyik Efsanesi.

BEŞA 3.

3. EFSANEYA EVÎNA BIJEN Û MENÎCE

3.1. Kurteya Efsaneyê

Evîna Bijen û Menîce, ji ber ku Bijen xwarziyê Ristemê Zal bûye û wî ew ji bîrê rizgar kiriye, bi efsaneya Mala Zalê û Ristemê Zal re tê gotin. Di vegotina çîrokên wêjeya devkî ya derbareyê efsaneya Ristemê Zal de, evîna Bijenê¹⁸⁸ xwarziyê Ristem û Menîceya keça Efrasiyab¹⁸⁹ cihêkî girîng digre. Di Şehnameya Fîrdewsî de bi navê Bîjen û di gelek berhemên din de bi navê Bijen¹⁹⁰ wekî kurê Gîwê Guhderzî (an Gêwê Guhderz), xwarziyê Ristemê Zal tê naskirin. Di berhevoka Hilmî Akyol a bi navê “Mala Zalê” de di du mînakên wêjeya devkî ya gel de qala Bijen û Menîce tê kirin. Ev evîn di dîroka wêjeya kurd û farisan de pir girîng e, lê mixabin heta niha di zaravayê kurmancî de li ser wê lêkolîn çênebûne û ew derneketiye pêş. Bi zaravayê Goranî xebatek Muhemmed Mukrî bi navê "Bîzan û Manîja" hatiye çapkirin¹⁹¹ û li Parîsê di sala 1966an de wergera wê ya bi Fransîzî hatiye weşandin. Kadrî Yildirim jî di jêrenota berhemek xwe de wiha qala Bijen û Menîce dike:

"Bijenê ku bi navê Bîzen an Bîcen jî tê nasîn, kurê Gîw e, neviyê Guhderz e. Di heman demê de kurê xuşka Ristem e û lehengek bi nav û deng ê dema Keyxusrev e. Ev efsane ji aliyê Ata b. Yakûb ve derbasî nivîsê bûye. Dema Keyxusrev li ser text bûye, ji zerarên xinzîrên kûvî yên ji herêma Erman a li ser tuxubê Îran û Tûranê ditengije, ji fermanbaran dixwaze ku yek biçê wê herêmê û dest deyne ser wê rewşê. Bijen vê erkê digre ser milê xwe û bi Gurgînê Milad re diçe û wan xinzîran ji holê radike. Lê Gurgînê ku ji Bijen didexise, wî dibe nava welatê Tûranê û dike meclisa şox û şengê. Bijen dikeve çadira keça Efrasiyab Menîjeya ku li wê derê bi stranbêjan re di kêf û şahiyê de bûye. Ew bi hev re mey vedixwun û evîndarê hev dibin. Gava Efrasiyab vê yekê dibihîze, Bîjen girêdide û davêje bîrekê. Gurgîn Bijen di wê rewşê de dihêle û vedigere Îranê û ji Keyxusrev re dibêje Bijen winda bûye. Lê Keyxusrevê ku li Cam-i

¹⁸⁸ Peyva "bi-jan" bi wateya “kesê ku janê an êşê dikşîne” ye. Bnr. Farqînî, h.b., 889.

¹⁸⁹ Di berhemên cihê de navên ji hev cuda wekî Elfesiya, Elpisiya an Erwasiya li kralê welatê Turanê hatiye danîn.

¹⁹⁰ Navê cihê yên vî lehengî hene: Bêjen, Bêrjem, Bijen û hwd. Di hin berhemên de navên van lehengan “Bîjen û Mûnîje” ne, di hin çavkaniyan de "Bijen û Menîce" ne. Bnr: Muhsîn Kızılkaya, Kayıp Divan (Dîwana Winda) Weşanên Îletîşîm, Stenbol, 2000, Hilmî Akyol, Mala Zalê, Weşanên Enstituya Kurdî ya Amedê, Amed, 2006 û Edîb Polat, Ristemê Zal, Weşanên Evrensel, Stn. 2007.

¹⁹¹ Muhammed Mukrî, Efsaneya Bîzan û Manîja (Versiyona Populer a Kurdistana Başûr), Weşanxaneyê Centre National, belavkirin: Librairie Klincksieck (Paris), 1966.

Gîtînumayê (mîreka dunyayê) dinihêre, dibîne ku Bijen tenê ye û di bîrê de dîl e. Keyxusrev ji bo xelasiya wî erkê dide Ristem. Ristem û çend fermandar diçin Tûranê, bi alîkariya Menîje Bijen xelas dikin. Keyxusrev bi vê yekê dilşa dibe û wan dizewicîne. Di wêjeyên rojhilatî de cureya zîndana ku Bijen tê de dîl girtine, wekî 'Çah-i Bijen' (Bîra Bijen) an 'Çah-i Erjeng' (Bîra Erjeng) tê binavkirin..."¹⁹²

Di Şehnameya **Fîrdewsî** de waryantek efsaneyê evîna Bijen û Menîce cih digre, lê ew wekî berdewama mesnewiya helbestvan e û ne pexşan e, lewma em wê ne wekî waryantek bingehîn a vê tezê, lê wekî çavkaniyek plansaziya pişt digrin dest. Min kurteya vê efsaneyê ji pexşana (romana) **Ristemê Zal**¹⁹³, ji **Dîwana Winda**¹⁹⁴ û ji pexşanên pirtûka **Mala Zalê**¹⁹⁵ ku di jêrenotan de navên wan cih digrin sûd wergirt. Di van sê pirtûkan de çar waryant (an formên) evîna Bijen û Menîce cih digrin. Kurteya efsaneyê wiha ye:

Di dema Keyxusrev de şevê çar peya ji welatê Erman tîn mêvandariya Keyê Îranê, dibêjin xinzîr dikevin zeviyan, pir zerarê didin me, em bi wan nikarin, alîkariyê bide me. Kurê lehengê bi navê Gêwo derdikeve pêş, ji Keyxusrev re dibêje ez Bijen im, bi can û rih di bin fermana we de me. Digel ku bavê wî Gêwo li dijî xwesteka kurê xwe dertê jî, Bijen li rikê siwar dibe, dixwaze biçê. Keyxusrev jî beriya destûra çûndina wî bide, dibêje Bijen jêhatiye, lê xişîm e, riya welatê Erman nizane, bila Gurgînê kurê Mîlad jî pê re here. Her du pêlewan çend roj bişûnde xwe digihînin daristana ku xinzîr lê dijîn. Ewil gelek êzing dicivînin û agir vêdixin, pezkûviyekê dipijînin. Gurgîn sermest dibe, dixwaze binive, lê Bijen jê re dibêje here pêşiya avê, bi gurzê xwe li xinzîran bide.

Gurgîn ji Bijen re dibêje cihê dîlanê û geştê heye, keçik tîn wir, di nava wan de Menîceya keça Efrasiyab (Elfesiya) balê dikşîne, wekî hûrileyman e, li wir şerab heye, gul û sosin hene. Kêfa Bijen tê, dilê wî dikeve gola peroşê û tavlê li hespê xwe siwar dibe. Ew li ser piştê Şevreng,¹⁹⁶ Gurgîn jî bi hespê xwe bi rojan di rê de diçin, roja sêmîn digihîjin wê deştê. Gava Menîce ji bin kon dertê, li derûdora xwe dinêre, Gurgîn Menîce nîşanê Bijen dide. Bijen ji bo xwe ji tîna rojê biparêze li ser hespê diçe bin siya

¹⁹² Kadri Yildirim, *Ehmedê Xani Mem û Zîn*, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2010, r. 288.

¹⁹³ Edîb Polat, *Ristemê Zal*, Weşanên Evrensel, Stn., 2007. Di vê berhemê de vegotina Evdîlqadirê Cafo yê ji gundê Çorepa jî cih digre, çirok bi dengê wî hatiye qeydkirin û di pirtûka navborî de cih digre.

¹⁹⁴ Muhsîn Kızılkaya, *Kayıp Divan (Dîwana Winda) Weşanên Îletişim*, Stenbol, 2000.

¹⁹⁵ Hilmî Akyol (Berhevkar), *Mala Zalê*, weş. Enstituya Kurdî ya Amedê, Amed, 2006.

¹⁹⁶ Di hin berheman de navê "Şebrenk" cih digre.

dara selwê. Gava hinekî din nêzîkî çadira Menîceya rûxweşik dibe, çavek li bin kon digêrîne, wê gavê dilê wî jê diçe.

Menîceya rûxweşik jî gava ji bin çadirê li rê dinihêre, pêlewaniyê Îranî dibîne. Kêliya li rûyê wî yê mîna stêrkê dinihêre, bala xwe dide taca pêlewaniyê ya li sera, wê gavê di dilê wê de hezkirinek dike. Menîce miraq dike, vedigere bin kon. Li bin kon bang li jinekê dikê û wê dişîne cem Bijen û wî vedixwîne bin çadirê, bi hev re şerabê vedixun. Keça Elfesiyaya li bin kon dermanê bêhişiyê dide Bijen û piştî wî li ser hespê girê dide û direvîne.

Haya qralê Tûranistanê Elfesiyabê Bavpêşeng (Elfesiyaya) ji fiêlên keça xwe tune bûye. Bijen piştî derbaskirina şox û şengekê, dixwaze vegere, lê destê Menîce jê nabe. Lewma Menîce planekê çêdike, bang li xizmetkarên xwe dike, ferman dide ku dermanek bêhişiyê têkêlî hunguv bikin û bidin Bijen. Kêliya ku Bijen dermanê nava hunguv dixwe, dibe mîna serxweşan, êdî nikare serê xwe ragire. Piştî vê yekê deveyekê amade dikin û Bijenê bêhiş davêjin ser piştê. Aliyekî mahfeya devê mîna doşekê, aliyê din mîna zîn amade dikin. Menîce li ser wir, toza dara ya bi ava gulên û kafûrê direşîne. Gava digihîjin nêzîkî bajêr, ew rûyê Bijen digre, di nivê şevê de bi nihênî wî dibe koşka xwe. Ji biyaniyan re tiştê nabêje, cihekî xweş jê re amade dike û piştî dermanê şiyarbûne bera guhê wî dide. Gava Bijen tê xwe, di himêza xweşikê rûheyv de, li koşka Efrasiyab xwe dibîne. Wê gavê bi felaketa ku hatiye sera dihise, êdî bêhizûr dibe û xwe dispêre Xwedê. Paşê ew û Menîce derbasî eywana xwarinê dibin. Ji aliyekî ve dawet û zewac, ji aliyê din ve jî dara sêpê tê ber çavê Bijen.

Menîce weke ku dilê wî bixweyne, dibêje:

-Ger bavê min bibihîze ku tu li cem min î, dîsa xem nîn e, ez dê xwe bikim bi qurbana te, nahêlim ew xerabiyê bi te bike.

Dema ku ew di qesra qerêl de ne, bavê Menîce bi wan dihise. Ev agahî ji aliyên kesên cihê tê guhê Efrasiyab.

Piştî vê agahiyê serê sibehê Efrasiyab li defa hewarê dixwe, leşker li dora koşka ku Bijen û Menîce tê de ne dicivin. Haya Bijen û Menîce ji vê yekê tune bûye, ew li ser nan û xwarinê bûne. Gava xwarina ji ber wan dimîne di pacê re dirêje, Menîce bala xwe dide derve, leşker dor li koşkê girtine. Ew bang li Bijen dike, dibêje mala bavê te şewitî, dora koşka me tije leşker in! Bijen dibêje te çima wisa got, serê min werimî, kûpek xwîn ket eniya min! Bijen dertê ber derê qesrê, bi xencerê li leşkeran dide û gelek ji wan dikuje. Ew wiha nav di xwe dide:

“Wah, ez kî me? Ez Bijenê kurê Gêwoyê Guhderz im!”

Leşker êrîşî wî dikin, lê pê nikarin. Efrasiyab vê yekê dibîne, dibêje ew kî ye leşker bi me ve nehişt? Jê re dibêjin ew biyanî ye, em wî nas nakin, lê nav û halanan di xwe dide, dibêje “Ez Bijenê kurê Gêwoyê Guhderz im!” Efrasiyab dibêje: “Dêwekî me heye li binê zîndanê, di bîrê de ye, ne ew be kesekî din dê pê nikaribe.” Diçin, kevir ji ser bîrê radikin, bang li pêlewanê dêw dikin, dibêjin Bijenê kurê Gêwo hatiye şer. Dêw dibêje: “Na, na! Ez ji şerê Mala Zalê tobedar im.” Agahî didin Efrasiyab, dibêjin pêlewanê te nayê. Efrasiyab dibêje ew çewa nayê? Herin jê re bêjin heke ew neyê, ez rojê pezek didim wî, lê ji niha pê ve ez dê xwarina wî bibirim, ew dê di binê bîrê de ji birçîna hişk bibe.

Heman (Human) wezîrê milê çepê bûye. Pîran ê ku rastiyan dibêje, yê milê rastê bûye. Hemanê ku karê wî vir û derew bûne, îxbara Bijen û Menîce dike. Ji Efrasiyab re dibêje îro li qesra Menîce dengê Îraniyan hatiye guhê min. Ger baweriya we nayê, herin binêrin. Ez bi texterewanê te kim, bi xanedana bavê te kim, bi serê Efrasiyab kim,¹⁹⁷ hebe tunebe êtîmekî ji binemala Ristemê Zal hatiye, sêhrebend li xwe kiriye, dixwaze vî bajarê Kengê binqut bike, bajar qir bike û Menîcayê ji xwe re bibe.

Pîran dibêje: "Ya Heman, derewan neke, ev dîwanxane hinde giran... Tu xeberên nexweş dibêjî." Heman dibêje: "Ya Pîran, tu tiştêkî jî ji min bawer nakî. Bila xulam biçin binêrin ka ez rast dibêjim an na."¹⁹⁸

Du sed qasid bijartin, çûn, nihêrîn ku peyva Heman rast e. Qral ferman dide, dibêje bila serokên pêlewanan werin, hemî bi şîş û rim, bi hesp û zîn, bi kurk û ebayên xwe ve der û dora qesrê dorpêç bikin, wî mirovî bigrin û li pêş çavên min serjê bikin.

Qesrê dorpêç dikin, Bijen dîl digrin, tînin dîwanxaneyê Qralî, dibêjin fermana te çi ye. Qral li Pîran û Heman dinihêre, dibêje fikra xwe bêjin. Herçî Pîran e, her yê qencîyê ye, dibêje heke tu vî pêlewanî bikujî, heta roja qiyametê em û Îranî dev ji hev bernadin. Tu wî hefs bikî ji kuştinê çêtir e. Heman dibêje naxêr, mêrê Îranî ketiye destê me, em dê rabin, goştê laşê wî li qesapxaneyê bifroşin. Qral bi ya Pîran dike, dibêje biryara edaletê çêtir e ji ya kuştinê, em pêlewanê Îranî nakujin.

Bijen dikin zîdaneka wekî bîrê kûr û tarî, Qral ji bo Menîcayê jî dibêje: "Wê serkol û pêxwas bikin, di kolanên der û cîranan de bimeşînin. Kesek bila nan nede wê, kes xwedî lê dernekeve!" Keça qrêl dibin, pora wê diqusînin, hûrê birêx dikuşînin serê wê, diqewirînin, wê derdixin derve.

¹⁹⁷ Em di çîrokên berê de sondên bi vî rengî dibînin. Ji ber ku di wê serdemê de olên Yekxwedayî kêm bûn sondan bi roj û şevê, an Xwedayê şev û rojan dixwarin.

¹⁹⁸ Kızılkaya, *Kayıp Divan (Dîwana Winda)*, weş. Îletîşîm, r. 160, Stn. 2000.

Bijen nakujin, wî davêjin zîndana bîra kûr, kevirê şeşdere davêjin ser. Menîce digere li ser koşk û tenûran, nan dixwaze, dibêje:

“Ez Menîca me,
Keça Elfisyabê Bapîşey me,
Serê min girêdaye ber desmalan.
Rûyê min şil e ber kirasê kitan,
Ez serkol û pêxwas kirime.
Kolanên der û cîranan de kirime xar,
Ser xatira Bêjenê kurê Gêwê Guhderzê xwarzê Ristemê Zal.
Ez bextê we me, bextê Xuday me.
Ez bextê we me,
bextê şev û rojan im,
Parçek nan bidin min, da bo xwe û Bêjen bibim.”¹⁹⁹

Hinarkên rûyên Menîce ji girî winda dibin. Gersiyûz femandarekî Efrasiyab bûye, ew gencîneya wê talan dike, kincên ser wê zîval zîvalî dike, serqot û pêxwas bi erdê re kaş dike heta ser devê wê bîrê. Jê re dibêje “cîh û warê te, êdî dê ev der be. Tu dê wekî qewraş li vir bimînî.” Piştî Gersiyûz ji wir diçe, ew bi naperûkan qulek di kevirê bîrê de vedike. Nan û xwarina ku dicivîne bo têkirina Bijen di wê qulê re bera bîrê dide.

Gava ferên aşan diqelibînînin ser devê bîrê, xwelî diçe xwarzê, qefa çê dibe. Keçik carna guhên xwe dide bîrê, Bijen dibêje ax, ax! Ez he me, ez Bijen im, kurê Gêwo me, xwarziyê Ristem im. Ev deng diçe keçikê.²⁰⁰

Gurgîn heftteyekê li wir dimîne, lê tu agahî ji hevalê xwe Bijen nagre. Bi ber wî dikeve û pir digrî. Paşê vedigere Îranê, nûçeya vegera Gurgîn digihînin Keyê Îranê. Lê ew vê xeberê ji Gêwo re nabêje da ew li dijî wî nebe xwedî xerez û kîn, xerabî pê neke. Lê Gêwo bi vê yekê dihise, li hespê xwe siwar dibe û diçe cîhê ku Gurgîn lê ye. Di dilê xwe de dibêje, heke Bijen jî ne pê re be, ez dê serê wî hilqetînim. Gurgîn gava ji dûrî ve dibîne ku bavê Bijen ber bi wî tê, tavilê ji hespê xwe dadikeve û ber pê baz dide. Serqot û pêxwas, xwe davêje bin piyê Gêwo, nava toz û axê. Dibêje çavên min fedî dikin ku li te binêrin. Ez çiqas rondikên xwînî bi ser hinarkên rûyê xwe de birijînim jî, têr nake. Lê xema nexwe, ez dê bidim nîşandin ku şikir ew sax û selamet e! Gêwo ji aliyekî de guh dide wî, li aliyê din çav bi hespê kurê xwe yê di nava ax û dûxanê de perîşan dikeve.

¹⁹⁹ Kızılkaya, h.b., r. 161.

²⁰⁰ Hilmi Akyol, Mala Zalê, Weşanên Enstituya Kurdî ya Amedê, r: 52-53, Amed, 2006. (Ji vegotina çîrokbêj Şakirê Mecît ji gundê Melefeyata ye ku bi ser navçeya Bismil ve ye).

Hiş ji sera diçe, ji ser hespê digindire ser axê. Por û riha xwe dikişîne, dike ay û way, axê bi serê xwe de dike... Li Gurgîn dizîvire, dibêje: Ka ji min re bêje, kîja xerabî hat serê Bijen ku ket kemîna belayek wiha? Te ev hespê bêxwedî çewa dît û tu li kuderê ji Bijen dûr ketî?

Gurgîn mijarê rast nabêje, dibêje me li welatê Erman di daristanek kevn de cihekî bêdar û ber dît. Her cih tijî lanên xinzîran bûn, xinzîr bi keriyên, wekî çiyayan dihatin ser me. Me ew diavêtin erdê û diranên wan diweşandin. Kêliya me berê xwe da malê, nişka ve ji çayirê kerekî kûvî derket pêşberî me. Pir xweşik bû, guh û terîya wî dişibiya yên hespê Bijen Şevreng. Hat li nêzîkî Bijen sekinî, Bijen tavilê kemenda xwe avêt sitûyê wî. Lê ew veciniqî û beziya. Ew beziya, Bijen li dû wî çû. Wê gavê rûyê erdê bû mîna deryaya bi kef û her cih welê tevlihev bû ku, him kerê kûvî û him jî Bijen ji ber çavan wînda bûn. Cih nema, ez lê bigerim, lê ji bilî hesp û zîn tiştêk di dest min de nema.

Gêwo diçe dîwana Keyxusrev, mesela kurê xwe û Gurgîn ji serî heta dawî bi hûngilî dibêje. Key dibêje: "Mûbîdên xwedî eql û remildarên bi nav û deng gotine ku Bijen hêj sax e, tu jî hêviya xwe wînda neke, ez dê bo xelaskirina wî bixebitim."

Gurgîn li cem Key diranên xinzîran vala dike ser xalîçeyê, derheqa Bijen de dîsa derewan dike, Key vê yekê fam dike û wî diqewirîne, ferman dide ku kostekê ji bizmaran amade bikin, wê kostekê li piyê wî bixin.

Keyxusrev nameyekê ji Ristemê Zal re dinivîse, tê de wiha dibêje: Qasid hatibûn, ji bo daristanên xwe li hember xinzîran biparêzin alîkarî dixwestin. Bijen jî rabû çû wir, lê li wir wînda bû. Ji ber ku tu serdestê hemî welatan î, ji bo çareserîya vê meseleyê hêviya min tu yî... Te gava vê nameya min girt, divê bi Gêwo re derkevî rê...

Gêwo nameyê digre û piştî dide Ristem, fiêl û xerabiyên ku Gurgîn kirine jî tîne ziman. Ristem dibêje tu hîç miraq neke, ez heta Bijen xelas nekim, zîn ji ser pişta hespê xwe venakim...

Ristemê Zal ji Gurgîn re dibêje heke Bijen zindî bifilite û were tu dê jî bestika xwe xelas bikî, lê heke felek çep vegere, wê gavê dev ji canê xwe berde! Ez Bijen nebînim tu ji destê Gêwo xelas nabî!

Ristemê Zal gava vê meselê ji Keyxusrev re vedike, Key dibêje "Min bi tac û text, heyv û rojê, merîx û sitêrka şivanan sond xwar ku, heke Bijen ji zincîrên zîndanê xelas nebe, Gurgîn dê bela xwe ji min bibîne!"

Ristem dibêje Gurgîn helbet sûcdar e, lê ger tu wî efû nekî dê ji ezabê ku dikşîne bikesire, bibebece û bimre. Ew poşman e.

Li ser gotina Ristem, Gurgîn ji bîra tarî derdixin.

Key ji Ristem dipirse, ev şerê bo xelaskirina Bijen divê çewa pêk were? Ristem dibêje ez divê vî karî bi dizî pêk bînim, mifta karên wiha zehmet, hîle û dek in. Divê mirov di dilqê ticarekî de, bidizîka têkeve axa Tûranistanê. Divê ez gelek kinc, xalîçe, zêr û zîvan bi xwe re bibim. Padîşah li ser vê peyva Ristem ferman dide, devê xizîne vedike, zêran li deh deveyan, eşyayên din jî li sed deveyan bar dike. Piştî ji reîsê kaffileyê re dibêje ji artêşê sed siwarî bibijêre.

Digel artêşê, pêlewan jî derdikevin rê. Gava digihîjin tuxubê Îranê, Ristem serekên artêşê cihê dike, ji artêşê re dibêje: “Şiyar bin! Heta Xwedê rihê min nestîne, hûn ji cihê xwe nelibitin, pençeyên we bila ji xwînêtinê re amade bin!” Û artêşê li wir dihêle, ew jî digel fermanaran beriya bikeve ser riya Tûranistanê, kembera nava xwe vedike, xwe wekî taciran girêdide. Piştî pêlewanên din kemberên zîvîn ji nava xwe vedikin, Ristem kincên keten li wan dike. Deh deve bi barên xişir, sed deve jî bi barên alavên din bar dikin..

Karwan xwe digihîne bajarê ku Pîran lê dimîne. Pîran wê gavê li seydê bûye, Ristem li benda wî dipê heta vedigere. Jê re dibêje kesek wekî te bi nav û deng û bi şeref tune ye. Seba ku tu wezîrê Padîşah û xemla textê wî yî. Pîran li navê wî û bajarê wî dipirse. Ristem dibêje ez jî qûlekî te me, Xwedê rizqê min li vir, li bajarê te daye. Ji bo bazirganiyê ji Îranê rabûme, di riyên zehmet de hatime heta Tûranê. Him tiştan difroşim, him dikirim. Ger tu min biparêzî ez dê xişir bifroşim, di vegeerê de ajalan bikirim.

Ristem piştî zêrên di stekanê de valayî ber Pîran dike û çend hespên erebî wekî diyarî dide wî.

Pîran piştî wan diyariyan peznê Ristem dide û wî dibe li nik textê xwe dide rûniştandin. Pîran dibêje, kêfa xwe qet xera nekin, bixwe bawer bin, hûn dikarin bikevin bajêr. Ez dê di nava seraya xwe de jî cih bidim te. Kesek nikare tiştêk bi te bike, tu çi difroşî an dikirî tu dizanî. Xwe ji malbata min bihesibîne.

Ristem dibêje malên min yên te ne, lê divê ez li ser alavên xwe bim, her cure xişir di nav de hene.

Nûçeya ku ticarekî zêr û zîv û xalîçeyan ji Îranê aniye li her cihî belav dibe, ji her alî ve muşterî radiweşin ser. Ristem her roj ji berbangê heta germaya navrojê li vê malê dixebite.²⁰¹

²⁰¹Edîb Polat, Ristemê Zal, weş. Evrensel, r. 323, Stn. 2007.

Ji ber ku gelek welatî bi hatina ticarê Îranî dihesin, Menîceya gerok jî rojekî tê ber deriyê cihê ticaretxaneyê Ristem, ewil wesfê wî dide, piştê dibêje gelo ji padîşahê Îranê û ji Gêwo agahdariya te heye, ew çewa nin? Ji Bijen nûçeyek gihîştîye Îranê? Heqê Xwedê ye ku ew gêncê ji malbateka mezin di nava zincîran de, lingên wî bi kostekên giran girêdayî bin û bi bizmaran kutandî bin, kincên wî seranpê di xwînê de bin? Ji ber wê êşa ku dikêşîne, ez jî bi şev ranazêm, çavên min her gav şil in...

Ristem gava van galgalan dibihîze ewil ji komplojekî ditirse, lewma wê diqewirîne, dibêje biteqize, ji cem min here! Ez ne padîşahan nas dikim ne jî fermanbaran! ...Gêwo kî ye?

Digel ku Ristemê Zal vê bersivê dide jî, Menîce ji wir dûr nakeve, digrî heta ku rondikên xwînî dirijîne. Dibêje tu zilamekî jîr û mezin î, galgalên wiha sar bi te nakevin. Ez jixwe birîndar im, qene tu min neqewirîne. Ev yek di toreyê Îraniyan de nîn e!

Dilê Ristem nerm dibe, ferman dide da xebatkarên wî nan û xwarin bînin ber Menîce. Ristem di vê navberê de sebebên ketina wê ya wî halî dipirse û dibê çî karê te bi Îraniyan re heye?

Menîce dibêje ez ji ser devê bîra ku Bijen tê de ye bi dilekî xemgîn rabûm û hatim cem te. Ez Menîceya keça Efrasiyab im. Ji bo xatirê Bijen ji tac û text jî bûm. Bijenê reben di wê bîra kûr de ne rojê dibîne ne jî heyvê, her gav mirina xwe ji Xwedê dixwaze. Heke riya te bi Îranê ket û tu li qesra Keyxusrev pêrgî Ristem an Gêwo hatî, bêje rebenê Bijen di bîrê de ye. Ger dereng bimînin bila destê xwe jê bişonin!

Ristem ferman dide xwarinpêjan, mirîşkek pijandî li nanekî nerm pêçandî tînin. Ristem bi lez û beza sêrbazekî gustîlka xwe dike nava mirîşka pijandî. Dibêje ey alîkarî bo kesê ketî ye, vê xwarinê, bibe cihê Bijen lê zîndankirîye. Menîce nasekine, xwarina di nava kevnîkê de tîne dide Bijen. Bijen gava çav bi xwarinê dikeve, nava mirîşka pijandî vedike, gustîlka xalê xwe dibîne. Bi vê yekê him şaş dibe, him kêfa wî tê. Navê Ristem li ser qaşa gustîlkê bûye. Ji kêfa, bi dengêkî êlî dikene, dike hire hir. Menîce bi dengê wî vediciniqe, dibê tu dîn bûyî di bîrê de. Bijen dibêje şens bi min kenîya, heke tu soz bidî ji kesekî re nebêjî, ez dê her tiştî bi te re parve bikim. Divê tu bi zimanê xwe karibî. Bijen ji bin bîrê bang lê dike, dibêje ey evîndara min a xwedî eql û şifqet! Ez dê niha nepenîya dilê xwe ji te re bêjim. Bizanibe ku kesê zêr û alavan difroşe û xwarin daye te, ji Îranê bo min hatiye, ne ji bo fîrotina xişir û mişran. Xwedê li rûyê min kenîya. Niha jî dîsa here cem wî, bêje ey serpêlewan, ey lehengê dilzîz! Heke tu siwarê Rexşê Belek Ristemê Zal î, ji min re bêje.

Menîce bi kêf ji nava daristanê dipeke, xwe digihîne cem Ristem û van gotinan ji wî re dibêje. Ristem dibêje, Xwedê te ji hezkirina Bijen mehrûm neke. Niha vegere cem Bijen, ji daristanê êzingan bicivîne û heta serê sibehê li nêzîkî wê bîra zîndanî agir vêxe. Ji Bijen re bêje Xwedê siwarê Rexşê Belek bi hewara te de şandiye.

Xem û keserên dilê Menîce winda dibin, bi bazdanê xwe digihîne wî çiyayê ku bîra zîndanî lê ye. Bi ser bîrê de diqîre, dibêje min hemî gotinên te ji wî zilamê meşhûr û xwedanxêr re got. Wî jî agahî da ku kemberên xwe bo xelasiya te girêdane û xwe wekî pilingan amade kirine. Gava tarî ji nava pençeyên rojê xelas bû, divê ez agirekî gur, mîna çiyayekî bilind vêxim da ew karibe riya devê vê bîrê bibîne. Bijen dibêje te van êş û azaran bo xwe wekî zikir hesiband, dest ji dê û bav, tac û text berda. Ger xelas bibim, wekî qûlekî, ez dê li pêş te destê xwe vekim, dê wekî xizmetkaran her dem li ser dest û piyên te bigerim.

Menîce wekî çûka beytik ku li ser şaxan digere, çindikan dide xwe û êzingan dicivîne. Gava roj diçe ava, agirekî bi heybet da dide. Wê gavê dengê simên Rexşê Belek tê guhên wê. Gava Ristem û şervanên xwe digihîjin ber bîra ku bi kevir hatibû girtin, Ristem ji heft şervanên xwe re dibêje, dema pengizandina vî kevirî hat, bîrê vekin! Hemî pêlewan bi hev re dest davêjin kevirî, lê ew ji cih jî nalive. Hemî di nava xwîn û xwêdanê de dimînin, kevir bi erdê re wekî lehîmkirî be dimîne. Ristem xwe ranagre, ji Xwedê qewet dixwaze û çewa dest davêje kevirî, ew divirvirîne çolê, ji gurmîna wî erd diheje. Bang li Bijen dike, dibêje tu heta niha çewa di wir de mayî? Bijen wiha bersiv dide: Erda min hesin, ezmanê min ji kevir bû, min ji dunyayê hêviya xwe birîbû. Ristem dibêje xwestekê min ji te heye, hestên tolhildanê ji dilê xwe bavêje, Gurgînê kurê Mîlad efû bike.

Bijen ewil naxwaze Gurgîn efû bike, Ristem dibêje tu wî efû nekî ez jî te ji vir dernaxim der. Bijen dibêje di malbatê de ez tenê bêşens im. Ez dê li rûyê Gurgînê ku xerabî bi min kiriye çewa bikenim. Lê xerez ne baş e, min kîna wî jî ji dilê xwe deranî!

Ristem piştî sozê xwarziyê xwe kemendê berdide bîrê û Bijen ji wir xelas dike.

Ristem ferman dide, qeydên Bijen vedikin, ser û piyên wî dişûn. Gurgînê ku di nava artêşê de bi wan re hatibû tînin, li ber Bijen didin rûniştandin, ew poşmaniya xwe tîne ziman û lêborîn dixwaze. Bijen jî kîn û xereza dilê xwe radike, heqê xwe lê helal dike.

Ristem li Rexşê Belek siwar dibe, çekên xwe hildigre, li aliyekî wî Menîce li aliyê din Bijen cih digrin, dibêje ez dê ji Efrasiyab tola we bigrim, îşev ji min re xwarin, vexwarin û xew tune ye!

Bijen û Menîce digihîjin miradê xwe û li Zabilistanê bi cih dibin.

3.1.1. Karakterên Efsaneyê

Karakterên sereke yên vê efsaneyê Bijen û Menîce ne. Bijen kurê Gêwoyê Guhderzî ye ku di efsaneya Ristemê Zal de ew pêlewanek sereke ye. Menîce keça qralê Tûranistanê Efrasiyab e, navê wê di berhemên cihê de weke Menîca an Menîje jî cih girtiye.

Efrasiyab di hin waryantan de wekî Elpisyabê Bapîşey²⁰², an Erwasya²⁰³ jî hatiye binavkirin. Lê di hemî waryantan de ew bavê Menîce û padîşahê welatê Tûranê ye.²⁰⁴

Lehenegek din yê sereke Ristemê Zal e ku ew serpêlewanê Îran û Arîyan e, kurê Zal e, xalê Bijen e, li Zabilistanê qesra wî heye, pêlewanek bi nav û deng e, gelek caran bi Efrasiyab re dikeve şer û cengên giran. Ew Bijen ji bîra zîndanî xelas dike.²⁰⁵

Gurgîn hevalê Bijen e ku bi wî re diçe seyda xinzîran. Dema Bijen dîl dikeve, ew hewldanek nîşan nade, bo azadkirina wî qet tekoşîn nade. Lê, di encama efsaneyê de Bijen wî efû dike. Di hin waryantan de kesê bi navê Ecawil Paşa²⁰⁶ rola Gurgîn pêk tîne.

Keyxusrev, di wê demê de Keyê (an Şahê) Îranê bûye, alîkariya Ristem dike, dixwaze Bijen xelas bike.

Heman (an Human) û Gersîyûz wezîr û fermandarên Efrasiyab in ku îdama Bijen dixwazin.

Pîran wezîrekî Efrasiyab e ku derheqa Bijen de başiyê dixwaze, rehm di dilê wî de heye, mal û dikan dide Ristemê Zal da karibe bazirganiyê bike. Ew li dijî îdamkirina Bijen dertê. Di efsaneya Derwêşê Evdî de rola Eferê Gêsî çî be, ya Pîran jî wiha ye.

Navê Efrasiyab, di waryantên din ên vê efsaneyê de wekî Êzdînşeb, Elfisyabê Bapîşey, Elfesiya an Erwasya jî cih digre.

3.1.1.1. Têkiliya Karakteran

Bijen û Menîce wekî du evîndarên hev, ji welatên ji hev dûr in û malbatên wan neyarên hev in, bi hev re di şer û pevçûnê de ne. Olên wan, eşîrên wan, baweriyên wan ji hev gelekî cihê ne. Bavên wan **Gêwo û Efrasiyab** jî du aliyên neyarên hev in. Yek

²⁰² Muhsîn Kızılkaya, Kayıp Dîwan (Dîwana Winda), weş. Îletîşîm, r: 158, Stn. 2000.

²⁰³ Hilmî Akyol (berhevkar), Mala Zalê, weş. Enstituya Kurdî ya Amedê, r:46, Amed, 2006.

²⁰⁴ Efrasiyab (an Elfesiya) wekî lehengekî tirkan tê nasîn ku navekî wî yê din jî li gor rîwayetan Alper Tûnga ye. Lê di derbareyê vê yekê de çavkanî niha di dest me de tune ne.

²⁰⁵ Edîb Polat, Ristemê Zal, weş. Evrensel, r: 330, Stn., 2007.

²⁰⁶ Hilmî Akyol (Berhevkar), Mala Zalê, weş. Enstituya Kurdî ya Amedê, r: 114, Amed, 2006.

lehengê kurdan û welatê Îranê ye, yê din qralê Tûranê ye. Ne pêkan e ku ew bi urf û adetên dunê bizewicin. Dema ku şer û cengên giran di nava Îraniyan û Tûraniyan de pêk tên, Bijen û Menîce pêrgî hev dibin, ji hev hez dikin.

Gurgîn lehengê hevalê Bijen e, ew bi hev re diçin seyda xinzîran. Lê Gurgîn şertên hevaltiyê bi cih nayne, ji hevalê xwe didexise, wî tenê dihêle, gava Bijen winda dibe, ew qet lê nagere û xemê nakşîne. Piştî vedigere Îranê jî qala dîlketina Bijen nake.

Ristemê Zal xalê Bijen e, ji bo xwarziyê xwe ji zîndanê xelas bike pir dixebite, pêlewanan bi xwe re dibe, di nava bajarê Efrasiyab de bazirganiyê dike, di encam de Bijen ji bîra zîndanî azad dike.

Keyxusrev keyê (şahê) Îranê ye, ew Bijen û Gurgîn dişîne bo alîkariya gelê cîran da wan ji belaya xinzîran xelas bikin. Ristemê Zal serpêlewane Key bûye, bo azadkirina Bijen ji alî Keyxusrev ve tê erkdar kirin.

Kesê ku Bijen dide girtinê wezîrê Efrasiyab **Hûman** e ku ew jî peywîrê dide **Gersîyûz**. Gersîyûz bi xap Bijen dide girtinê. Lê wezîrê Efrasiyab **Pîran** naxwaze Bijen were îdamkirin, alîkariya Îraniyan dike, cih dide Ristemê Zal.

Di vê efsaneyê de rola kesayetê negatîv dane Hûman û Gersîyûz. Ew du pêlewane Tûranistanê ne ku mîna Bekoyê di efsaneya Mem û Zîn de her daîm fesadiyê dikin û kuştin û pevçûnê dixwazin. Lê Pîran humanîst e, bo azadkirina Bijen alîkariyê dike.

3.1.2. Li Gor Waryantan Guherîna Karakteran û Bûyeran

Wekî li jor jî hatiye gotin, Prof. Dr. Kadrî Yildirim derheqa vê evînê de wiha dibêje: "Ev efsane ji aliyê Ata b. Yakûb ve derbasî nivîsê bûye"²⁰⁷ lê me di derheqa Ata b. Yakûb de agahî bi dest nexistine. Em dibînin ku gelek çîrokbêjan vê efsaneyê gotine û Fîrdevsî di Şehnameya xwe de qala vê evînê dike. Wekî Yildirim dibêje ji ber ku "di wêjeyên rojhilatî de cureya zîdana ku Bîjen tê de dîl girtine, wekî 'Çah-i Bîjen' (Bîra Bîjen) an 'Çah-i Erjeng' (Bîra Erjeng) tê binavkirin", çîroka vê evînê jî li ser zar û zîmanan bûye efsane. Di hemî waryantan de evîndarên hev Bijen û Menîce ne, bav û malbata wan neyarên hev in. Di waryanteka Amedê de ku ji aliyê kesê bi navê Nezîrê Miheme ve hatiye gotin, Ristem ji bo neyê naskirin navê xwe dike "Xoce Xuroş", navê

²⁰⁷ Kadrî Yildirim, (Prof. Dr.) *Ehmedê Xanî Mem û Zîn*, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2010, r. 288

xulamê xwe "Emro" datîne.²⁰⁸ Di vê waryanta ku me ew wekî numûneyek ji wêjeya gel girtiye dest de navê Efrasiyab jî Erwasya ye.

Guhertina nav û erkên lehengên stero: Di çavkaniyekê de navê diya Ristemê Zal Rûdabe ye²⁰⁹, lê di waryanta ku li devera Çolemêrgê tê gotin de navê xuşka Ristem, angî diya Bijen Rûdabe ye.²¹⁰ Di heman wariantê de navê hevalê ku bi Bijen re diçe Tûranistanê Hejale ye²¹¹ ku ew rola Gurgîn pêk tîne. Ev erk di wariantek din de li ser milê kesê bi navê Ecawîl Paşa ye.²¹²

Cihê ku Bijen û hevalê xwe diçin seyda xinzîran di hin wariantan de çiyayê **Şaderûtê** ye (Waryanta Çolemêrgê)²¹³, di hin wariantan de jî çiyayê **Edawatê** ye (Warianteka Amedê, vegotina Nezîrê Miheme)²¹⁴. Van navan li gor herêman (jixwe ev jî taybetmendiyeke wêjeya devkî ye) tên guhertin. Ger meriv wekî çavkaniyek dîrokî lêbikole, di Şehnameya Fîrdevsî de navê wezîrekî Efrasiyab wekî **Hûman** tê nasîn.²¹⁵ Di waryanta Çolemêrgê de **Heman**²¹⁶ cih digre ku wezîrê Elpisyabê Bapîşey e. Di heman wariantê de Ristemê Zal gava bo azadkirina Bijen diçe Tûranistanê kincên xwe diguhere, navê xwe dike **Hacî Quromê Yemenî**.²¹⁷ Di warianteka Amedê de wekî me li jor got leqabê Ristem **Xoce Xuroş** e û navê Bijen jî wekî **Bêrjem** cih digre.²¹⁸ Balê dikşîne ku çewa peyvên "Bijen" û "Bêrjem" nêzîkî hev in, herwiha "Xuroş" û "Qurom" du peyvên dişibin hev.

Di warianteka Amedê de Efrasiyab wekî **Ezdînşeb** tê nasandin, di dewsa Pîran de ew bi Ristem re elaqedar dibe û dixwaze Ristem li bajarê wan bazirganiyê bike. Di warianteka Amedê de a jî aliyê Şakirê Mecît ve hatiye gotin ku ji ber ew kulav li xwe dike bernavê Bijen Kulafok e, birayek wî heye bi navê Gurik. Têkiliya wî û birayê wî ne baş e, Gurik dixwaze Bijen bikuje.²¹⁹

Di vê wariantê de Bijen li qesra Efrasiyab (Erwasya) de dibe qahwefiroş. Menîce di pencereyê û şaneşînan de lê dinihêre, dilê wan dikeve hev, Menîce kevnika nexşîn jê

²⁰⁸ Hilmî Akyol, *Mala Zalê*, Weş. Enstituya Kurdî a Amedê, r: 120-121, Amed, 2006. Li gor rîwayetê navekî Keyxusrev wekî "Kuroş" an "Xusro" jî tê bi lêv kirin. Niha jî di nava kurdan de peyva "Xusrev" wekî "Xusro" tê gotin.

²⁰⁹ Fîrdevsî, *Şehname*, Weşanxaneya Wezaretê Perwerdehiya Netewî, werger: Necatî Lugal, c. I, r: 325, 1990. Ji ber ku ev berhem mesnevî ye, ji bo me nabe wariant, lê dibe çavkaniyek pişt a dîrokî.

²¹⁰ Kızılkaya, *Kayıp Dîwan* (Dîwana Winda), r: 162.

²¹¹ Kızılkaya, *Kayıp Divan* (Dîwana Winda), r: 155.

²¹² Akyol, *Mala Zalê*, r: 113.

²¹³ Kızılkaya, h.b., r: 156.

²¹⁴ Akyol, h. b., r: 114.

²¹⁵ Fîrdevsî, *Şehname*, c. IV, r: 124, 131.

²¹⁶ Kızılkaya, h. b., r: 169.

²¹⁷ Kızılkaya, h. b., r: 172.

²¹⁸ Akyol, *Mala Zalê*, r: 113.

²¹⁹ Akyol, h.b., r: 45 û 47.

re davêje. Erwasya vê yekê dibîne, şevêkî li civatê dibêje: "Em çewa bikin, çewa nekin? Dibêjin -Welahî kesek nikare ji wî merivî xeber bide. Atrîk Paşa hebû, qralê gawir bû.²²⁰ Ew hat qîza Erwasya xwest."²²¹ Bijen riya xwazgîniyên Menîce dibire, şerekî mezin diqewime, ew gelek leşkerên Atrîk Paşa dukuje û bi ser dikeve. Ev beş dişibe şerê Hesên Axayê Şikakî û Siyabendê Silîvî. Wekî me li jor gotibû reqîbek ji lehengê evîndar re dertê, ger ew bi ser bikeve dê evîndariya xwe îspat bike. Siyabend bi Hesên Axa re şer dike, bi alîkariya pîrejînê, di dema dawetê de Xecê ji dest wî xelas dike, piştî jî gelek şervanên wî dukuje. Bijen (Kulafok) jî bi Atrîk Paşa re şer dike, pêlwanên wî dukuje. Lê Menîce ji dest wan xelas nake, ew bi xap digrin, davêjin bîrê.

Piştî Bijen tê girtin, wî davêjin bîrê. Di vegotinek Amedê de Ecawîl Paşayê ku bi Bijen re çûbû Tûranistanê vedigere. Rojekî gava ew di ber deriyê mala diya Bijen re dibuhure, diya Bijen ku xuşka Ristem e bang lê dike, dibêje ka kurê min li ku ma? Ew jî dibêje sal qediya tû hêj pirsê kurê xwe dikî? Diya Bijen diçe bûyerê ji Ristem re dibêje.²²²

Di waryanta Çolemêrgê de çar siwar tên, dibin mêvanê Keyxusrev, lê welatê wan ne diyar e. Di Şehnameya Fîrdevsî de welatê ku xinzîr zeraê didin zeviyan, "Erman" e.²²³ Dîsa di vegotina Çolemêrgê de tê gotin ku ew siwarî dibêjin ejderhayekî maran ketiye cih û warên me, me ji kar û emel kiriye. Di jêderka ku me li jor ji Kadri Yildirim girtiye de ew ne ejderha ye, lê xinzîr in.

Li gor berhema Muhsîn Kizilkaya ku ji çîrokbêjekî bi navê Evdilqadir Kizilkaya neviyê Evdirehman (ji devera Çolemêrgê) û Hecî Kerik²²⁴ girtiye, ji du pêlwanan yek Hejale ye û yê duem Bijenê xwarziyê Ristemê Zal e.²²⁵ Piştî ew karê xwe diqedînin, vedigerin bajarê Zabolê²²⁶. Li gor ve wêjeya gel, ew bi hev re di tarîbana şevê de gava di çiyayê Şaderûtê re dibuhurin, xewa Hejale tê, xewa heft şev û heft rojan. Di wariantên din de tiştek wiha tune ye, ew li cihê kuştina xinzîran çav bi konê Menîce dikevin. Lê di berhema Kizilkaya de tê gotin ku Bijen askek dibîne, ask tê, xwe li ber piyê hespê Bijen dide û xwe berdide deştê. Bijen li hespê xwe siwar dibe, dide dû askê.²²⁷ Ew ask li deştê dertê, Bijen dibîne di nava deştê de xîvetek ji konan

²²⁰ Peyva "gawir" bi wateya kesên ne Îranî hatiye bikaranîn. Lewre di wê demê de misilmanî-xiristiyanî hêj tune bû.

²²¹ Akyol, h. b., r. 49.

²²² Akyol, h. b., r. 119-120.

²²³ **Fîrdevsî, Şehname, c: IV.**

²²⁴ Kizilkaya, *Kayıp Divan* (Dîwana Winda), r: 29-31.

²²⁵ Kizilkaya, h. b., r: 155.

²²⁶ Zabol, niha bajarekî di nava tuxubê Efxanistanê de ye.

²²⁷ Kizilkaya, *Kayıp Divan* (Dîwana Winda), r. 156-157.

vegirtine, çil leşkerên Romî yê xemilî, nobedarên vê xîvetê ne. Ew ask diçe bin konên xîvetê, Bijen jî li ber derê xîvetê peya dibe û aska xwe dixwaze. Bi dengê wan re "zabît"ê wê derê şiyar dibe ku ew Menîce ye. Menîce heft sal in ku kincê zilaman li xwe kiriye û xwe wekî zilam daye nasîn. "Zabît" dibêje tu li çi digerî? Bijen dibêje ez seyah im, zabît (Menîce) dibêje tu rast nabêjî, ez dizanim ku tu Bijen î, kurê Gêwoyê Guhderz î, biraziyê Ristemê Zal î. Di vê waryantê de nayê zanîn û nayê gotin ku Menîce kengê û çewa Bijen nas kiriye. Ew raste rast dibêje ev heft sal û heft zeman e, min sêrebend li xwe kiriye, ketime nava kincê zilaman, ez keç im aşiq û maşûqê te me. Navê min Menîce ye, keça Elfesiyayê Bapîşey im ku ew qralê Tûraniyan e. Ez bi te me, tu bi min î²²⁸.

Vegotinên wiha di wêjeya devkî de hene ku di wan de sebaba hevnasîna lehengan nayê zelalkirin. Lê di waryantên din de hûn dê bibînin, Bijen raste rast li Menîceya ku sêrebend lê tune ye dinihêre, Menîce jî bala xwe dide wî, piştî ew dibin evîndarê hev.

Menîce nahêle Bijen vegere Zabûlê, jê re dibêje em dê biçin bajarê Kengê.²²⁹ Di vir de qanîkirina Bijen heye, ji ber ku piştî dikevin kêf û seyranê, sê şev û sê rojan nayên xwe. Lê dîsa jî roja sêem Menîce dermanê bêhişiyê dide ber pozê Bijen, ew dike xew, di sindoqê de bêyî xwesteka wî bi karwanê xwe re dibe bajarê Kengê. Ev jî dîlgirtina wî ya bi zext û zorê ye ku di gelek waryantan de cih digre nîşan dide.

Bavê Menîcayê, qralê Tûranê Elfesiyayê Bapîşey du wezîre xwe hene. Wezîrê milê rastê Pîran e, wezîrê milê çepê Heman e. Heçî Pîran e her rastiyan dibêje, lê belê Heman her yê fesadiyê û derewan e. Ev yek jî di gelek çîrokan de cih digre ku antagonîzma nava rêveberiya demî, diyalektîka şeweya hukumdariya wan dide nîşandan. Heman dibêje ev deng yê Îraniyan e, divê ez vê xeberê bigihînim bavê Menîce. Ev tevger di efsaneya Mem û Zîn de şeweya tevgere Bekoyê Ewan e. Heman gava vê gotegotê radigihîne, Pîran li dijî wî dertê. Çewa ku Qeretajdînê ku li hember fesadiyên Beko dertê û li gel Mem cih digre.

Du qasidan dibijêrin, diçin dinêrin ku nûçe rast e. Bijen digrin, tînin dîwana qrêl, li benda fermana wî dipên. Efrasiyabê ku gelek fermanên qetlê daye, vê carê ji wezîrên milê rast û çepê dipirse, seba ku siyaseta wan a bi Îranê re pir girîng e ev şewir pêk tê. Pîran wezîrê qencyê ye, dibêje em kîn û xerezê nekin nava xwe û Îraniyan, tu wî hefs bikî çêtir e ji kuştinê. Heman her qetlê dixwaze. Lê Efrasiyab bi gotina Pîran dike, Bijen

²²⁸ Kızılkaya, h. b., r: 157-158.

²²⁹ Îroj ev bajar heye an na, ev nayê zanîn. Di çavkaniyan de em pêrgî navê bajarî nehatin. Dibe ku ew dîrokî be, rûxiyabe.

dikin zîndana bîrê. Dor tê ser cezayê Menîce, qral dibêje wê serkol û pêxwas bikin di kolanên de bimeşînin, kesek bila nan nedê, kesek xwedî lê derneyê. (Di hin waryantan de dibêje wê bikujin.) Menîce pêxwas dikin, bera kuçeyê didin, ew digere, parsekiyê dike. Ev jî cezayê padîşahan e ku didin kesên ji malbata xwe, da bibe êbret li kesên ku qaşo "îxanetê dikin".

Di waryanta Çolemêrgê de tê gotin ku hevalê Bijen Hejale ji xewa heft şev û heft rojan şiyar dibe li çiyayê Şaderûtê. Li dora xwe dinêre Bijen nabîne. Ji şerm û fediyar çiya serûbin dike. Hewarê tîne bajarê Zabolê, diya Bijen bi xeberê dihisîne²³⁰. Di nîşeya Kadrî Yildirim a ku li jor cih girtiye de hevalê Bijen Gurgîn e, lê jê didexise û ew dike nava şox û şenga konê Menîce û gava vedigere Îranê dibêje Bijen winda bûye. Di waryanteka Amedê di vegotina Şakirê Mecîdê Amedî de hevalê Bijen **Gurik** e, birayê wî ye, lê jê didexise "morîkek xewê dike kerika guhê wî, li kerkedanê siwar dibe û diçe." Gava vedigere, jê dipirsin Bijen li kuderê ye? Ew dibêje "Çi Berjen (di vê wartantê de jê re wiha tê gotin) çi hal! Em çûne seydê. We digot pêlewanekî menşûr e. Dêw hatin me. Jixwe Berjen ji hev de kirin toz û Weleh min ew kuştin, lê ez bi xêra lingê kerkedan xilas bûm."²³¹

Di waryanta Çolemêrgê de tê gotin ku heft sal wiha derbas dibe, lê di romana li ser "Ristemê Zal" de Bijen di şertên hêsîrî de çiqas dem derbas kiriye ne diyar e. Wiha tê gotin: "Roj derbas dibûn, hefte û meh jî li dû. Bihar xemilî û roja Newrozê hat bi ser wan de..."²³² Di waryanteka Amedê de tê gotin ku sal di ser de derbas bûye, Ecawil Paşayê hevalê Bijen li ser pîrsa xuşka Ristem dibêje: "Mala Zalê çima wisa nin? Sal qediya ye û te negotiye kanî lawê min. Ez Tavilê hatime, lê lawê te nehatiye, ez çi bikim?"²³³ Diya Bijen diçe çiyayê Şaderûtê, li nava daristanan digere. Sal di ser gera wê re dibuhurin, lê ew şopa kurê xwe nabîne.²³⁴ Di vir de divê meriv qala êşa dayikan a li pey ewladan bike ku di waryantên din de cih nagre. Diya Bijen jinek pir bi êş e, raçaviya riya karwanan dike.

Me berê gotibû şopa Bijen a li zîndanê ji alî remldaran ve an di "Cam-i Gîfînuma" (mîreka dunê) ya Keyxsurev de tê dîtin. Lê xortekî di nava karwanekî de bi her awayî

²³⁰ Kızılkaya, h. b., r: 161-162.

²³¹ Akyol, Mala Zalê, r. 45.

²³² Polat, Ristemê Zal, r. 314. (Nivîskar du çavkanî bo romana xwe dide nîşandan: Yek, çîrokbêjê bi navê Evdilqadirê Cafo ji gundê Çorepaya bi ser Bismil ve, ya duem Şehnameya Fîrdevsî ye ku di pêşgotina romanê de eşkere kiriye.)

²³³ Akyol, Mala Zalê, r. 119-120.

²³⁴ Polat, Ristemê Zal, r. 315.

şahidiya dîtina Menîceya dilketiya Bijen dike. Ev jî dibe sebab ku Ristem biçe û wî xelas bike.

Menîce bi helbestî rewşa xedar a xwe û Bijen tîne ziman ku me di kurteya efsaneyê de ew pêşkêş kiribû:

"Ez Menica me keça Elfisyabê Bapîşey me,
Serê min girêdaye ber desmalan..."²³⁵

Menîce vê lorînê bo hin kes herin ragihînin Ristemê Zal dibêje. Di waryantên din de, Menîce dîsa bi heman armancê du rist helbest dibêje:

"Ax li vî Gurikê bêbext,
Li Berjen, li welatê Erwasya bi şûr û rext."²³⁶

Van ristan mîna şifre ne û gava ev şifre digihîje Ristem, ew fam dike ku Bijen di di rewşa xerab de ye.

Di vê waryanta Amedê de gava Erwasya (çîrokbêj ev nav li Efrasiyab kiriye) keça xwe bi Bijen re di xewletxaneyê de digre, dibêje keça min bibin pişt a wî çiyayî, wê bikujin û kirasê wê di xwîna wê bidin, bînin bavêjin hemberî min, bila êşa canê min xelas bibe. Du xulam Menîce dibin pişt çiyê, lê destê wan naçe keçikê ku bikujin, rehm dikeve dilê wan, wê serbest berdidin. Lê kirasê wê jê dikin, di xwîna kûsîyekî de dilewutînin, tînin û davêjin oda bavê wê. Bi vî awayî Menîce sax dimîne, lê pars û pûrsê dike.²³⁷

Di heman waryantê de gava girtina Bijen tê rojevê, yek ji amadekaran girtinek bi dek û xap pêşniyarî Erwasya (Efrasiyab) dike:

"...Yek li binê şekalan rûniştibû, got: -Aydê min... Di serê bajar de bîreka çil metre fireh û kûr, pere bide, bide kolan. Ê ser wê bîrê zil bike. Ê kursî deyne serê. Nanekî (xwarinek) li erdê raxe, nanekî pir mezin. Ê bibêje ku tu neyî li ser rûnenêyî, em qebûl nakin. Pişîka wî dê mezin bibe, gava li ser rûnişt, wê 'gurm!' di wê bîrê wer bibe. Ê bila pêlewan sê ferên aşan biqelêbin ser devê bîrê. Îcar tu qîza xwe jî çawa dikî bike."²³⁸

²³⁵ Kızılkaya, Kayıp Divan, r. 161. (Hin nav û peyv orijînal in, çewtî hebe para nûserê wê çavkaniyê ne.)

²³⁶ Akyol, Mala Zalê, r. 53.

²³⁷ Akyol, h.b., r. 52.

²³⁸ Akyol, h.b., r. 51-52.

Ev pêşniyarî pêk tê, Bijen gava dikeve bîrê kevirên mezin bi ser de diqelibînin. Ev kevir di hin çavkaniyan de "sê ferên aşan" in, "şeşdere"²³⁹ ye, di hin berhemên din de zinarekî bi navê "Kevirê Dêwê Eqwan" e.²⁴⁰

Heke wekî agahdariyek dîrokî ev bûyer were lêkolînkirin, dê were dîtin ku di çavkaniyên din de jî Bijen bi xap hatiye girtin.²⁴¹

Girtina Bijen ji Ristemê Zal re dibêjin, ew jî bavê xwe Zal pê dihisîne. Zal wiha bersiv dide:

“ Ji kengê ve nesîhetên bavan, zû ji bîra kuran diçin? Ristem bila sê sed pehlewaniyên bijarte amade bike, du sed pêlewaniyan bila bike du sed sindoqan. Du sed sindoqan bila li piştta du sed fil û gergedanan bike. Sed peyayan bike qantirçî, navê xwe bike Hacî Quromê Yemenî.”²⁴²

Şîretên Zal li gor wariantan tên guhertin. Di warianteka Amedê de Zal ji Ristem re wiha dibêje:

"-Kurê min tu herî, tu dê bi çî awayî wî (Bijen) derxî? Wisa ye tu û Gêwoyê bavê wî, deh hêstiran bar bikin ji nan, deh hêstiran bar bikin ji goşt, dehan jî bar bikin ji birincê. Herin wî bajarî. Tu here seraya Ewrasya (Efrasiyab), seraya qral. Bibêje ku bi destûra Xwedê û bi destûra te be, min we'ed kiriye, ez dê nanekî li bajarê te li erdê bixim. Niha li ku dibin ku birçî hatin ser nê, gava te hozek girte destê xwe, wê gavê tu çî dikî bike."²⁴³

Di warianteka din a Amedê de jî Ristem xwe dike tucar. Wiha tê gotin: "...Anî navê xwe guhert, kir Xoce Xuroş. Navê Emro jî guhert, danî Hemzo. ... Anî malê bazirganiyê stend. Topê qumaş û filan stendin, tijî kirin. Wan anî, kete nava bajarê Zabiloyê (Zabûlê)."²⁴⁴

²³⁹ Akyol, h.b., r. 119.

²⁴⁰ Polat, Ristemê Zal, r. 309.

²⁴¹ Ne wekî peşan, lê wekî çavkaniyek dîrokî ya plansaziya pişt em dixwazin serî li Şehnameya Fîrdewî bidin. Derbareyê vê yekê de wiha tê gotin: "Bijen di gîzmeya xwe de her dem kêrek di rengê avê de vedişart. Destê xwe avêt xencerê û nav di xwe da: Ez yek ji neviyên Gevşat, serokê pêlewaniyan û kesên azad Bijen im! ... Ger hûn bixwazin bi min re şer bikin, ez dê xwe nedim paş bo lepên xwe têkim xwînê. Ez dê bi vê xencerê serê gelek pêşengên Tûraniyan bifirînim. Na heke tu (Gersiyûz) min bibî cem padişahê Tûranê, ez dê jê re bêjim da çewa ketime vî halî. Ji bo ew xwîna min nerijîne bibe şefaetkar! Were ji vê başiyê re bibe rêber! ... Piştî vê axaftina wî Gersiyûz soz dide û sond dixwe ku dê zerar negihîje wî û nesîhetan jî lê dike. Wî sond xwar ku dê xencera destê wî jî lê vegeirîne. Bi vî awayî xencerê jê sitend û bi zerekî şêrîn mîna zexel wî seranpê girêda." Fîrdewî, Şehname, c. IV, wergera vê gotarê ji tirkî: Edib Polat, r. 335-337.

²⁴² Kızılkaya, Kayıp Divan (Dîwana Winda), r. 168.

²⁴³ Akyol, Mala Zalê, r. 54.

²⁴⁴ Akyol, Mala Zalê, h.b., r. 120 (Ji vegotina Nezîrê Miheme).

Gustîlk wekî amûrek ragihandinê, di vê xebatê de di efsaneya Mem û Zîn, di waryanteka Siyabend û Xecê de jî cih digre. Ew him amûrê naskirinê û him jî yê bawerî ye ku du lehengan bi hev dide nasîn. Mînak piştî ku Xecê didin Hesên Axayê Şikakî, Siyabend diçe mala pîrejineka ku li bajarê Hesên Axa ye. Pîrê di nava şîr de gustîlka Siyabend digihîne Xecê, piştî du evîndar biryara revê didin.

Derheqa reva Bijen a ji zîndanê de, vegotinên cihê hene. Di waryanteka Amedê de tê gotin ku "...dest avêtine kevir, qelavt û kindir berî xwarê da. Got: Bêrjem (Bijen) kindirê bavê nava xwe. Bêrjem (Bijen) kindir bi nava xwe ve girêda û Ristem ew kaş kir, anî diyar..."²⁴⁵

Di waryanteka din de Ristem gava diçe bo xelaskirina Bijen, bavê wî Gêwo jî bi xwe re dibe. Li ser bîrê bav ji kurê xwe re dibêje "Bijen lawo xwe hilbavê!" Cara ewil bi ser nakeve û bav jî li pey kurê xwe dikeve bîrê. Piştî Ristemê Zal her duyan ji bîrê xelas dike.²⁴⁶

Di waryanta Çolemêrgê de tê gotin ku Menîce dide pêşîya Ristemê Zal, ew tîne ser zîndanê. Du pêlewan nobedar bûne, Ristem serê wan li hev dixwe, şûtika xwe vedike û bera bîrê dide, Bijen şûtik li navtenga xwe girêdide û derdikeve ser devê bîrê. Bijen dibin hemamê, heft qalib sabûna Helebê li ser canê wî dimehînin. Piştî destek kinc li Menîce jî dikin, her du dibin dixin odeyekê. Du sed pêlewan ji sindoqan derdikevin û bi Tûraniyan re dest bi cengê dikin. Bijen û Menîce jî bi vî awayî digihîjin miradê xwe.²⁴⁷

Di hemî waryant û çavkaniyên dîrokî yên me diyarkirine de tê dîtin ku Bijen û Menîce piştî ewçend êş û azaran digihîjin miradê xwe, gava vedigerin welatê xwe bi hev re dizewicin. Di nava çar evînen efsanewî yên ku me girtine dest de, evîna ku bi bextewarî diqede tenê ya Bijen û Menîce ye. Mixabin di yê din de wekî ku dê were dîtin mirin û trajedî hene.

3.2. Dem û Cih

Ev efsane di dema Keyaniyan de, ku ew wekî împaratorên demê di axa Med û Persan de hukum kirine, pêk hatiye. Key Kawus, Key Kubad û Key Xusrev sê "Key"ên ku rêveberiya axa Medan û Persan kirine. Bûyerên efsaneya evîna Bijen û Menîce bi taybet di dema Key Xusrev de qewimîne. Ji ber ku di gelek waryantên vê efsaneyê de navê Key Xusrev û serpêlewanê Îranê yê wê demê Ristemê Zal derbas dibe. Ev evîndarî

²⁴⁵ Akyol, Mala Zalê, r. 124.

²⁴⁶ Akyol, h.b., r. 57. (Ji vegotina Şakirê Mecît.)

²⁴⁷ Muhsîn Kızılkaya, Kayıp Divan (Dîwana Winda) Weşanên Îletîşîm, r: 172, Stn., 2000.

parçeyek ji Destana Ristemê Zal e. Li gor rîwayetan çar sed salan B. M. Med û Pers di bin hukumdariya Keyaniyan de bûne.²⁴⁸ Key Xusrev mîna qralê herî dawî yê Medan tê naskirin.

Cihên ku ev efsane hatiye jîyîn, cografyaya Îranê, Afganistanê û Asya Navîn e ku berê ji wir re digotin Tûranistan, Zabulistan û Persîan. Bijen li welatê Tûraniyan dîl dikeve, qralê ku wî dîl digre Efrasiyab e. Cihê ku Bijen û Ristemê Zal lê dijîn herêma **Zabulistanê (an Zabûlê)** ye ku ew niha li ser tuxubê Îranê, di nav axa Efxanistanê de ye. Qala bajarê Zabulê tê kirin ku ew di herêma Zabulistanê de ye. Menîce keça Efrasiyab e ku ew jî li welatê Tûranistanê dijî. Cihê qesra qralê Tûranê ya wê demê li ser tuxubê Çînê ye. Di wêjeya devkî de navên bajaran tê guhertin, mînak di hin waryantan de navê bajarê **Kengê**, çiyayê **Şaderûtê** û **Edawatê** derbas dibe. Dibe ku ew nav ên dîrokî bin û niha nayên bikaranîn û navên wan yên niha nayê zanîn. Ev yek dibe mijara lêkolînek din.

3.3. Encam û Nirxandin

Wekî encam, tê dîtin ku aliyên hevpar ên van waryantan gelek in. Navên serlehangên Bijen û Menîce, Ristemê Zal, Efrasiyab (Ewrasya, Elpisy), Heman (an Hûman) û Pîran nayên guhertin. Di hemî waryantan de Menîce keça qralê Tûranê ye, lê navê qrêl ji ber taybetmendiyên wêjeya devkî ku li gor herêman diguhure, cihê ye. Ji aliyê fonetîkî ve Ewrasya, dişibe Efrasiya, herwiha Elfesiya jî dişibe Efrasiyab. Ger wekî çavkaniyek dîrokî were nirxandin, li gor Şehnameya Fîrdewsî navê bavê Efrasiyab Pêşeng e²⁴⁹, di waryanta Çolemêrgê de jî ji wî re Elfesiyayê Bapîşey tê gotin ku peyva “bapîşey” ji aliyê fonetîk ve pir dişibe peyva “bav-pêşeng”.

Ji aliyê tevna efsaneyê ve jî şibandinek heye, Bijen diçe welatek din, li wir ji hevalê xwe dûr dikeve û Menîce dibîne. Menîce ew dike sindoqê an bêhiş dike û direvîne, dibe bajarê xwe. Ev yek balkêş e, ji ber ku di civaka kurdan de bi piranî keç kuran narevînin, lê kur keçan direvînin. Bavê Menîce qral e, gava vê yekê dibihîze Bijen digre û davêje bîrê. Bîr zîndan e, bîra zîndanî di waryantan de nayê guhertin. Ristemê Zal di hemî waryantan de bi hewara xwarziyê xwe Bijen de diçe û wî xelas dike. Waryanta Amedê (ya Nezîrê Miheme), waryanta Çolemêrgê û çavkaniya Fîrdewsî ji aliyê şeweya azadkirina Bijen ve jî dişibin hev. Ristem kincên bazirganan li xwe dike,

²⁴⁸ Kadri Yildirim, *Ehmedê Xani Mem û Zin*, Weşanxaneya Avesta, r. 154, Stn. 2010 (jêrenota 49emîn).

²⁴⁹ Fîrdevsî, *Şehname*, Weşanxaneya Wezareta Perwerdehiya Netewî, werger: Necatî Lugal, c: 1, r. 501, Enq. 1994.

pêlwanên xwe vedişêre, bi dizî dibe welatê Tûranê, li wir gava alavên xwe difroşe Menîce bi kincên kirêt û kevn tê cem wî, ew di nava nan û xwarinê de gustîlka xwe dişîne ji Bijenê di bîrê de. Bi vî awayî haya wan ji hev çêdibe, Ristem bi rêberiya Menîce diçe ser bîrê, Bijen xelas dike. Tê zanîn ev vegotin him li Îranê û him li nav kurdên Tirkiyeyê heye. Lewra pîremêrên kurdan bi pîranî xwendin û nivîsîna tirkî nizanin, ne pêkan e ku wan wergera Şehnameya Fîrdevsî xwendibin û çîrokê ji wir girtibin an di bin bandora berhemek din ên nivîskî de mabin. Dibe ku Fîrdevsî beriya Şehnameya xwe binivîse li nava eşîrên kurdan geriyabe û vê çîrokê qeyd kiribe.

Guherîna tevnê an navan, ji ber sebaba wêjeya devkî ye. Di waryanteka Amedê de (ya Şakirê Mecît) astengiyek dertê pêşiya Bijen; Menîce didin kesê bi navê Atrîk Paşa.²⁵⁰

Taybetmendiyek din ên wêjeya devkî ev e ku hin şayesandin û sond wekî helbest tèn gotin. Mînak:

“Ez bi nan û rûn kim,
Bi teyr û tûr kim,
Pirsa teyr kir Hafûsê Kafûs,
Ez bi serada mezin kim.”²⁵¹

Ev nîşana wêjeya devkî û taybetmendiyek wê ye ku di şayesandina xweşikiya Menîce de jî cih digre:

“Menîce çewa can e,
Bejin rihan e,
Sing zozan e
Memik bacan e...”²⁵²

Aliyên mîstîk mîna hemî çîrok û efsaneyên berê, di vir de jî hene. Numûne, di waryanteka Amedê de beriya Bijen xwe bide nasîn, Menîce dibêje “Tu Bijen î”. Ew dipirse “tu çewa dizanî”, bersiv wiha ye: “Wêneyê te di îspehiya me da hebû, min ji wir sitendiye û va ye bi min re ye.”²⁵³

²⁵⁰ Hilmi Akyol, Mala Zalê, Weşanên Enstituya Kurdî ya Amedê, r: 49, Amed, 2006. Taybetmendiyek zargotina Kurdan e, gava çîrokan dibêjin lehengên xwe di gund û bajarên xwe de didin nîşandan da bala guhdaran bikşînin. Ev yek çiqas rast e, divê were nîqaşkirin. Tê zanîn ku efsaneya Ristemê Zal û femandariya Keyaniyan, herwiha jiyana Bijen jî li Îranê derbas bûye, lê çîrokbêj ew li Amedê dide nîşandan, di derê Mêrdînê re derbas dike.

²⁵¹ Akyol, Mala Zalê, r. 115.

²⁵² Kızılkaya, Kayıp Divan (Dîwana Winda), r. 158.

²⁵³ Akyol, Mala Zalê, r. 114.

Gelo wê demê wêne hebûn? Dibe ku ev tiştêkî fantazî be, tenê lihevanîn be. Rasthatina Bijen û Menîce jî ne zelal e û ne xwezahî ye jî. Bijen û hevalê xwe diçin nêçîrê, li wir pêrgî konekî dibin. Di nav wî û Menîce de çewa evînek ji nişka ve diafire pir ne zelal e. Çîrok, destan, mesneviyên wê demê, li ser zimanan heta îroj hatine, di her civakê de cihê hatine gotin û heta gihîştine roja me, vegotin û bûyerên mîstîk li wan hatine zêdekirin.

Keça qralekî ji bo evîndarê xwe kedek çewa dide, ev yek di kesayeta Menîce de dertê holê. Ew helbesta ku dubare dibe jî baş li çîrokê tê: “Ez Menîca me, keça Elfesiyayê Babîşey im...” Kilam an helbest kencek (tesîrek) mezin li merivan dikan, Menîce bi vî awayî geriyaye, heta bi leq Ristem ve hatiye.

Lehengî û femandariya Ristem jî aliyek din yê vê efsaneyê ye; ew çewa xwe dike bazirgan, çewa pêlewana di sindoqan de dibe bajarê Tûraniyan, ev hemî xebatek pisporî dixwazin.

Hespê Bijen jî bijarte ye, navê wî **Şevreng** e. Ev yek jî taybetmendiyek lehengên van efsaneyan e. Çewa ku hespê Derwêşê Evdî Hedban e, yê Siyabendê Silivî Deybilqiran e û yê Memê Alan Bozê Rewan e...

Me berî niha gotibû ku di destan an çîrokan de her lehengek, hevaleyê xwe heye. Hevalê Bijen li gor wariantan tê guhertin, Gurgîn e, Hejale ye, Ecawil Paşa ye û Gurikê birayê wî ye.

Wekî ku me di efsaneyên din de jî gotibû, di her evîndariyek efsanevî de astengî û bendên mezin hene li pêşiya bextewariyê. Pirsgrêka mezin a li pêşiya Bijen û Menîce şerê di navbera Îranî û Tûraniyan de ye. Ev şer bi salan didome, ew dibin du qewmên neyarên hev û ev neyartî ji bavan derbasî lawan dibe. Baweriyên wan du civakan cihê ne, Tûranî Şaman in, Îranî Zerdeştî ne. Di wan şertan de ne pêkan e ku bavê Bijen Gîw (an Gêwo), li gor urf û adetên demê here keça Efrasiyab Menîce ji kurê xwe re bixwaze. Ji ber ku ew neyartî kûr e û pir bi kîn e, ew li kuderê çav bi hev bikevin, hev dikan. Lewma gava dengê Îraniyek ji qesra Menîce tê, tavi lê sîxur Efrasiyab agahdar dikan, beriya tiştêkî ji Bijen bipirsin dixwazin wî bikujin.

Baş û xerab, di nava hemî rêveberiyên de hene. Pîran naxwaze Bijen were kuştin dibêje: “Ya qralê me, qey di bîra te nayê me bavê Hejale li Îranê kuşt, heta vê gavê xwîna wî di misîne me de dikele! Ger tu vî pêlewana jî bikujî, heta roja qiyametê em û Îranîyan ji neyartiya hev û din venabin.”²⁵⁴

²⁵⁴ Kızılkaya, Kayıp Divan, (Dîwana Winda), r. 160.

BEŞA 4.

4. EFSANEYA EVÎNA MEM Û ZÎN

4.1. Kurteya Efsaneyê:

Efsaneya Mem û Zîn bi heman navî bûye mijara mesneviya Ehmedê Xanî. Lê ev berhem digel ku manzûm e jî wekî çavkaniyek nivîskî ya tevna vê evînê, ji alî naverokê û agahiyên dîrokî ve di nava vê xebatê de dê cih bigre. Jixwe du pexşanên ku me girtiye dest ("Romana" S. Remezan El-Bûtî û çîroka M. Mehmûdê Beyazidî) hestiyê rista bûyeran û vegotinan ji vê mesneviya Xanî girtine û vê yekê eşkere nivîsîne. Hêjayî û nirxa berhema Xanî ne tenê bo kurdan e, herwiha navnetewî ye jî. Ev yek di pêşgotina berhemê de ji alî wergêr ve wiha tê ziman: "Mem û Zîn, di nava pirtûkên bêjeyî yên dinyayê ên nemir de li qora pêşîn cih girtiye. Ev pirtûka gewre bi babetê xwe hevtayê Romeo û Jûliyeta Şekspîr û Leyla û Mecnûna Fizûlî ye."²⁵⁵

Beriya berhema Ehmedê Xanî, di civatên kurdan de Destana Memê Alan hatiye gotin ku ew nimûneyek wêjeya devkî ya kurdî ye. Yek ji berhevkarê herî naskirî yê vê destanê **Roger Lescot** e ku di destpêka berhevoka xwe de wiha dibêje: "Piştî Siyabendê Silivî, Memê Alan destana kurdî ya yekane ye ku muhteşemî tê de xwedî rolekî mezin e û mijara wê jî ne dîrokî, lê bi temamî **efsaneyî** ye."²⁵⁶ Digel ku menzûm e jî, berhevoka Lescot ji aliyê rêza bûyeran û honandina efsaneyê ve çavkaniyek girîng e. Wekî tevna plansaziya li pişt em dê vê berhemê jî bigrin dest. Gava werin lêkolînkirin dê were dîtin ku her du berhem ji hev cuda ne. Wekî Lescot dibêje: "Mem û Zîn a Ehmedê Xanî li gorî sewiya zanayan e û hewayeke dîndarî tê de heye li ser hîmê çêşna destanromanên camiyê hatiye avakirin, ji ber vê yekê ji Memê Alan a gelêrî pir dûr ketiye."²⁵⁷ H. Mem di berhema bi navê "Mem û Zîn Îdeal e, Memê Alan Çîrok û Destan e" de wiha dibêje: "Memê Alan û Mem û Zîn xwediyên du nasnameyên pir cuda ne. Peyvên ewil ên her du berheman 'Mem' xwedî simbol û wateyên cihê ne. Memê Alan, padîşahek kurd e ku bi navê binemala Alan a kurdên xwedîsalet tê nasîn û tê hizirîn... Ji her du berheman ya ewil bi şeweya devkî ye, ya din bi nivîskî ye."²⁵⁸ Wekî tê zanîn di nav gel de jî gava ev efsane bi çîrokî tê gotin teqez ji destana Memê Alan sûd tê wergirtin, wariantên nivîskî bipiranî para Mem û Zîna Ehmedê Xanî ne, lê tesbîta vê yekê bi arîşe ye. Gelek lêgerîn

²⁵⁵ Ehmedê Xanî, Mem û Zîn (Pêşgotina M. Emîn Bozarlan), Weşanxaneya Hasat, r: 8, Stn., 1990.

²⁵⁶ Roger Lescot, Memê Alan, Weşanxaneya Avesta, r: 9, ç: 3, Stn., 2013.

²⁵⁷ Lescot, h. b., r: 15.

²⁵⁸ H. Mem, Mem û Zîn Îdeal Memê Alan Destan Masal (Mem û Zîn îdeal e, Memê Alan Çîrok û Destan e) Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, r: 31, Stn., 2005.

û lêkolîn derbareyê vê efsaneyê de hatine kirin. Xebatên Kadrî Yildirim²⁵⁹ û Îzetîn Mistefa Resûl ên li ser Xanî û Mem û Zîn de hêjayî gotinê ne.²⁶⁰ Di xebata lêgerîna pexşanan de, me çar berhemên ji çavkaniya vê efsaneyê bi dest xistin. Pexşana Mihemed Said Ramazan el-Bûtî li ser tevna mesnewîya Ehmedê Xanî hatiye nivisîn.²⁶¹ Jixwe di serê romanê de ev yek eşkere hatiye nîşandan. Çîroka Mele Mehmûdê Bazîdî ya bi heman navî, di qada pexşanên Mem û Zînê de yek ji berhemên destpêkê ye.²⁶² Berhevkar Hüseyin Gündüz di berhema xwe ya bi navê "Kurteçîrokên Kurd ên Evîniyê" de cih daye mînakek çîroka Mem û Zînê jî.²⁶³ Pexşana duem ku di derbareyê vê efsaneyê de ye ji aliyê Ronî War ve hatiye weşandin.²⁶⁴

Bûyera eşqa Mem û Zînê li Cizîrê, li qesra Mîr Zeyneddîn (an Mîr Zeydîn) pêk hatiye û serpêhatiya du evîndaran û fesadek neyarê wan ê bi navê Beko, bûye mijara vê efsaneyê. Mîr Zeydîn zilamek otorîter, zengîn û xwedihêz bûye. Bi navê Mem katibê wî yê qesrê hebûye ku ew dibe aşiqê xuşka wî ya biçûk a bi navê Zînê. Lê, Bekoyê xizmetkarê Mîr ji vê evîne re dibe asteng û nahêle ew bi bextewarî bi encam bibe.

Ev evîn bi du waryantên sereke tê gotin an hatiye nivisîn, yên din formên van waryantan in. Çîrok û romanên ku tevna û çavkaniya xwe ji "Destana Memê Alan" digrin, bi qasî evîna Mem û Zînê serpêhatiyên Memê Alan jî derdixin pêş. Evîna efsanevî ya Mem û Zînê bûye para waryantên ji çavkaniya berhema Xanî jî. Me jî kurteya vê evîne li gor tevna mesnewîya Ehmedê Xanî ku gelek çîrok û roman li ber wê hatine honandin girt. Kurteya bûyeran û hêşînbûna vê evîne wiha ye:

Di rojêke Newrozê de du xuşkên Mîr **Sitî** û **Zîn** ji bo ku karibin bi dizî ji qesrê derkevin kincên mêran li xwe dikin. Armanca wan geşta Newrozê bûye, lê dagirtina dilên vala û bêevîn hevesa wan a sereke bûye. Mîr Zeydîn plana çûndina nêçirê dike, ev yek ji aliyê wan du xuşkan ve tê zanîn, gava êla qesrê ji bo pîrozbahîya Newrozê û nêçirê dertên, ew xwe li paş dihêlin. Sûk vala û qad aram dibin, gelê Cizîrê derdikeve ser mêrgan û qeraxa çemê Dîcleyê. Girseyek mezin di kuçe û kolanan de diherike, di nav wan de du mêrxas hebûne ku pir qeşeng bûne, çav li ser wan bûne. Di rastî de ew

²⁵⁹ Yildirim, *Ehmedê Xanî Mem û Zîn*, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2010.

²⁶⁰ Îzeddîn Mustefa Resûl, *Ehmedê Xanî* (Şairun ve Mufekkirin ve Feylesûfen ve Mutesevvifen) wer. Kadrî Yildirim, weşanxaneya Avesta, Stn. 2007.

²⁶¹ M. Said Ramazan El-Bûtî, *Mem û Zîn*, Weşanên Kent Işıkları, ç: 5, Stenbol, 2012.

²⁶² Mele Mehmûdê Beyazîdî, "Çîroka Mem û Zînê", Antolojiya Edebiyata Kurdî, Berhevkar: Firat Cewerî, Weşanên Nûdem, 2003.

²⁶³ Hüseyin Gündüz, *Kürt Aşk Hikayeleri-1 (Kurteçîrokên Kurd ên Evîniyê)*, Weşanên Do (Mîr), r: 81-107, Stenbol, 2009.

²⁶⁴ Ronî War, *Mem û Zîn*, Weşanên Ava, ç:1 Stenbol, 2011.

du keç bûne di dilqê mêran de, ew Sitî û Zîn bûne, ji bo xortên li gor dilê xwe bi cibînin ji qesrê bi dizî derketine.

Ew du kesên bi tebdîlîbas (came tebdîl) heta êvarê di Newrozê de bi şox û şeng digerin, lê kesekî li gor dilê xwe nabînin. Dem, êdî esra dereng bûye, siya dar û giran êdî dirêj dibe li ser mêrgan. Gel dinihêre ku roj xatiran dixwaze, ew jî dikevin ser riya malên xwe. Her du prenses gava ji elaleta keç û jinan dûr dikevin, Mem û Tajdîn bi kincên du qîzên xama bi meşeke tewşîk ber bi wan ve tên. Mîna naskiriyên tên, lê ew şaş dimînin da çi bikin. Dema ew digihîjin nêzîkî wan, serê wan têkel dibe, li pêşberî wan disekinin. Bi awiran hûr hûr li rûyên wan dinihêrin. Wê gavê her du biyanî mîna du terhikan dihejin û bi ser hev de dinizilin erdê, ji hişê xwe diçin. Du prenses jî ber rewşa wan dişeqizin, miraqa wan dikin da ew ji kîja eşîrê ne, çi kes in, ji ku derê ne. Lê ditirsin ku li ber serê wan bimînin, ewil derbas dibin, li wan hay nabin, lê paşê dibînin ku kesek li wan xwedîtî nake, şifqet dikeve dilê wan û ew bişûnde vedigerin. Li ber serê wan disekinin, li rûyê wan, bedewiya wan heyr û mital dimînin. Ji rewşa wan famdikin ku ew ji çîna serdest in, ji maleka xuyanî ne, xweşîkiya izet û azametê di dêmê wan de veşartî bûye. Kincên wan dişîbiya hev, belkî xism û eqrebayên hev bûn. Wan bi şifqet li du “keçan” nihêrîn, lê bi fermana Xwedê ew şifqet hêdî hêdî veguherî hezkirinê.

Wê kêliyê, ji ser giran siwarî diherikin jêr, ew texmîn dikin ku Mîr Zeydîn û hevalên xwe ne ji nêçîrê vedigerin. Divê ew beriya Mîr biçûna malê. Tavilê du gustîlkên xwe yên giranbuha bi yên du “keçên” li erdê diguherin. Ji bo di dahatuyê de karibin ew binasin, sirên wan hîn bibin vê yekê pêwîst dibînin. Du gustîlkên xwe yên ji aqût û almastan, bi du gustîlkên erzan vediguhêzin, ew di rewşa razayî de dihêlin û dimeşin malê.

Ew du “keçên xerîqî”, ne keç lê du xortên ji dîwana Mîr bûn. Yek jê kurê wezîrê yekemîn Eskender ku bi navê xwe Tajdîn bû, yê din jî sekreterê dîwanê Mem bû. Tajdînê ku bi mîrxasî û camêriya xwe di Cizîrê de dihat nasîn, birayê Çeko û Arif bû. Mîr di gelek kar û xizmetan de bi wan bawer bibû. Mem hevalê Tajdîn ê herî nêzîk û dildar bû. Tajdîn di nava dostên xwe de herî pir ji wî hez dikir. Biratî û dostaniya nava wan, bêhempa bû. Sebeba gera wan a bi kincên qîzan jî dîtina du prensesan bû. Wan ew dinasî, gava li ser riya vegeê çav bi wan ketibûn, dilên wan wî barê xweşîkiyê hilnegirtibûn, serxweş ketibûn. Sebeb evîndarî bû, dildarî bû, dilbirîndarî bû. Piştî êvar dibuhure, şev dikemile, bedenên wan giyanên xwe dîsa dibînin, hiş jî şiyar dibe û ew tên xwe.

Gava Mem û Tajdîn xwe di nava şevêka sitêrkên xwe windakirî de dibînin, li bêdengiya deşteka bêşop, ezmanekî bêdeng heyrî dimînin. Xays diçin, çî bi serê wan ve hatiye, hemî ji bîr dikin. Tiştekek nedizanîn. Tenê tiştekekî dihesandin, dilê wan bi hêz lêdida, hestên wan guherîbûn, taqetên wan sist bibûn, serên wan têkel û pêkel bibûn.

Hefteyek derbas dibe, Mem û Tajdîn di nava tengezariya wê şevê de dimînin, dibin mehkûmê hestên seyr û bêwate. Ji ber ku ew hest xerîb bû, êşê dida wan, nedixwestin derdê xwe ji hev re jî bêjin. Demek bişûnde rengên wan diçilmise, dikevin bîra ponijînê, tevgerên wan sist dibin. Rojekî derdê xwe li hev parê dikin, lê wê gavê bala Tajdîn diçe ser gustîlka pêçiya Mem a ku diçirise. Almasta ku navê Zîn li ser bûye, wan difikirîne. Mem jî şaş dibe ku gustîlka wî çewa hatiye guhertin û yekser derdixê û digel Tajdîn lê dinihêre. Lê bala wan diçe ser a destê Tajdîn jî. Bi nepeniyek kûrtir navên Zîn û Sitî dubare dikin, lê nayê hişê wan ew kî bûn. Ji ber ku Tajdîn mîna Mem hiş winda nekiribû, difikire ku van navan berê jî bihîstibû. Gava kûr diponije, tê bîra wî ku ew du navên prensesên qesra Mîr Zeydîn in ku pir bi nav û deng in. Dibêje: Ev navên du xuşkên Mîr Zeydîn in!

Ew du prenses jî mîna wan tebdîlîlîbas geriyabûn di dilqê mêran de. Êdî her gav û saetên roja Newrozê li pêş çavên wan jî ronî dibû. Ew du xort, ew ciwanên ku nedişibiyên xortan, tîna bîra wan. Wateya guherîna gustîlkan, parvekirina hestên xweş bû, wan ev bi cih anîbûn. Tajdîn têdigihîje ku, hemî êşên dikişandin, ji ber nepenhiştina vê bûyerê bû. Piştî mesele tê fam kirin, ew êşê tîk dibe. Lê Mem, wekî ku giyanê wî berê di ser rê de bû, niha ji rê derketibû. Zelalbûna rastiyê, agirê dilê wî bêtir gur kiribû û kulpîna dil zêde kiribû.

Tajdîn dixwaze Mem qanî bike, lê Mem qet guhê xwe nade wî. Ew ji çavên xwe yê şil û dilê bi kulpîn, gelek êşan dikişîne. Navê Zîn dubare dike û awirên wî diçin ser gustîlkê û wê maç dike.

Ji aliyê din ve, Sitî û Zîn ew şev bi dizîka dikevin hundurê qesrê, kincên zilaman ji xwe dikin. Ew du “keç”, rewşa wan ya ecêb, fikar û miraqaan ji wan re çêkiribûn. Di nava wan miraqaan de, xwesteka naskirina wan, hestên ku di dilên wan de dilibitîn, digel ku di dilqê keçikan de bûn jî, hezkirina ku di dilê Sitî û Zînê de afirandibûn, rewşek têkel derxistibû holê. Xeyala wan hêdî hêdî li hemî ramanên Sitî û Zînê dilefiya û ev zîzî ew hêsîr digirtin. Lê, ew li ser mijarê bêniqaş nediman, li quncik û odayên tenha de bi kurepistî qala wan dikirin.

Dadêyek wan hebû ku tiştekek jê nedihat veşartin. Navê wê Hayzebûn bû. Rûyê wê çilmisî, lê hişê wê geş û ronî bû. Porsipî û lawaz bû, piştî wê jî xûz bibû. Wê famkiribû

ku piştî çûndina şahiya Newrozê rewş û tevgera du prensesan hatiye guhertin. Rojekê destûr dixwaze û tê cem wan. Bi halê xemgîn ku çeneyên wan di qirikên wan re kutayî bû dibîne. Ji wan re dibêje ku we ji roja Newrozê û vir ve şox û kêfa xwe winda kiriye, xem bi we re hatiye qesrê, we çî nepenî bi xwe re anîye ku hûn ewçend kûr diramin? Rastî çî ye bêjin ku belkî karibim alîkariya we bikim. Ez dikarim bi riya remalan û falbêjan gelek tiştên veşartî jî zelal bikim.

Yek ji wan wiha dibêje: “Wê rojê tengijandinek ket dilê me, şopek li ser me ma, em di kênca wê şopê de ne.” Dadêya wan zanibû ku di rojên Newrozê de keç û xort hev dibînin, hev dicibînin, dilên hev didizin, lewma wiha dibêje: “Hûn têngihîştine ku Xwedê xweşikiyek bêhempa daye we? Ew kî ne ku li ber we xwe natewînin û we kirine nava agirên xwe? Heke hûn bêjin ew kî ne, hûn dê bibînin çewa wan têkim tora sêhra xwe û wan bînim ber piyên we.” Sitî xwe nagre, dibêje dadê ew sir e, xaçepirsek e ku çar alî radayî ye. Lê em tenê dikarin pêkhatina wê bûyerê bêjin. Dadê dibêje bi destûra Xwedê ez dê vê pirsgrêkê çareser bikim.

Sitî dibêje hal û mesele ev: Dema di Newrozê de em li ser mêrg û çayiran digeriyan du keçên ku nedişibiyar kesekî derketin pêşberî me... Dadê kûr diponije, paşê dibêje ev xewn û xiyal e. Lewra di nava ewçend xortên qeşeng de ne pêkan e ku dilên we ketibin du "keçên xerîb"... Belkî jî we xweziya xwe bi wan aniye, we xwestiye ku di dahatuyê de keçên we jî mîna wan xweşik bin! Mecnûn tune bûya, xweşikiya Leyla bi kêrî tiştêkî dihat? Kesekî dîtiye gul bûye evîndarê gulê, bilbil li ser hêlîna bilbîlek din xwendiyê? Nehêlin xeyal û wehmên wiha bikevin dilê we!

Zîn dertê pêş:

-Ew ne xeyal û xewn bû, dixwazî bêje şeytan in, dixwazî bêje melek in an jin in, di dest me de delîl hene ji wan. Lewra gava ew xeriqîn me ji tiliyên wan ev gustîlk deranîn.

Ew du gustîlkan rê dadê dide. Wê gavê çavên wê dibiriqin, dibêje min niha meseleyê fam kir. Ez niha dikarim perdeya ser vê pirsgrêkê rakim, lê wext pêwîst e ji min re û divê ev gustîlk jî bi min re bimînin.

Her du prenses soza ku ew gustîlkan winda neke û mijarê ji kesekî re nebêje, pêşniyara wê qebûl dikin. Dadê ji wir radibe, diçe cem falbêjeka jin, li cem wê rûdinê û çend quruşan dide wê. Bi fenokî wiha diaxife:

-Du kurên min ên sêwî hene, roja Newrozê derketin ser mêrgan û geriyan. Gava vegehiyan malê kincên wan qetiyabûn, ser û sincên wan guherîbûn û şaş û şeqizîbûn, hiş

û eql ji serên wan firiyabû, du gustîlk di tiliyên wan de bûn ku min ew ji te re anîn, sirên wan di van gustîlkan de ne.

Falbêja pîrejin radike du gustîlkan, awiran dikute nava defterê, hesaban pêk tîne. Demek bişûnde serê xwe radike, li jînikê dinihêre û dibêje ne du kurên te, du xezalê te hene. Mesele ne dînîtiye, ew bi atiyê neketine, mesele pêrgîbûna du giyanan, lihevketina du dilan e. Xwediyên van gustîlkan ne melek in, ne şeytan in. Ew du kesên ku dilê xwe dane du xezalên te, du xort in ku di nava êşê de xerq bûne. Lê ez navên wan nikarim hîn bibim. Heke tu bikevî dilqê bijîşk, dermanan bi xwe re bigerî, li her cihên Cizîrê bigerî, ew kî bin, tu dê bala wan bikşî ser xwe.

Di demek kurt de Hayzebûn xwe mîna bijîşkeka pispor amade dike; navên dermanan hîn dike, êş û nexweşînan jiber dike, kincên hekîman li xwe dike, alavên bijîşkiyê bi xwe re digerîne û dikeve kuçên Cizîrê. Nav û dengê bijîşka nûhatî zûka belav dibe, kesekî nebihîstî namîne, heta ku Mem û Tajdînê ku xemgîn û ponijandî ne jî pê dihesin. Ew di nava êş û elem û azarek bêhempa de bûn. Lê êşa wan ji hev cihê bû: Mem ketibû dafika evînê, xew lê heram bibû, ramana wê evînê ew kiribû nava terafa êgir. Tajdîn êş nakşîne, wekî Mem kûr naponije, xemgîn nabe, lê bi xwediya gustîlkê ve tê girêdanê. Şika wî tune ku dê Mîr xuşka xwe bide wî. Ji ber ku ew kurê wezîrê yekem bû, mîr bi birayên wî jî bawer bû. Şika wî tune bû ku dê bibe zavayê Mîr Zeydîn, lewma nediket çala sewdayek reş. Lê ew di etra Mem de, di xem û miraqa wî de bû. Dizanîbû ku ji ber ew katibê dîwanê bû, rewşa wî bo zewaca xuşka mîr ne guncaw bû.

Rojekê gava ew û Mem bi hevalên xwe re li mêvanxaneya koşka xwe sohbet dikin, bijîşka pîrejin (Hayzebûn) silav dide û derbas dibe hundur. Kesên ku nav û dengê wê bihîstine wê gavê tîn cem wê, dixwazin ku ew demekê li cem wan rûnê. Arifê birayê Tajdîn jê dipirse da ew kîja cure nexweşîyan derman dike? Ew dibêje bêtir nexweşînan manewî û giyanî derman dike. Wê gavê Tajdîn lê dinihêre û tê cem, dibêje “teherên nexweşiyên manewî û giyanî çi ne?”

Hekîme bi awirên tûj lê dinihêre, wê gavê diniquite dilê wê ku yek ji kesên ew li wan digere, ew bi xwe ye. Ew dibêje ku gelek nexweşên manewî derman kirine, gelek cureyên van nexweşînan dizane û ew derman jî kirine.

Mem dikeve navbeynê: “Ji van nexweşîyan a herî dijwar kîjan e xaltîkê? Tu dikarî qala wê bikî, naveroka wê bêjî?”

Hayzebûn wê gavê bawerî tîne ku du kesên ew li wan digere, niha li pêş wê ne. Axînek dikşîne û wiha bersiv dide: “Xwedê nîşan nede, ev nexweşî ji çavan dertê rê, derbasî çavan dibe, paşê di dil de bi cih dibe. Rûyê meriv diguherîne, êşê dike qefesa

sîngê, agirek li canê meriv belav dibe. Helandina laş dest pê dike. Ne hekîm kare tiştê bike, ne derman. Agirê evînê, tenê bi bihevrebûna du giyanan dikare sar bibe û bife.

Jinika hekîm dengê xwe dibire, dibîne ku Mem digrî û madê Tajdîn jî zer bûye. Wê gavê li civatê dinihêre, teqez bawer dike ku dilketiyên du prensesan ew du xortên li hember wê ne.

Hekîma jin diçe quncik cem du evîndaran, ji wan re dibêje “xemgîn nebin, dermanê derdê we bi min re ye.” Piştê ji civatê destûr dixwaze, herkes dertê der, ew sê kes tenê dimînin. Wê gavê guhê xwe dide çîroka serpêhatiya rastlêhatina Mem û Tajdîn. Paşê bibişîrîn wiha dibêje: “Bila dilê we rihet be, çavê we ronî be lawên min. Sond dixwim ku ji bo birîna we derman bikim, ez ew qasid im ku ji alî wan prensesan ve hatime şandin. Ha ji we re du gustîlkên wan!”

Mem xwe nagre, çengî himêza jinikê dibe, piştê kirasê wê maç dike. Tajdîn jî ji kelecanaan nizane çî bike, bêdeng dimîne û li wê dinihêre. Hayzebûn Xatûn gustîlkên ku ji du prensesan sitendibû dide Mem û Tajdîn, dibêje ez dereng namînim, dê li we vegerim.

Pir kêfa Tajdîn tê, tavilê navê xwe, cihê xebata xwe ji jinikê re dibêje, piştê gustîlka Sitîyê dirêjî destê wê dike. Lê Mem dibêje min efû bike, lê ev gustîlka Zînê min bi jiyane ve girêdide, ez pê sebra xwe tînim, ew tune be ez dê dîn bibim. Tu dixwazî ez bêgiyan bimînim? Ev nefesa min e.

Piştî vê axaftinê jinik razî dibe ku ji Mem gustîlka Zînê nestîne.

Ji alî din ve Sitî û Zîn wekî li ser agir bûn; Hayzebûn dê derheqa sirên wan du “keçan” de agahiyek bianiyana. Di nava miraqê û bêtebatê de, derî lê dide, Hayzebûn bi rûyek qermîçî û bi piştê xwe ya xûz dikeve hundur. Hêj ew napirsîn, dadê dest bi axaftinê dike:

-Ez niha ji cem wan tîm. Dilê min hej jî bi merhemeta wan lêdide. Her cara ku navên we dibihîzin, xwîna rehekên wan dibin mîna agir, seranpê dilerizin. Ew qencên Xwedê ne ku hemî xweşikayî bûye para wan. We çewa di nava elaletekê de ew dîtin? Ew layîqê xweşikiya we ne.

Sitî û Zîn bi van peyvan re şaş dibin. Wê gavê tiştê di dilê wan de diqewime, dikevin nava perşek mezin. Ev perş her ku diçe gurtir dibe, heta ku canên wan disincire. Êşa ku heta niha ji ber nepeniya wan dikişandin, niha vediguherî rastiya hezkirinê. Dadê tiştên ku zanîbû ji wan re got, lê Zîn êş û elama xwe anî ziman, got tu dizanî te me kir nava agirekî çewa?

Pîrejinê dibêje hûn ferman bidin, ez dê bi cih bînim. Dema ku hûn di nava vê êşê de bin, aramî ji min re tune ye.

Sitî û Zîn vê peyamê didin xatûna Hayzebûn:

“Ji wan re bêje hûn di nava van hest û êşan de ne tenê ne. Ji sedemî hezkirina we, ew du kesên ku hûn bo wan xeriqîn jî wekî we êşê dikşînin. Nalînên êşa evînê ji dilên wan tên. Ji wê roja Newrozê û vir de ew bo hevaltîya jîyanê we qebûl dikin. Hûn kengê dil bikin, dikarin herin me ji Mîr Zeydîn bixwazin.”²⁶⁵

Gava ev peyam digihîje Mem û Tajdîn, her du ji kêfan bi hewa dikevin, basik ji wan kêr dimînin. Li ber guhên wan ji ber hêza bextewariyê, dengên muzîkên serxweşiyê bilind dibin. Di nava wê sewsîbûnê de, ew gelek diyarî; xişir, guhar, gustîlk, bazin didin qasida pîrejin.

Dotira rojê sibehê birayên Tajdîn, Arif û Çeko digel çend rûsipiyên Cizîrê ji bo ku Sitî ji Tajdîn re bixwazin berê xwe didin qesra Mîr. Biryar didin ku du bûkan bi hev re nexwazin, ecele nekin. Ji bo peşk li meseleyê nekeve ewil Sityê dixwazin, lê qet qala Zînê nakin. Piştî ku Tajdîn bibûya zavê Mîr, xwestina Zînê dê hêsantir bibûya.

Arif ji bo kekê xwe Tajdîn, Sityê dixwaze.

Mîr tu astengî li pêşîya qebûlkirina vê xwesteka wî nabîne. Dibêje wekîlê zavê kî ye bila were, bang li erkdarê marbirînê jî bikin, me ji niha de biryara peymanî mara Sitî û Tajdîn da. Dotira rojê êvarê qesra Mîr tê xemilandin, amadekariyên dawetê dest pê dikin. Beg dizane ku dostaniya zava û Mem heye, çav li Mem digerrîne, ew bi dilekî xemgîn, ponijî û serîdiberde dibîne. Bang lê dike, dibêje tu hevalê Tajdîn yê ji can î, li vir kesekî mîna te nêzîkî wî tune ye. Tu dê ezeperiyê wî bî. Mem dibêje fermana te li ser sera û diçe li cem Tajdîn rûdinê. Di dawîya şevê de mara Tajdîn û Sitî tê birîn, bi vî awayî gahvê yekem bo dawetê tê avêtin.

Heft şev û heft rojan dawet didome, di berbangê şeva heftan de mûmek dirêj di dest hevalên bûk û zavê de, li pêş Tajdîn bi cih dikin. Dem dema zîfafê bûye, Mem bi Tajdîn re diçe heta ber derî. Sê şev û sê rojan ew ji hûndur dernayên, di vê demê de Mem jî ji ber derî naçe, nobedariya wan dike. Beg vê erkê dide wî, beriya herkesî wî dê Tajdîn pîroz bikirana. Memê ku li dora Qesrê wekî notirvan digere, li ser peyvên Beg difikire, ew jê re dibin hevî. Bextewariya xwe û Zînê xeyal dike, dilê xwe xweş dike, lê belkî jî Beg li evîna wî û xuşka xwe dihesîne.

²⁶⁵ M. Said Ramazan El Bûtî, Mem û Zîn, Weşanên Kent Işıkları , Stenbol, 2012.

Navmaliyê Mîr Zeydîn merivek qamkurt, gurî, rûmirûzî û çavhesûdî bû ku navê wî Beko bû. Ew kurê kî bû, nedihat zanîn. Kîn û buxd, nefret û hesûdî ji çavên wî dibariyan. Tajdîn jê hez nedikir, lewma rojekî ji Mîr re dibêje vî hesûdî dê zerarê bide te, kûçik jî di xizmeta xwediyên xwe de ne, lê Beko ji kûçikekî xerabtir e, qasî kûçikekî berjewendiyê nade te. Mîr dibêje jiyan Tajdîn, jiyan! Ew me muhtacî Bekoyan dike. Ji bilî qesrê jî berjewendiyên me hene, pirsgrêkên ku em nikarin ji bin derên hene. Heke ez Beko li cem xwe negrim, nikarim serî bi teşqeleyan re derxînim.

Beko jî fam dikir ku Tajdîn dafik li pêşiya wî datîne, lewma wî jî amadekariya kemînekî dikir. Rojekî ji Mîr re wiha dibêje: “Begê min ev çar roj in piyên Tajdîn bi dîwana te nebûne, qey ew wext nabîne were cem te?”

Mîr guh nade Beko, pê re dixeyide, lê Beko dibêje: “Te xuşka xwe Sitfî bi erzani da Tajdîn, ev yek wî qure kiriye, ew ji ola xwe derketiye. Gumana min ev e ku ew dê nankorî bike. Ji merivê tima re, qencî û zengînî pere nake. Ji dinyanedîtîyan re jî!”

Mîr hêrs dibe, dibêje: “Hiş be, dinyanedîtî tu yî! Ez dizanim Tajdin kesek çewa ye, çiqas rast e, ji dil e û camêr e. Ji kera ku barê te ne lê be, nebêje ço! Pozê xwe neke her karî!”

Beko dibêje min jî ew wiha dizanî, lê tiştên tu nabînî hene. Ji dema ku ew bûye zavê we, pozê xwe dike her karî, bi serê xwe tevdigere. Tevgera wî ya ez şaş kirim jî ev e ku, wî Zîna prenses ji bo Memo pêşkêş kiriye û soza zewaca wan daye.

Mîr Zeydîn bi vê peyvê hêrs dibe, radibe û peyase dike, kufînî jê diçe, çavên wî sor dibin. Di ber xwe de dibêje Tajdîn bêyî min çewa karê wiha dike? Bêyî destûra min, xuşka min dizewicîne? Wî pir rû girt ji min, lewma ne tirsawî ne jî hurmeta wî ji min re maye.

Beko li benda fersendek wiha destê xwe di hev dide, dibêje:

“Tirsawî min ew e ku sibehê bi hêza vê mertiyê xwe wekî Mîrê Botan bibîne!”

Mîr diçe li cihê xwe rûdinê û bi wê hêrs û kînê wiha diaxife:

“Dilê min hebû di demek nêz de daweta Mem û Zînê li dar bixim. Lê niha fikra min guherî, ez bi ceddê bapîrên xwe kim, xwîn wekî lehiyê jî biherike ez dê Zîn nedim Mem!”

Kesekî nizanîbû Mîr seba gotinên Beko vê biryarê girtiye, lê hemî navbeynkar zanibûn ku gava qala zewaca Mem û Zînê dibû, ew hêrs dibû, herkesî dişikand û mijarê diguhert. Carek ji caran ji Tajdîn û birayên wî re wiha gotibû: “Hûn baş bizanibin ku Belkî Zîn qet nezewice, lê ew dê destê wê qet negihêje Mem, li sebeba vê yekê jî qet nepirsin. Ez wiha dixwazim.”

Sitî û Tajdîn di kêf û xweşiya rojên ewil ên zewacê de digevizîn, bi hev şa dibûn, ji evîna xwe tam û lezzet digirtin û di hev de diheliyan.

Ew pir dernakevin derve, sohbeta wan bi Mem re jî namîne. Zîn jî êdî nikaribû bi xuşka xwe re gilî û gazindan bike. Mem di tenêtiya ku dînîtiyê bi xwe re dianî de, di wahşeta bêhevaltiyê de, bi derdên xwe re rû bi rû mabû. Piştî zewaca Sityê çil roj derbas bibûn, alava agirê di dilê Zîn de pêl dabû, giliyê xwe bi kesekî re par nekiribû. Eql ji sera firiyabû, kûr diponijî û di xeyalan de winda dibû. Ji odeya wê tenê dengê girî û nalînan, îske îsk û fişe fiş dihat. Hêstirên wê bibûn bade jê re. Wekî heyva ku hêdî hêdî bitefe, xweşikiya wê difiriya, hinarkên wê diçilmisîn û diqermiçîn. Keç û jinên qesrê gava vê yekê didîtin, ji wan wetrê ku ew pir bi ber çûndina Sitî dikeve, bi zewaca wê dikesire. Rojekê nedîme dicivin û diçin cem wê, dibêjin te xwe kuşt bi vî girîyî, Sitî ji te qetiya, lê ew bextewar e, çi bûye ji te? Jiyan xweş e, tu jê xweşiktir î, dunya li dora te diçirise, direqise. Rabe piya, bikene, şên bibe ku dunya jî şên bibe. Lê, deng ji Zîn nayê, xire xir ji sînga wê tê, giriyek boş ji dêmên wê mîna çem diherikin. Nedîme li benda peyvekê ne, lê ew devê xwe jî venake. Piştî nas û hevalên wê ji odeyê dertên, ew bi xwe re diaxife, xeyalan dibîne, bang li Sitî dike, derdê xwe ji siya wê re dirijîne. Ew bi şev li odeya xwe şiyar dimîne heta sibehê. Li nik mûmekî rûdinê, pê re diaxife, dibêje ez jî mûmek im û bi te re dihelim. Jiyana wê wiha dibuhurî, bi xeyal, sî, weswese, xewnan re diaxifî, lê di hestan de û di mêjiyê wê de tenê navê Mem dima. Bextê wê yê reş, ew ji lezetên dunyayê dûr dixist.

Mem jî di nava êşê de, bi elem digiriya, ji merivan û dostan direviya, digel ku katibê mîr bû jî, gava ew li pêş xwe didît, dev ji êş û kedera xwe bernedida. Gava pêlên evîne radibûn, ew diçû hafa çem an jî serê çiyayekî, di tenêtiyê de digiriya, dinaliya. Carna bi ava Dicleyê re diaxifî, digot: *Tu jî mîna rondikên min diherikî, bi şev û roj nawestî?*

Wî gelek caran kesekî li der û dora xwe nedidît, şikl û alavên dunyayê nedihat ber çavên wî, wê gavê êşa wî du qat dibû, bi dilê xwe re diket cengê. Carna pê re diaxifî, qala rojên berê dikir. Ew pir digiriya, heta ber çavên wî reş dibûn, wî rondik dirijand. Gava kaniya hêstiran diçikiya, cenga nava giyan û dilê wî dîsa dest pê dikir, hestan dîsa ew difetisand û rondik dîsa der dibûn. Bi vî awayî ew ketibû tora çeqûbelka hestan. Ew êdî dilerizî, diçû di bin kendalekî Dicle de xwe diquncifand ser hev, ji bilî çend dostên wî kesek nedihat cem. Wî êdî dev ji mala xwe ya bajêr berdabû, ditirsiya ku Mîr zerarê bide wî, lewma derdê xwe ji bilî Tajdîn bi kesekî re parê nedikir.

Rojekî delal li defê dixê, bang dike dibêje Mîr dê derkeve nêçîrê, tîr û kevana kî hebe bila pê re bikevin pêşbirka nêçîrgirtinê. Bi sebehê re Mîr û peyayên xwe, bi esanafan û xortan re ber bi çolê ve diherikin. Bi biçûk û mezinan, herkes dixwest para xwe ji vê kêfê bigre. Di demek nêz de li ser giran û geliyan pan dibin. Her kesek bi pey nêçîreka ku pê peznê xwe bide dikeve.

Zîn tenê dimîne, bi rengê rûyekî miçiqî, bi piştêk xûz bêhal dibe. Tenêti bêdengiyê tîne, wê gavê awirên wê dikeve nava baxçe, her cure fêkî hebûn, gul, çiçek û sosin bêhn didan. Dengê çivîkan dihat, minminîk tenê difiriyan. Bêdengî û tenêti bi dilê wê bû, dixwest di nava baxçe de bigere. Gava çav bi çivîkan dikeve, bi wan re diaxife. Ew xwe dide taldeya darekê, piştê xwe dide koka wê. Çavê wê diçe ser guleke zer, hisreta wê û êşa dil dîsa pêl dide. Mem jî di tenêtiyê de ji nişka ve xwesteka gerê dihesîne, taqet di xwe de dibîne ku derê derve û bigere. Eba bi ser xirqa de li xwe dike û dimeşe, xwe di sûka vala a Cizîrê de dibîne. Ji bêdengiyê fam dike ku gelê bajêr bi Mîr re derketiye seyde. Gava ew wiha difikire, baxçeyek hêşîn li ber çavên wî dikeve, lingên wî ew dibin ber derê baxçeyê Mîr Zeydîn. Çîkê çîka çûkan bêdengiyê xera dike. Piştî qeyrana giyanek westiyayî, dixwaze xwe li bin darekê dirêj bike.

Zîna ku piştê wê li darekê bû, ji dûr ve reşahiya Mem dibîne. Ev ji bo wê surprîzek bû, lewma diricife. Baş bala xwe didê, gava bawer dibe ku ew e, şaş û şeqizî dibe, di cih de dikeve, ji hiş diçe. Mem dimeşe, bala xwe dide dengên bilbilan, lê wê gavê rast li bedena keçekî tê, diwerqile. Dewxa wî diçe, deryaya bîrvekirinan ew digre nava xwe û ew jî bi ser Zîn de dikeve. Demek wiha derbas dibe, heta Zîn hêdî hêdî şiyar dibe, gava ew tê xwe, Memê ku ji dûr ve çav pê ketibû li nik xwe dibîne. Mem xays çûbû, tenê nefes digirt. Zîn hişê xwe dicivîne, dibêje ev leystika qedere ye, roja Newrozê jî ew li ser min bêhiş ketibû. Radike serê Mem û datîne ser çoka xwe, hêdî hêdî pora wî miz dide. Demek bişûnde serê Mem radike, Mem çavê xwe vedike, bişîrîna Zîn û destê wê yê li ser dil dihesîne. Wiha dibêje:

“Tu Zîn î, tu dilê min î? An ez niha xewnekî dibînim, belkî jî em di jiyana din de, di cineta baqî de ne?”

Zîn ji bo bihesîne, destê wî dike nava yê xwe û wiha dibêje: “Evîna min, ez Zîn bi xwe me, em niha li baxçeyê bavê min in, qey tu vê derê nas nakî?”

Ew bawerî bi dengê Zîn ê nazik û şêrîn tîne, gava tê xwe dîsa li Zînê dinihêre, li çav, birû, dev û lêvên şekirî û pora xweşik hûr dibe. Dibêje: “Bi rastî jî tu pir xweşik î!”

Zîn dibêje: “Hemî xweşikiya min deyndarê te ye, lewma tu dibînî ji roja min te wînda kiriye ev xweşikî jî nemaye. Min hemiyar bi qurbana te kir.”

Mem:

“Çi pêwendiya min bi vê xweşikiyê re maye? Çewa hebe ew dê qet nebe para min. Mafê min ew e ku çola xwe bikim balgîf ji serê xwe re.”

Gava ew wiha dibêje û bi îske îsk dest bi girî dike, alava çavên wî dilê Zînê jî pêdixê, ew radike destê Mem û pê rondikên xwe paqij dike û sonda dawî dixwe:

“Ez sond dixwum ku Mem, ji bilî gora tarî ji xeynî te ez destûr nadim kesek xwedî li min derkeve. Ez dê tenê bibim ya te. Bihevrebûna me yan li vê dunyayê, yan jî li axretê dê pêk were.”

Piştê ew bi hev re ber bi çardaxa nava baxçe ve diçin. Li wir rûdinên û bi hevûdin şa dibin û hev qanî dikin, derdê xwe li hev parê dikin. Sohbet ewçend wan li nava ewran digêrîne ku, mîna serxweşan dunyayê û hemî alavên wê ji bîr dikin. Dem çewa derbas dibe, ew hay jê namînin. Nêçîrvaniya Mîr û Cizîriyan xelas dibe, êdî roj dadigere, haya du evîndaran ji gera dunyayê jî namîne. Mîr û peyayên xwe westiyayî vedigerin malê û beriya biçin odeyê dixwazin li nav baxçe bêhna xwe berdin. Mîr berê xwe dide çardaxê, Mem û Zîn hêj di xewna evînê de bûne, gava pêjna merivan û reşahiya wan bi girtina derî re dihisînin, qet xwe ji cih dilivînin. Gava şiyar dibin, êdî dereng e, ew vediciniqin, di cih de sar dimînin. Zîn ji kelecane xwe davêje bin ebayê Mem, wê gavê Mîr û çend zilamên xwe dikevin hundurê çardaxê. Reşahiyek li guşeyê çardaxê dibînin. Mîr bang dike: “Ev kî ye bêdestûr hatiye bin çardaxê?” Mem wêrek tevdigere, ji cihê xwe nalibite, dibêje:

“Mîrê min, ez im, Mem. Tu agahdar î ku ev demek dirêj e ez nexweş bûm, li ser doşekê bûm, lewma tevlî koma seydvanan jî nebûm. Lê ez îşev pir tengezar bûm, ji bo bimeşim ji nava nivînan rabûm, min xwe li nav baxçeyê we dît. Ji bo bêhnekê ez benî...”

Dilê Mîr xweş dibe, dipirse:

-Mem tu niha çewa yî? Tu çima di tariyê de yî, çima mûmikan vênaxî?

-Jixwe min karîbûya, ez dê ji ber cenabê we rabûma ez benî.

Mûm vedikevin, herkes rûyên hev dibînin, Tajdîn li Mem dinihêre, dibîne ku madê wî tirş e, tengezar e, wekî ku li ser diriyê rûniştibe. Ew dixwaze hîn bibe Mem di vê saetê de li nav vî baxçeyî çî dike, nepeniya dilê wî çî ye. Gava Mîr avê dixwaze, Tajdîn xwe dide pêş, tavilê avê tîne, li civatê belav dike. Li ber Mem disekine, tasa avê dide wî, wê gavê Mem serê guliyê Zînê ji bin ebayê xwe derdixê û nîşanî Tajdîn dide. Tajdîn meseleyê fam dike, di cih de dicemide, dikeve kelecane wisa ku zuxrikên xwêdanê di eniya wî re diavêjin. Ev xetereyek mezin bû, dibû ku ew rewş bibûna

sebebê heyata wan. Tajdîn difikire da çewa dostên xwe ji wî halî xelas bike. Fenek tê hişê wî, piştî avê belav dike, bi hinceta çûndina daşirê derdikeve der. Bi bazdan diçe malê, ji jina xwe re dibêje eşyayan ji malê derxîne, zûka odeyan vala bike. Zarokek wan jî hebûye, Sitî ew himêz dike, digel hin alavên malê dertê ber derî.

Tajdîn mala xwe dide ber êgir, ji jina xwe re wiha dibêje: “Xelkê heta niha agir bi avê tefandiye, ez dê îro agir bi agir vemirînim! Mem û Zîn di xetereyek mezin de ne...”

Di demek kurt de zimanê alavê text û darên xanî, dîwarê odeyan dialêse. Tajdîn li ber derî bang dike, dibêje “Hewar e!” Dûxan bilind dibe, dengê hewarê zêde dibe, alav bilind dibe, hemî Cizîrî bi vê yekê dihesin û bo alîkariyê baz didin. Nûçe digihîje Mîrê ku wê gavê li bin çardaxê ye. Herkes bi şaşwazî tevdigere, hemî gelê qesrê dertên, her cih vala dibe. Mem ji cih nalive heta bawer dibe ku kesek nemaye. Wê gavê Zîn ji bin ebayê wî dertê. Mem dibêje: “Te hunerên Tajdîn dît? Ji bo me xelas bike qesra xwe da ber agir.” Zîn diçe aliyê malê, Mem jî diçe alîkariya tefandina êgir.

Li gor hin rîwayetan gava Zîn dibeze aliyê malê, Beko ji derveyî baxçe ew dibîne û meseleyê fam dike. Hin çîrokbêj jî dibêjin beriya agir, Bekoyê ku hêj li bin çardaxê bûye di guhê Mîr de dibêje: “Mîrê min!

Kurkê Memo qube ye,

Tiştêk di bin de heye!...”

Mîr guhê xwe nade Beko, fesadiya wî mîna karekî ji rêzê dibîne û cidî nagre.

Nûçeya ku Mem û Zîn hev dîtine, bi hev re bûne tavilê li nava bajêr belav dibe. Ev gotegot digihîje guhê Beko jî. Beko rojekî gava ew tenê dimînin her tiştî di guhê Mîr de dibêje, tiştêk kêr nahêle, belkî li ser zêde jî dike. Mîr eciz dibe, hêrs dibe, di cihê xwe de nikare bisekine, alav ji dev û pozê wî diavêje. Ramanên xerab xwe li mêjiyê wî dipêçin: Carna hewl dide ku here ber deriyê Mem û bi destê xwe serê wî jêbike, carna dixwaze li hember Tajdîn û birayên wî jî şer li dar bixe. Lê li xwe diwerqile ku ew kesê nûçeyan jê re aniye, Bekoyê Ewan e, fesaad e, bêxîret e û fetbaz e. Rojekî dîsa di nava ramanên kûr de ditengije, bang li Beko dike, dibêje: “Mafîr ku tu gelek gotinên ne li rê dibêjî, ka van fikrên xwe şênber bike, min bide bawerkirin.”

Beko dibêje Mîrê min, heke tu Mem vexwendî leystika kişikê (setrencê) bikî, tu dê rastiya van gotinên min hîn bibî! Mafîr ku tu di kişikê de mahir î, tu û Mem şertekî deynin navbeyna xwe, kî têk here, bila xwestekê yê serketî bi cih bîne. Di encamê de Mem dê mecbûr bimîne evîna xwe û Zînê eşkere bike.

Ev gotin dikeve serê Mîr, yekser ew bang li xizmetkaran dike, dibêje textê kişikê amade bikin û biçin pey Mem, bêjin bila were qesrê.

Dibe êvar, eywana qesrê ji peyayên Mîr û temaşevanan tijî dibe, lê haya Tajdîn û birayên wî ji vê yekê qet namîne. Mîr bi zanîn bang li wan nake. Gava ew diçe li ser textê xwe rûdinê, berê xwe dide Mem û dibêje: “Min bihîstiyê ku tu di kişikê de pir jêhatî yî. Tu naxwazî îşev hunera xwe nîşanî min bidî?” Mem li tevgerên Mîr dinihêre, xof dikeve dilê wî, dibêje: “Çi heddê min e Mîrê min? Li dijî cenabê we ez dikarim peznê xwe bidim? Lê heke hûn ferman bidin, ez nikarim li dijî xwesteka we bisekinim.”

Mîr Zeydîn radibe, ber bi maseya kişikê ve dimeşe, ji Mem re dest dihejîne û dibêje “were em çend destan bileyzin. Îşev em dê cengê li dar bixin, da em bibînin kî dê bi ser bikeve.”

Mem radibe, li hember Mîr rûdinê, beriya kişik dest pê bike, Mîr qala şert û şurûdê leystikê dike:

“Şertê me ew e ku, kî têk biçê, dê xwesteka kesê serketî bi cih bîne.”

Wê gavê Girgînê kurê Mîr jî li eywanê bûye ku ew dostê Mem bûye. Haya wî ji evîna nava meta wî û Mem hebûye, lê ji hêrsa bavê xwe ne razî bûye. Lewma ditirse ku ew leystik bibe sebaba qeyranekê an bobelatekê. Di destpêka leystikê de ew radibe, bi dizîka ji qesrê dertê der û diçe cem Tajdîn û ew agahdar dike. Di demek kurt de Tajdîn, Çeko û Arif dikevin hundur û di civatê de cihê xwe digrin.

Mem du caran li ser hev Mîr têk dibe, Mîr pir ji hunera Mem hez dike. Beriya leytika sêem dest pê bike, şeytaniyek tê eqlê Beko. Ew dikeve pey dek û dolaban. Lewre dizane ku wê carê jî Mîr têk biçê, dê Mem Zînê jê bixwaze û ew mecbûr e wan bizewicîne. Beko divê riyek bidîta. Di destpêka leystika sêem de, li pişt Mem li ber şibakeyê Zîn dixuye, ev yek bala Beko dikêşîne. Beko hêdîka ji Mîr re dibêje: “Ez benî, adetek heyê divê carna reqîb cih biguherin...”

Haya du leystikvanan ji dek û dolabên Beko tune bûye, lê bi ya wî dikin û cih diguherin. Piştî çend xulekan awirên Mem li şibakeyê dielîqe ku çî bibîne! Zîn wekî rojê dibiriqe!

Bala Mem wê gavê belav dibe, nikare hişê xwe bide leystikê, çavê wî her li ser şibakeyê dimîne. Destên wî li ser kevîran bêvîn digere, carna peyayan bi hespan diguherîne, carna fil û wezîr dişibîne hev. Bi vî awayî Mîr pênc caran Mem li ser hev dibe û leystik wiha bi dawî dibe. Mîr vedigere cihê xwe, li Mem dizîvire dibêje: “Te şertê me jibîr nekîr ne wisa?” Mem di bin hestên têkçûyînê û deka ku Beko lê çêkiribû de, dibêje: “Na, ez benî tu çî dixwazî kerem bike, bêje.” Mîr wiha mijarê vedike: “Ez li pey nepeniyan digirim, tu îro dilê xwe veke, bêje evîna di dilê te de, keça ku tu dixwazî

bibe bermaliya te kî ye? Ji me re jî bêje, heke yeka hunkûfê te be, em te û wê bextewar bikin.”

Mem deng nake, Beko seba vê bêdengiyê rê dibîne, wiha dipeyive:

“Mem fedî dike navê yara xwe bêje. Ji ber ku ew yeka pîsa merdala rûqirêj e!”

Ev gotin hiş ji serê Mem dibe, ji hêrsan yekser xwe nagre û wiha dibêje:

“Ya ku ez dihebînim necîb û xudan begzade ye,

Nîhayet el emir, çiqas Mem zêde erinî navê wê Zîn e, xuşka we ye.”

Mem bi ser Beko de jî diqîre: “Here wê de pîsê rezîlê bênamûs! Yên wiha layîqî te ne. Ya di dilê min de rûmetbilind e, heyva çardeşevî jî xwe nagihîne wê. Xweşikiya wê bêemsal e. Ew esîlzade ye, Xwedê wê bêqusûr afirandiye. Ew prensesa vê Cizîrê ye!”

Gava peyva dawî dibêje, Mîr nahêle ew êdî biaxife, dibêje:

“Tu lewma dikevî qesra min û bi rezîliya xwe vê derê kirêt dikî?”

Mîr tavilê ferman dide dergevanan: “Hûn hêj çi sekinîne? Vî seriyê zimandirêj çima nafîrînin?”

Beriya ku dergevan gahv bavêjin, sê bira Tajdîn, Çeko û Arif bi xencerên li pişt xwe dertên navenda eywanê. Tajdîn dergevanan dide sekinandin û şiyariyek wiha dide:

“Baldar bin, ji cihê xwe nelivin rezîlno! Hûn bi hunerê şerê me dizanin, dînîtiyê nekin ha! Em dê vê eywanê bikin gola xwînê!” Ew paşê bi ser Mîr ve li ba dikeve, dibêje: “Fermana Mîrê min çi be, em nabin asteng jê re. Em qencyên wî jibîr nakin.”

Herkes bêdeng dimîne, civat li benda biryara Mîr Zeydîn dipê. Mîr ji cihê xwe radibe, bi destê xwe qevdikên Mem girêdide, fermana zîndankirina wî dide. Tajdîn û birayên xwe deng nakin û bertek nîşan nadin. Ew bawer dikin ku di dahatuyê de dê karibin Mîr bo berdana Mem razî bikin.

Mem davêjin binê zîndaneka mîna tenûrê; tenê devê wê hebûye, pace tune bûye. Ew ji dunyayê dûr dikeve. Di tenêtiyê de nimêj dike, dua dike, zîndanê ji xwe re dike mîna mizgeftê. Her cara ku dergevan xwarinê jê re dibe, ew li piya an li secdeyê, di rewşa îbadetê de dibîne. Bedena wî roj bi roj lawaz dibe, lê giyan û baweriya wî her diçe xurt dibe.

Zîn di odeya xwe ya qesrê de bi tenê dimîne, carna êş û azarê dikşîne û bi ser tenêtiya Mem de digirî. Carna xwe sûcdar dike, dibêje ew di zîndanê de ez li qesra Mîr, di hebûnê û xweşiyê de dijîm.

Wê carna Mem xeyal dikir, bi xeyala wî re diaxifî, digot tu dibêjî qey qesra ku ez tê de me ji çala ku tu tê de yî çêtir e? Dunyaya ez tê de me ji ya te ronîtir e? Zîn bi van

axînan ji xwarin û vexwarinê qut dibe, bedena wê bêhal dikeve. Mîr dizane ku xuşka wî ji ber Mem ketiye wî halî, lê ew hêj di bin tesîra quretî û hesûdiya xwe de bûye. Wî hemî têkiliyên xwe pê re birîbû, ne li rewşa wê dipirsî, ne rehm diket dilê wî.

Şevkî hemî hevalên Mem û Tajdîn dicivin, biryar didin ku sibehê bi hev re biçin cem Mîr, efûya Mem jê bixwazin. Heke qebûl neke, dixwestin planek din pêk bînin. Arif dibêje, ne hewce ye em biçin cem Mîr, jixwe ew dê tiştêkî qebûl neke, em divê rûmeta xwe nedin bin piyan. Em nikarin Mem bi tika û lave lavan ji zîndanê derînin, em tenê dikarin bi hêza zend û bendên xwe wî xelas bikin. Em divê xwe li qadê bidin nişandan.

Gelê Cizîrê sibehê sê birayan, Tajdîn, Arif û Çeko digel hevalên wan li pêş qesrê dibînin. Ew bi çek bûn, gel jî li pey wan bû. Ew di nava xwe de rîsipiyekî dibijêrin û dişînin dîwana Mîr. Rîsipî ji Mîr re dibêje, sûcê Mem çi ye? Ew tenê evîndar bûye, tu jî zanî tiştêkî bi hêza eşqê nikare. Sê bira hatine ber derê te, cara dawî ji te efûya Mem dixwazin, heke ev nebe, ew jî naxwazin êdî bijîn.

Mîr ewil difikire, paşê dibêje: “Here ji wan re bêje, çima bi gotinên tewşîk bawer dikin. Wan xizmetek mezin ji min re kirine. Me çima ceza da Mem? Ji bo ew qure nebe û ji ola xwe derneyê. Ez niha Mem û Zînê bi qurbana Tajdîn û birayên wî dikim. Bila dilê wan rihet be. Ez dê niha Zîn teslîmî wan bikim, da zanîbin ez çiqas ji wan hez dikim.”

Kalemêr bi kêf û coş ji cem Mîr dizîvire, vê nûçeyê gava digihîne sê birayan û gelê bi wan re, hêrsa wan datîne, ew nerm dibin, aramî dikeve nava girseyê. Ew bi kêfxweşî vedigerin malên xwe.

Beko piştî veqera kalemêrê qasid, berê xwe dide dîwanê, Mîr di nava fikar û xeman de dibîne. Jixwe tiştên Mîr ji qasid re gotibûn, Beko ji pişt derî bihîstibû, lewma haya wî ji dek û dolabên Mîr hebû. Beko dibêje:

-Xwedê şahid e, min texmîn dikir rojekê dê wiha bikin, Tajdîn bikin mîrê Botan. Lê, ne hewce ye tu bîponijî ez benî, tunekirina Tajdîn û du birayên wî ne zahmet e, tu kengê bixwazî tu dikarî. Ji xwe mirina Mem wekî qurtek av e! Mîrê min bila here cem Zîn, bêje ez poşman im û min biryara zewaca we daye. Piştê bila Zîn biçe zîndanê cem evîndarê xwe. Tu wê gavê were diyarê, bibîne wê çi bibe! Bi qasî ez dizanim, Mem li ser Zîn dimre, piştî ewçend êş û azaran, piştî bêrîkirina evînî, ew gava ji nişka ve Zîn li pêşberî xwe bibîne, dê bixeriqe û ji dil here. Heke tu sê birayan ji min re bihêlî, çend nuqut jehrîya li nav şerabekê besî wan e!

Mîr guhê xwe dabû Beko, lê dev ji ramanên kûr bernedabû; planan, dek û dolaban, leystikan di serê xwe de çêdikir. Di wê kêliyê de Beko derdixê der, derî li ser digre. Wê rojê heta êvarê û bi şev jî heta sibehê difikire, li çareyekê digere. Pêşniyariya Beko jî digre ber çavan, hezar xayile jê re çêdibin. Lê di nava planan de efûkirina Mem, zewaca wî bi Zînê re tune bûye. Gelek sebeb hebûn bo vê yekê: Tajdîn û barayên wî serî hildabûn, wî nikarîbû serî pêl bikirana, evîna Mem û Zînê ya bi vê şêweyê li dijî toreyan bû. Lê jehrîkirina sê birayan jî ne karê eqilan bû. Gava Mem di zîndanê de Zînê bidîta, ew bawer bû ku dê ji can biçûna.

Di dema taştê de, Mîr diçe odeya Zîn, wê di odeyek tarî, perdekirî û bêdeng de dibîne. Zîn tenê bûye, ew nêzîkî wê dibe, bi halê wê yê lawaz, bêtaqet û bêmecal diêşe, dikesire. Diçe li rex wê rûdinê, çavên xwe li odeyê digerîne, xemgînî û keder li her deveran dixuya. Destê xwe hêdîka dibe çeneya xuşka xwe û serê wê bilind dike, li çavên wê dinihêre, heyrî dimîne da ew çewa bênûr û bêronahî mane. Zînê bi awiran dibêje: Ez xuşka te me, tu çewa wiha bêwijdan bûyî? Te bi destê xwe bextewariya min ji holê rakir! Ev kîn û buxda te ji ku tê? Sûcê min çi bû keko? Min xayîntiyê bi te nekir, tiştêkî ku tu pê fedî bikî, min nekir, ez kirêt nebûm.

Dilê Mîr bi van nêrînan dikizire, bi merhamet dilerize. Hemî hêrsa dilê wî derbas dibe, poşman dibe û dest bi girî dike, dibêje: “Bi rastî jî min bêheqî li te kir, zilma min li te kiriye, bi poşmaniyê safî nabe, gunehên min efû nabin.”

Zîn lawaz bû, nexweş bû û bêhal bû. Gava van gotinan ji kekê xwe dibihîze, dilê wê dikele, ji nişka ve vedireşe, xwîn ji dev û pozên wê dipijiqe û ew dixeriqe. Mîr li ber serê wê dike hewar û gazî. Wê gavê Sitî serê xwe dike nava derî, lê gava wan di wê rewşê de dibîne, ji wê wetrê ku Mîr hêrs bûye û Zîn kuştîye. Diqîre: “Hey zalim, ev eziyeta te li vê rebenê kir ne bes bû? Te çi anî sera? Ev têr nekir, te xwîna wê jî rijand?” Mîr dibêje: “Bes e xuşka min, agirê dilê min besî min e, ez ne qatil im, min ew nekuştîye, ew bi xwe qeriqiye.”

Hemî gelên qesrê li ser serê Zînê dicivin, lê nikarin wê şiyar bikin. Heta roj diçe ava, serê wê li ser çoka Mîr, di xewek kûr de diçe. Wê gavê xizmetkarek bi bazdan dikeve hundur, dibêje Mîrê min, dergevanek hatiye dibêje Mem nexweş e, bêhal e, li ber mirinê ye. Fermana we çi ye ez benî?

Zîn di wî halî de gava navê Mem dibihîze çavên xwe vedike, li dora xwe dinihêre, li xwîna erdê mat dibe, dibîne ku Mîr hêj digrî, dibêje:

“Tu di roja daweta min de digrî? Giyanê min ber bi bextewariya li bendê bûm ve difire. Ez hatime dawîya rêwîtiya xwe ya di nava pêlên deryayê de derbasbûyî. Ji roja min Mem ji xwe re wekî heval hîlbijart, min ev êş jî qebûl kir. Tu rabe, here ser textê xwe li kêfa xwe binihêre, şerabê belav bike. Li ser rûyê dunyaya fanî, tiştê ji min re nema, perdeyan nava min û Mem rabûn, qasekî din ev beden dê biçê axê, lê tiştê nikare ji bihevrebûna giyanê me re bibe asteng. Mîrê min, tu tabûtek xweşik û mezin ji xuşka xwe re amade bike û dawetê li dar bixe. Bila ew dawet ji ya Sîfî ne kêmtir be. Bila Sîfîya xûça min cesedê min bişo û bixemilîne, bila ew min verê bike. Mem jî ji Tajdîn re bihêle, ew bila wî bişo. Wesyeta min e, bila di nava min û Mem de tu perde û astengî tune bin, mezelen me li rex hev bin. Me di qebrê de tenê bihêlin, da em bi hêsanî hev himêz bikin.”²⁶⁶

Herkes digrî, Mîr çavên xwe paqij dike, dibêje min efû bike, ji bo zewaca we çî ji destê min were ez dê bikim.

Wê gavê rewşa Mem ya nexweş tê bîra Mîr, ferman dide kesên li dora xwe: “Zûka bazdin zîndanê! Bila Zîn jî bi we re were, bawer im ew xeriqiye, dê were xwe. Mizgîniyê hêdî hêdî bidin wî, bila şoq nebe, gava derket dê were xwe.”

Gava ku ji Zîn re dibêjin Mîr destûra zewaca we da, rabe here Mem ziyaret bike, ew hildiqevize, bi kêf û coş radibe, xwe dixemilîne û li hespekî siwar dibe, bi gel re diçe zîndanê. Dergevan derî vedike, Zîn ji bo Mem ji nişka ve wê nebîne û ji dil neçe, xwe ji paş ve digre. Mem li ser şalika nimêjê, bêtevger, bêvîn, di rewşeke cemidî de dibînin. Wekî komek hestî wiha bêmade û bêliv bû. Ji qerdiyan rewşa wî dipirsin, ew dibêje ji sibehê de wiha ye, girtiyên din gotine ku sibehê bi nimêjê re gurzek ronahî li hundurê zîndanê belav bûye, sebaba vê yekê nizanin. Kêliya Zîn ber bi wî ve diçe, wê gavê xwe nagre bi ser de digrî. Mem tê xwe, çavên xwe vedike, hewl dide ku rûnê, piştê tiştê nabêje û berê xwe dide qibleyê. Piştî diçe secdeyê, serê xwe radike û li Zîn dinihêre, dibêje “tu ji bo min çî rêberek xweşik î! Tu min dibî cem Rebbê min!” Zîn jî dibêje: “Tu çî evîndarekî qenc î!”

Sîfî û kesên din dibêjin Mem were xwe, xwe li dînitî daneyne, de rabe em bi hev re biçin cem Mîr, ew dê daweta we bike, tu dê bi Zîn re bizewicî, ew êdî ya te ye!

Mem çavê xwe vedike, dibêje na, ez naçim ber deriyê Mîran, ez nabim dîlê kesekî Xwedê em qebûl kirine, wî mara me birî. Cînet li benda me ye, em dê tenê li huzûra Xwedê daweta xwe bikin, ne li cihekî din.

Piştî van gotinan ew çavên xwe digre û wekî ku di xewekî kûr de biçê, bedena wî sist dibe. Kesê wê derê fam dikin ku Xwedê emanetê xwe jê sitendiye. Zîn jî wê gavê

²⁶⁶ El-Bûtî, Mem û Zîn (Wekî kurte ji heman berhemê), r: 129-130

xays diçe, herkes dest bi hewar hewarê dike. Tajdîn bi peroşek çavsorî baz dide, dixwaze were zîndanê, bi rê ve di nava komêk meriv de çav bi Beko dikeve. Mîna birûskê xwe davêje ser, dest dike qirika wî û wiha dibêje:

“Hey şeytan! Ey marê ji xeynî fesadiyê tiştêk ji dev dernayê! Tu bûyî derîyek hesin di nava van du evîndaran de. Tu li ser birînên wan bûyî agirek, te dilê wan ji bextewariyê mehrûm hişt. Te min ji dostê hêja veqetand!”

Piştê ew bilind dike, heta ser milên xwe hildide, paşê bi hemî hêza xwe davêje erdê. Mêjiyê Beko belav dibe.

Tajdîn tê zîndanê, temeziya ser çavê Mem radike û ew himêz dike û rondikên boş dibarîne. Dû re ji zîndanê mîna hêçan baz dide, bi ser qerdiyanan de hêrs dibe. Dibêje “Ez dê îro vê zîndanê xera bikim. Mîr, ey mîr tu li kuderê yî, ez dê te di qesra te de dirêj bikim!”

Mîr dengê wî dibihîze, ew dide girtin, destên wî girê dide, heta roja din di zîndanê de dihêle. Sîfî jî Zîn dibe malê, lê hêza Zîn tune bûye, xism û eqreba li ser serê wê dicivin, dixwazin dilê wê xweş bikin.

Roja din, Mîr pir digrî, ji qesrê dernayê, lê poşmaniya wî êdî pere nake. Mala Mem û ser riya qebristanê tijî elalet dibe. Meşa cenazeyê Mem dest pê dike, hemî gelê bajêr radibin ser piyan. Qebristan û sûk dibin cihên şînê. Di nava wê elaletê de bi bejna xwe ya dirêj Zîn dertê meydanê, bêçarik û bêpeçe dimeşe. Paşê baz dide, lê gel nahêle. Gava ew digihîje ser mezêl, êdî cenaze hatiye defnkirin, axê avêtine ser, Zîn xwe li ser axa qebra Mem dirêj dike, bi rondikên xwe şil dike. Wiha dibêje:

“Wekî wê tejiya li zîndanê, ez dê emanet teslîmî te bikim, bedena xwe îro radestî te bikim!”

Mîna li balîfekî xwe bipêçe ew axa mezêlê Mem himêz dike. Demekê wiha dimîne, yên li derûdorê dixwazin ew ji wir rabikin, lê gava dest davêjin milê wê, dibînin ku rih daye. Mîr wê gavê tê, xwe davêje ser cesedê xuşka xwe.

Mezêlê Mem cardin vedikin, Zîn wekî ku wesyet kiribû dişonin, kefen dikin. Mîr dadikeve hundurê mezêlê û bi destê xwe ew dike himêza Mem, dibêje: “Ha ji te re Mem, gava tu sax bûyî ez bûm qeyd û bend, min evîna te ji te girt, ji niha û pê ve bi hev re bin.”

Mezêlê Beko li jêr mezêlên Mem û Zîn dikolin, ew jî li wir defn dikin. Zîn beriya mirina xwe pir bi ber Beko dikeve, dibêje qedere te erkdar kir bo ji me re bibî asteng, evîna me jî bi vî awayî bû evînek giyanî û olî. Tu dê li dunya wî alî bibî dergevanekî sadîq bo me.

4.1.1. Karakterên Efsaneyê

Du evîndar, Mem û Zîn (Memê Alan û Zîna Zeydan) karakterên sereke ne. Kekê Zînê Mîr Zeydîn (Mîrê Botan, Mîr Zeyneddîn), navmalî, xizmetkar û dergevanê qesrê Bekir (Bekoyê Ewan), hevalên Mem sê kurên Eskender Tajdîn (an Qeretajdîn) û du birayên xwe Arif (di Destana Memê Alan de Hesên) û Çeko, Sitîya xuşka Zînê karakterên girîng in, di efsaneyê de û di honandina bûyeran de li pêş in.

Waryanteka efsaneya evîna Mem û Zînê weke tê zanîn Destana Memê Alan e. Li gor ku di lêkolîna H. Mem de tê gotin di çîroka Memê Alan de hijdeh karakter hene:

"Di senaryoya ku tê pêşandin de qehremanên Memê Alan Elî, Emer, Elmaz, Memê Alan, Bengîn, Xizir, Zîna keça Beko, Bekoyê Ewan, Zîna Zêdan, Sitî, Rihan, Hesên, Çeko, Qeretacîn, Mîr Şem, Sêvdîn, Mîr Ezîn û hespê çîrokê Bozê Rewan in."²⁶⁷

Di Destana Memê Alan a Roger Lescot de "Baxçevan" jî lehengek e ku Beko dike. ²⁶⁸ Tê zanîn di Mem û Zîna Xanî de qesasê Beko Tajdîn e wekî ku dibêje:

"Pirsîn: 'Eceb ev çi bê newa ye?

Gotin: 'Bekirê xwedan ceza ye,

Tacdîn ji rûwê dinê fena kir,

*Alem bi fenayîya wî şa kir."*²⁶⁹

Alan, di çîroka Hüseyin Gündüz de bavê Mem e²⁷⁰, di romana Ronî War de apê Mem e û di heman romanê de bavê Mem Al Paşa ye, Alan û Zindiyan jî du apên wî ne.²⁷¹ Ger wekî berhemek agahîgirtinê û qumaşê pişt van pexşanan werin lêkolînkirin, di mesnewiya Xanî de bavê Mem ne Alan e, Mem ji Cizîrê ye, katibê Mîr Zeydîn e, navê bavê wî û diya wî nayên diyarkirin, di destana Memê Alan a Lescot de navê bavê Mem Elî ye, diya wî ji Qureyşiyên e, lê navê wê ne diyar e, apên wî Emer û Elmaz beg in,²⁷² tê gotin ku: "Derbareyê navê Alan de çend şirove hene. Navê Alan piştî Mem û Zîna Ehmedê Xanî ketiye deve dengbêjan. Her wekî bavê Memê berdevkê Mîrê botan bû û di şeran de ala wî hildigirt ev leqeb li Mem tê kirin. Di wextekî de jî bakurê Qefqesya ta çemê Tuna di destê milletê Alen de bûye. Dîroknivîsên rojhilat Alen kirine Alan."²⁷³

²⁶⁷ H. Mem, Mem û Zîn îdeal, Memê Alan Destan Masal, r. 31.

²⁶⁸ Roger Lescot, Memê Alan, Weşaxaneya Avesta, r: 151, ç:3., Stenbol, 2013.

²⁶⁹ Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, Weşaxaneya Hasat, r: 424, Stn., 1990.

²⁷⁰ Gündüz, Kürt Aşk Hikayeleri, r: 86.

²⁷¹ War, Mem û Zîn, r: 14.

²⁷² Lescot, Memê Alan, r:26-27.

²⁷³ Lescot, h.b., r:11, 13, 25.

Têlî Eyşan, di romana Ronî War de navê diya Mem e.²⁷⁴

Lescot destana Memê Alan ji kîjan dengbêjan girtiye diyar kiriye, lê çavkaniyên War ne eşkere ne, ev yek sebaba rexneyê ye.

Karakterên stero yên di romana el-Bûtî de jî ev in:

Kurê Mîr Zeydîn **Girgîn** heye ku gava Mem û Mîr bi kişikê dileyzin ew diçe Tajdîn û birayên wî adahdar dike²⁷⁵, di waryantên Memê Alan de cih nagre. Dadêya Sitî û Zînê rêvebera qesra Mîr, **Hayzebûn** Xatûn²⁷⁶ wekî bijîşkekê digere, evîndaran digihîne hev.

Remal²⁷⁷ (remildar) jî karakterek stero ye ku bi navê xwe nayê nasîn, tenê alîkarî dide Hayzebûn Xatûn da ew bi hêsanî du xortên xwediyên gustîlkan bibîne.

Rihanê²⁷⁸ navmaliya Zînê ye, Zînê wê dişîne bo civandina gulan, gava ew diçe ji bo ava gulan ji xatûna xwe re bîne, li nava baxçe Mem dibîne, ji ber husna wî ji devger dikeve, wesfê wî li cem Zînê dide. Di çîroka Memê Alan de heye, lê di pexşanên Mem û Zînê yên me lêkolandiye de cih nagre.

Gulistan, di forma çîroka Memê Alan de keçika li ser kaniyê ye, baxçeyê Mîr nîşanî Mem dide. Di çîroka Gündüz de rêberiya Mem dike.²⁷⁹ Ew di çîroka Hüseyin Gündüz a navborî de rêberiya Mem dike.

Zîna keça Beko di waryant û formên Memê Alan de cih digre, dertê pêşiya Mem²⁸⁰, dixwaze wî bixapîne, lê Mem vê yekê fam dike û wê qebûl nake, lewma bavê wê Beko ji Mem re dibe neyar.

Bengîn (an Begî²⁸¹) di hin waryant û formên Memê Alan de heval û destbirakê Mem e, di çîroka Gündüz de ew ji bajarê Mixribê pê re tê Cizîrê²⁸², lê di berhema Lescot de piştî mirina Mem ew tê Cizîrê.²⁸³ Ev karakter di waryantên ji tevna berhema Ahmedê Xanî de cih nagre.

Emer Beg, di romana Ronî War de seyisê Bozê Rewan e²⁸⁴, lê Lescot ew wekî şêxekî Qureyşiyîyan dide nasîn.²⁸⁵

²⁷⁴ War, h.b., r: 15

²⁷⁵ M. Said Ramazan el-Bûtî, weş. Kent Işıkları, r: 103, ç: 5, Stn., 2012.

²⁷⁶ El-Bûtî, h. b., r: 41.

²⁷⁷ El-Bûtî, h. b., r: 37.

²⁷⁸ Lescot, h. b., r: 70

²⁷⁹ Gündüz, Kürt Aşk Hikayeleri, r: 90-91.

²⁸⁰ Lescot, h. b., r: 51.

²⁸¹ Lescot, h. b., r: 29

²⁸² Gündüz, h. b., r: 90-91.

²⁸³ Lescot, Memê Alan, r: 152.

²⁸⁴ War, h. b., r: 26.

²⁸⁵ Lescot, h.b., r: 144.

Xocê Xizir di çîroka Memê Alan de gava ku Mem riya Cizîrê nizane û rê şaş dike, ew dertê pêşiya wî û ew agahdar dike.²⁸⁶ Herwiha Tavbanû, Heyvbanû, Stêrbanû sê cinên Mîrê Cinan in ku di tevna Memê Alan a Lescot de cih digrin²⁸⁷, di şiklê kevokan de digerin.

Bozê Rewan di destana Memê Alan de wekî hespê Mem cih digre,²⁸⁸ di waryantên ku tevna xwe ji mesnevîya Xanî girtine de bi tu awayî ew cih nagre.

4.1.1.1. Têkiliya Karakteran

Têkiliya **Mem û Zînê**, têkiliya du evîndaran e, herwiha **Tajdîn** û **Sitî** jî ewil evîndar in, paşê dizewicin, bextewar dibin. Lê di çîrok û romanên ji tevna destana Memê Alan de beriya bûyeran Sitî ne bi Tajdîn re lê bi Hesên re zewicandî ye.²⁸⁹

Pexşana (romana) M. Seîd Remezan el-Bûtî tevna û mijara xwe ji mesnevîya Xanî girtiye, çewa ku di destpêkê de wergêrê berhemê Abdulhadî Timurtaş dibêje:

"Xanî bi vê berhema xwe mînaka wêjeyek sincpak derxistiye holê..." Wergêr di berdewamê de xebata Bûtî wiha dide nasîn: "...Bûtî, gava berhemê bi şeweya romanê ji nuh ve nivîsandiye, pêvekek peşkî (hindik) bi ser orîjînalê ve vekiriye. Bi vî awayî berhem, bi vegotin û wêjeya Bûtî ya ku keda xwe jî bi ser ve kiriye, bûye xebatek resen."²⁹⁰ Ji vê yekê tê zanîn cihêtiya berhema Bûtî û Beyazîdî ji bilî şeweya nivîsê (ku yek çîrok ya din "roman" e) qet ji hev tune ye.

Di "romana" Bûtî de Tajdîn hevalê Mem yê herî nêzîk e, alîgir, piştîmêr û destbirakê wî ye. Kesekî merd e, camêr û mêrxas e. Ew rojekî ji Mem re wiha dibêje: "Sond dixwim dostê min, ger ez riyeka ku bextewariya xwe bi ya te biguhêzim bibînim, an riyeka evîn û şadiya xwe ji ya te re fîda bikim bizanîbim, dê teqez bikim."²⁹¹ Mîna hevaltîya lehengên din ên efsanevî: Hevaltîya Qeregêtranê Salê û Siyabend, Sadûn û Derwêşê Evdî û hwd. Tajdîn ji bo Zîn di bin ebayê Memo de neyê dîtin û girtin, mala xwe dide ber êgir.

Heman hevaltî di destana Memê Alan de di navbera Hesên û Memê Alan de heye ku dema Hesên bo xelaskirina Mem û Zîn agir bera mala xwe dide ev yek şênber dibe:

"Hesên dît Mîr nehat, hema ar berda qesr û qonaxane,

²⁸⁶ Lescot, h. b., r: 49.

²⁸⁷ Lescot, h.b., r: 32

²⁸⁸ Lescot, h. b., r: 28.

²⁸⁹ Lescot, h. b., r: 75.

²⁹⁰ M. Saîd Ramazan el-Bûtî, weş. Kent Işıkları, ç: 5, r: 10-11 Stn., 2012.

²⁹¹ El-Bûtî, h. b., r: 63.

Pê da rabû gurîk û dûmane,
Sitiyê li çonga xwe xist û got: 'Birao hele binhêr ev çi dûman e
Hesen ar berda qesr û qonaxane,
Ma çima tu wanî dilhişk bûyî? Dilê te naêşe ji bo kesane.'..."²⁹²

Sitî digel ku xuşka mezin a Zînê ye, di heman demî de hevala nepeniyên wê ye jî. Mîr Zeyneddîn (an Mîr Zeydîn) kekê Zîn û Sitiyê ye, lê li gor destana Alan ew zarokên Mîr Zengîn in. Nakokiya di nav Mîr û Mem de, dibe sebebê mirina Mem û Zîn. Mîr Mem davêje zîndanê, dibe sebeb ku Zîn jî ji kerba Mem bimre. Wekî çavkanî, li gor agahiya ku ji destana Memê Alan a Lescot hatiye girtin, Mem di zîndanê de bi hinara bi jehriya marê kaşan dagirtî ku Zîna keça Beko jê re tîne dimre.²⁹³

M. Emîn Bozarslan di peşgotina Mem û Zîna Ehmedê Xanî de derheqa analîza karakterên du evîndaran de wiha dibêje: "Xanî... başî, rastî, bêgunehî, jarî û bindestî di şexsê Memê û Zînê de civandiye û nîşan daye. Xerabî, şalûzî, fesadî û durûtî jî di şexsê Bekir de kiriye qalikekî şênber û li ber çavan raxistiye."²⁹⁴

Di kurtiya çîrokê de tê dîtin ku Arif û Çeko du birayên Tajdîn in, mêrxas in, li gel Tajdîn parastina Mem dikin. Arif Sitî ji Tajdîn re dixwaze. Lê di destana Memê Alan de Hesen li pêş e, Çeko jî rolek xwe yê girîng heye, gava nava wî û du birayan xera dibe, ew Mem jî vedixwîne qada şer:

"Çeko got: 'Memo ez ker bûme guhên min nabihîzin tu şorane
Eger di dilê te da jî heye, tu were tevî wane
De bila weqiya te jî were ser lîtira wane
Madam îş hat sekinî li van derane
Ji qerezê Hesen ra, tewr ez dê neqedînim tu îşane.'..."²⁹⁵

Di pexşana Bûtî de Girgîn kurê Mîr e, lê alîkarê Mem e, lewma di dema leystika kişika di navbeyna Mîr û Mem de, agahdarî dide Tajdîn û birayên wî da rê li ber belayekê bigrin, herwiha Hayzebûn (an Mîrzebûn) Xatûn şewirmenda Sitî û Zînê ye, bi "tebdîl el qiyafe" dibe hekîme, li bajêr digere Sitî û Zîn û Mem û Tajdîn digihîne hev.²⁹⁶ Ew di waryantên Memê Alan de cih nagre.

²⁹² Lescot, h. b., r: 129.

²⁹³ Lescot, Memê Alan, r: 146.

²⁹⁴ Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, Weşanxaneyê Hasat, r: 10, Stn., 1990.

²⁹⁵ Lescot, Memê Alan, r: 93.

²⁹⁶ El-Bûtî, Mem û Zîn, r: 39.

Bekirê dergevan (Bekoyê Ewan) li dijî Mem û Tajdîn tevdigere, neyartiya Mem û Zînê dike, naxwaze Mîr xuşka xwe li Mem mar bike, ew di hemî waryantên vê efsaneyê de bi rolek xerab û neyinî cih digre. Ew wekî kelem dikeve nava du evîndaran û fesadiya wan dike, di dawiya efsaneyê de ji alî Tajdîn ve tê kuştin. Di Destana Memê Alan a Lescot de Beko ji alî baxçevanekî ve tê kuştin.²⁹⁷ Mezelê wî li bin mezelê Mem û Zînê tê kolandin.

Di waryanta Memê Alan a Lescot de têkiliyên karakteran cihê ne: Tavbanû, Heyvbanû, Stêrbanû hene di bin serokatiya Mîrê Cinan de. Elî, Emer û Elmaz beg sê bira ne, zarok ji wan re çênabin. Qîza begê Qureyşiyî ji Elî begê re tînin, ji wê Mem tê dunê.²⁹⁸ Piştî ku Mem mezin dibe beriya Tajdîn, Beglî dibe heval, alîgir û xizmetkarê wî. Di pexşana (romana) War de heta dawiya çîrokê Beglî nayê Cizîra Botan. Di heman pexşanê de zîna keça Bekoyê Ewan dixwaze bi Mem re bizewice, lê Mem pê razî nabe,²⁹⁹ belkî jî ev yek e ku dibe sebaba kîn û xereza di navbera Mem û Beko de.

Di honandina pexşanên li bin siya destanê de **Xocê Xizir** jî cih digre ku ew riya Cizîrê rê Mem dide.

Erkên karakteran ên di destana Memê Alan û mesnewiya Ehmedê Xanî de, pir ji hev cihê ne.

4.1.2. Li Gor Waryantan Guherîna Karakteran û Bûyeran

Me du waryantên vê efsaneyê û ji her waryantek jî formekî girte nava vê xebatê. Waryantek ji wêjeya devkî, dengên dengbêj û çîrokbêjan, ji tevna Destana Memê Alan reh û teşeya xwe digre. Me wekî bingeh û rêza bûyeran berhema destana Memê Alan a Roger Lescot girtiye dest. Waryantek jî ji ya nivîskî ye ku li ser bingeha Mem û Zîna Ehmedê Xanî ye.

Herçiqas di vê waryantê de wekî ku ji nav jî tê fam kirin "Memê Alan" li pêş be jî, lê parçeyek ji wê destanê evîna Mem û Zîn e. Pexşana Bûtî û çîroka M. Mehmûdê Beyazidî weke di serî de eşkere kirine ji tevna mesnevîya Mem û Zîn a Ehmedê Xanî hatine girtin, weke pexşan hatine nivîsîn. Di navbera Xanî û Beyazidî de, ji hêla nivîsandina berhema de nêzîkî sed û şêst sal dem heye. Mele Mehmûd xwe wekî xwendevanê Ehmedê Xanî dibîne. Çend mînakên şibandînan di nava mesnewiya Ehmedê Xanî û çîroka M. Mehmûdê Beyazidî de ev in:

²⁹⁷ Lescot, h. b., r: 151.

²⁹⁸ Lescot, h.b., r: 27.

²⁹⁹ Ji bo hevpeyvîna navbera Zîna Beko û Mem binêrin: War, Mem û Zîn, r: 67, 68, 69 û 70.

Xanî ji bo bavê Tacdîn dibêje:

“Babê wî, digotinê Skender

Lekîn Ereban digotin Xezenfer”³⁰⁰

Bazîdî jî dibêje: “Ji nav Cizîrê ji eşrafên begzadan û eyanan, Eskendar bi nav pehlewaneke zemanî hebû.”³⁰¹

Mînakek din:

Xanî radigihîne ku ew (Mem û Zîn) li Newrozê hevûdu dibînin, evîndarî hev dibin û ji tesîra wê evînê hişê wan ji serê wan diçe, weke ku dibêje:

“Ne fehm û xîret, ne aql ne hûş

Gerbûne li ser zebûnî, medxûş”³⁰²

Bazîdî jî wiha dibêje: “... Tacdîn û Memê ji kemala dereca mowedetê, xwe şimirandin û hisêbke bêhiş bûn.”³⁰³

Di berhema Xanî de Bekirê dergevan, buhtan û derewan li Tacdîn dike û ji mîr re dibêje nîyeta Tacdîn heye ku xuşka te Zînê bide Memê:

“Roja ku Sitî te daye Tacdîn

Wî ji aliyê xwe dayiye Memê, Zîn”³⁰⁴

Di çîroka Bazîdî de jî heman tişt heye: “Lakîn Mem kurê debîran e û çavê wî jî li Zînê ye û Tacdîn bi hisêbke xweser Zîn daye Memo.”³⁰⁵

Romana Ronî War û çîroka Hüseyin Gündüz dişibin tevna destana Memê Alan a Roger Lescot û jê sûd wergirtine. Mînak di romana War de, qala bajarê Mixribê û qala sê birayan "Zindiyan, Alan û Al Paşa" tê kirin ku Al Paşa wekî "siltanê bajarê Mixribê" tê nasandin.³⁰⁶ Di berhema Lescot de ew sê bira "Elî Begê, Emer begê û Elmaz begê" ne.³⁰⁷ Di romana War de derxistina hespê Bozê Rewan ji deryayê bi şeweyek efsanevî tê

³⁰⁰ Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, Weşanên Deng, Beşa 10'an 214, ç: 3, Stn., 2010.

³⁰¹ Mele Mehmûdê Bazîdî, Mem û Zîn, Weşanên Lîs, ç: 1, r: 24, Amed, 2007.

³⁰² Xanî, Mem û Zîn, beşa 14. r: 234.

³⁰³ Bazîdî, h.b., r: 28.

³⁰⁴ Xanî, h. b., r: 358.

³⁰⁵ Bazîdî, h.b., r: 32.

³⁰⁶ War, Mem û Zîn, r: 9 û r: 11.

³⁰⁷ Lescot, Memê Alan, r: 25.

gotin.³⁰⁸ Heman bûyer dîsa bi vegotinek serxwezayî di berhevoka Memê Alan a Lescot de cih digre.³⁰⁹ War di pexşana xwe de qala sê kewên qîzên mîrê cinan Tavbanû, Heyvbanû û Stêrbanû dike ku ew di berhema Lescot de jî cih digrin.³¹⁰ Aliyên hevbeş ên romana War û destana Memê Alan a Lescot ev in: Di berhema War de ji aliyê cinan ve veguhestina textê Zînê bo bajarê Mixribê cih digre,³¹¹ heman tişt di destana Memê Alan de wiha hatiye zimên:

"Textê Zînê rakirin, dane ser piyê cin û periyane,
Tevî wan çiran û meşalane,
Anîne bajarê Mixribiyane
Danîne di daîra Memê Alane."³¹²

Di berhema War de veguhestina gustîlkên Mem û Zînê heyê³¹³, di berhevoka Lescot de jî ev bûyer bi peyva "bi hev ra guhertin qaşê gustîrane" hatiye zimên³¹⁴. Di pexşana Ronî War de bav û ap, bo rêwitiya ber bi Cizîrê ve destûr didin Mem³¹⁵. Di pirtûka Lescot de jî Mem bo biçê Cizîrê destûr ji bav û apan digre.³¹⁶ Di pexşana War de Zîna keça Beko pêrgî Mem dibe³¹⁷, di destana Memê Alan de heman rastlêhatin li ber çem pêk tê.³¹⁸ Bûyerên din ên heta mirina Mem û Zînê di pexşana War de wiha rêz bûne: Serlêdana Mem li mala Hesên, Çeko û Qeretacîn li bajarê Cizîrê, çavpêketina Rihanê li Memê Alan û agahdarkirina Zînê, hevdîtina evîndaran a ewil, berteka Çeko li hember evîna Mem û Zînê, hevdîtina Mem û Zînê li qesra Mîr, agirvêxistina Hesên û hewara Sitîyê, girtina Memê Alan di qesra Mîr Ezîn de, mirina Mem a di zîndanê de, bi Mîr Şem re şandina şûr û cilên Mem li ser piştê Bozê Rewan ber bi bajarê Mixribê ve cih digrin.³¹⁹ Di destana Memê Alan a Roger Lescot de honandina van bûyeran bi

³⁰⁸ War, h. b., r: 21.

³⁰⁹ Lescot, h. b., r: 29-30.

³¹⁰ Bnr. di pexşana War a navborî de rûpela 28. û di berhema Lescot de rûpela 32.

³¹¹ War, h. b., r: 32.

³¹² Lescot, Memê Alan, r:33.

³¹³ War, h. b., r:41.

³¹⁴ Lescot, Memê Alan, r: 41.

³¹⁵ War, h. b., r: 53.

³¹⁶ Lescot, h. b., r:47.

³¹⁷ War, h. b., r: 63.

³¹⁸ Lescot, H. b., r: 51.

³¹⁹ War, Mem û Zîn, li gor rêza bûyeran binêrin li rûpelên 76, 95, 98, 102, 115, 125, 143, 152 (û 153) û 155.

heman rêzê pêk hatiye, lê van rûdavan bi şêweyek stranî, bi kafiye hatine gotin. Herwiha hejmara rûpelên du berheman jî pir ji hev ne cuda ne.³²⁰

Herwiha di "roman"a navborî a War de navên karakterên mîna Mîr Ezin, Beglî, Mîr Şem, Hesên, Çeko, Qeretacîn û Zîna Beko heman nav û karakter in ku di destana Memê Alan a Lescot de jî derbas dibin. Weke ku War hin aliyên destanê bi vîna xwe guhertiye, lê berhema manzûm vegerandiye şiklê pexşanê. Aliyên cihê yên pexşana navborî ji destana Memê Alan a Lescot ev in:

Alan, Al Paşa û Zindiyan sê navên xeyalî yê berhema War in. Di dawiya "romanê" de her sê birayên Celalî (Hesên, Çeko û Tajdîn) bi hev re Beko dikujin, lê di destana Memê Alan a Lescot de seba ku Mîr Ezîn bo kuştina Beko fîdye daniye, ji alî baxçivanekî ve ew tê kuştin. Di romana War de Beglî qet nayê Cizîrê, lê di destanê Alan a navborî de di dawiya berhemê de tê Cizîrê "sê şev û sê rojan di nava Cizîrê de dibe axirê dewrane!"³²¹ Di romana War de mirina Mem di zîndanê de ji qehr û kerban pêk tê³²², di Memê Alana Lescot de ew bi jehriya nava hinarê ku ji aliyê Zîna Beko ve hatiye amadekirin wefat dike.³²³ Di pexşana War de Mîr Ezîn dertê nêçirê di heman demê de Mem diçe cem Zîn³²⁴, lê di Memê Alan a Lescot de nêçir cih nagre, di dewsa wê de "çûndina şerê Eceman" heye, ev jî derewek Beko ye ku tê plankirin; ew dixwaze Mîr xwarinekê bide, ew jî "axûya Silêmanî" bike nava nanê Mem.³²⁵

Bi nêrînek gelemperî meriv dikare bejê ku Ronî War hin aliyên pexşana xwe ji Mem û Zîna Xanî an çavkaniyek nediyar girtiye, lê ji gelek aliyan ve rêza bûyeran şibandîye Destana Memê Alan a Lescot.

Aliyên çîroka Hüseyin Gündüz a bi navê "Mem û Zîn" ku dişibin Destana Memê Alan a Roger Lescot ev in:

Di çîroka navborî ya Gündüz de³²⁶, hevpeyvîna Şahê Cinan di dîwanê de bi cinan re heye û vê pîrsa wî cih digre: "Gelî cinan, di nava we de kî ji we du kesên li ser balgîfekî û hunkûfên hev dîtine?" Di çîroka Gündüz de: Nasandina bajarê Mixribê, Bozê Rewan ê ji deryayê derketî, veguheştina textê Zînê bo bajarê Mixribê odeya Memê Alan, guhertina gustîlkan û vegerandina Zîn bo Cizîra Botan, destpêka rêwitiya Mem û

³²⁰ Lescot, Memê Alan, li gor rêza heman bûyerên ku li jor hatine gotin, li rûpelên 68, 72, 86, 88, 125, 129, 137, 146 û 151 binihêrin.

³²¹ Lescot, Memê Alan, r: 153.

³²² War, Mem û Zîn, r: 152.

³²³ Lescot, Memê Alan, r: 146.

³²⁴ War, h.b., r: 111.

³²⁵ Lescot, Memê Alan, r: 114.

³²⁶ Gündüz, Kürt Aşk Hikayeleri, weş. Do, Stenbol, 2009.

Bengîn bo Cizîrê, mêvantiya Mem li mala Qeretacdîn, Çeko û Arif³²⁷, çûndina Mem bo Qesra Mîr Zeydîn³²⁸, pêrgîbûna du aşiqan, Mîr Zeydîn û Beko Memê Alan digrin nav xwe û jê dixwazin ew navê hezkiriya xwe bibêje, Mem li xwe mukur tê navê Zînê bi lêv dike, piştî rakêşî di nava wan de dertê, jivana Mem û Zîn, veşartina Zîn di bin ebayê de û agirberdana mala Qeretajdîn, leystika setrencê, fenokiya Beko û girtina Mem, derxistina Mem ji zîndanê û mirina wî, mirina Zînê li ser mezêlê Mem, efsaneya vejîna sitîriyekî li ser xwîna Beko di navbera mezêlê Mem û Zîn de³²⁹ cih digrin.

Gündüz jî mîna War hin aliyên pexşana xwe ji tevna Mem û Zîna Xanî girtiye û ji destana Memê Alan a Lescot dût ketiye. Mînak: Zîn xuşka Mîr Zeydîn e³³⁰ divê ya Mîr Ezîn bûya, kesên ku Mem li mala wan dibe mêvan Qeretajdîn, Çeko û Arif in³³¹ ku navên sê birayan di mesneviya Xanî de cih digrin, lê di destana Memê Alan a Lescot de navên Hesên, Çeko û Qeretajîn cih digrin. Mirina Mem a di zîndanê de jî piştî destûra zewaca wan a ji aliyê Mîr Zeydîn ve bi çavpêketina Zînê re pêk tê.³³²

Mixabin çavkaniyên taybet ên çîroka Gündüz û romana War nediyar in.

Cudahiyek eşkere di navbera veristina destana Memê Alan û tevna mesneviya Mem û Zîna Ehmedê Xanî de heye. Ji ber ku vegotinek çîrokî reng daye berhemê, lêkolîner Mem û Zîna Xanî bi tevayî wekî helbest nanirxînin. "Profesor Îzzetîn Mistefa Resûlê ku şirovekarê nûjen ê Xanî ye, Mem û Zînê mîna **çîrok-helbest** dibîne."³³³ Lescot jî ji bo Mem û Zîna Xanî dibêje "...Li ser hîmê çeşna **destanromanên** camiyê hatiye avakirin, ji ber vê yekê ji Memê Alan a gelêrî pir dût ketiye."³³⁴

Derbareyê malbata Mîr Zeydîn de M. Mahmûdê Beyazidî wiha dibêje: "Ji malbata Hizretî Xalid li Cizîre Mîr Zeynedîn hebû."³³⁵ Ev agahiya dîrokî balkêş e, lê rastiya wê cihê niqaşê ye. Balkêş e ku Beyazidî Mîr Zeynedîn wekî "ji taîfa kurmancên ereban ji silsîla hezretî Xalid" dide nasîn. Nasînek wiha ku kurd û ereban ji heman rehê dide nîşandan di waryantên din de nayê dîtin.

³²⁷ Cihê niqaşê ye ku ev sê kes di destana Memê Alan de cih nagrin, lê di mesneviya Xanî de cih digrin. Ev jî nakokiya vê çîrokê ye ku tevnek têkel pêk aniyê.

³²⁸ Navê Mîr Ezîn ê destana Memê Alan, li vir çima dibe Mîr Zeydîn, ev ne diyar e, sebaba niqaşê ye.

³²⁹ Gündüz, h. b., li gor rêza van bûyeran binihêrin li rûpelên: 81, 82, 84, 85, 88, 92, 93, 94, 96, 99, 101, 105, 106 û 107.

³³⁰ Gündüz, h. b., r: 82.

³³¹ Gündüz, h. b., r: 92.

³³² Gündüz, h. b., r: 105.

³³³ H. Mem, Mem û Zîn Îdeal, Memê Alan Destan Masal, Weşanxaneya Enstituya Kurdî ya Stenbolê, Stn. 2005, r. 27.

³³⁴ Lescot, Memê Alan, r: 15.

³³⁵ Cewerî, Antolojiya Çîrokên Kurdî, r. 42. Nivîskar dibêje ji taîfa kurmancên ereban ku ev peyv ne zanistî ye, ji ber û kurd û ereb du miletên cuda ne. Lê dibe ku bi zewaca jinan xînamîtiya wan pêk hatibe.

Di romana El-Bûtî de têkiliya çar kesan, Mem-Zîn û Tajdîn-Sitî ji rojeka Newrozê destpêdike. Di vir de şahê cinan û çar cinên ku hatine erkdarkirin bi tu awayî cih nagrin. Herwiha di çîroka M. Mehmûdê Beyazidî de jî cudahiyeke tune ye, du pexşan jî di riya Xanî nîşan kiriye de diherikin.³³⁶

Di du pexşanên navborî; berhema War û çîroka Gündüz de, Mîrê Cinan Zîn bi şev dibe cem Mem, demsal ne diyar e, eşîra du evîndaran eşkere nabe, hevdîtina wan ne rojek taybet a kurdan e. Lê di romana Bûtî de ne tenê roj, dem jî diyar e, wiha tê gotin: "Dema esirkî bû. Gel, ji bo bihara saleka nuh pêşwazî bikin, xwe ji oxirkirina 20ê Adarê re amade dikirin."³³⁷

Di "romana" War a li ser bingeha Destana Memê Alan de, roja hevnasîna Mem û Zînê ne diyar e, tenê dem şev e, Mem di xewek kûr de ye: "Memê Alan, siltanê kurdan jî di wê saeta şevê de ketibû xewek giran. Piştî ku textê Zînê yê razanê li odeya Mem ya razanê danîn, her sê xwehan xwe avêtin devê kulek û pencereya Memê Alan."³³⁸ Di vir de balê dikşîne ku nivîskar wekî Lescot peyva "siltanê Kurdan" bo Mem bi kar tîne, lê welatê ku Mem lê dijî, ango bajarê Mixrib ê kurdan e an na, ev yek ne diyar e. Di "romana" Bûtî de Sitî û Zîn du xuşkên xama ne, li qîsmetên xwe digerin, lewma dixwazin roja newrozê bi kincên mêran derkevin gerê. Ev pêşniyarî ji Zîn tê: "Tiştê ku em dê bikin ev e, westandina xwe bikin bahane, em dê xwe ji êla qesrê paşve bigrin. Gava qesr vala bû, em dê kincên zilaman li xwe bikin û bikevin nava gel."³³⁹ Lê di formata vegotina Memê Alan de (him di berhema Lescot, him di ya War de) Zîn tenê Mem dibîne, Sitî xuşka wê ya mezin e û bi Hesên re beriya hevnasîna Mem û Zîn zewicandî ye. Lewma di destana Memê Alan de Sitî pir nabe dostê derdê Zînê.

Di vegotina War de temenê Mem û Zînê nêzîkî hev e; Zîn sêzdeh e dikeve çardan, Mem jî panzdehan dikeve şazdehan.³⁴⁰ Di romana Bûtî de temenên çar ciwanên ku pêrgî hev tînin (Mem û Zîn, Tajdîn û Sitî) ne diyar in. Zîn û Sitî du xuşkên Mîr Zeydînê emîrê Cizîra Botan in. Di çîroka Hüseyin Gündüz de jî Zîn, weke dotmama Qeretajdîn (ne dotmama Hesên) tê nasandin.³⁴¹ Di pexşana (romana) War a ku bi tevna vegotina destana Memê Alan hatiye nivîsîn de tê diyarkirin ku: "Hungulîskên (gustîlkên) xwe bi hev guhertin. Li ser ya Mem, Memê Alan û li ser ya Zîn, qîza mîrê Cizîra Botan Zîna

³³⁶ Bi gelemberî li çîroka Beyazidî û romana El-Bûtî binihêrin.

³³⁷ El-Bûtî, Mem û Zîn, r. 19.

³³⁸ War, Mem û Zîn, r. 32-33.

³³⁹ El-Bûtî, h.b., r. 21. Di vir de nivîskar nîşeyek nivîsiyê, gotiye ku di rojên newrozan û pîrozbahiyên bi vî rengî de, lixwekirina kincên zayenda dîtir, di nava kurd û farisan de adet e.

³⁴⁰ War, h.b., r. 35-36.

³⁴¹ Hüseyin Gündüz, Kürt Aşk Hikayeleri (Çîrokên Evîni yê Kurdan), weşanxaneya Do, Stn., ç.2, r: 82, 2009.

Zêdan nivîsandî bû.³⁴² Ew demekê bi hev re, di odeya "Memê Siltan" de dimînin. "Sondek giran di nava hev de danîn. Bi soz û qerarê mêr û jinên berê sond xwarin. Mem ji situyê xwe hemayliya meqbûl danî û şûrê lahûr anî danîn navbera textê xwe û Zîna Zêdan û got 'em ê îşev mîna xuşk û birayan bi hev re rakevin. Gava bû sibeh, em ê bang li şêx, mele û alimên bajarê Mixribê bikin. Bi emrê Xwedê em ê mahra xwe bibirin!"³⁴³ Ev şevêk taybet e ku tu caran dubare nabe, piştê qet fersendek wan a wiha çênabe, heta mirinê êdî bi şev bi hev re namînin. Tajdîn û Sitî berê zewicandî ne, di serê vê waryanta efsaneyê de cih nagrin.

Di waryanta M. Mehmûdê Beyazidî de ku ew wekî çîrokek kurt hatiye amadekirin, bavê Tajdîn, Arif û Çeko eşkere dibe ku Eskender e. Lê ev karakter dernakeve pêş, rol nagre. Herwiha di heman waryantê de navê dadêya Sitî û Zîn wekî Mîzebûn Xatûn hatiye danasîn.³⁴⁴ Wekî tê zanîn digel ku ji heman tevnê hatiye girtin jî di romana Bûtî de ew Hayzebûn Xatûn e.³⁴⁵

Li gor vebêja Destana Alan a Lescot û War, Mîrê Cinan ew şev Zînê dîsa bişûnde tîne Cizîra Botan nava nivîna wê. Mem sibehê şiyar dibe û gustîlka tiliya xwe dibîne, bûyerê wekî xewnekê di bîr tîne, biryara şopandina Zînê dide. Hespê Bozê Rewan di vir de rol digre.

Di pexşanên li ser veristina destana Alan de, jiyaneke Mem li bajarê Mixribê heye, ew siltan e, diya wî ji Qureşiyana e (li gor pexşana Ronî War Têlî Eşyan e). Diya wî ewil dil nake ku kurê wê li pey Zînê biçê Cizîrê, lê piştê dixwaze ew gelek zêr û diyariyan bi xwe re bibe da herkes bizanibe kurê wê siltan e. Di dema oxirkirinê de ji Mem re duayan dike. Herwiha balkêş e ku navê diya Zînê ne diyar e. Bavê Memê Alan heta dema dawî jî naxwaze kurê wî ji mal biçê, di dema oxirkirinê de nifiran li kurê xwe dike.³⁴⁶ Gava ew û Bengîn dertên riya Cizîrê, Xocê Xizir pêrgî wan tê, dibêje vegezin, bi dîtina min, ji ber ku tu bi gotina dê û bavê xwe nakî, tu dê negihîjî meqsed û miradê xwe.³⁴⁷ Ger li encama efsaneyê were nêrîn, nifirên bavê Mem û ev pêşbîniya Xocê Xizir tê dibîranîn. Di waryantên mesneviya Xanî de ev cih nagrin.

Me li jor gotibû ku di Mem û Zîna pexşanên ji tevna Xanî de, Mem û Zîn di roja Newrozê de hev dibînin. Di pexşanên destana Alan de, Memê Alan û Zîna Zêdan piştî

³⁴² War, h.b., r. 41.

³⁴³ War, h.b., r. 40-41.

³⁴⁴ Firat Cewerî, Antolojiya Çîrokên Kurdî, weşanxaneya Nûdem, Stn. 2003, r. 44. (Beşa Mele Mahmûdê Beyazidî, Çîroka Mem û Zînê)

³⁴⁵ El-Bûtî, Mem û Zîn, r. 39.

³⁴⁶ War, Mem û Zîn, r. 50-54.

³⁴⁷ Gündüz, Kürt Aşk Hikayeleri, r. 90.

şeş mehên wê şeva hevdîtina li odeya Mem, cara ewil di rojeka biharê de, li nava baxçeyê bavê Zînê hev dibînin û Mem ji Zînê tasek ava ji Kaniya Gulan dixwaze: "...Gava ku meriv li dora wan civiyabûn, Zînê jî tevlî çardeh cêriyên xwe hat nav baxçe, bala xwe dayê çî komek mezin û giran li hev civiyane. Dît ku Memê Alan siwarê Bozê Rewan di nav komê de mîna heyva li çardehan diçûrise."³⁴⁸

Di roja yekem a li Cizîrê, Memê Alan Zîna keça Beko dibîne, keçik xwe wekî Zîna Zêdan dide nasîn, lê Mem jê bawer nake. Lewra gustîlka Mem pê re nîn e. Zîna Beko malbatên xuyanî yên vî bajarî bi Mem dide nasîn: "Kesên ku tên Cizîrê heke ji bo terbiye û talîmê hatibin diçin mala Mîr Ezîn. Heke ji ber heft dewêlên ecnebî fermanî û îdamî bin û di bin taqîbata mufrezeyan de bin diçin mala Hesên, Çeko û Qeretajdîn. Ger ew li fesadî û gelaciyê bigerin, ji bo her roj dozdeh gundan bera hev bidin û bixwazin rojê sed mêr werin kuştin, ew dê herin mala bavê min Bekoyê Ewan."³⁴⁹

Beriya vê tarîfê, Zîna Beko dibêje ya ku tu ji bo wê diçî Zîna Zêdan e dergistî û qelendayiya Çeko ye. Çeko van rojan amadekariya zewacê dike. Balê dikşîne ku beriya Mîrê Cinan Zînê bibe cem Memê Alan, Zînê bi dergistî ye.

Nirxandinek: Ev yek li dijî prensîbên zewacê yên civaka kurdan e. Tê dît ku Çeko reqîbê Mem e. Gava ku eşkere dibe ku dilê Zîn jî ji Mem re heye, Çeko li hev şaş dibe, bawer nake, dibêje: "Min digot qey gava Mem hatiye Cizîrê bi rê ve çav bi keçekê ketiye û dil girtiye. Ji ber ku ev şeş meh in Zînê ji hundur derneketiye, ne mumkûn bû ku ew keçik Zînê be."³⁵⁰

Zîna Beko di pexşanên ji tevna berhema Xanî de cih nagre, navê wê û tu rolek wê tune ye. Ger di berhema Bûtî û çîroka Beyazidî de Zîna Beko, Beglî, Hesên, Bozê Rewan an Mîr Şem rol bigirta, ev dê wekî nakokiya van berheman bihata nirxandin.

Cudahiyek din jî ev e ku di tevna berhema Xanî de sê bira Tajdîn, Arif û Çeko rol digrin, lê di waryantên pexşan ên Memê Alan de sê bira Hesên, Çeko û Qeretajdîn hene, lê Arif cih nagre. Lê di çîroka Gündüz de çima navê Arif jî tê zikiririn û navê Hesên cih nagre, cihê niqaşê ye, ev nakokiyek e ku nayê fam kirin.³⁵¹

Di vê pexşana War de Memê Alan, Sitiya jîna Hesên dişibîne Zînê (belkî ji ber ku xuşkên hev in).³⁵² Hesên Memê Alan ji aliyê namûsê ve diceribîne, lê dibîne ku Mem xwedîexlaq e, piştî dixwaze Zîna keça Beko ji Mem re bixwaze.³⁵³

³⁴⁸ War, h.b., r. 98.

³⁴⁹ War, h.b., r. 69.

³⁵⁰ War, Mem û Zîn, h.b., r. 102.

³⁵¹ Gündüz, Kürt Aşk Hikayeleri, r. 92, 96, 97 û 99.

³⁵² War, h.b., r. 92.

Memê Alan piştî soza biratiyê ji sê birayan digre, li mala wan dibe mêvan. Çeko ji bo xatirê vê mêvantiya wekî "biratiyê" dev ji Zînê berdide.

Sehneya kişikê:

Di romana Bûtî de sebaba leystika kişika ku Mîr û Mem şert datînin, wekî fesadiya Beko ku gotibû "Mem evîndarê Zînê ye, bila ev eşkere bibe" tê nîşandan. Lê di forma M. Mehmûdê Beyazidî de tê gotin ku gava Mîr li nêçîrê ye Mem û Zîn hev di baxçe de dibînin, hildikşin jor û li odeya qesrê bi hev şa dibin. (Di wariantên din de ew li nava baxçe ne.) Wê gavê ji nişka ve Mîr vedigere malê û Mem li odeya xwe dibîne, Mem şaş dibe, dikeve kelecane û tavi lê Zîn di bin ebyê xwe de vedişêre. Ev yek ji aliyê Beko ve tê zanîn, ew jî lewma pêşniyariya leystika kişika bi Mem re li Mîr dike. Piştî Mîr sê derban Mem têk dibe, doza eşkerekirina yara dilê wî dike. Leystika kişikê (setrencê) di hemî wariantên ku me lêkolîn kirine de û herwiha di Memê Alan a Roger Lescot de jî heye. Di çîroka Gündüz de tê gotin ku ewil Mem di leystikê de şeş derban bi ser dikeve, ger cara heftemîn jî bigre, Mîr dê têk biçê û xwesteka Mem bi cih bîne. Beko li serketina Mem dihesîne, bo rê li vê yekê bigre diçe qesrê û ji Zînê re dibêje rabe xwe bixemilîne û derkeve pencereyê temaşe bike, hindik ma Mem biserkeve, ew dê te ji Mîr bixwaze, dê daweta we li dar bikeve. Zîn xwe dixemilîne û dertê temaşeyê, Beko jî tê cem leystikê, bo berê Mem bikeve wê pencereyê ji Mîr re dibêje cihê xwe bi yê Mem biguhere. Piştî ew bi gotina Beko dikin, Mem têk diçe.³⁵⁴ Di pexşana (romana) War de sehneya kişikê cihê ye. Beko dibêje Mîr Ezîn: "Roja ku Hesên (balê dikşîne ku ew ne Qeretajdîn e) agir bi axurê xwe xist, te dît ku Memê Alan li odeya xweha te Zînê bû." Mîr bi vê gotinê bawer nake, lewma plana leystika kişikê dertê pêş. Tê gotin ku "Mem tu fersend nedida Mîr û sê dest jê birin. Mîr têk diçû!"³⁵⁵ Beko vê yekê dibîne, lê naçe qesrê û Zîn amade nake, jê re nabêje xwe bixemilîne, tenê ew dibîne ku Zîn li pencereyê rûniştiye. Wê gavê dibêje Mîr "siûda meriv bi cih tê", pêşniyar dike ku ew cih biguherin. Piştî cihguhertina du leystikvanan, berê Mem dikeve pencereya Zîn. Piştî "pir neajot, Mîr şeş dest ji Memê Alan bir û bi ser ket."³⁵⁶ Ev bûyer di destana Memê Alan a Lescot de jî cih digre. Balê dikşîne ku di çîroka Gündüz de Mem şeş dest bi ser ketibû.

Di Romana Bûtî de tê gotin ku evîna Mem û Zînê êdî li nava gel belav dibe. Ev gotegot diçe guhê Beko jî, rojekî ew ji Mîr re dibêje: "Ger begê min Mem vexwîne

³⁵³ Gündüz, h.b., r. 92, 93 ve 94.

³⁵⁴ Gündüz, h.b., r.101-102.

³⁵⁵ War, Mem û Zîn, r. 140.

³⁵⁶ War, h.b., r. 141.

leystika ku bi mahirbûna wê îftixar dike, dê wê demê hîn bibe ku ew gotegot çendîn rast in. Lê belê, divê tu şertê xwe deynî, kesê ku têk here divê xwesteka yê serketî bi cih bîne. Ew bi ser jî bikeve û têk jî here, gava begê min vê yekê jê bixwaze, ew dê mecbûr bibe eşqa xwe ya bo Zîna prenses eşkere bike."³⁵⁷ Mîr tê salonê, Mem vedixwîne ber maseya kişikê, dibêje "rabe, bi min re bileyize. Îşev di nava min û te de şer heye. Tu divê teqez tevlî bibî!" Piştî ku Mem bi tirs diçe ber maseya leystikê, beriya dest pê bikin, Mîr şertên xwe datîne: "Şertê me bila ev be, kî sê destan têk biçe, bila xwesteka kesê serketî bi cih bîne." Qeretajdîn û birayên xwe ne li eywanê bûne, kurekî Mîr Zeydîn hebûye bi navê Gurgîn ku hezkiriyê Mem bûye û ji evîna nava meta xwe û Mem jî agahdar bûye. Ji bo ku ew leystik nebe sebaba belayê, bi dizîka ji qesrê dertê û agahî dide Tajdînê dostê Mem. Tajdîn û du birayên xwe Arif û Çeko di demek kurt de digihîjin wir û li kişikê temaşe dikin. Di heman romanê de tê gotin ku "Mem du destan li ser hev zora Mîr dibe. Wan dê dest bi ya sêemîn bikira. Mîr bi heyrana zîrekî û bikêrhatina Mem bibû, Memê ku bi hemî hêza xwe dileyist, bextewariya rûyê xwe venediştart..." û di berdewamê de wiha tê gîtin "...Dema leystika sêemîn destpêkir, Zîna ku bi keçikên qesrê re di pencereya pişt Mem de li qewimînan temaşe dikir, bi ber çavê Beko ket. Beko bi kêf çû cem Mîr, got: 'Li gor prensîbên leystikê, begê min divê carna bi reqîb re cihê xwe biguhere.' Her du leystikvan, bêyî ji hîleya Beko agahdar bibin cih guhertin."³⁵⁸ Di encama wê leystikê de, Mîr pênc desteyan li ser hev zora Mem dibe û xwesteka xwe wiha bi lêv dike: "Hezkiriya dilê xwe bêje, ger ew hunkûfê te be, em dê hewl bidin we bextewar bikin." Mem hezkiriya dilê xwe dibêje, Mîr jî wî davêje zîndanê.

Di vê sehneyê de rola Girgînê kurê Mîr pir girîng e ku ew di wariantên pexşanên Memê Alan de cih nagre. Fermana pêşî ya Mîr "serjêkirina" Mem e, wê gavê Tajdîn û birayên xwe dertên meydanê û nahêlin xwîn birije.

Hespê Memê Alan: Navê hespê Memê Alan, Bozê Rewan e ku ew bi alîkariya tora masiyan ji deryayê tê derxistin. Di romana War de wiha tê gotin: "Memê Alan bi Beglî re xeber ji xalê xwe Emer Beg re şand. Piştî demek kin Emer Beg tevlî komek kal hat. Beglî jî tevlî hezar û pêncsed xortên kurdan xwe dan ben û werîsan. Ben û werîs kişandin, bû hufe hufa pêlan û çîrke çîrkê ben û werîsan, tor ji binê avê derket. Dîtin ku di şebekeya toran de cenewarekî ku dişibe hespan di xew de ye. Li eniya wî Bozê

³⁵⁷ El-Bûtfî, Mem û Zîn, r. 101.

³⁵⁸ El-Bûtfî, h.b., r. 102-103.

Rewan nivîsandiye. Mem nihêrî ku eynî wekî gotina wan rîspî û kalên wê rojê ye."³⁵⁹ Di çîroka Gündüz de derheqa Bozê Rewan de wiha tê gotin: "Memê Alan siwarê Bozê Rewan ê ku ji deryayê derketibû ye. Bozê Rewan jî ne karê henekan e, ew ne hespekî ji rêzê ye. Gelek taybetmendiyan xwe hene ku ew di hespên din de tune ne, di deryayê de jî dikare bijî. Mîna qertelekî di ser zinar û geliyan de dikare bifire. Ew hespekî wiha ye ku him diaxife, him dikene û him jî digrî."³⁶⁰ Di pexşanên Bûtî û Beyazidî de rola Bozê Rewan tune ye û bi tu awayî ew cih nagre. Sebeba vê yekê ew e ku, di mesneviya Ehmedê Xanî de jî erkek Bozê Rewan tune ye. Lê di çîrok û romanên ji honandina Memê Alan de kêma zêde qala Bozê Rewan tê kirin.

Ger di romana M. Seîd Remezani el-Bûtî de an di çîroka Mele Mahmûdê Beyazidî de Bozê Rewan rol bigirta, ev yek dê wekî nakokiyek van berheman bihata nirxandin.

Derxistina Bozê Rewan ji deryayê vegotinek mîtolojîk e mîna vegotina mîrê cinan.

Bihevrebûna Mem û Zîn:

Ev ne jivan e, lê bihevrebûnek rastlêhatî ye, di rojeka ku Mîr, peyayên wî û gelê qesrê diçin nêçîrê de pêk tê. Dîmenên vê sehneyê di hemî wariantan de dişibin hev (çi di wariantên destana Memê Alan û çi di wariantên tevna berhema Ehmedê Xanî de bin), lê bi her awayî ne mîna hev in. Bo vê sehneyê aliyên pexşanan ên hevpar ev in:

1-Di hemiyana de, di demek tenha ku Mîr û peyayên xwe ne li mal in an li nêçîrê ne de pêk tê.

2-Di dema hevşabûnê de, Mîr, Beko û kesên din ji nişka ve tîna nava baxçe (an odeyê), cihê ku evîndar li wir in.

3-Zîn xwe vedişêre, Mem jî bi hinceta nexweşiyê ji cihê xwe ranabe,

4-Mem Zîn vedişêre, piştî jî wê rewşa xwe ya tengezar hevalê xwe agahdar dike, hevalê wî Tajdîn (di destana Memê Alan de Hesên) bo Zîn di wê rewşê de neyê dîtin, mala xwe dide ber agir. (Di destana Memê Alan de kesê ku mala xwe dide ber agir, Hesên e.)

5-Di encama hemiyana de, Zîn ji wê pêşîrtengiyê bi saya wî agirî xelas dibe.

Bi gelemperî aliyên cuda yê pexşanan:

1- Di pexşana War de, fikra çûndina Mîr bo nêçîrê ya Hesên e, plansaziyekî çêdike, Mîr Ezîn dişîne nêçîrê da aşiq karibin biçin cem hev. Lê Beko dixwaze Mem jî bi wan re were nêçîrê. Lê Mîr dibêje "Li gorî ku ez zanim mêvanê Hesên hîna pir ciwan

³⁵⁹ War, Mem û Zîn, r. 24.

³⁶⁰ Gündüz, Kürt Aşk Hikayeleri (Çîrokên Evîni yê Kurdan), r. 82.

û delalî ye. Ji ber ku delalî rabûye û ji riyek dûr hatiye, tirsra min ew e ku ji ser pişta hespê bikeve, ew dê ji me re bibe eybek giran!"³⁶¹ Di vir de nakokiyek heye: Kesekî ku bi rojan li ser pişta Bozê Rewan ji bajarê Mixribê heta Cizîrê hatibe, çima bi çûndina nêçîrekî bi hêsanî ji ser pişta hespê bikeve?

2-Di çîroka Gündüz de ev sehne ne li nava baxçe, lê di odeya qesra Mîr de pêk tê:

"...Mem gava diçe malê xwe digihîne cem Zîn, di odeya wê de dikevin kêf û seyranê. Nobedarê ku datînin ber derî jî hay ji xwe namîne. Hespê Qeretajdîn nagihîje yê Beko. Gava siwarî yek bi yek dikevin hundur, Mem nizane dê çi bike, Zînê di bin ebayê xwe de vedişêre. Mîr jî tê odayê. Mîr di odayê de piyase dike, lê Mem ji ber wî ranabe. Qeretajdîn çav jê re dişikîne bo rabe, lê Mem jî bi îşaretan dide famkirin ku Zîn li pişt wî ye. Qeretajdîn dîsa bêçare dibe, ji birayê xwe Çeko û Arif re dibêje xwe bidin dora Mem da heta ji malê vegerim tiştêk neyê sera."³⁶²

Ji vir pê ve tê zanîn ku Qeretajdîn diçe cem jina xwe Sitî û paşê mala xwe dide ber agir.

3-Di romana Bûtî de jivana du aşîqan li çardaxê ye. Bûyer wiha tê ziman:

"...Her du evîndar hêj bi serxweşiya hatina cem hev, hemî dunya di çavên wan de winda bibû, ji bilî çardaxa nava baxçeyê li dorhêla wan tiştêk nedidîtin. Mefhûma demê ji ramanên wan derketibû, nizanibûn wext çewa derbas bûye. Mîr û peyayên xwe ji nêçîrê vegeyiran...

...Li aliyekî baxçe Tajdîn, du birayên xwe û Beko li piya bûn, Mîr westiyayî bû, digel peyayan ji bo hinekî aram bibe berê xwe da çardaxa ku Mem û Zîn li wir bûn. Evîndar ji her tiştî bêagahdar, di dema herî xweş a evîna xwe de, peyvên dilşahiye ji hev re digotin... Di wê gavê de, ew werqilîn, fam kirin ku çi li wir dibe, lê ji şaşmayînê di cih de sar bûn. Zîn ket bin kurkê Memo."³⁶³

Mem ji cih ranabe, Mîr li sebeba vê yekê dipirse, Mem xwe li nexweşî datîne, dibêje mecala min hebûya dê bi we re bihatama nêçîrê. Mîr avê dixwaze, Tajdîn diçe pêş, avê li herkesî belav dike. Gava dor tê Mem, ew bi destekî avê dirêjî wî dike, ji aliyekî ve jî bi awiran dixwaze rewşa wî ya heyî fam bike. Mem hêdîka destê xwe dike bin eba û serê keziyeka Zînê rê wî dide. Wekî tê zanîn lehengê ku mala xwe dide ber agir, di vê waryantê de ne Hesên, lê Tajdîn (an Qeretajdîn) e. Balê dikşîne ku nîşandana guliyê Zînê jî û belavkirina avê jî di hemî waryantan de tune ye.

³⁶¹ War, Mem û Zîn, r. 113.

³⁶² Gündüz, h.b., r. 98-99.

³⁶³ El-Bûtî, Mem û Zîn, r. 94-95.

Nakokiyek di romana War de heye ku di vê sehneyê de balê dikşîne. Dema Memê Alan ji ber Mîrê Cizîra Botan ranabe, rehên eniya Mîr radibin, çav mîna fincanên xwînê li serê wî sor dibin. Ji ber vê bêhurmetiya Mem, gava Mîr dikeve hundur silav nade wî, di dilê xwe de wiha dibêje: "Çiqasî bavê vî lawikî ji bavê min mezintir be jî, ez bi emrê xwe jê mezintir im, diviyabû ji ber min rabûya ser lîngan û hurmeta xwe nîşan bida. Ev çî bêedebiyek mezin e!"³⁶⁴

Pirs ev e: Li gora waryantê Mem ji bajarê Mixrib hatiye, Mîr Ezîn ne wî û ne jî bavê wî dinase, çewa dikare bêje "çiqasî bavê vî lawikî ji bavê min mezintir be jî..."? Mîr kengê û çewa temenê bavê Mem hîn bûye?

4-Veşartina Zînê ya bin kurk: Di romana War de, ne Qeretajdîn, lê Sitî bi Beko û Mîr re hildikişe qata duduyan (ne li nava baxçe). Sitî dinihêre ku Mem di nava kurk û ebayan de rûniştiye. Gava çavê Mem bi Sitî dikeve, guliyên Zînê di binê kurk de rê wê dide. Piştî Sitî mêtê xwe Hesên haydar dike, Hesên dibêje tu hesp û dewaran berde, ez dê agir berdim axur, tu jî here li Mîr Ezîn bike gazî û hewar, belkî em wî bi vî awayî ji wir rakin.³⁶⁵

Di waryantên din de ev karê şiyarkirinê û rakirina Mîr a ji odayê ne yê Sitî ye, yê Qeretajdîn e û Mem jî guliyê Zînê nîşanî Qeretajdîn dide.

Di romana War de, Beko dibîne ku Zîn ji bin kurkê Memo bazda, diqîre, lê deng naçe Mîr. Ew vê yekê piştî ji Mîr re wiha dibêje: "Heke tu bawer nakî, ez dê bi wî bidim gotin. Ew dê li xwe mukur were." Mesela pêşbirka kişikê piştî, ji bo Mem li xwe mukur were tê plankirin. Di dema ku Hesên, Çeko û Tajdîn diçin deverên dûr bo civandina bacê, Mîr vê fersendê ji dest bernade, kişikê li eywanê datîne.

5-Meseleya civandina baca ji eşîra Berazan: Ev yek di pexşanên War û Gündüz de heye. Bi pereyên bacê, qaşo dê avahiyên şewitî tekûz bikin. (Di romana War û çîroka Gündüz de.³⁶⁶) Lê di pexşanên ji mesneviya Xanî sûdgirtî û Memê Alan a Lescot de ev yek tune.

Di çîroka Gündüz de tê gotin ku rojekî Mem, Mîr û Beko li cem hev sohbet dikin, ji hev re dibêjin her kesek bila navê yara xwe bêje. Beko dibêje ya min Fatma ye, Mîr dibêje ya min navê wê Begîme ye. Ji ber ku Mem dengê xwe nake, Beko dibêje ya te satila mast li ser mila ye li çarşîya Cizîrê digere, kîja xort wê dibîne kevçiyek li mastê wê dixê. Wê gavê Mem hêrs dibe, dibêje: "Dosta min Zîn e, kekê wê Mîr Zeydîn e, ew

³⁶⁴ War, Mem û Zîn, r. 123.

³⁶⁵ War, h.b., r. 125

³⁶⁶ War, h.b., r. 132-133 û Gündüz, h. b., r. 101.

çêliya kevokê ye, apê wê jî Qeretajdîn e!” Gava Mem wiha dibêje Mîr çav ji peyayên xwe re dişikîne dibêje wî bigrin. Mem fersenda şûrkişandinê nabîne, tê girtin. Nûçe zûka digihîje Tajdîn û du birayan. Tajdîn û birayên xwe tî ew ji destê Mîr azad dikan.³⁶⁷

Di heman çîrokê de dîmena cengê heye, pir balkêş e, kurteya wê wiha ye:

"Mîr ferman derdixe, sibehê herkes digel siwariyên xwe derdikevin qada şer. Lê ji siwariyên Qeretajdîn tenê Mem dertê meydanê. Çardeh siwariyên Mîr dertên pêşberî wî. Mem her çardeh kesan dikuje. Piştî wan Mîr dertê. Tajdîn bang li Mem dike dibêje Mîr nekuje..."³⁶⁸

6-Şandina nameyê: Di vegotina çîroka Gündüz de, gava Mem davêjin zîndanê, hevalê wî Qeretajdîn û birayên xwe ji bajêr derketine, çûna civandina bacê. Zîn jê re nivînan dibe zîndanê, xwarin dide wî, baş lê dinihêre. Beko vê yekê dibîne, li cem Mîr gilî dike, Mem dişînin zîdanek din, ew li wir birçî dimîne. Zîn vê meseleyê di nameyekê de ji Tajdîn re dişîne: "Beko û Mîr Mem avêtine zîndanê. Nan û ava Mem di destê Beko de ye. Heke hûn di demek kurt de vegerin hûn dê bigihîjinê, an na Mem dê di zîdanê de bimre."³⁶⁹ Name jî, guhertina zîndanê jî, di waryantên din de cih nagrin. Di heman çîrokê de tê gotin ku Tajdîn digel birayên xwe û Bengîn tî ew ber qesra Mîr û şûrên xwe dikşînin. Mîr ditirse, ji Beko re dibêje çareyekê ji min re bibîne. Beko dibêje "Mîrê min, Mem û Zînê li hev mar bike, daweta wan li dar bixe."

7-Windabûna Mem: Li gor ku di romana War de tê gotin, Mem bîst û neh rojan windayî dimîne, kesek nizane ew li kuderê ye, Sitî û Zîn di xema wî de ne, Hesên û sê bira ne li Cizîrê ne, Zîn jî ne ji odeya xwe dertê, ne bi kesekî re dipeyive.³⁷⁰

Beko tê ber derê zîndanê, Mem diqehirîne, dibêje Zîn didin yekî din. Beko diçe cem Mîr, jê re wiha dibêje: "Heke her sê bira werin Mem di vî halê de bibînin dê nexweşiyek, teşqeleyek derê, a baş tu Zînê bişîne ber derê zîndanê, bila def û zirne lêkeve, bila ew ji Mem re bêje daweta me dest pê kir. Belkî bi vê nûçeyê ew were xwe. An na ew dê di zîndanê de bimre."³⁷¹

Di heman pexşanê de tê gotin ku Mem di zîndanê de dengê defê dibihîze, peyva Beko tê eqlê wî, dibêje Zînê didin yekî din. Diçe ber derî, li derve dinihêre, dibîne ku Zîn di serê govendê de ye. Di waryantên din de dîlan û dawet tune ye.

8-Wefata Mem û Zînê:

³⁶⁷ Gündüz, Kürt Aşk Hikayeleri, r. 96.

³⁶⁸ Gündüz, h.b., r. 97

³⁶⁹ Gündüz, h.b., r. 103.

³⁷⁰ War, Mem û Zîn, r: 148.

³⁷¹ War, h.b., r: 151.

Di her pexşanekî de mirina du lehengên efsanevî cuda ne. Di romana Bûtî de, xizmetkarek nûçeya nexweşiya Mem wiha digihîne Mîr: "Qerdiyanek ji bo agahdariya efendiyê me hat, dibêje Mem li ber mirinê ye."³⁷² Zîn bi bihîstina peyva "Mem" çavê xwe vedike, dilerize. Xwîna ber xwe ya li erdê dibîne... Mîr bi xuşka xwe re dipeyive, Zîn jî wesyetên xwe lê dike. Mîr wê gavê rewşa Mem a li zîndanê di bîr tîne, fermanek wiha dide yên li rex xwe: "Ji bo dîtina Mem niha bazdin zîndanê. Bila Zîn jî bi we re were. Bawer im ew ne di ber rih de ye. Ya xerîqî ye, ya jî êşê dikşîne. Mizgîniyê hêdî hêdî bidin wî, gava ew ji zîndanê derkeve, dê were xwe."³⁷³ Piştî ew çavê xwe vedike, çend peyvan bi Zînê re diaxife, bêdeng dibe û çavê xwe digre. Tê gotin ku çûka di qefesê de çewa bo derîvekirinê vir de wê de bêsebat çindik dide xwe û gava destek dirêjî wê dibe bi lezgînî difire, giyanê Mem jî bi lezgînî ji nava qefesa hestiyar a ku êşê dida wî wekî tiştê nebûbe veqetîya û firiya jor.

Di çîroka Beyazidî de mirina Mem wiha tê ravekirin: "Cewaba hatina Zînê mizgîn birin ji bo Memo. Lakîn çi fayde! Paşî çi? Beîde xerab el Besra. Her çi ye, Zîn hat û Mem dî û himbêz kirî. Wekî dest bi xeberdanê kirin. Memê jar derhal rûh be teslîm kir ji darê dinyayê axîretê îrtîhal kir."³⁷⁴ Di heman kurteçîrokê de tê gotin ku rojek bişûnde Zîn jî koç kiriye, "çûye dar el beqa"yê.³⁷⁵

Di pexşana (romana) War de dawîya jiyana du evîndaran wiha hatiye zimên:

"... Zîn radibe, gava ji hundur dertê, Beko ferman dide mitriban, humîn û gurmîn olan dide. Zîn di serê govendê de, desmal li ba dike, Mem dengê defê dibihîze, serî radike, baş guh didêre. Ji xwe re dibêje peyvên Bekoyê Ewan rast in, Zînê dane yekî din. Bedena wî ya ku hêz têde nemabû li ba dibe û dikeve erdê. Wê gavê govend dikişe ber deriyê zîndanê, Zîn di serê dîlanê de hey direqise. Gava çavê Mem bi Zînê dikeve, nema xwe radigre, reha dilê wî diqete, dikeve."³⁷⁶

Di berdewama bûyerê de tê gotin ku Zîn wê gavê xwe avêt ser Mem û li wir pela wê jî tevlî ya Memê Alan ji darê qetîya!

Di çîroka Gündüz a bi heman navî de hatiye destnîşankirin ku Mem di zîndanek kûr de ye. "Xizmetkar bo Mem werîs berdidin jêr, Mem xwe pê ve hişk girêdide û ew

³⁷² El-Bûtî, Mem û Zîn, r: 128.

³⁷³ El-Bûtî, h. b., r: 132.

³⁷⁴ Cewerî, Antolojiya Çîrokên Kurdî, r: 51.

³⁷⁵ Hevokên ji çîroka Beyazidî bi awayek resen hatine neqilkirin. Ger çewtî hebin, nivîskarê çîrokê berpirsiyar e.

³⁷⁶ War, Mem û Zîn, r: 152.

wî dikşînin. Gava Mem derdixin, dinêrin ku ew miriye..."³⁷⁷ Di vê kurteçîrokê de tê gotin ku piştî Zîn bang li kesên der û dorê dike, dibêje: "Xêrxwazno rabin! Bi bêr û bivîrên xwe ji Memê min re gorekî vekin. Memê min li nava mezelên şêran û merdan veşêrin." Piştî ew nifiran dike, dibêje ey çil melekên ser rûyê erdê! Dengê min bibihîzin. Ey çil melekên ezmanan! Dengê min bibihîzin. Piştî Memê min heta êvarê rihê min jî bistînin! Wê rojê gava dibe êvar, Beko ji Mîr re dibêje: "Gel ji ser mezelan hat, lê Zîn ji ser mezêlê Mem ranabe." Mîr û Beko bi hev re dîsa diçin nava mezelan, dibînin ku Zîn jî miriye. Mezelê wê jî li rex yê Mem vedikin, Zîn jî li wir teslîmî axê dikin.

9-Kuşîna Beko: Kuşîna Bekoyê Ewan di pexşanan de ji hev cuda hatiye nivisîn. Di romana War de bi kurteyî wiha ye: Hesen, Çeko û Tajdîn wê gavê vedigerin Cizîrê, dinêrin ku elaletek li ser mezelan heye. Sê Celalî fam dikin ku Mem û Zîn mirine, her sê bi hev re êrîşî Beko dikin, serê wî bi şûr jêdikin, xwîna wî dipijiqe nava tirba her du evîndaran.³⁷⁸

Di romana Ramazan el-Bûtî de tê gotin ku piştî mirina Mem, Tajdîn li nêzîkî qesrê di nava komêk meriv de Beko dibîne. Mîna tîrê xwe çeng dike ser û bi zeqema wî digre. Wiha bang li Beko dike: "... Ey kûçîkê har! Piştî ku min dostê xwe siparte axê, tu îroj bi çî rûyî li ser erdê dikarî bijî?"³⁷⁹ Piştî bi du destan Beko bilind dike heta texma sermilkê û bi hemî hêza xwe wî li erdê dide. Mêjiyê Beko bi vî awayî belav dibe û pêwendiya wî bi dunê ve qut dibe.

Gündüz di çîroka xwe de kuşîna Beko wiha neqil kiriye: Beko ew şev mezelan vedike Mem û Zîn dike mezelekî, sibehê jî tê ji Mîr re dibêje min xewn dîtiye ku ew di himêza hev de ne. Piştî çîrok wiha diherike: "... Diçin mezêl vedikin, lê dibînin ku ew ne di heman gorê de ne. Qeretajdîn şûr dikşîne, her çiqas Mîr dibêje 'Qeretajdîn, Beko nekuje, ew bo min girîng e. Ger ew here dê malê min jî here, qonaxên min jî dê herin', Qeretajdîn serê Beko ji nava milên wî tîne xwarê. Dilopek xwîna Beko ya li ser şûrê Qeretajdîn, dikeve nava mezêlê Mem û Zîn û mîna sitiriyek reş şîn tê."³⁸⁰

Mîr wê şevê xewnan dibîne, qulîkek di gora Zîn de tê ber çavan, sibehê diçe ser gora wan, diçe ser wê qulikê, li hundurê qebrê dinihêre dibîne ku wa ye destên du

³⁷⁷ Gündüz, Kürt Aşk Hikayeleri-1, r. 105.

³⁷⁸ War, Mem û Zîn, r. 153-154.

³⁷⁹ El-Bûtî, Mem û Zîn, r. 137.

³⁸⁰ Gündüz, Kürt Aşk Hikayeleri (Çîrokên Evîni yê Kurdan), r. 106.

evîndaran di hev de ye. Ji bilî waryanta Ronî War³⁸¹ di waryant û formên din de tiştek wiha mîstîk cih nagre.

Waryanta ku ji aliyê Ronî War ve wekî pexşan (roman) hatiye amadekirin û weşandin, ji gelek aliyan ve dişibe vegotina çîroka Hüseyin Gündüz ku me li jor qal kiribû. Her du vegotin jî bingeha xwe ji edebiyata devkî, destana Memê Alan digrin. Lê mixabin du nivîskaran jî çavkaniyên ku berhemên xwe jê girtine eşkere nekirine.

10-Aliyekî mîstîk yê efsaneyê: Di romana War de hatiye ziman ku ew şev Zîn çend caran tê xewna Mîr, dibêje: "...Keko dinêrim tu ji sedemî min fedîkar bûyî, nikarî derkevî nav gel. Ji bo tu evîna me ya rasteqînî bibînî, roja îne gava siwar derketin cirîdê, tu jî were nava mezelan, di navbeyna tirba me de bisekine, wê gavê tu dê nema ji min gazinan bikî."³⁸²

Di rûpela dawî a heman berhemê de qala bûyerek enteresan tê kirin: Mîr ew şev sê caran heman xewnê dibîne. Sibehê diçe nava goristanê di nava qebra Mem û Zînê de disekine, wê gavê qulikek bala wî dikşîne, xwe xwar dike, dibîne ku destên Mem û Zînê di hev de ne. Dengê ji Zînê tê: "Keko, te eşqa me her duyan bi çavên serê xwe dît?"³⁸³

Hesen, şûr û alavên din ên Mem bi pismamê xwe Mîr Şem re dişîne bajarê Mixribê. Di pexşana War de di derbarê vê yekê de wiha tê gotin: "Bozê Rewan ji tewlxanê derxistin, zîn û taxim lê kirin, cil, alav û şûrê Mem li ser terkiyan şidandin. Mîr Şem li Bozê Rewan siwar bû, hesp da ber zengûyan û berê xwe da bajarê Mixribê."

384

4.2. Dem û Cih

Dem û cihên vê efsaneyê, li gor du waryantan, Destana Memê Alan û Mem û Zîna Ehmedê Xanî û formên wan tîn guhertin. Di berhema M. Seîd Remezan el-Bûtî de hatiye diyarkirin ku bûyer P. Z. di sala 1393an de qewimîye.³⁸⁵ Lê li gor çîroka M. Mehmûdê Beyazidî di tarîxa "şeş sed û çend salekî Hicrî da"³⁸⁶ (Mîladî nêzîkî salên 1200) ev evîndarî û bûyerên pê ve pêk hatine. Di hemî waryantan de cihê evîndariyê û mirina Mem û Zîn li Cizîra Botan e, lê bajarê ku Mem lê dijî tê guhertin: Li gor Destana Memê Alan û formên wê, Mem ji bajarê Mixribê ye ku ew ji çîrokê tê famkirin li ber

³⁸¹ War, Mem û Zîn, r. 154-155.

³⁸² War, h.b., r. 154

³⁸³ War, h.b., r: 155.

³⁸⁴ War, h.b., r: 155

³⁸⁵ El-Bûtî, h. b., r: 9

³⁸⁶ Beyazidî, h. b., r: 42

deryayê ye, bi beden e û bi beza piyên hespê bi mehan ji Cizîrê dûr e. Ji ber ku "Mixrib" di wateya "Rojava" de hatiye bikaranîn, ev bajêr li rojavayê Cizîrê bûye. Hin şiroveker ew dişibînin Mersînê, hin kes dibêjin Stenbol e, hin kes jî dibêjin di nava axa kurdan de ye, ango dibe ku Wan be. Wekî tê zanîn di mesnevîya Ehmedê Xanî de Mem ne ji bajarek din hatiye, ji Cizîrê ye, katibê dîwana Mîr Zeydîn e.

Di destana Memê Alan de cihên ku bûyer lê derbas dibin; qesra Elî beg a (an Al Paşa) li bajarê Mixribê, deryaya ku Bozê Rewan jê derdixin jî li wê herêmê ye, lê kîja bajar e û kîja derya ye, ne diyar e.

Di formata mesneviya Xanî de cihê bûyeran navenda Cizîrê ye, qesra Mîrê Botan Birca Belek e, çol û çiyayên derûdorê ku wekî cihên nêçîrvaniyê tên bikaranîn hene, kuçe û kolanên Cizîrê, zîndana Mîrê Botan, çemê Dicleyê, baxçeyê qesra Mîr Zeydîn, eywan û dîwanxaneyê qesrê, ango cihê kişik lê hatiye leyistin, mala Qeretajdîn û axurên wî yên ku hatibûn şewitandin, qebiristana Cizîrê ku niha jî gora Mem û Zînê tê de cih digrin.

4.3. Encam û Nirxandin

Me di vê xebatê de çar berhemên pexşan girtine dest; du ji wan pexşanên dirêj ("roman") in, du ji wan çîrok in. Her çîrokek formek e û dişibe van pexşanan. Wekî tê zanîn efsaneyê evîna Mem û Zînê beriya mesneviya Ehmedê Xanî, bi navê Destana Memê Alan, di wêjeya devkî de cih digirt. Ew piştê derbasî nivîsê bûye. Hin aliyên van waryant û forman ên hevbeş û yên cihê me li jor anî ziman. Di hemî waryantan de dê û bavê Zînê û Mem rolek girîng nagrin. Di destana Memê Alan a Roger Lescot de tê zanîn ku Zîn keça **Mîr Zengîn**³⁸⁷ û xuşka **Mîr Ezîn** e û Mem kurê Elî beg e. Diya Mem ji Qureyşîyan e. Di romana Bûtî û çîroka M. Mehmûdê Beyazîdî de van navan ne diyar in. Cudahiyek van waryantan ev e ku, di waryanta Destana Memê Alan de Mem ji bajarê Mixribê ye, lê di waryantên ji tevna mesneviya Ehmedê Xanî de (di romana Bûtî û çîroka M. Mehmûdê Beyazîdî de) ew ji Cizîrê ye, katibê Mîrê Botan e.

Di waryanta Destana Memê Alan a Lescot de vegotinek mîstîk heye, şahê cinan bi şev Zîn dibin qesra Memo ya li bajarê Mixribê, ew hev dibînin, evîndarî hev dibin û gustîlkên xwe diguherin. Sitî û Tajdîn di vê sehneyê de cih nagrin, lê di waryant û formên mesneviya Xanî de çar kes (Sitî û Zîn, Mem û Tajdîn) roja Newrozê pêrgî hev dibin, gustîlkên xwe bi hev diguherin.

³⁸⁷ Lescot, h. b., r: 32.

Pirsek: Çima Mem Zînê ji xwe re dineqîne, çima Sitî dibe para Tajdîn, xusûsiyet çi ne, çi diqewime ku ew vê bijartinê bikin? Ev tenê rastlêhatin e? Di waryant û formên mesnevîya Ehmedê Xanî de, Mem û Tajdîn di kincên keçan de, Zîn û Sitî di kincên mêran de bûne. Mafir ku ew wekî keçan hatin dîtin, bo çi wan gustîlkan bi hev guhertin?

Heke di destana Memê Alan de pêwîstiya çûndina Cizîrê tune bûya, helbet dê pêdivî bi Bozê Rewan jî tune bûya. Lewma di tevna Xanî de ew hesp cih nagre, lewre di mesneviya Xanî de Mem ji Cizîrê ye, katibê Mîr e. Di destana Alan de Mem ji Mixribê ye, lê divê were Cizîrê, wê gavê amûrek bo neqilkirina wî divê. (Mîrê Cinan Zînê li ser baskê xwe neqil dike, lê bo Mem riyek wiha nafikire!) Amûrê neqilkirinê Bozê Rewan e ku bi vegotinek efsanewî ji deryayê tê derxistin.

Di "roman"a Ronî War de jî hatiye gotin ku “mîrê cinan gotiye du evdên Xwedê hene ku ji wan bedew û xweşiktir kesek tune ye, divê em wan bînin cem hev.”

Pirs ev e: Mîrê cinan çima keçika bi dergistî dibe qesra Mem?

Di heman "roman"a War de wekî li jor tê dîtin ku zarok ji malbata Mem re çênebûne, du apên wî jî nezewicîne. Bavê wî di temenek kal de dizewice, Xwedê kurek dide wî, ew navê wî Mem datîne. Ev yek taybetmendiya efsaneyên bi vî rengî ne. Mînak: Zal ji dê û bavê xwe tenê ye, albîno ye, bi salan jê re kur çênabin. Birayên Siyabendê Silivî jî tune ne, di zarotiya xwe de sêwî jî dimîne.

Balkêşiyek e ku Mîr Zeydîn bavîtî li xuşka xwe dike, lê ev paşê dibe eziyet û zilm. Mîna ap û amojina Siyabendê Silivî ku di zarotiya wî de tade û eziyetê lê dikan. Di "romana" Ronî War de sê bira Hesên, Çeko û Tajdîn Celalî ne, diya Mem Têlî Eysan ji Qureyşiyên e. Alan jî navê eşîrek kurdan e. Di çîroka M. Mehmûdê Beyazidî de malbata Mîr Zeydîn wekî ji binemaliya Xalîd Bîn Welîd hatiye nîşandan. Di romana Ronî War de Memê Alan, wekî kurê Al Paşa tê nîşandan. Cudahiyên mijarî û yên bi bûyeran ve girêdayî wekî din jî hene: Mem û Zîn dema li qesra Mîr bi hev şa dibin û Mîr û Beko ji nişka ve bi ser wan ve tên, Mem guliyên Zînê nîşanî Sîtiyê dide, Hesên mala xwe dide ber agir. Lê di waryantên din de Mem serê guliyên Zînê ji bin ebayê xwe derdixe û nîşanî Qeretajdîn dide, ew jî bo wan ji wê tengezariyê xelas bike, diçe agir bera mala xwe dide.

Nakokî û cihêfî him di nava waryantan de hene, him jî di nava formên cihê yên waryantekê de hene. Vegotina ku tê gotin Beko bi şev Mem û Zîn kiriye yek mezelekî û sibehê dibînin her yek ji wan di mezêlê xwe de ye, mîstîk e û serxwezayî ye. Di destan, efsane, kilaman de gotegotên bi vî rengî gelek hene. Di romana Ronî War de, Tajdîn û

birayên xwe beriya bûyer biqewimin bo civandina bacê ji Cizîrê dertên. Gava ew vedigerin, gel li ser mezelan dibînin, wê gavê li ser cihê mezelan niqaş di nava Mîr û Beko de hebûye, sê Celalî jî ji gotinên wan fam dikin ku Mem û Zîn mirine. Her sê bi hev re xwe davêjin ser Beko, şûr davêjin serê wî, xwîna wî dipijiqe nava tirba du evîndaran.

Di nava formên waryantekî de jî guhertin hene. Mînak di çîroka Hüseyîn Gündüz de, ji bo Mem navê Zînê wekî evîndara xwe eşkere bike, tu qeyd û şert nehatiye gotin. Piştî Mem navê yara xwe eşkere dibêje, Mîr emrê êrîşê dide peyayên xwe. Mem fersenda kişandina şûr nabîne, piştî xwe dide dîwêr. Qeretajdîn, Arif û Çeko tên hewara wî... Qeretajdîn dibêje: "Ey Mîr, Ey Beko! Mafir ku hûn ew çend mêr in, em dê niha birayê xwe Mem bibin malê, hûn jî amadekariya şer bikin û werin wî ji mala me bibin!.. Mîr ferman dide, rojek din sibehê herkes derdikeve meydana cengê. Şervanê Qeretajdîn tenê Mem e, lê yên Mîr gelek in. Çardeh mêrxas li hember Mem şer dikin, yeko yeko tên kuştin. Di encam de Mîr bi xwe dertê li hemberî Mem. Tajdîn nahêle Mem Mîr bikuje..."³⁸⁸

Ev ceng jî taybetmendiyek çîroka navborî ye û di waryant an formên din de em pêrgî bûyerek wiha nebûne.

Di "romana" Ronî War de beriya bi kişikê bileyzin Beko ji Mîr re qala bihevrebûna Mem û Zînê dike û dibêje sebaba şewata mala Sitîyê, xelaskirina Zîn a ji bin kurkê Memo bû. Ew bi kişikê dileyzin, kesê di kişikê de têk diçe (Mem), mecbûr dibe navê hezkirîya xwe dibêje.

Di çîroka M. Mehmûdê Bazidî de mirina Zînê wiha tê gotin: "Rojek piştî mirina Memo, Zîn jî koç dike, diçe ser dilovaniya xwe"³⁸⁹ Ev mijar di "romana" Ronî War de wiha cih digre: "Gava çavê Mem bi Zînê dikeve, nema xwe radigre, reha dilê wî diqete, dikeve. Kêlikê bişûnde Zîn derî vedike, cesedê Mem li erdê dibîne, xwe davêje ser, bi ser de dike qêrîn û hawar. Girî û zare zar belav dibe, Zînê careke din serê xwe ji himêza Mem ranake, ew jî li wir diçe ser dilovaniya xwe."³⁹⁰ Ew li zîndanê bi ser hev de dikevin û dimrin. Di çîroka Hüseyîn Gündüz de mirina Zînê wiha cih digre: "Dema herkes diçin malên xwe, Zîn li ser mezêlê Mem dimîne û li wir wefat dike. Dibe êvar,

³⁸⁸ Gündüz, Kürt Aşk Hikayeleri (Çîrokên Evîni yên Kurdan), r: 96-97.

³⁸⁹ Cewerî, Antolojiya Çîrokên Kurdî, c:1, r. 53.

³⁹⁰ War, Mem û Zîn, r: 152-153.

Beko dibêje 'Mîrê min, gel ji ser mezel hatiye, Zîn ji ser mezelê Mem ranabe.' Mîr digel Beko dîsa tê nava mezelan. Dibînin ku Zîn jî miriye."³⁹¹

Di çîroka Hüseyin Gündüz de nifirên Alan Paşa ji bo kurê xwe hene. Ji ber ku ew bi gotina wî nake, dibêje hevî dikim tu negihîjî meqseda xwe. Beko jî nifir dike û kîn ji Mem digre, ji ber ku Mem bi Zîna keça wî qayîl nabe. Di heman çîrokê de, Mem bera bîra zîndanî didin, lê Zîn her roj jê re xwarinan dibe, nivînan jê re dişîne, nahêle ew lawaz bikeve.³⁹² Gava Beko bi vê yekê dihise, Mîr hişyar dike. Cihê zîndanê jî diguherin û qesra Zînê jî. Ev hûngilî di waryant û formên din de tune ye. (Bîra zîndanî, bîra ku Bijen tê de hatibû dîlgirtin bila were dibîranîn.)

Di du pexşanên ku ji Destana Memê Alan çavkanî girtine de, çîrok bi awayek mîstîk hatine honandin. Mîrê cinan û sê cin rolek mezin dileyzin, herwiha hespê Mem Bozê Rewan jî mîtolojîk e, ji deryayê tê derxistin. Nediarkirina bajarê "Mixrib" jî, aliyê mîstîk ê waryantê zêde dike. Xocê Xizir wekî karakterek çîrokê rolek stero digre ser milê xwe ku ew di waryantên din de tune ye.

Wekî me li jor gotibû, di pexşana Ronî War de gava Zîn di bin ebayê Mem de bûye, di dîwanê de Mîr, Beko û xizmetkarên qesrê hebûne. Mem ji cih ranabe, di wê tengzariyê de guliyên Zînê nîşanî Sitî dide. Ev tevgera Sitî di tu waryant an forman de tune ye ku rola jina kurd a bi bizav tîne ziman. Di romana Ronî War de Mem bi dek û dolabên Beko dimre. Beko ewil ji Mem re dibêje Zîn bi yekî din re zewicîye. Bi vê fesadiyê ew dide bawerkirin. Ji Mîr û Zîn re jî dibêje daweta Mem û Zîn li ber derê zîndanê li dar bixin, bila Zîn bikeve serê govendê da kêfa Mem were, ew sax bibe. Gava dengê defê tê, Mem li derve dinihêre Zîn di serê govendê de dibîne, ji qehra ku wê dane yekî din dimre. Ev vegotin di waryantên din de tune ye.

Guhertina gustîlkan di hemî waryant û forman de cih digre. Navên karakterên ku Ronî War pêk anîye, cihê niqaşê ye. Navên mîna Al Paşa, Zindiyan, Mîr Tacîn ji kîja çavkaniyê hatine girtin an nivîskar bi xwe van navan afirandiye ev ne diyar e.

Du pexşanên vê efaneyê, berhema War û Gündüz ji formên wêjeya gel a devkî ne, jixwe berê hatine afirandin an nivîsîn, nivîskaran li gor şeweya xwe cardin nivîsîne. Berhema Ehmedê Xanî mesnevî ye, lê bûye çavkanî ji çîrok û romanên re. Dema van berheman li şeweyek din a wêjeyê tînan lihevanîn, hişmendiya "rastiyê" dertê pêş û pirsgrêk û nakokî di qada "şibandina berheman" de dertên. Tê dîtîna ku wêjeya devkî pir li romana modern nayê û herwiha "romanbûna" van berheman dibe mijara niqaşê.

³⁹¹ Gündüz, Çîrokên Evîni yê Kurdan, r: 106

³⁹² Gündüz, h. b., r: 102.

ENCAM

Di encama vê xebatê de hin xalên balkêş derketin holê.

1-Hemî efsaneyên evînê ji wêjeya devkî ya gel çavkaniyên xwe girtine, di zargotina kevn de bi cih bûne û bi piranî weke mesnevî, kilam an destan heta roja me hatine. Di encama vê xebatê de em dibînin ku ew weke pexşan jî di wêjeyê de cih digrin, hin ji wan bûne mijara wêjeya nûjen (roman an çîrok) jî. Ji aliyên hin helbestvanên klasîk ve wekî mesnevî hatine nivisîn, ji alî dengbêjan ve weke kilam jî tînin gotin. Mînak Şehnameya Fîrdewsî ya ku evîna Bijen û Menîce tê de cih digre mesnevî ye. Herwiha Mem û Zîna Ehmedê Xanî jî mesnevî ye, lê ji aliyê Mele Mehmûdê Bazidî ve wekî çîrok pêşkêşî xwendevanan bûye û herwiha ew wekî "roman" jî hatiye nivisîn.³⁹³

2-Lehengên van romanên bi piranî xwedî hesp in, hesp jî mîna kesayetan tînin qebûl kirin û ew bi nav û deng in. (Mînak Hedban, Demirqerê Xeybê an Deybilqiran, Şevreng, Xemrevîn û hwd.) Efsaneya hespan di nava kurdan de baş tê zanîn. Mînak ji bo efsaneya hespê Derwêşê Evdî tê gotin ku hespekî boz û mezin ji ezmanan dadikeve û bi mehîna bi navê Qemerê re tê cem hev, piştî vê bihevrebûnê Hedban çêdibe. Bizmarê nalê wî zêrîn, nal sipî ye.³⁹⁴ Ev vegotin, dişibe efsaneya hespê Memê Alan Bozê Rewan ku tê bawer kirin ew ji deryayê derketiye. Di dîroka folklorê kurdî de, nexasim di zargotinê de mirov leqay gelek navên hespan û mehînan tê. Her lehengek kurd xwedî hespekî taybet e û bi nav û deng e.³⁹⁵ Di efsaneyên evînê de hesp kesayet in, gava leheng bi hêz bin, neyarên wan hespê leheng ji xwe re dikin armanca êrîşê. Mînak Derwêşê Evdî di şer de nakeve, neyarên wî kemîn çêdikin, piyê Hedban di erda qulemişk de dişikênin. Di vir de Hedban leheng e, şervan e, lewma ewil ew dibe armanca êrîşê. Deybilqiran hespê Hesên Axa ye, Siyabend ew bi dest dixê, lê beriya vê, Xocê Xizir tê xewna Siyabend û Deybilqiran pêşkêşî wî dike. Aliyê mîstîk yê Deybilqiran ev e: Siyabend gava bi şev li bajêr dimîne, katibê Başbazirgan xerc û mesrefên dawetê jê re bi

³⁹³ Bnr. War, Mem û Zîn, Weş. Ava, Amed, 2011 û El-Bûtî, Mem û Zîn, Weş. Kent Işıkları, Stn., 2012.

³⁹⁴ Dr. Ömer Uluçay, Destana Derwêşê Evdî, Weşanên Dîwan, Stenbol, 2012, r: 185 û 249.

³⁹⁵ Çend navên hespên (canî, welaq, mehîn) bi zaravayê Kurmancî ku me ew tesbît kirine ev in: Gêjo (Hespê Bavê Fexriya), Rexşê Belek (Hespê Ristemê Zal), Sosik û Nijdî (Caniyên Kher û Kulik), Bilîcan (Diya Sosik û Nijdî, mehîna Mîrê ereban), Qereqeytan (Hespê Huseynê Kurd), Çîçek (Mehîna Elî Begê neviyê Kor Huseyn Paşa), Secra (Mehîna Mahmûd Begê Cizîrî), Xedra (Diya Secrayê), Kovê (Mehîna Bavê Lalo), Şevreng (Hespê Eliyê Mîrî kurê Silivî Beg), Şepala Şînboz (Mehîna Ehmed Beg), Şemlê (Mehîna Emer Axa), Deybilqiran (Hespê Siyamedê Silivî), Bozê Rewan (Hespê Memê Alan), Hedbên an Hidban (Hespê Derwêşê Evdî), Nîgar (Hespê Yadoyê Dimilî), Sîqal (Hespê Emînê Ehmed), Şevdiz (Hespê Keyxusrev), Şemlan (Hespê Serokê Eşîra Milan), Xemrevîn (Hespê Cembeliyê Kurê Mîrê Hekarî), Bozê Çaçanî (Hespê Feyzo Bavê Îpekê). M. Zahîr Kayan, Kovara Rewşen-Name, *Di Mitolojiya Kurdî de Moçikeke Xemlane û Bedew*: Hesp, Gulan 2003, Hejmar: 3, r:10

cih tîne, nîvê şevê bi dengê Deybilqiran şiyar dibe, heywan dihîre û pêkolîyê dike. Siyabend mîstîk difikire, dibêje tiştêk bi Xecê hatiye lewma Deybilqiran dihîre û nasekine. Gava ew vedigere cem Xecê, dibîne ku heft birayên wê hatine kuştin, Qeregêtran jî birîndar e.

3-Hin ji van lehengên evînê, di heman demê de lehengên gel in jî, lewma wêje jî ya gel e, ew şervan in, siltan in, pêlewan in an serokê civaka xwe ne. Mînak Derwêşê Evdî wekî şervanekî efsanevî yê kurd e, serokê şervanê kurdên eşîra Milan e. Ew bi cengnameya xwe tê nasîn ku navê xwe li destanê daniye. Destan an efsaneya Derwêşê Evdî li Rojhilata Navîn û Kafkasya jî wekî kilam tê gotin. Siyabendê Silivî jî bi mêrxasiya xwe, bi kuştina Hesên Axayê Şikakî tê nasîn. Memê Alan beriya li pey Zînê were Cizîrê, siltanê bajarê Mixribê bûye û bi eşîra Alan tê nasîn.

4-Li pêşîya van evînan astengî dertên, jixwe lewma ew dibin eşq, lê bextê hemiyar reş e, dawîya hemiyar bi neyînî xelas dibe. Lê îstîsna jî hene: Mînak Bijen û Menîce, piştî xelaskirina Bijen ji aliyê Ristemê Zal ve, bi hev re vedigerin Zabilistanê û dizewicin. Lê li vê dunyayê miradê Derwêş û Edûlê, Siyabend û Xecê û Mem û Zînê nabe. Rengên van astengiyan cihê ne; ew an malbatî ne, an jî bi hebûna evîndarek alternatîv pêşîya wan tê birîn. Bi piranî kesên ji malbata aliyê keçê li dijî evînan dertên. Di mînakên me girtiye dest de bavê Edûlê Zor Temir Paşa naxwaze keçê xwe bi Derwêş re bizewicîne. Pismamê Xecê Hesên Axayê Şikakî dibe kelem li pêşîya evîna wê û Siyabend. Herwiha bavê Menîce Efrasiyab evîndarê keçê xwe Bijen dike zîndana bîrê. Kekê Zînê Mîr Zeydîn jî li dijî bihevrebûna Mem û Zînê dibe neyarê herî mezin. Bi taybetî ji bo keçan carna namzetê zavayek din tê dîtin. (Mînak di efsaneya Memê Alan de Çeko, di efsaneya Derwêş û Edûlê de Îsoyê Mele Elî, di waryantek Bijen û Menîce de Atrîk Paşa, di efsaneya Siyabend û Xecê de Hesên Axayê Şikakî û hwd.)

5-Aliyêk din ê şibandina van efsaneyan heye ku kesên reqîb an xêrnexwaz bihevrebûna evîndaran naxwazin, giliyên wan dikin. Wekî ku li jor tê dîtin; Beko giliyê Mem û Tajdîn dike, selwanê deveyan giliyê Derwêşê Evdî û Edûlê li cem Temir Paşa dike, erebekî lêvdeqandî giliyê Siyabend û Xecê li cem Hesên Axayê Şikakî dike, Human giliyê Bijen û Menîce li cem Efrasiyab dike û hwd. Di pêşbirka kişîkê (setrencê) de Mem li xwe mukur tê, navê evîna xwe eşkere dike. Herwiha Derwêş jî piştî leystika merxeleyê, nav di xwe dide û dibêje "Ez Derwêş im, kilê çavê Edûlê me!" Peyva Derwêş ji alî pismamê wan Îsoyê Mele Elî ve tê bihîstin û ev yek ji paşayê Milan re tê gotin. Di efsaneya Bijen û Menîce de, Bijen nav di xwe dide: "Ez Bijenê Gêwê

Guhderz im, xwarziyê Ristemê Zal im!" Ev halana wî dibe sebaba gilîkirina li cem neyarên wî.

6- Xwekuştina evîndarên jin pir balkêş e. Li gor waryanta Qafqasyayê ya Derwêş û Edûlê, Edûlê piştî kuştina Derwêşê Evdî, radibe ser çokan, diqîre û bi hemû qeweta xwe xencer li ser sînga xwe dixê. Serê Edûlê dikeve ser cesedê Derwêş.³⁹⁶ Ev xwekuştin dişibe xwekuştina Xecê ya piştî mirina Siyabend ku ew jî xwe di gelfî de davêje. Herwiha Zîn jî li ser mezelê Mem digrî û ji kerb û kelewaca dilê xwe mirinê himêz dike, nema radibe. Ev jî cureyek xwekuştinê ye.

7-Rola dayikan di van efsaneyan de çî ye? Di efsaneyan de erkê dayikan ne li pêş e. Ew ya rolek biçûk digrin, an qet rol nagrin. Ev jî aliyê van efsaneyan ê hevbeş e. Seba ku çanda demî ya serdestiya mêran li ser jinan hukum kiriye, ev encam derketiye holê. Mêran nehiştiye jin bo ewladên xwe hewldanek bikin. Dayikên Edûlê û Derwêş di efsaneyê de qet rol nagrin, navên wan jî nayê zanîn, di stranan de kesek qala wan nake, di civatan de bêdeng in. Di zarotiya Siyabend de diya wî wefat dike, Xecê jî bêdê dimîne, tenê birayên wê hene. Diya Zînê kî ye nayê zanîn û ew jî erkê nagre, lê di waryanta Memê Alan de diya Mem (li gor waryantekî Têlî Eyşan e) li welatê Mixrib dimîne, gava Mem dertê ser riya Cizîrê ew jê re duayan dike, wekî din rolek girîng nagre. Gava Mem dimre, jixwe ew ne li Cizîrê ye, li bajarê Mixrib e, lewma nayê ser gora wî. Balkêş e ku di romana Bûtî de jî (di mesnewîya E. Xanî de jî), digel ku Mem di zîndanê de ye tevgerê balkêş a diya Mem tune ye. Dê û bavê Zînê jî qet rol nagrin, tenê kekê wê Mîr Zeydîn li pêş e. Îstîsnayek heye, ew jî diya Bijen e: Gava kurê wê di zîndanê de ye ew pir li kurê xwe digere, ji karwanan dipirse. Dayikek dilbiêş e, ev gera wê dibe sebeb ku cihê zîndankirina Bijen tê hînkirin. Lê diya Menîce qet bi pey keça xwe nakeve, nabêje çima ew bi kuçeyê ketiye an winda bûye.

8-Di gelek efsaneyan de aliyê keçê, ezmûn didin pêşiya kur (berzava), ger ew bi ser bikeve, bihevrebûna wan tê pesendkirin. Ezmûna Mem leystika bi setrencê ye, ger bi ser biketaya tê gotin ku Mîr dê destûra zewaca wan bidaya. Ezmûna Derwêşê Evdî vexwarina "Qahweya Şertê" û çûndina şerê Gêsan, Tirkmenan û Şemiran e. Ger di wî şerî de bi ser biketaya, dê Temir Paşa keça xwe Edûlê bidaya wî. Ezmûna Siyabend kuştina gakuwî ye, ger wî gakuwî serjêbikiraya, dê eşqa dilê Xeca evîndara xwe xurttir bikira. Ezmûna Bijen xweragirtina di bîrê de ye, xalê Bijen Ristemê Zal wî ji bîrê xelas dike, lewma Menîce pê re dizewice, her du bextewar dibin.

³⁹⁶ Uluçay, Destana Derwêşê Evdî, r. 141.

9- Amûra gustîlkê: Balkêş e ku di forma Zeynel Abîdîn Zinar de Siyabend, Xecê di xewna xwe de dibîne û wê gavê gustîlkên xwe bi hev diguherin. Ev sahne dişibe sahneyek efsaneya Mem û Zînê ku di Newrozê de dema Mem û Tajdîn Zîn û Sitî dibînin ji xwe ve diçin, Zîn û Sitî gustîlkên xwe û yên du xortan bi hev diguherin. Amûra gustîlkê weke alavek ragihandina û sadiqbûna evîndariyê di sê efsaneyan de; di Mem û Zîn, Siyabend û Xecê û Bijen û Menîce de cih digre. Weke di rûpelên berî niha de tê dîtin; di waryanta mesneviya Xanî de roja Newrozê Mem û Zîn, Sitî û Tajdîn, di waryanta destana Memê Alan de tenê Mem û Zîn li odeya Mem bi mebesta careke din hev bibînin, hev winda nekin, hezkirina wan daîmî be gustîlkên xwe bi hev diguherin. Di efsaneya Siyabend û Xecê de, piştî Xecê ji alî pismamê xwe Hesên Axayê Şikakî ve tê revandin, Siyabend bi pêrejinekê re di nava tasa şîr de gustîlk ji Xecê re dişîne qesra Hesên Axa. Ew bi vî awayî pêwendî bi Xecê re datîne û piştê wê xelas dike. Herwiha di evîna Bijen û Menîce de jî amûra gustîlkê bo ragihandinê tê bikaranîn. Gava Bijen di bîrê de ye û Menîce ji bo wî li kuçe û kolanan nan û xwarin dicivîne, pêrgî Ristemê Zal tê. Ristem bi Menîceyê re di nava nê de goştê tûtîkê û gustîlka xwe bo Bijen dişîne. Bijenê di bîrê de gava gustîlka xalê xwe Ristem dibîne, fam dike ku ew ji bo azadkirina wî hatiye.

10-Di efsaneyan de aliyekî efsûnî û baweriyê jî heye ku lewma wekî efsane hatine binavkirin (ev yek di şiroveya Roger Lescot ya li jor de tê dîtin). Mînak di efsaneya Mem û Zîn de, rîwayet e ku gava Tajdîn serê Beko jêdike, niqutek xwîna wî li nava mezelê Mem û Zîn dikeve. Her sal li cihê wê xwîna sitirîyek di nava du mezelan de şîn tê. Ev rîwayet dişibe dawîya efsaneya Siyabend û Xecê. Wekî tê zanîn Xecê piştî ketina Siyabend a bin gelî, ew jî xwe davêje. Her du li ser heman dara benîştokê dikevin û li wir jiyana xwe ji dest didin. Li gor rîwayetê her sal biharê, li ber serê mezelên wan du kulîlk şîn dibin û serên xwe bi alî hev de ditewînin, dema serê wan nêzîkî hev dibin, gakuviyek tê kulîlkan diqurmiçîne. Çewa gakuvi nahêle ew kulîlk bigihîjin hev, herwiha sitirîya bi xwîna Beko avdayî jî nahêle Mem û Zîn bigihîjin hev. Ev du vegotinên mîstîk in ku pir dişibin hev. Di waryanteka efsaneya Derwêş û Edûlê de di fîncana qahweya şertê de serê rawirên dirinde dertên, ev jî vegotinek efsûnî ye. Di waryantên efsaneya Bijen û Menîce de şervanên dêw hene ku di rastiye de ne pêkan in. Herwiha mefhûma "bîra zîndanî", xweragirtina di wê bîrê de sîd daye gelek çîrok û destanan. Kadri Yildirim di jêrenotekî de dibêje ku "di wêjeyên rojhilatî de cureya zîndana ku Bîjen tê de dîl girtine, wekî 'Çah-i Bîjen' (Bîra Bîjen) an 'Çah-i Erjeng' (Bîra Erjeng) tê

binavkirin."³⁹⁷ Di vir de tê dîtîna ku wate û sembola bîrê, wekî amûrek efsûnî di nava çîrokan de belav bûye.

11- Di efsaneya Mem û Zînê waryanta Memê Alan de Şahê Cinan dibêje: “Wan bigrin, bibin bajarê Cizîrê, li odeya Zînê serê wan deynin ser balgîfekî.” Cinekî temendirêj li hember vê xwestekê dertê, dibêje “me heta niha nedîtiye mêr li pey keçekê wiha dûr biçê! Zîn bibin odeya Mem, çêtir e!” Di vir de parastina mêran heye, zayenda jinê li paş tê hiştin. Wekî tê zanîn di dema niha de, di mijara zewacê û evînê de mêr li pey jinan diçin, wekî me li jor jî got bi ezmûnan ewil xwe bi wan û malbata wan didin qebûlkirin, ezmûnên bi vî rengî em di gelek çîrokên evînî de dibînin.

12- Di çîroka Mem û Zîn a forma Hüseyin Gündüz de Mem berdidin bîrê. Gava Zîn bi vê yekê dihise, jê re nivînan û xwarinan dişîne. Balê dikşîne ku heman tevger di efsaneya Bijen û Menîce de jî cih digre. Zîn jî mîna Menîce xizmetê ji evîndarê xwe re dike, kekê wê jî mîna bavê Menîce jê hez nake û li dijî evîna wê dertê. Wekî tê zanîn Menîce, Bijen di bîrê de bi nanê parsekiyê xwedî dike. Ew li kuçeyan digere, nan û xwarinê dicivîne, di quluka kevir de bera bîrê dide, Bijen bi vî awayî têr dike. Ev yek fedekariya jinê bo hezkiriyê xwe dide nîşandan.

13-Evîndarî hinek bi nepeniyê ve girêdayîye. Hevdîtîna û jivanên wan bidizî ne. Jivana Derwêş û Edûlê ya li Guhera Deveyan, dişibe sahneya Mem û Zînê a di nava baxçeyê Mîr Zeydîn de. Mîr Zeydîn di nava baxçe de beriya pêrgî du evîndaran were, Zînê dikeve bin ebyayê Memo. Gava Mîr tê, ji tevgera Mem dikeve şikê, lê beriya rewş were fam kirin, Tajdîn ji bo hevalê xwe Mem ji wî halî xelas bike mala xwe dide ber êgir. Piştî Bêko ji Mîr re rastiya meseleyê dibêje: “Di bin kurkê Memo de Zîn hebû, ew lewma ji ber te ranebû.” Mîr bawerî bi Bêko tîne û plansaziya pêşbirka setrencê tîne rojevê û di encama vê leystikê de Mem têk diçe, evîna xwe eşkere dike û tê zîndankirin. Li gor waryanteka destana Derwêşê Evdî, Mîr di dema jivana Derwêş û Edûlê ya Guhera Deveyan de bi hinceta destavê radike misîn û diçe derve. Bi çavê xwe dibîne ku Edûlê û Derwêş çûn nava deveyan. Di waryantekî de jî selwanê deveyan bihevrebûna wan dibîne, evîndar xwe ji selwan vedişêrin, lê mîna Bêko ew jî fesadiya Derwêş li cem Temir Paşa dike. Fermana malbata Êzidiyan piştî vê yekê dertê. Herwiha Bijen û Menîce li odeya Menîce ji aliyê Hûman (an Heman) ve tîna dîtîna, dengê wan tê bihîstin, Hûman Efrasiyab agahdar dike, Bijen didin girtin. Hûman rola Bêko û selwanê Mîrê Milan dileyze.

³⁹⁷ Yildirim, b.n., r: 288 .

14-Roman û çîrokên hatine lêkolînkirin, ji aliyê tama wêjeyî; afirandina sahneyan, şayesandina kesayetan, derûniya lehengan, saykolojiyê (psîkolojiyê), şayesandina xwezayê û hwd. ve ne wekî roman û çîrokên nûjen in, lewma em van berheman wekî "pexşan" bi nav dikin. Digel ku ew weke "roman" hatine binavkirin jî, ji ber ku bi "rastiya" dîrokî ku ew jî tê niqaşkirin û guhertin û bi vegotina wêjeya dengbêj û çîrokbêjan ve girêdayî mane, "roman"bûna wan bi arîşe ye û cihê niqaşê ye. Ji ber ku kesayet di wêjeya devkî de berê hatine afirandin, taybetiyên wan tên zanîn, romannûs kirûyek, rûdawek an kesayetek nûh nikare bi ser ve bike. Piraniya sahneyan (dîmenan) jî mîna hev in, an dişibin hev, li gor waryantan zêde nayên guhertin. Mînak di Efsaneya Derwêş û Edûlê de jivana wan ya li Guhera Deveyan di du romanên mînak de jî cih digre û pir nayê guhertin. Herwiha hevaltiya Eferê Gêsî û Derwêş, axaftina wan ya beriya şerê Edçanê, alîkariya Zuhre Xatûna xuşka Efer bo Derwêş, şikestina lingên hespê Derwêş Hedbên, evîna Evdê Milhim û Rehîma xuşka Temir Paşa, sahneya vexwarina "qahweya şertê" ev hemî di waryantan de, di kilam û çîrokan de berê cih girtine. Lewma romannûsan jî ew neguhertine. Herwiha pêrgîbûna Mem-Zîn û Tajdîn-Sitî ya roja Newrozê, veguhestina gustîlkên wan, bihevrebûna Mem û Zîn a li nava baxçeyê Mîr Zeydîn, veşartina Zîn a bin kurkê Memo, şewata mala Tajdîn, sahneya leystika setrencê û mukurhatina Memo bo evîna Zînê pir nayên guhertin. Di waryanta Destana Memê Alan de rola Mîrê Cinan, birina Zînê bo odeya Memo ya li welatê Mixrib jî bi şeweyek din an dîmenek din nayê nivisîn. Erka Beko ya di vê efsaneyê de jî nayê guhertin, nabe ku romannûs kirasê kesayetek din li Beko bike. An Memo bike dewsa Beko, Zînê bike dewsa Sitîyê, Tajdîn bike Mîrê Botan. Ev yek taybetmendiya berhemên qlasîk e. Derûniya Mem, fikir û ramanên Zînê, hêrs, dilşahî, bi xwe axaftin, hûrgilî û kêliyên kurt ên jiyana rojane û dîyalogên lehengan ne mîna yên romanên nûjen in. Kesayet ne li pêş in, bala xwîner li ser herikîna bûyeran e. Roman cureyek nivîsevaniya sedsala bîstan e, lewma çîrok, destan, mesnevî dema bi vê cureyê tên nivisîn, serketiniya wan berheman tê niqaşkirin. Pirsgirêk di şeweya "romanbûna" wan de dertê holê. Romannûsên van berheman ji aliyê mijarê ve ne azad in.

15-Di hin efsaneyan de kesayetên metafîzîk hene. Mînak: Xocê Xizir û Mîrê Cinan. Mînak di waryanta Memê Alan de dema Mem li riya Cizîrê digere, Xocê Xizir tê pêşiya wî. Herwiha di efsaneya Siyabend û Xecê de Xocê Xizir tê xewna Siyabend, dibêje tu dê bibî xwediyê hespê Deybilqiran, Qedegêtran jî dê bibe destbirakê te. Mîrê Cinan ferman dide ku Zînê bibin bajarê Mixribê, bikin odeya Memê Alan. Di efsaneya Siyabend û Xecê de bi navê Erezbincîr şervaneka jin cih digre, bi Siyabend re şer dike,

piştire ji nişka ve winda dibe, tê hînkirin ku ew keça Mîrê Cinan bûye. Van lehengên mîstîk çîrokan dixemilînin û balkêşiya wan zêde dikin.

16-Di piraniya van efsaneyan de lehengên mêr ewil tên kuştin an dimrin, piştire yên jin an hevalên leheng li pey wan dimrin an jî xwe dikujin. Di çîroka Hüseyin Gündüz a waryanta Memê Alan de, piştî Mem dimre Bengîne hevalê wî li ser mezel wiha dibêje: "Ey Mem, bila piştî te dunya li min heram be!" û şûrê xwe li ser dilê xwe dixê.³⁹⁸ Ev jî fedekariya hevaltiyê dide nîşandan ku ev yek di tevgera Tajdîn de jî cih digre. Lewra bo hevaltiyê mala xwe dişewitîne. Di sê mînakên li jor de, ewil Derwêşê Evdî di encama şerekî de tê kuştin, Edûlê li pey wî xencer li ser dilê xwe dixê³⁹⁹. Di mînaka duem de Siyabend bi hewldana lingê gakuwî di gelî re wer dibe, Xecê xwe li pey wî davêje. Di efsaneya Mem û Zîn de Mem ewil di zîndanê de dimre, Zîn tê li ser mezelê wî ji kerb û keser û êşa dil jiyana xwe ji dest dide. Ev yek balkêşiyek e bandora civaka pederşahiye (maskulîzm, ataerkîl) li ser van efsaneyan dide nîşandan ku mêrxasî, qehremanî û fîdekariya ji bo evîne an nirxên civakî ewil bûye para mêran.

17-Efsaneyek evîni çiqas li nava gel belav bibe û li civatan û şevbêrkan were gotin, ew çend bingeş û reseniya xwe winda dike û dibe xwediyê gelek waryantan. Efsaneyên mijarcuda çiqas li şevbêrkan û civatan werin gotin, ewçend dişibin hev, aliyên wan ên hevpar zêde dibin.

18-Evîna efsaneya Bijen û Menîce ku heta niha di qada nivîskî de bi zaravayê kurmancî nedihat nasîn, wekî ku li jor tê dîtin ji gelek çîrokbêjan û berheman hatiye girtin, xwendevên dikare çîrokan birawirdî hev bike. Waryantên çîrokbêjên ji herêmên cihê, di vê babetê de xwendevên digihîne encameka têgihîştî.

19-Hin pexşanên van destan an efsaneyan hene ku ji devên dengbêjan, ji mesneviyan an çîrokbêjan hatine girtin û di wan de tu guhertin nehatiye kirin, tenê navê "roman" an "çîrok"an li wan hatiye danîn û hatine çapkirin. Mînakên wiha divê mîna "waryant" neyên nirxandin û qebûl kirin.

20-Di hin pexşanan de çîrokbêj lehengan tînin gund û bajarên ku çîrokbêj lê dijî. Bi mebesta ku çîrok an destan ji aliyê guhdêr ve baş were fêmkirin û bi balkêşî were guhdarîkirin bûyeran û sehneyan li welatê xwe dane jiyîn. Mînak di waryanteka çîroka Mala Zalê de gava qala evîna Bijen û Menîce tê kirin, çîrokbêj lehengê xwe di Pira

³⁹⁸ Gündüz, Kürt Aşk Hikayeleri-1 (Çîrokên Evîni yên Kurdan), r. 106.

³⁹⁹ Uluçay, h.b., r. 141.

Dehderî û Derê Mêrdînê yê Amedê re derbas dîke.⁴⁰⁰ Di vir de helbet hişmendiyek zanistî tune ye, guhdêr an xwîner dizanin ku leheng li Amedê ne jiyane û bûyer jî li hêla Îranê rûdane.

-----DAWÎ-----

⁴⁰⁰ Hilmi Akyol, Mala Zalê, Weşanên Enstituya Kurdî ya Amedê, r: 44-57, Amed, 2006. (Ji vegotina çîrokbêj Şakirê Mecîd ji gundê Melefeyata ye ku bi ser navçeya Bismil ve ye).

ÇAVKANÎ (BÎBLİYOGRAFYA)

- 1-Ahmedzade, Haşîm, Ulus ve Roman (Roman û Netewe), Weşanxaneyaya Perî, Stn., 2004.
- 2-Akyol, Hilmî: Mala Zalê, Weşanên Enstituya kurdî ya Amedê, ç.1, Amed, 2006.
- 3-Aras, Ahmet: Siyabend û Xecê, ç.1, Weşanên Pirtûkxana Ülkem, İzmir, 1993.
- 4-Beyazidî, M. Mehmûd, Mem û Zîn, Weşanên Lîs, Çapa Yekem 2007.
- 5-Bulut, Faîk, Xanî'nin Kaleminden Kürtler'in Bilinmeyen Dünyası (Ji Pênûsa Xanî Dinyaya Nepen a Kurdan), Weşanxaneyaya Berfîn, 2011.
- 6-Celîl, Ordîxan-Celîlê Celîl: "Siyabendê Silivî û Xecê" Destanên Kurdî, Weşanên Zel, Stenbol, 1994.
- 7-Cewerî, Firat, Antolojiya Edebiyata Kurdî, Beşa "Çîroka Mem û Zînê" a Mele Mahmûdê Beyazidî, Amadekar: Firat Cewerî, Weşanên Nûdem, Cîld: 1, Stn., 2003.
- 8-Cindî, Heciyê-Emînê Evdal: Folkloru Kurmancan, Weşanên Avesta, Stenbol, 2008.
- 9-Çelîk, Amer: Derwêşê Evdî-Destan, Weşanên Wezaretî Roşenbîrî û Lawan, Hewlêr, 2011.
- 10-Çolemêrgî, Îhsan, Cembeliyê Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanxaneyaya Avesta, Stn., 2001.
- 11-Dara, Dilbixwîn, Felsefeya Ehmedê Xanî, Weşanên Enstituya Kurdî ya Berlîn, Berlîn, 1995.
- 12-El-Bûtî, M. Said Ramazan, Mem û Zîn, Weşanên Kent Işıkları, ç: 5. Stenbol, 2012.
- 13-El-Bûtî, M. Said Ramazan, Siyamend û Xecê, Weşanên Kent Işıkları, Stenbol, 2011.
- 14-Erdem, Hüseyin: Siyabend ile Xecê, ç:1, Weşanên Belge, Stenbol, 1990.
- 15- Farqînî, Zana, Ferhengê Tirkî-Kurdî, Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, Stn, 2000.
- 16-Ferat, Bawer: Dermansız Sevda Derwêş ile Edûle (Sewdaya Bêderman Dewrêş û Edûlê) Weşanên Yurt, ç:1, Enqere, 2009.
- 17- Fîrdevsî, Şehname, Weşanxaneyaya Wezaretê Perwerdehiya Netewî, werger: Necatî Lugal, Stenbol, 1990.
- 18-Gündüz, Huseyin: Kurteçîrokên Evînî yê Kurdan-1 (Kürt Aşk Hikayeleri-1), Weşanên Do (Mîr), ç: 1, Stenbol, 2009.
- 19- İzolî, D. Ferheng, Weşanên Deng, Stn. 1991.
- 20-Karasevda, Necdet, Mem ile Zîn (Mem û Zîn), Weşanxaneyaya Erguvan, Stenbol, 2008.

- 21-Kayan, Zahir, Di Mîtolojiya Kurdî de Moçikeke Xemlane û Bedew: Hesp, Kovara Rewşen-Name, Gulan 2003, Hejmar: 3, r: 10
- 22-Kemal, Yaşar, Üç Anadolu Efsanesi (Sê Efsaneyên Enedolê), Weşanxaneya Adam, ç: 9., Stn., 2002.
- 23-Kiran, Eyup, Derwêşê Evdî, ç: 2, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2011.
- 24-Kizilkaya, Muhsîn, Kayip Dîwan (Dîwana Winda), Weşanên Îletîşîm, Stenbol, 2000.
- 25-Lescot, Roger, Memê Alan, Weşanxaneya Avesta, ç:3, Stenbol, 2013.
- 26-Mem, H., Mem û Zîn Îdeal Memê Alan Destan Masal, (Mem û Zîn Îdeal e, Memê Alan Çîrok û Destan e) Weşanxaneya Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2005.
- 27-Mem, H., Xanî ve Memzaları (Xanî û Memzayên Wî), Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2013.
- 28-Mem, H., Xanî'den Mem'e Bir Buket Çiçek (Ji Xanî Bo Mem qevdek Kulîlk), Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 1999.
- 29-Mem, H., Mamosteyê Sêemîn Xanî, wergêr: Zana Farqînî, Weşanên Êkitiya Nivîskarên Kurd -Duhok, Duhok, 2006.
- 30-Mukrî, Muhammed, Efsaneya Bijen û Menice (Versiyona Populer a Kurdistana Başûr), Weşanxaneya Centre National, Belavkirin: Librairie Klincksieck (Paris), 1966.
- 31-Nenyasî, Mihemedê, Antolojiya Dengbêjan, Weşanên Şaredariya Bajarê Mezin A Diyarbekirê, Stenbol, ç: 2, 2011.
- 32-Osman, Îbrahîm, Evîna Merxasekî, Weşanxaneya Lîs, Amed, 2008.
- 33-Polat, Edîb: Ristemê Zal, Weşanên Evrensel, ç:1, Stenbol, 2007.
- 34-Resul, Îzeddîn Mustefa, Ehmedê Xanî (Şaîrun ve Mufekkiren ve Feylesûfen ve Mutesevvifen) wer. Kadrî Yildirim, Weşanxaneya Avesta, Stenbol. 2007.
- 35-Semend, Siyabedov: Siyabend û Xecê, Weşanên Hîvda, Stenbol, 2008.
- 36-Şîraz, Hovhannes, Sîamento û Xecêzare (Romana Cimaeta Kurmanca û Ermeniya), wergêr: Casimê Celîl û R. Drambian, weşanên Neşra Hukûmata Ermenistanê, 1936.
- 37-Uluçay, Ömer: Destana Derwêşê Evdî, ç:1, Weşanên Dîwan, , Stenbol, 2012.
- 38-Uluçay, Ömer: Siyabendê Silîvî, ç:1, Weşanên Gözde, Edene, 2010.
- 39- War, Ronî: Mem û Zîn, ç:1, Weşanên Ava, Stenbol, 2011.
- 40- War, Ronî: Siyabend û Xecê, ç:1, Weşanên Ava, Stenbol, 2011.
- 41-Xanî, Ehmedê , Mem û Zîn, Weşanên Deng, ç: 3, Stenbol, 2010.
- 42- Xanî, Ehmedê, Mem û Zîn, Weşanxaneya Hasat, Stenbol, 1990.

- 43-Varli, Ebdulah M., Dîwan û Jîneweriya Ehmedê Xanî, Weşanxaneya Sîpan, Stenbol, 2004.
- 44-Yalsızuçanlar, Sadık, Mem ile Zîn (Mem û Zîn), Weşanxaneya Tîmaş, Stenbol, 2001.
- 45-Zinar, Zeynelabîdîn: Siyabend û Xacê, Weşanên Pencinar, Stockholm, 1992.
- 46-Zîlan, Reşo-Serdar Roşan, Destanên Kurdî, Weşanxaneya Weqfa Kurdî ya Kulturî li Stockholmê, Swêd, 200?.

PÊVEK I

Ji devê Edûlê waryantek strana ku li ser Derwêşê Evdî hatiye gotin

Liyan e liyan e egîdo dilê min liyan e,

Şêro dilê min liyan e,

Erebê çîpê oryan e, ketiye wêşê konan e.

Urîna, zûrîna vî erebî, mîna gurê serê çolan û çiyane,

Liyan e, liyan e. Axayê Milan digot: Erebo çima derdê te pir e, kulê te giran e?

Eger te jin revandiye, ez dê bidim qalindê bavan e,

Eger te mêr kuştiye ez dê bidim xwîna wan e,

Te terş û talanê xelkê biriye, ez bidim lokê devan, borê miyan e.

Wêl wêl... Wî erebo.

Wêl egîdo dilê min liyan e wêl liyan e,

Çiyayê Şengalê reîsê çiyane,

Deşta Heranê gul û sosin û çîçekan xwe daye çokê devane,

Erebê çîpê oryan e, ketiye qêyşa qîz û bûkan e,

Xwe berdayê nava konê axayê Milan e,

Axayê Milan digot: Erebo çima derdê te pir, kulên te giran e,

Digot bila canê axayê min ji min ra sax be li darê dunyayê,

Ne min jin revandiye tu bidî qalindê bavan e,

Ne min mêr kuştiye tu bidî xwîna wan e,

Ne min terş û talanê xelkê biriye, tu bidî lokê devan borê miyan e,

Jê ra dibên Îbrahîmê Çîl ê tirkane,

Eskerê xwe top kiriye, ketiye bajar û gundan e,

Dibê ez dê sibehê bajom ser konê axayê Milan e,

Konê reş ê erebî bidim ber şûran e,

Erz û namûsê bikim pênc quruş û çar peran e,

Bi çepilê qîza wî Edûlxanê bigrim bavê payê çît û perdan e,

Erz û namûsê ji wan bixim nav lingane,

Yar yar... egîto yar,

Wêl egîto dilê min liyan e, wêl liyan e,

Heçî kalan riyên xwe mizdane,

Heçî xortan, simbêl devê wan de şikiyane,

Qertekî dagirtin ber xwe erd kolan e,

Evdo wa yê li nava şekalan, dewsa solane,

Got: Gelî kalan we çima riyên we mizdane?
Gelî xortan çima simbêlên we şikiyane?
Çi giraniya Îbrahîmê Çîl ê tirkan heye, bila temamî li ser milê min ê han e,
Yar yar... egîto yar,
Wêl egîto dilê min liyan e,
Wan çepikên xwe li hev xistin bi Evdo keniyane,
Digotin: Evdo lawo eslê te Êzîdî ye, pîrê Şeytan e,
Emrê te çûye heftê û pêncan e,
Qûna te nagre... nebekiyê hespan û tewlan e,
Tu nikarî bi qîz û bûkên Milan re bikî henek û kêf û laqirdiyan e,
Ji wî re dibêjin şerê Îbrahîmê Çîl ê tirkan e,
Ne şerê sebî û sakûlan e,
Evdo rabû ji nava şekalan berê xwe da alî kêşê konan e,
Digot: Dewro lawo tu roviyê bikeve qulan e,
Eger tu pûşt î here devê xwe bide ber devê qîzan û bûkan e,
Eger tu mêr î rabe here, berê xwe bide bin konê axayê Milan e,
Were, se û sakûlê kuçan îro bi extiyarê bavê te keniyane,
Yar yar... egîto yar,
Wêl egîto dilê min liyan e, wêl liyan e,
Derwêş radibû ji binê konan e,
Berê xwe dida bin konê axayê Milan e,
Rûdiniştin li nava şekalan li dewsa solan e,
Axayê Milan digot: Derwêşê keremke quncê odê, pişta xwe bide doşek û
nazbalîfan e,
Digot: Axa cihê mêran li nava şekalan e,
Pişta mêran li palî devan e,
Weleh îro di odeya te de se û sakûlê kuçan bi extiyarê kalê bavê min keniyane,
Yar yar... egîto yar,
Wêl egîto dilê min liyan e, wêl liyan e,
Nizanin ji min ra dibêjin Derwêşê Evdî hûtê binê beriyan, gamêşê golan, seqalê
nava siwaran e,
 ...
Qey nizanin ji min ra dibêjin Derwêşê Evdî hûtê binê beriyan, gamêşê golan,
seqalê nava siwaran e,

Weleh cihê mêran nava şekalan e,
Piştâ mêran li palî devan e,
Yar yar... egîto yar,
Wêl liyan e, dilê min liyan e, egîto dilê min liyan e,
Ew diketin şêwr û mişêwra giran e,
Bala xwe didanê, Îbrahîmê Çîl ê tirkan dikete nava konan e,
Konê reş ê erebî dida ber şûran e,
Digirtin Edûlxanê gula nava qîzan û bûkan e,
Davêtin payê çitan û perdane,
Heçî xortan, simbêl di devê wan de şikiyane,
Heçî kalan riyê xwe mizdane,
Derwêşê Evdî radibû ji hêşê konan e,
Diket pey siwarê wan e,
Çîl siwaran dikuştin ji wan e,
Lingên hespê wî diketin nava qulê kurmoriyan e,
Îbrahîmê Çîl ê tirkan ew da ber şûran e,
Yar yar... egîto yar,
Evdo digot: Sebro lawo dilê min liyan e,
Îro sê şev û sê roj in, Derwêş rabûye çûye şer û qewxê giran e,
Tu ketî nava komê pîrekan e,
Law rabe hela mêzeke birayên te li ku mane,
Sebro radibû ji nava konan e,
Diket pey siwarê wan e,
Îbrahîm Çîl ê tirkan dikuşt tevî siwarê wan e,
Dianî Derwêşê Evdî gamêşê hêçê geliyan e,
Yar yar... egîto yar,
Axayê Milan wê gavê soz û qirarê Edûlxanê dida wan e,
Yar yar... egîto yar.⁴⁰¹

⁴⁰¹Mihemedê Nenyasî, ji berhema Antolojiya Dengbêjan, Weşanên Şaredariya Bajarê Mezin A Diyarbekirê, Stenbol, ç: 2, 2011.

داستان

پدیده‌های زبان و منیجه

زبان گورانی

از داستانهای ملی ایران — روایت قدیم متعلق به کردتشنین

متن مصحح، ترجمه فرانسوی، مقدمه، یادداشتهای زبان شناسی

و فرهنگ گورانی

با تحقیقی در باره موضوعات مربوط به فرهنگ عامه

از

دکتر محمد مکرری

از انتشارات مرکز تنبغات علمی وزارت معارف فرانسه

پاریس

۱۳۴۵ شمسی — ۱۳۸۶ قمری

۱۹۶۶ مسیحی

محل فروش در کشور فرانسه :

کتابفروشی کلینکسیک

۱۱ کوچه لیل

پاریس ۷

PÊVEK II:

Berga orjînal a pirtûka Muhammed Mukrî, Efsaneyê Bijen û Menîce (Versiyona Populer a Kurdistana Başûr), Weşanxaneyê Centre National, belavkirin: Librairie Klincksieck (Paris), 1966.

**T.C.
Mardin Artuklu Üniversitesi
Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Ana Bilim Dalı**

Yüksek Lisans Tezi

BİR KAÇ KURMANCÎ NESİRDE EFSANE AŞKLAR

**Edip Polat
11711010**

**Danışman
Prof. Dr. Kadri Yıldırım**

Mardin 2015